11

Kurdiname

Akademîk

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

e-ISSN : 2687-5438
Issue/ Jimar 11
Mijdar/ November 2024

https://dergipark.org.tr/kurdiname

Kurdish Turkish English Persian Arabic

CONTENT / NAVEROK

Research Articles / Gotarên Lêkolînî / Araştırma Makaleleri

		Page/ Rûpel
1	**Cotepeyv di Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî da** (Reduplications in Sheikh Shamsedddin Akhlati's Diwan) **Önder Beyter** – Türkiye **Zafer Açar** –Bingöl University- Türkiye	**1-17**
2	**Hunerên Edebî di Dîwana Mela ‘Ebdûllahê Babnîrî da** (Literary Arts in The Court of Mela 'Abdullah Babniri) **Mehmet Edip Çağmar** - Dicle University - Türkiye	**18-44**
3	**Bandora Kanalên asimanî yên Kurdî Liser hevnizîkirina zaravayên zimanê Kurdî (TRT Kurdî - Sahar Kurdish - Rudaw)** (The role of Kurdish satellite channels in approximating the dialects of Kurdish Language (TRT Kurdî - Sahar Kurdish - Rudaw) **Hunar Muhammad Hussein-** Cihan University -Iraq **Reber Hussein Abo**-Ministry of Finance and Economy -Iraq	**45-74**
4	**Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jiyan û Hunera *Kilamcî* Elî Dore** (Between Tradition and Technology: The Life and Art of the *Kilamci* Elî Dore) **Sevim Hatun Sürücü** - Türkiye	**75-95**
5	**Şopên Ziman û Edebîyata Kurdî di “Seyahatname”ya Ewlîya Çelebî de** (Traces of Kurdish Language and Literature in the “Seyahatname” of Ewlia Celebi) M. Zana KARAK - Türkiye	**96-117**
6	**مدينة "نصيبين" في مصادر العصر الآشوري الحديث (912-612 ق.م)** (The City of "Nusaybin" in the Sources of the Neo-Assyrian Period) (912-612 BC) **Farouk Ismail** - Aleppo University - Syria	**118-129**
7	**هێمایێن مێژوویی دشعرا نووخازا کوردیدا** (Historical Aspects In The Poetry Of Kurmancis) **Surood Weli Ismael Al-jaf** - University of Baghdad-Iraq **Rabeea Ismael Khaled Zebari** - Knowledge University-Iraq **Hemn Karim** - Komar University- Iraq	**130-150**
8	**شۆرەشا شێخ عوبەیدوڵلاهێ نەهری و هەلوێست و سیاسەتا بەریتانیا 1880-1883: خواندنەکا مێژووی و بەڵگەنامەیی** (The Revolt of Sheikh Obaidullah Nehri and the British Attitude and Policy 1880-1883: A Historical and Documentary Study) **Karwan Salih Waisy**- Zakho University-Iraq	**151-184**

Translation Articles / Gotarên Wergerî /Çeviri Makaleleri

9	**Kuzey Mezopotamya’ya Yolculuklar II** (Journeys in North Mesopotamia II) **Mark Sykes** Wergera ji Îngîlîzî: **Emrah Işik**, Batman University - Türkiye **Kenan Bozkurt**, Batman University - Türkiye	**185-198**

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

e-ISSN: 2687-5438

Kovara Kurdiname'yê ya Bi Hakem û Navnetewî
International Peer-Reviewed Journal of Kurdiname
Uluslararası Hakemli Kurdiname Dergisi
(e-Journal)

Publisher
Assoc.Prof. Osman ASLANOĞLU –Dicle University - Türkiye
Email:osman.aslanoglu@dicle.edu.tr– aslanogluosman@gmail.com
Orcid: 0000-0001-6534-3125

Frequency - Demên weşanê
April - November // Nîsan – Mijdar

Articles' Languages - Zimanên Gotaran
Kurdish – Turkish – English - Persian - Arabic

Website - Malper
https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiname

Editorial Board // Licneya Edîtorîyê
Prof. Dr.Hayreddin KIZIL /Dicle University/ Türkiye, hkhayreddin@gmail.com
Orcid: 0000-0001-9165-3274
Assoc.Prof. Osman ASLANOĞLU / Dicle University/ Türkiye, aslanogluosman@gmail.com,
Orcid: 0000-0001-6534-3125
Asst.Prof. Yadollah Pashabadi / University of Kurdistan, Sanandaj / Iran: y.pashabadiuok.ac.ir
Orcid: 0000-0002-5781-4975.
Assoc. Prof. İlyas SUVAĞCİ. (Hakkari University) Türkiye: ilyascembeli@gmail.com
Orcid: 0000-0001-6409-1229
Dr. Nevzat Eminoğlu / Muş Alparslan University/ Türkiye: nevzat.eminoglu@hotmail.com
Orcid: 0000-0002-4980-7556

Associate Editors // Alîkarên Edîtor

R. A. Resul GEYİK // Mardin Artuklu University - resulteacher@gmail.com
Orcid: 0000-0003-3516-098X
R.A. Betül ÇOBAN // Mardin Artuklu University - cbnbetul@gmail.com
Orcid: 0000-0002-2715-9885

Fields' Editors // Edîtorên Qadan

Classical Literature:
Dr. Nevzat EMİNOĞLU / Muş Alparslan University, Türkiye / nevzat.eminoglu@hotmail.com
Orcid: 0000-0002-4980-7556
Modern Literature
Assoc. Prof. İlyas SUVAĞCİ / Hakkari University, Türkiye / ilyascembeli@gmail.com
Orcid: 0000-0001-6409-1229
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN / Dicle University, Türkiye / hacidicleyeni@gmail.com
Orcid: 0000-0001-9528-0209
Grammer and Linguistic
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN / Dicle University: tahirhan@hotmail.com
Orcid: 0000-0002-2586-2956
Folklor and Culture
Prof. Dr. Hayreddin KIZIL / Dicle University, Türkiye / hkhayreddin@gmail.com
Orcid: 0000-0001-9165-3274

Languages' Editors // Edîtorên Zimanan

Kurdish/Soranî: Asst. Prof. Hemin OMAR AHMAD / Bingöl University, Türkiye / hahmad@bingol.edu.tr
English: Dr. Resul GEYİK / Mardin Artuklu University, Türkiye / resulteacher@gmail.com, Orcid: 0000-0003-3516-098X
Kurdish/Kurmanji: Betül ÇOBAN / Mardin Artuklu University, Türkiye / cbnbetul@gmail.com
English: Yasser ABDY / Dicle University, Türkiye / yasser.abdy@dicle.edu.tr
Kurdish/Zazaki: Esat ŞANLI / PhD student, Türkiye / esatsanli84@gmail.com
Orcid: 0000-0002-3130-1143
Kurdish/Kurmanji: Haşim ESEN / PhD student, Türkiye / esenhasim2102@gmail.com
Orcid:0000-0002-0278-1336
Kurdish/Zazaki: Veysel YILDIZHAN/ PhD student, Türkiye / vyildizhan@outlook.com
Orcid: 0000-0002-0419-2789

Manuscript Editor // Edîtorên Raçavê

Phd. Sinan GÜLTEKİN, PhD student, Turkiye, mamostesinan@gmail.com,
Orcid: 0000-0001-8562-6018

Advisory Board // Licneya Şêwrê

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK / Mardin Artuklu University: Turkiye, abdurrahmanadak@gmail.com
Orcid: 0000-0002-9124-1605
Prof. Dr. Tahirhan AYDIN / Mardin Artuklu University: Turkiye, tahirhan@hotmail.com-
Orcid: 0000-0002-2586-2956
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ / Dicle University: Turkiye, tanriverdi21@hotmail.com
Prof. Dr. Nesim DORU / Mardin Artuklu University: Turkiye, nesimdoru@artuklu.edu.tr
Orcid: 0000-0002-3519-7654.
Prof. Dr. Yadgar R. Hamadameen / Soran University: Iraq: ya@soran.edu.iq
Prof. Dr. Carina Jahani, Uppsala University, Sweden, E-mail:carina.jahani@lingfil.uu.se
Prof. Dr. Ludwig Paul, Hamburg University, Germany, E-mail: ludwig.paul@uni-hamburg.de
Prof. Dr. Michael Chyet, USA, mooklash@yahoo.com
Prof.Dr. Hüseyin YAŞAR / Siirt University, Türkiye: hyasar@siirt.edu.tr
Prof. Dr. Hayreddin KIZIL / Dicle University: Turkiye, hkhayreddin@gmail.com
Prof. Dr. Zahir ERTEKİN / Mardin Artuklu University: zahirertekin@hotmail.com
Assoc. Prof. Jaffer Sheyholislami, Carleton University, Canada, JafferSheyholislami@cunet.carleton.ca
Assoc. Prof. Ayhan TEK /Muş Alparslan University: Turkiye, ayhan_tek@hotmail.com
Assoc. Prof. Mustafa ÖZTÜRK / Mardin Artuklu University: Turkiye, mustafaozturk47@gmail.com
Assoc. Prof. Birgül Açıkyıldız / Paul Valéry Montpellier III University, birgul@acikyildiz.com
Assoc. Prof. Necat KESKİN / Mardin Artuklu University: Turkiye, necatkeskin@gmail.com
Assoc. Prof. Hassan Sarbaz / Kurdistan University: Sanandaj- Iran h.sarbaz@uok.ac.ir
Assoc. Prof. Hacı ÖNEN / Dicle University: Turkiye, hacionen@gmail.com
Assoc. Prof. İsmail SÖYLEMEZ / İnönü University: Turkiye, ismail.soylemez@inonu.edu.tr
Assoc. Prof. Ahmet KIRKAN / Mardin Artuklu University: Turkiye, ahmetkirkan@gmail.com
Assoc. Prof. Ercan GÜMÜŞ / Mardin Artuklu University: Turkiye, ercangumus1977@gmail.com
Assoc. Prof. Mehmet Emin PURÇAK / Muş Alparslan University: Turkiye, epurcak@hotmail.com
Prof. Dr. Feryad Fazil Omar, Freie Universität Berlin, Germany, Email: feryad-fazil.omar@fu-berlin.de
Argun Çakır, University of Bristol, Germany: argun.cakir@bristol.ac.uk
Assoc. Prof. İlyas SUVAĞCİ / Hakkari University: Turkiye, ilyascembeli@gmail.com
Asst. Prof. Mehmet Rezan Ekinci / Mardin Artuklu University: merekinci@gmail.com
Asst. Prof. Faruk KAZAN / Dicle University Turkiye, fkazan21@hotmail.com
Asst.Prof. Bakhtiyar Sajjadi / Kurdistan University: Sanandaj /Iran: bakhtiar_sadjadi@yahoo.com
Asst.Prof. Esmail Shams, University Of Allameh Tabataba'i, : Tahran / Iran, shams.guranlur@gmail.com
Asst.Prof.Arkhwan MOHAMMED OBAID-Karkuk University: Iraq: arkhawanmohammed83@uokirkuk.edu.iq
Dr. Hewa Salam Khalid/ Koya University: Iran: hewasalam@gmail.com
Dr. M. Şirin FİLİZ / Mardin Artuklu University: Türkiye: mehmetsirinfiliz@gmail.com

Referee Board / Licneya Hakeman

Journal of Kurdiname uses double-blind review fulfilled by at least two reviewers.
Referee names are kept confidential.
(Kovara Kurdinameyê nirxandina herî kêm "du hakemên kor" bikar tîne.
Navên hakeman tên veşartin)

INDEX

ERIH PLUS, MLA, EBSCO Host, Brill Linguistic Bibliography
Index Islamicus ……

CONTACT/TÊKILÎ

Chief-Editor: aslanogluosman@gmail.com, osman.aslanoglu@dicle.edu.tr
Journal : kurdiname@dicle.edu.tr
Website: https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname

ABOUT JOURNAL

Kurdiname is a Refereed International Journal Published in Electronic
Publish period is twice a year
This journal uses double-blind review
Publishing article is free for authors
The journal articles are open access for readers
Articles being controlled for plagiarism before review
All articles are licensed under the *"Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)"*
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/
The Responsibility of the articles published in the journals belongs to the author/authors.

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

CONTENT / NAVEROK

Research Articles / Gotarên Lêkolînî / Araştırma Makaleleri

		Page/ Rûpel
1	**Cotepeyv di Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî da** (Reduplications in Sheikh Shamsedddin Akhlati's Diwan) **Önder Beyter** – Türkiye **Zafer Açar** –Bingöl University- Türkiye	**1-17**
2	**Hunerên Edebî di Dîwana Mela ‘Ebdûllahê Babnîrî da** (Literary Arts in The Court of Mela 'Abdullah Babniri) **Mehmet Edip Çağmar** - Dicle University - Türkiye	**18-44**
3	**Bandora Kanalên asimanî yên Kurdî Liser hevnizîkirina zaravayên zimanê Kurdî (TRT Kurdî - Sahar Kurdish - Rudaw)** (The role of Kurdish satellite channels in approximating the dialects of Kurdish Language (TRT Kurdî - Sahar Kurdish - Rudaw) **Hunar Muhammad Hussein**- Cihan University -Iraq **Reber Hussein Abo**-Ministry of Finance and Economy -Iraq	**45-74**
4	**Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jiyan û Hunera *Kilamcî* Elî Dore** (Between Tradition and Technology: The Life and Art of the *Kilamci* Elî Dore) **Sevim Hatun Sürücü** - Türkiye	**75-95**
5	**Şopên Ziman û Edebîyata Kurdî di “Seyahatname”ya Ewlîya Çelebî de** (Traces of Kurdish Language and Literature in the “Seyahatname” of Ewlia Celebi) M. Zana KARAK - Türkiye	**96-117**
6	**مدينة "نصيبين" في مصادر العصر الآشوري الحديث (912-612 ق.م)** (The City of "Nusaybin" in the Sources of the Neo-Assyrian Period) (912-612 BC) **Farouk Ismail** - Aleppo University - Syria	**118-129**
7	**هێمایین مێژوویی دشعرا نووخازا کوردیدا** (Historical Aspects In The Poetry Of Kurmancis) **Surood Weli Ismael Al-jaf** - University of Baghdad-Iraq **Rabeea Ismael Khaled Zebari** - Knowledge University-Iraq **Hemn Karim** - Komar University- Iraq	**130-150**
8	**شۆرەشا شێخ عوبەیدوڵاهی نەهری و هەڵوێست و سیاسەتا بەریتانیا 1880-1883: خواندنەکا مێژووی و بەڵگەنامەیی** (The Revolt of Sheikh Obaidullah Nehri and the British Attitude and Policy 1880-1883: A Historical and Documentary Study) **Karwan Salih Waisy**- Zakho University-Iraq	**151-184**

Translation Articles / Gotarên Wergerî /Çeviri Makaleleri

9	**Kuzey Mezopotamya’ya Yolculuklar II** (Journeys in North Mesopotamia II) **Mark Sykes** Wergera ji Îngîlîzî: **Emrah Işik**, Batman University - Türkiye **Kenan Bozkurt**, Batman University - Türkiye	**185-198**

Kurdiname Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

Cotepeyv di Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî da

(Reduplications in Sheikh Shamsedddin Akhlati's Diwan)
(Şeyh Şemsedddin Ahlati Divanı'nda İkilemeler)

Önder BEYTER*
Zafer AÇAR**

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatin: 09.10.2024
Accepted // Pejirandin: 05.11.2024
Published // Weşandin: 29.11.2024
Pages // Rûpel: 1-17
DOI: 10.55106/kurdiname.1564380

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/

Citation/Atif: Beyter, Önder û Açar, Zafer, Cotepeyv di Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî da, 2024, *Kurdiname*, 11, r. 1-17

Authors Contributions/Rêjeya Nivîskaran: Data Collection: Author-1 (%60), Author-2 (%40), Data Analysis: Author-1 (%60), Author-2 (%40), Submission and Revision: Author-1 (%60), Author-2 (%40)

Plagiarism/Întîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Cotepeyv wekî cureyeke komepeyvan bi dubarebûna morfem an jî peyvan saz dibe ku bi vê dibe qalibekî rêzimanî û maneyî. Dîsa cotepeyv di risteyê da erkên giring ên wekî xurtkirina hêza ravekirinê, dupatkirina wateyê û dewlemendkirina têgehê hildigire. Hin rêzimanên kurmancî cih daye pênase û nimûnekirina cotepeyvan, lê xusûsen, di kategorîkirina cotepeyvan da, di lîteratura kurdî da kêm xebat hene û herwiha li ser metnên kurmancî kêm xebat hatine kirin. Xebata me cotepeyvên Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî vedikole. Yek ji egerên vê xebatê jî hêla şiira Exlatî ya ku bi tekrara deng û peyvan sazbûyî û ahenga muzîkal e ku têra xwe nimûneyan pêşkêşî vê sehayê dike. Me di xebata xwe de ji bo cotepeyvan çar kategorî pêşniyaz kir û me her kategoriyek jî dabeşî ser çendîn sernavan kirin. Her wiha ji bo van sernavan jî me ji *Dîwana Exlatî* mînak anîn û parve kirin. Cotepeyvên ku me li gorî kategoriyan lîste kir û yên alfabetîk rêzkirî me anî di pêveka xebatê de li ser tabloyan pêşkêş kir. Bi vê xebata xwe ve me di *Dîwana Exlatî* da 106 cotepeyv tesbît kirin. Herwiha me dît ku Exlatî di dîwana xwe da cotepeyvên ji heman peyvan û herwiha yên ji peyvên hemwate, nêzwate û dijwate bi kar anîne. Dîsa bi qasî ku me tesbît kir, Exlatî di helbestên xwe da di forma navdêr, rengdêr, hoker, lêker û nîdayê da sûd ji cotepeyvan wergirtiye û bi wasiteya daçek û gihanekan jî cotepeyv çêkirine. Dîsa me dît ku Exlatî di helbestên xwe da cotepeyvên ku ji peyvên bêwate çêdibin, neemilandine. Ji aliyekî din ve jî pareke mezin ya cotepeyvên Exlatî karekter û meşrebê wî yê tesewifî diyar dike ku hêjayî lêkolînan e.

Peyvên Sereke: Cotepeyv, cureyên cotepeyvan, Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî

Abstract

Reduplications are grammatical and semantic word patterns consisting of morpheme and word repetitions. At the same time, they are structures that increase the power of interpretation, strengthen meaning and enrich concepts in sentences. Although some linguistic studies in Kurdish have included definitions and

*Xwendekarê doktorayê, Zanîngeha Bîngolê, Ziman û Edebiyata Kurdî, Turkiye, beyter1990@hotmail.com, Orcid: 0009-0002-4859-3004 /// *PhD student of Kurdish Language and Literature, University of Bingol Turkiye,* beyter1990@hotmail.com, Orcid: 0009-0002-4859-3004

**Doç. Dr., Zanîngeha Bîngolê, Şaxa Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Turkiye, zafer13acar65@gmail.com, Orcid: 0000-0001-5323-9531 /// *Assoc. Prof., Bingol University, Department Kurdish Language and Literature, Turkiye, zafer13acar65@gmail.com, Orcid: 0000-0001-5323-9531*

exemplifications of doubling, there are very few studies in the literature on categorization and selected examples from Kurdish texts. Our study analyzes the reduplications of Şey Şemseddin Akhlati's Diwan. One of the factors that led to this study is the literary expressions and musical harmony consisting of sound and word repetitions in Akhlati's poetry, which contains enough material for this subject. Our study consists of two parts. In our study, we have dealt with the subject in four categories, each category consisting of different headings. For each heading, we have explained the examples we have quoted from Ahlati Divan. In the appendix of our study, we have tabulated and presented the reduplications that we have divided into categories together with the ones we have arranged in alphabetical order. In this study, we have identified 106 reduplications in Akhlati's Diwan. We have found that Akhlati uses reduplications in the Diwan as consisting of the same words, synonyms, close meaning, antonyms. In the same way, we found out that he utilized the noun, adjective, adverb, verb and noun forms of doublets, and formed doublets with the help of prepositions and conjunctions. We also found out that Akhlati did not use reduplications formed with meaningless words. On the other hand, we revealed that a significant number of reduplications in Akhlati's Diwan point to his Sufi style and character and that this aspect is worthy of research.

Keywords: Reduplications, reduplication types, Sheikh Shamsedddin Akhlati’s Diwan

Özet

İkilemeler morfem ve kelime tekrarlarından oluşan dilbilgisel ve anlamsal söz kalıplarıdır. Aynı zamanda cümle içerisinde yorum gücünü artıran, anlamı güçlendiren ve kavramları zenginleştiren yapılardır. Kürtçe'de kimi dilbigisi çalışmalarında ikilemelerin tanım ve örneklendirmelerine yer verilmiş olsa da, literatürde, kategorilendirme hususunda ve Kürtçe metinlerden seçme örnekler vererek yapılan çalışmalar çok azdır. Çalışmamız Şey Şemseddin Ahlati Divanı'nın ikilemelerini incelemektedir. Bu çalışmaya neden olan etkenlerden birisi de Ahlati'nin şiirindeki ses ve kelime tekrarlarından oluşan edebi ifadeler ve müzikal ahenktir ki bu konu için yeterince malzemeyi ihtiva etmektedir. Çalışmamızda konuyu her bir kategorisi farklı başlıklardan oluşan dört kategori halinde ele aldık. Her başlık için Ahlati Divanı’ndan alıntıladığımız örnekleri açıkladık. Kategorilere ayırdığımız ikilemeleri de çalışmamızın ekinde alfabetik sıraya göre dizdiklerimiz ile birlikte tablolaştırarak sunduk. Bu çalışmamızla Ahlati'nin Divanı'nda 106 ikileme tesbit ettik ve ikilemelerin; aynı sözcüklerden oluşan, eş anlamlı, yakın anlamlı, zıt anlamlı şeklinde kullanıldığını gördük. Aynı şekilde ikilemelerin isim, sıfat, zarf, eylem ve nida biçimlerinden faydalanıldığını, edat ve bağlaçlar yardımıyla da ikileme oluşturulduğunu ortaya çıkardık. Yine Ahlati'nin anlamsız sözcüklerle oluşturulan ikilemeleri kullanmadığını tesbit ettik. Öte yandan Ahlati'nin Divanı'ndaki önemli sayıda ikilemenin onun tasavvufî meşrep ve karekterine işaret ettiğini ve bu yönüyle araştırmaya değer olduğunu ortaya koyduk.

Anahtar Kelimer: İkleme, ikileme türleri, Şeyh Şemsedddin Ahlati Divanı

Despêk

Cotepeyv di kurmancî da wekî dubarekirina peyvan hatiye pênasekirin û wisa jî wekî têgeheke rêzimanî ketiye lîteraturê. Lê di îngilizî da dema em berê xwe didine lîteraturê, em dibînin ev têgeh anku *reduplication* dubarebûna dengan, morfem an jî peyvan nîşan dike ku dikare wekî "(du)carîkirin"ê bê manekirin. Hasphelmath û Sims (2010, r. 38) cotepeyvê bi kopîkirina perçe yan jî qurmekê îfade dikin ku li vir "kopîkirin" îfadeyeke krîtîk e ji bo pênasekirina vê têgehê. Urbanczyk (2017) jî cotepeyvan wekî cureyeke sazkirina peyvan dibîne ku dema qismekî peyvê yan jî temamê wê dubare dibe, cotepeyv saz dibe û ev qismê kopîkirî dikare ji perçeyeke peyvê yan jî komên peyvan pêk were. Di tirkî da jî têgeh li ser ducarkirinê anku *ikileme*yê saz bûye ku ji bo binyad û tebîeta têgehê maneyeke guncan jê re dîtiye. Jixwe di eynî xebata xwe da Hasphelmath û Sims ji bo hin cureyên cotepeyvan têgeha *duplifixes*ê pêşniyaz dikin ku (Hasphelmath û Sims, 2010, r. 39) ducarîkirina morfeman xweş nîşan dide.

Dîsa, gelek xebatan ev binyadên semantîk, morfolojîk û morfosentaktîk pênase kirine. Cotepeyv wekî îfadeyên qalibî ne ku hêmanên wê nayên perçekirin Baran (2010, r.39). Cotepeyv bi gelemperî wekî wan hêmanan tên pênasekirin ku bi dubarebûna bêjeyên hemwate, nêzwate û dijwate ava dibin û her wisa dewlemendiya zimanî ya ji hêla hebûna bêjeyî nîşan didin. Cotepeyv hema hema di hemû zimanan da hene û ji hêmanên heyîna bêjeyî ne (Taş, 2012, r. 43). Cotepeyv ew koma peyvan e ku ji dudu yan jî zêdetir peyvan pêk tên û di navbera wan da pergaleke dengî heye, ji hêla teşe û maneyê têkildarî hev in û hemwate, nêzwate yan jî dijwate ne (Korkmaz, 2010, r. 123). Dîsa li gorî dîtineke din, cotepeyv, rêbazeke ravekirinê ya bêdaraz e ku ji bo xurtkirina hêza vegotinê, dupatkirina wateyê û dewlemendkirina têgehê tê emilandin. Cotepeyv her wisa wê peywirê jî tînin cih ku gotinên pêşiyan û biwêj di hişê mirov da rûnên. Dîsa tişta ku li beramberî îfadeyên dirêj, hêz û quwetê dide biwêjan, ew cotepeyv in ku di avaniya wan da heye (Demir, 2006, r. 596). Her wisa bedewbûn û lihevhatina dengan, dirûvgirtina wateyî û rêzikî, di ristesaziyê da emilandina wê ya wekî navdêr, rengdêr, hoker û lêkeran û her wiha xurtkirina hêza ravekirinê, dupatkirina wateyê û dewlemendkirina têgehê ji taybetiyên sereke yên cotepeyvan in (Aktan, 2016, r. 27).

Ev xebat helbet ne xebata pênasekirina cotepeyvan an jî nîşandana binyada wan û teorîzekirina wan e di şexsê kurmancî da. Lê ev xebat wê yekê dide ber xwe ku cotepeyvan li ser hin kategoriyên diyar ji berhemeke klasîk a kurdî nîşan bide û nimûne bike. Bi vê, him berî dide gramera van îfadeyan him jî berî dide rehendê maneyî yê van îfadeyan ku di vegêrana edebî anku belaxetê da giring in.

Ji bo ku em xebata xwe li ser kategoriyan tetbîq bikin me anî ji xebatên mîna Hatipoğlu (1981), Demir (2006), Korkmaz (2010), (Ertekin û Açar, 2015), Urbanczyk (2017) zêdetir sûd wergirt. Herwisa ji bo ku em nimûneyên xwe jê bidin me deqê Dîwana Şêx Şemsedînê Exlatî hilbijart ku me ji du nusxeyan; xebata Serdar (2015) û çapa Wezareta Çand û Turîzmê (2022) sûd wergirt.

Li ser kategorîkirina cotepeyvan dikare bê gotin ku di gelek zimanan da gelek xebatan ev hêman him ji alîyê rêzimanî û him jî ji alîyê maneyî ve kategorîze kirine. Bo nimûne (Çürük, 2016) derdibire ku Hans Georg Müller ji aliyê maneyê ve cotepeyv kirine duwazdeh kategorî ku bixwe jî di bin bîst kategorî/sernavî da cotepeyvan ji aliyê maneyê ve dinirxîne ku tevî binbeşê sernavan hejmareke mezin ya wan maneyan bi dest dikevin. Dema em berê xwe didine kurdî, di berhemên rêzimanên kurmancî da û di xebata Ertekin û Açar da hin kategorîkirin hatine kirin lê wekî ku Ertekin û Açar (2015, r. 91) amaje pê kirine ev mijar dikare bê berfirehkirin û di bin kategoriyên din da bê nirxandin.

Ji aliyê xwe ve Ertekin û Açar (2015, r. 85-86) di gotara xwe da wek mane û şiklî cotepeyv dabeşî du kategoriyên sereke kirine û di bin kategoriya wateyê da cotepeyv wekî cotepeyvên hemwate, cotepeyvên dijwate, cotepeyvên nêzwate û cotepeyvên têkilhev; di bin kategoriya şiklî da jî cotepeyv wekî cotepeyvên ducarî, cotepeyvên nêzdeng û cotepeyvên hevedudanî dabeş kirine. Lê me ji wan cudatir di xebata xwe da cotepeyv bi ser çar kategoriyan dabeş kirin ku ew jî ji aliyê avabûna wateyê, ji aliyê avabûna peyvê, ji aliyê cureya peyvê û ji aliyê dariştina peyvan ve ne. Dîsa ev kategorî jî her yek di nava xwe da dabeşî bi ser çend sernavên cuda dibin ku ev yek di beşa têkildar da hatiye destnîşankirin. Her di vir da divê em destnîşan bikin ku me

ravekirina mijar û sernavan û tetbîqkirina wê li ser *Dîwana Exlatî* rexberî hev meşand. Anku piştî ku me sernav pênase û rave kir û her wiha çend nimûne parve kirin, bi şûnda me cih da mînakên ji dîwanê. Di tetbîqkirina sernavan a bi ser dîwanê da û di bîterkirina mînakên ji dîwanê da em bi giştî bi ser ketin, lêbelê di wan herdu sernavên cotepeyvan da yên ku bi peyvên bêwate ava dibin, me di *Dîwana Exlatî* da nimûne nedîtin ku ev jî tê wê wateyê ku Exlatî di dîwana xwe da cotepeyvên bêmane bi kar neanîne.

Di beşa duyem a xebata xwe da jî me cotepeyvên ku di *Dîwana Exlatî* da derbas dibin, beş bi beş kirin lîste û her wiha herî dawî jî me lîsteya sercem cotepeyvan wek pêvek di dawiya gotarê da parve kir.

Wekî dawiya vê qismê, ku kurt bimîne jî divê em behsa Exlatî û şêwaza wî bikin ku terza helbesta wî bûye îlhama vê xebatê. Şêx Şemseddînê Exlatî ji gelek aliyan ve xwedî şêwazeke serbixwe ye. Di helbesta kurdî ya klasîk da qalib û hêmanên sentaktîk yên nû ava kirine (Yılmaz, 2013, r. 60). Çawa ku Başçı û Aykaç (2022, r. 77) jî derdibirin; “Exlatî dubarekirina tîpan, deng û kîteyan bi hostatî bi kar aniye û bi uslûba xwe ya serkeftî nîşanî me dide ku wî çiqas giringî daye mûsîqaya helbestê. Lewma dikare bê gotin, xala sereke ya şiira wî, aheng û armoniya xurt e.” Li aliyekî din ew tekrarên ku Exlatî di helbestên xwe da bi kar anîne, him dikarin bibin keresteyên lêkolînên fonolojîk ku Adak (2017, r. 51) hêmanên dengan ên mîna serwa, serwaya hundurîn (tesmît), paşserwa, tekrîr, cînas, îştîqaq, î’ade, eks, muwazene, aliterasyon û hwd. nîşan dide, him jî di peywenda xebatên morfolojîk da dikare bikeve ber lêkolînan ku ev xebat bi vê peywendê wan tekraran di nav vegira cotepeyvan da vedikole.

1. Kategoriyên Cotepeyvan

Di vê xebatê da me cotepeyv bi ser çar kategoriyan da dabeş kirin û me vekolîna xwe li gorî van kategoriyan pêk anî. Helbet ev her çar kategorî jî di nav xwe da bi ser çendîn sernavên cuda dabeş dibin. Kategoriyên sereke yên ku ev xebat li ser ava bûye ew kategorî ne ku cotepeyvan “ji hêla avabûna wateyê”, “ji hêla avabûna peyvê”, “ji hêla cureya peyvê” û “ji hêla dariştina bêjeyan” vediçirîne û herweha nimûne û analîzan pêşkêş dike.

1.1. Cotepeyv ji Aliyê Avabûna Wateyê ve

Ziman heyîneke zindî ye û timî hin peyvên wê dimirin, jê dikevin û hin peyvên nû jî li gorî şert û mercên jiyanê û pêdiviya demê, peyda dibin û tên wucûdê. Dema ev peyv peyda dibin an jî tên çêkirin, rêbazek jî ew e ku sûd ji cotepeyvan were girtin. Bi dubarekirina heman peyvê yan jî bi pevxistina du peyvên cuda ve wateyeke nû, ya xurt û berfirehtir tê bidestxistin. Ev jî derfetê dide ku mirov bi kêm peyvan, pir wateyan îfade bike. Lê wekî ku Hatipoğlu jî diyar dike, faktora herî giring a ku cotepeyvan derdixe holê, mane ye (Hatipoğlu, 1981, r. 55) û mirov dikare li gorî çarçoveya kategoriyên li xwarê, ji hêla wateyê ve li ser cotepeyvan raweste.

1.1.1. Cotepeyvên ku bi dubarebûna heman peyvê pêk tên

Ji bo bidestxistina maneyeke xurt, gelek caran bi rêya dubarekirina heman peyvê cotepeyv tên bidestxistin.

Mînak: bilez bilez, bere bere, car carî, dilop dilopî, hêdî hêdî, zû zû.

Geh li ser min ew tibû bar geh tibûm ez li wî sîwar
(Exlatî 3/9)[1] Her li bo tikrîme **car car** ku kerê min par*i* mir

Exlatî di vê malikê da di herdu misrayan da jî cotepeyv bi kar aniye û îfadeyeke xurt bi dest xistiye û her wiha bi rêya cotepeyvê di navbera herdu misrayan da jî ahengek pêk aniye. Lêbelê **geh geh**a di misraya yekem da ji ber ku wek qalib li pey hev bi kar neaniye, me nekir nav lîsteya cotepeyvan. Ev qalib zêdetir wekî gihanekên lêkdayî/hevedanî tê zanîn di kurmancî da ku "ne...ne, yan...yan, çiqas...ewqas" çend ji wan gihanekan in.

Sotim ji xemê **mû mû** ta çendî biçim **sû sû**
(Exlatî 7/2) Ey dost*i* were **zû zû** hey hey Çelebî qum qum

Di vê malika Exlatî da jî em çend nimûneyên cotepeyvên ji dubarebûna heman peyvî pêk tên dibînin. Exlatî di vir da diyar dike ku ew ji ber kul û xemê mû bi mû, têl bi têl şewitiye û wî rêya xwe wenda kiriye û nizane dê bi ku da biçe. Û lewma jî gazî kesê dost dike ku were hewara wî û rêyê nîşanî wî bide. Di vir da jî Exlatî bi emilandina cotepeyvê ve hem maneya malikên xwe xurt kiriye û hem jî muzîkalîte û ahenga wê berz kiriye. Dîsa Exlatî di vir da ji peyva farisî "sû"yê cotepeyv çêkiriye ku tê maneya "rê" û "alî". Ev bêje her wiha di peyva ku di Tirkî da wekî "çarşı" û di Kurdî da jî wekî "çarsî" hebûna xwe didomîne, tê maneya sûk û bazarê. Her wisa dema em ji hêla vê kategoriyê li *Dîwana Exlatî* dinihêrin, em dibînin ku 34 cotepeyvên ji vê cureyê hatine emilandin.

1.1.2. Cotepeyvên ku bi dubarebûna peyvên hemwate û nêzwate pêk tên

Di van cure cotepeyvan da bi gelemperî du peyvên hemwate digel hev tên emilandin. Anku mirov dema ji hêla wateyê ve li van peyvan binihêre, mirov dê bibîne ku maneya herduyan jî yek e û bi tenê forma peyvê ji hev cuda ye. Helbet meqseda emilandina li dû hev a du peyvên hemwate ew yek e ku îfadeyeke xurttir were bidestxistin.

Mînak: ar û heya, agir û alav, ax û wax, dil û can, canik û camêr, cerg û hinav, cewr û cefa, cil û cor, cih û war, eşq û muhbet, gul û giya...

Dîsa di nav van cotepeyvên hemwate û nêzwate da hin cotepeyv hene ku ji xeynî maneyê, ji hêla teşeyê ve jî dişibin hev û ahengeke şiklî jî di navbera wan da heye.

Mînak: zar û zêç, canik û camêr, ax û wax...

Dema ku em ji vê aliyî ve li *Dîwana Exlatî* dinihêrin, em dibînin ku di dîwanê da 64 cotepeyvên ji vê kategoriyê hatine emilandin ku ev jî rêjeyeke bilind e. Anku dîwan di warê kategoriya cotepeyvên hemwate û nêzwate da pir dewlemend e. Di cotepeyvên vê kategoriyê da Exlatî gelekî sûd ji mezmûnên edebiyata klasîk û her wiha peyvên Erebî û Farisî wergirtiye. Dema em li van cotepeyvan dinihêrin, em dibînin ku gelekê wan bi rêya peyvek Erebî, yek Kurdî û yan jî yek Erebî, yek Farisî hatine sazkirin. Ev yek di wan malikên Exlatî da jî dixuyê ku me wek nimûne li jêrê parve kirin.

Aşiq û dîwane yim ez muqîmê meyxane yim ez

[1] Nimûneyên ji *Dîwana Exlatî* me ji xebata Serdar (2015) û çapa Wezareta Çand û Turîzmê (2022) wergirtin. Di vir va reqema ewil rêza helbestê, reqema duyem jî rêza malikê nîşan didin. Anku "3" di vir da helbesta 3yem û "9" jî malika 9em îfade dike.

(Exlatî 1/3) Sot wekî perwane yim ez ten tele lat la la

Durrguher in biha yin ev cumle ji ber cema yîn ev
(Exlatî 8/7) Li aşiqan sefa yin ev wey ku bibêm wey ku nebêm

Geh geh wekî dîwane tigerim li kûyifan
(Exlatî 11/6) Geh bêser û saman tiçime **qerye û şaran**

1.1.3. Cotepeyvên ku bi dubarebûna peyvên dijwate pêk tên

Di kurdî da rêbazeke din a pêkanîna cotepeyvan jî emilandina peyvên dijwate ne. Hatipoğlu diyar dike ku di forma cotepeyvê da emilandina peyvên dijwate ya li rex hev, bi gelemperî sînorên wê têgehê nîşan didin ku tê xwestin were ravekirin (Hatipoğlu, 1981, r. 59).

Mînak: *kar û zirar* (birayê hev in), (wek) *şev û roj* (ji hev dûr in/cuda ne)*, xêr û şer* (tê da nemaye), *zû û dereng* (dê derkeve holê), *kêm zêde* (dişibin hev), *çepûrast* (lê dixe).

Wekî ku ji van mînakan jî diyar e, cotepeyvên bi vî rengî, darazê radigihînin û her wiha rastiyekê destnîşan û tewsîf dikin. Ji vê kategoriyê di *Dîwana Exlatî* da bi tenê 6 nimûne hene û me 3 jê li xwarê parve kirin.

Ji weqtê ku tinoşim meyê işqa Celalî
(Exlatî 10/4) Ne **leyl û nehar** bûn ne ev gunbedê gerdan

Ez xumar im baqerar im **roj û şev**
(Exlatî 14/2) Dûr ji yar im lew tizarim yol bilî

Ez*i* bêcah û meqam im **xadim û şah û xulam** im
(Exlatî 12/6) Meşriq û **nûr û zelam** im tenenaha ya hû

Di van malikên Exlatî da em dibînin ku dîsa cotepeyvên dikevin çarçoveya kategoriya jorîn, hatine sazkirin ku herdu peyvên wê yan Erebî, yan jî Kurdî ne. Anku Exlatî, şev roj hem bi Kurdî û hem jî bi Erebî îfade kiriye ku pê derfeta îfadekirina helbesta xwe dewlemendtir kiriye. Lê divê em wê yekê jî destnîşan bikin ku heger em ji hêla maneyê ve li ser hûr bibin, "leyl û nehara" di rûpela 142yem da dibe ku ne cotepeyv be. Lewra di vê malikê da wiha tê gotin, "Wextê (di qalûbelayê da) ku min ji bezma elestê vexwar meya işqa îlahî, hê ne şev û roj hebû û ne jî ev gunbeda gerdan (asîmanê bêstûn)." Lê leyl û nehar ji ber ku wek form, cotepeyv e, me ew jî kir nav lîsteyê. Ji aliyekî din ve, di vir da em dîsa cotepeyvên wekî "şah û xulam/nûr û zelam (ronahî û tarîtî)" dibînin ku ji têgehên dijber hatine sazkirin. Bi xwendineke sethî ve mirov nikare vê malikê fam bike. Lewra şair dibêje ku ew hem şah e û hem jî xulam û hem ronahî ye û hem jî tarîtî. Ji lewma jî divê mirov hay ji felsefeya şairî hebe ku meqseda wî çi ye di vê malikê da.

1.1.4. Cotepeyvên ku bi dubarebûna du peyvan pêk tên ku yek jê bi wate ya din bêwate ye

Cureyeke cotepeyvan jî ew e ku bi dubarebûna du peyvan pêk tên ku wekî di sernavê da jî derbas dibe, yek jê bi bi wate ya din jî bêwate ye. Di van cure cotepeyvan da yan peyva yekem an jî peyva duyem bi awayekî têkûz watedar e, peyva din siya peyva watedar e û bi kêrî xurtkirina wateyê tê (Hatipoğlu, 1981, r. 59). Dema em li mînakên li jêr dinihêrin jî em dibînin

ku carinan peyva yekem watedar e û ya duyem li gorî peyva yekem teşeyê werdigire û her wiha carinan jî peyva duyem watedar e û lewma peyva yekem diçe ser dirûvê ya duyem.

Mînakên watedarbûna peyva yekem: fen û fût, **fend** û finaz (Borak, 2014, r. 18), **vir** û vizik, **hişk**îhola, **zar** û zêç.

Mînakên watedarbûna peyva duyem: çil û **çiya**, kilî**kor**, ripî**reş**, şilî**şet**, xilî**xar**, zipî**ziha**, kûzî **kulfet**.

Her wisa bi qasî ku ji mînakên jêr diyar e, peyva bêwate yan jî ya di bin siya peyva watedar da timî bi herfa ewil a peyva watedar ve dest pê dike.

Mînak: **ç**il û **ç**iya, **f**en û **f**ût, **f**end û **f**inaz, **v**ir û **v**izik, **h**işkî**h**ola, **k**ilî**k**or, **r**ipî**r**eş, **ş**ilî**ş**et, **x**ilî**x**ar, **z**ipî**z**iha, **z**ar û **z**êç, **k**ûzî **k**ulfet.

Di *Dîwana Exlatî* da em rastî cotepeyvên ku dikevin çarçoveya vê kategoriyê nehatin.

1.1.5. Cotepeyvên ku bi dubarebûna du peyvên bêwate pêk tên

Peyvên ku cotepeyvên di vê kategoriyê da jê çêdibin, ji ber ku bi serê xwe maneyekê îfade nakin, bi awayekî cuda û tenê nayên emilandin. Lê bi şertê ku digel hev bên bikaranîn, ji van cure peyvan, îfadeyên watedar pêk tên.

Mînak: çîç vîç, tiroviro, şeqlobeqlo, hitil mitil.

Dîsa di *Dîwana Exlatî* da em rastî cotepeyvên ku dikevin çarçoveya vê kategoriyê jî nehatin.

1.2. Cotepeyv ji Aliyê Avabûna Peyvê ve

Cotepeyv ji hêla avabûna peyvê ve jî di nav xwe da dabeşî çar kategoriyan dibin. Ev cure cotepeyv ji hejmar, gihanek û daçekan çêdibin. Dîsa di vê kategoriyê da cureyek ji cureyên cotepeyvan bi "m"yê çêdibin. Cotepeyvên ku dikevin vê çarçoveyê tevî nimûneyên xwe li xwarê ne:

1.2.1. Cotepeyvên ji hejmaran çêdibin

Ev îfadeyên qalibî dikeve nava mêjerê ku peyvên hejmaran diyar dikin wekî jimarnav bûye cureyeke peyvan di hin xebatên kurmancî da. Hinek peyvên ku hejmaran îfade dikin, ji ya piçûk ber bi ya mezin rêz dibin û bi vî awayî cotepeyvan pêk tînin (Demir, 2006, r. 595). Carinan jî bi dubarebûna heman hejmarê ve jî cotepeyv çêdibe.[2]

Mînak: **du sê** quriş, **neh deh** meriv, **bîst sî** serî pez, tizbiya xwe **pênc pênc** berde, hûn **dudu dudu** werin.[3]

Di *Dîwana Exlatî* da em rastî cotepeyvên ji vê cureyê jî nehatin.

1.2.2. Cotepeyvên bi "m"yê çêdibin

[2] Xuyaye ku jimarên "dudu" û "sisê" (reng e sêsê ye) bi vê mantiqê saz bûne.
[3] Dîsa hin jimarnavên mîna yeko yeko, yek bi yek, du lib du lib... jî hene ku di risteyan da bi erka hokerê radibin.

Ev cure cotepeyv bi dubarebûna heman peyvê çêdibin, lêbelê dengê ewil ê peyva duyem dikeve û dengê “m”yê dikeve şûnê. Çoraklı (2001, r. 58) diyar kiriye ku ev taybetî bi tenê di zimanê Tirkî da heye û hêza afirîneriya zimanê Tirkî nîşan dide. Lêbelê diyar e ku ev yek, ne bi tenê taybetiyeke zimanê Tirkî ye, her wisa taybetiyeke zimanê Kurdî ye jî. Lewra ev xusûs di Kurdî da jî heye ku me mînakên wê li jêr nîşan dan.

Mînak: dar mar, heval meval, kel mel, kevir mevir, jin min, tişt mişt, zar mar, xan man.

Di *Dîwana Exlatî* da cotepeyvên ji vê cureyê jî tunene.

1.2.3. Cotepeyvên ji bikaranîna gihanekan çêdibin

Ji bo dupatkirin û xurtkirina wateyê bi bikaranîna gihanekan cotepeyv tên çêkirin. Di wan cure cotepeyvan da yên bi gihanekan çêdibin, gihanek bi gelemperî dikevin navbera heman peyvan, yan jî peyvên hemwate.

Mînak: çem û çem, jin û mêr, jêr û jor, jîn û jiyan, lez û bez, rev û bez.

Di *Dîwana Exlatî* da gelek bêjeyên hemwate bi rêya gihaneka “û”yê di forma cotepeyvê da hatine emilandin ku çend nimûne jê jî ev in; "cerg û hinav, ehd û wefa, pêt û pereng, roj û şev, ser û rîş, xemr û şerab”. Her wisa bi qasî ku me tesbît kir ji vê kategoriyê jî di *Dîwana Exlatî* da 64 cotepeyv hene û me 3 malik jî wek nimûne li xwarê parve kirin.

Walleh û kas im û deng im mest im û şox im û şeng im
(Exlatî 12/5) Serbiser **pêt û pereng** im tenenaha ya hû

Waleh û mest im û faş im **ser û rîş**an di tiraş im
(Exlatî 12/14) Ku ev est mal û qumaş im tenenaha ya hû

Îname nav ehd û wefa xeyrî te me havêt qefa
(Exlatî 1/7) Ku gehe min **zewq û sefa** ten tele lat la la

Dema em li van hersê malikên Exlatî dinihêrin, em dibînin ku bi gihaneka “û”yê, peyvên hemwate bi hev ve hatine girêdan û jê cotepeyv hatine çêkirin. Dîsa ev peyvên hemwate di malikekê da herdu jî bi Kurdî, di malikekê da herdu jî bi Erebî û di malikeke din da jî yek bi Kurdî û yek jî bi Farisî hatine emilandin. Pêt û pereng bi Kurdî, zewq û sefa bi Erebî û ser û rîş jî bi Kurdî û Farisî ne. Tan (2015, r.82) cotepeyvên peyvek bi kurdî yek bi erebî bi perwerdeya medreseyê ve girêdide, li gorî wî ders bi erebî dihatin xwendin lê bi kurdî dihatin şirovekirin loma ev awa ketiye zimanê kurdî.

1.2.4. Cotepeyvên ji bikaranîna daçekan çêdibin

Ji bo dupatkirin û xurtkirina wateyê bi emilandina daçekan cotepeyv tên çêkirin. Di van cure cotepeyvan da yên bi daçekan çêdibin, daçek bi gelemperî dikevin navbera heman peyvan.

Mînak: rê bi rê, ref bi ref, rû bi rû.

Ji hêla vê cureyê ve jî dema em li *Dîwana Exlatî* dinihêrin, em dibînin ku bi tenê 3 cotepeyv hene ku bi emilandina daçekan çêbûne û ew jî ev in:

Hûn mebên ku ’v[4] derd e evro rast e dilê kul xelat
(Exlatî 2/3) Ev e mîras hate bal min **qern bi qern** û **pişt bi pişt**

Walleh û kas im û deng im mest im û şox im û şeng im
(Exlatî 12/5) **Serbiser** pêt û pereng im tenenaha ya hû

1.3. Cotepeyv ji Aliyê Cureya Peyvê ve

Cotepeyvên ku ji cureyên peyvan pêk tên wekî kategoriyeke sêyem di vê xebatê da cih girtin. Ev cureyên peyvan jî navdêr, rengdêr, hoker, lêker û nîda ne û tevî nimûneyên xwe li xwarê ne:

1.3.1. Cotepeyvên ji navdêran pêk tên

Di Kurdî da hem ji navdêrên taybet û hem jî ji yên cisn û celeban cotepeyv çêdibin.

Mînakên navên taybet: Çîn û maçîn, Elî û Welî, Xelo û Celo, Heso û Huso.

Mînakên navên cisn û celeban: ref bi ref, derî bi derî, kuçe bi kuçe, kolan bi kolan.

Tirk û Zeng im şox û şeng im yol bilî
(Exlatî 14/1) Pir bireng im mest û deng im yol bilî

Di vê malika jor da em dibîbin ku Exlatî wek navên taybet, navê Tirk û Zengiyan emilandine û di helbesta xwe da cih daye van navan. Her wisa Exlatî di dîwana xwe da cih daye 43 cotepeyvên ji vê kategoriyê ku nimûneyeke din jî me li xwarê parve kir.

Enber û misk û bixûr im **sihuf û lewh û zebûr** im
(Exlatî 12/12) **Agir û av im û nûr** im tenenaha ya hû

Di vê malika xwe da Exlatî bi mezmûn û jêderên edebiyata klasîk, cotepeyv pêk anîne û di helbesta xwe da bi kar anîne. Enber, misk û bixûr hersê jî madeyên bêhnê ne û ji ber bêhna wan a xweş tên bikaranîn û di edebiyata klasîk da digel bêhna wan a xweş, ji ber rengê wan ê reş di şibandina rengê porê yarê da jî tên bikaranîn. Dîsa meqsed ji sihûf, lewh û zebûrê jî Kitêba Miqedes e û her wiha agir û av û nûr jî ji xwe ji enasirê erbeayê ne. Şair bi emilandina van ve hem ji hêla cotepeyvan ve û hem jî ji hêla maneyê ve di malika xwe da ahengek ava kiriye.

1.3.2. Cotepeyvên ji rengdêran pêk tên

Di Kurdî da bi rengdêran jî cotepeyv tên çêkirin û rêbaza wê jî ew e ku li dû navekî, du rengdêrên ji heman bêjeyî yan jî ji bêjeyên cuda tên emilandin û cotepeyv tên çêkirin.

Mînak: Xorxor, guşguş (ava guşguş), şeqlobeqlo, serabera, amil tamil, qijobelek, heleb celebî, taqtaqî.

Derdê ‘işqê weh li min rojê ezel kir sernivişt
(Exlatî 2/1) Her ji hingê dilê kul bûye çi **biryan û birişt**

Di beyta jor da Exlatî diyar dike ku Roja Elest gava derdê işq, anku eşqa îlahî jê ra wekî sernivişt (enînivîs) hat nivîsîn û pê ve dilê wî, fena biryan û birişt hatiye biraştin û pehtin û êdî jê ra tebatî nemaye.

Tirk û Zeng im **şox û şeng** im yol bilî

[4] Herfa ku li vir dixuyê divê “ev” be. Anku riste wiha ye: “Hûn mebên ku ev derd e…” Lê ji ber weznê, bêjeya “ev” hatiye kurtkirin da ku bi rêya weslê wekî “kuv” were xwendin û wekî kîteyekî were qebûlkirin.

(Exlatî 14/1) Pir bireng im **mest û deng** im yol bilî

Wekî ji van herdu mînakên me parve kirin eşkere ye ku di *Dîwana Exlatî* da hemû cotepeyvên rengdêran ji meznûnên edebiyata klasîk hatine sazkirin.

1.3.3. Cotepeyvên ji hokeran pêk tên

Wekî cureyên din, cotepeyvên bi bikaranîna hokeran çêdibin jî armanca wan, xurtkirin û zelalkirina wateyê ye. Beşek ji van cotepeyvan ji bêjeyên ku bi eslê xwe hoker in, beşeke din jî ji bêjeyên ku bi eslê xwe navdêr û rengdêr in, tên çêkirin.

Mînak: bere bere, car carî, car bi car, dem demî, dem bi dem, her û her, hêdî hêdî, tim û tim, zû zû, sivik sivik, giran giran.

Di *Dîwana Exlatî* da jî ji vê kategoriyê 28 cotepeyv hatine emilandin. Wekî me li jor jî diyar kir, ji van cotepeyvan hinek jê bi bêjeyên hokeran, hinek jê jî yên wekî “dil dil” û “geş geş/xweş xweş” bi bijeyên di eslê xwe da navdêr û rengdêr in, hatine sazkirin.

Car car ki tibit şeb şeb hey hey Çelebî qum qum
(Exlatî 7/1) **Xweş xweş** tibim ez **heb heb** hey hey Çelebî qum qum

.....**xweş xweş** ta sa vebim ez **geş geş**
(Exlatî 7/5) .....**weş weş** hey hey Çelebî qum qum

1.3.4. Cotepeyvên ji lêkeran pêk tên

Di çêkirina cotepeyvan da rêyek jî emilandina lêkeran e. Di vir da bi lêkerên kişandî yan jî bi peyvên gireyên lêkerî wergirtine, cotepeyv tên çêkirin.

Mînak: bilebil kirin, gijgijandin, milmilîn, qilqilîn, xulxulîn, galegal kirin, mirremirr kirin, nêzenêz kirin, (min) dîtiye nedîtiye, tê bîrê nayê bîrê.

Mişkê ku bûye dijmin hinban kiriye **kun kun**
(Exlatî 15/5) Nehişt genim û erzin rêj biriye poxînê

Hûn lêm negirin zeq zeq yêkcarî bûyim **şeq şeq**
(Exlatî 7/4) Heq maye tinê heq heq hey hey Çelebî qum qum[5]

Di van herdu malikên jor da Exlatî cotepeyvên ji dubarekirina lêkera kunkirinê (qulkirin) û lêkera olandanê şeqkirinê bi kar anîne. Her wiha Exlatî di dîwana xwe da 5 cotepeyvên cure lêker bi kar anîne.

1.3.5. Cotepeyvên ji nîdayan pêk tên

Hatipoğlu diyar dike ku ji bo xurtkirin û dupatkirina coş, hest û ramanên nîdayê îfade dikin, hema hema di hemû zimanan da nîda tên dubarekirin û hetta carinan tên sêbarekirin jî (Hatipoğlu, 1981, r. 32-33).

Mînak: ax ax, ax wax, hey wax, hela hela, heyf û mixabin.

Derd im ji te bit tex tex munşeqq e dil im rex rex
(Exlatî 7/13) Dîdar me tivê **ax ax** hey hey Çelebî qum qum

Şehmarê xemê ‘işqê dîsan ser ku hilîna

[5] Eger Exlatî "qum" wekî lêkera erebî bi kar anîbe di maneya “rabe”yê da ev jî dibe nimûneya vê kategoriyê.

(Exlatî 6/4) **Feryad û fîxan** ku ‘v dilê mecrûhi bi gest im

Di van herdu malikên jor da Exlatî cotepeyvên ji dubarekirina nîdaya “ax ax”ê û nîdaya “feryad û fîganê” ya ji du bêjeyên hemwate pêk tê, bi kar anîne. Her wiha Exlatî di dîwana xwe da 10 cotepeyvên cure nîda bi kar anîne. [6]

1.4.Dariştina bêjeyan ji cotepeyvan

Di kurdî da fonksîyoneke gelekî giring a cotepeyvan jî ew e ku pê, peyvên nû tên dariştin. Navê dengê heyber û neheyberan di serî da bi cotepeyvan bi peywirên curbicur peyv tên çêkirin û ev kategorî jî tevî nimûmeyên xwe wiha ne:

1.4.1. Dariştina navê heywan û gihayan ji cotepeyvan

Di kurmancî da navê hin ajal û giyayan bi rêya cotepeyvan hatine lêkirin. Ji bo vê jî paşgirên ‘-ok’, ‘-ik’, ‘-îk’, ‘-k’ hatine bikaranîn (Ertekin û Açar, 2015: 85).

Mînakên navên heywanan: bilbil, hudhud, fatfatok, gumgumok, legleg, perperik, pinpinîk, pûpûk, şevşevok, xapxapok, xalxalok.

Kunde tibêjit qû qû **hudhud** xwe tibêjit pû pû
(Exlatî 7/11) Ez her tibêjim hû hû hey hey Çelebî qum qum

Bilbilê aşiqê werd im gelekî bêxwab û xwerd im
(Exlatî 12/15) Ji xemê dostê bi derd im tenenaha ya hû

Di *Dîwana Exlatî* da ji bo vê kategoriyê me navê çivîkên “bilbil û hudhud” ên di malikên jor da derbas dibin bîter kirin.

Mînakên navên gihayan: gezgezk, kirkirk, lavlavk, xaşxaşk.

Di *Dîwana Exlatî* da me cotepeyvên ji navên nebatan bîter nekirin.

1.4.2. Dariştina navê dengê heyber û neheyberan ji cotepeyvan

Ev cure dariştin bi rêya vedengan (peyvên olandanê) pêk tên. Vedeng ew cure peyv in ku hewl didin dengê bûyerên siruştî nîşan bidin (Hatiboğlu, 1981, r. 35). Di vê kategoriyê da ji xeynî olandana dengên siruştî, me cih da dengên ku ji însan û heywanan jî olan didin.

Mînakên dengên însanan: fişefiş, hîkehîk, qareqar, mizemiz, nalenal, nêzenêz, barebar, tîqetîq, pîrqepîrq, zarezar.

Kunde tibêjit qû qû hudhud xwe tibêjit pû pû
(Exlatî 7/11) Ez her tibêjim **hû hû** hey hey Çelebî qum qum

Di terîqeta Xelwetiyan da salik bi derxistina dengê “hû” ve zikrê xwe dikin û diyar e ku Exlatî jî sûd ji vê “hû”yê wergirtiye û ev îfade wek cotepeyv di helbesta xwe da emilandiye. Em ê li xwarê bi berfirehî li ser vê mijarê rawestin.

[6] Li vir divê ev jî bê gotin ku xwendina çivîk û teyran jî cureyek ji nîdayê ye ya di navbera wan candaran da ku ew jî wekî nimûne dikare li vir bê dan ku di *Dîwana Exlatî* da nimûneyên wê gelek in. Lê ji bo ku li jêr di bin kategoriya “1.4.”ê da hatine nirxandin em li vir nimûneyan nadin.

Mînakên dengên heywanan: çîvteçîvt, ewteewt, hîrehîr, kalekal, kastekast, oreor, qebeqeb, qîqeqîq, zîqezîq.

Di *Dîwana Exlatî* da wekî dengên heywanan, "qû qû"ya kundan û "pû pû"ya hudhudan derbas dibe. Di Kurmancî da ji bo hudhudê, di heman demê da navên mîna "Silêmanê Dunukil, Dîksilêman, Dodo, Hophopk" jî tê gotin. Lewra wisa tê bawerkirin ku vê çivîkê di navbera Hz. Silêman û Melîkeya Sebeyê Belqîsê da xeberguhêzî kiriye (Harman û Kurnaz, 1998, r. 461).

Kunde tibêjit **qû qû** hudhud xwe tibêjit **pû pû**
(Exlatî 7/11) Ez her tibêjim hû hû hey hey Çelebî qum qum

Mînakên dengên neheyberan: çipeçip, çirkeçirk, gupegup, guregur, guşeguş, gurmegurm, vîzevîz (Yıldırım, 2013, r. 436).

Di dîwanê da me ji vê kategoriyê cotepeyv tesbît nekirin.

Ji aliyekî din ve, di *Dîwana Exlatî* da çend helbest hene ku bi temamî ji rengvedana kişandina zikr û wirdan pêk tên ku zikr û wird xusûsiyeteke sereke ya terîqetan e. Helbestên Exlatî yên bi malikên li xwarê dest pê dikin, nîşaneyeke xurt a vê yekê ye.

Mest û xerab im ji meyê ten tele lat la la
(Exlatî 1/1) Dibêjim ez ya lebeyê ten tele lat la la

Car car ki tibit şeb şeb hey hey Çelebî qum qum
(Exlatî 7/1) Xweş xweş tibim ez heb heb hey hey Çelebî qum qum

Ez ku mestê meyê 'işq im tenenaha ya hû
(Exlatî 12/1) Misr û Bexdad û Dimeşq im tenenaha ya hû

Uzlet tikirim daîm dîsan wekû kungir
(Exlatî 13/1) Her wê ku hebit kavilek ez lê tuxwînim qû qû

Dema meriv li wan helbestên Exlatî dinihêre, yên bi malikên li jor dest pê dikin, mirov bi eşkereyî dibîne ku Exlatî, dema ku di uzlet û xelwetê da bûye, ev helbest nivîsîne. Lewra di van helbestan da nexasim jî yên di rûpelên 136em û 149em da derbas dibin, ji xeynî deng û sewta Exlatî, meriv rastî balindeyan tê ku bi zarê xwe zikr û wirdê dikin. Dîsa di van herdu helbestên navborî da bi derxistina dengê xwe yê "qû qû" kund derbas dibe ku ev jî nîşan dide, Exlatî şevan raneketiye, li ser zikr û taeta xwe bûye.

Ji aliyê xwe ve wekî damezirînerê Tekyaya Brîfkanê ya li Duhokê ve ya ku li herêmê qedera 2 qirnan xizmeta terîqeta Xelwetiyan kiriye (Tenik, 2022, r. 86), Exlatî yek ji kesayetên herî giring ê terîqeta Xelwetiyan e. Exlatî wek şexs, ev nasnav neqişandiye dîwana xwe jî û di dîwana xwe da mexlesa "Xelwetî" emilandiye.

Her wiha dema em di qada pratîkê da li terîqeta Xelwetiyan dinihêrin, em dibînin ku rêgezên wekî "xwe birçî hiştin, bêdengî, îbadeta şevê, uzlet, zikr, tefekur, îbadeta li gorî erkanê û rebt (salik divê qelbê xwe bi yê şêxê xwe ve girê bide) derdikevin pêş (Knysh, 2011, r. 251). Taybetiya herî sereke ya ku terîqeta Xelwetiyeyê ji terîqetên din cuda dike ew e ku ji salikan tê xwestin ku bi navberên diyar, xelwetê (uzlet) dubare bikin. Ji bo xelweta herî kin maweya dihat pêşniyazkirin 3 roj bû. Her wisa ev mawe derdiket heta 40 rojan jî. Li gorî hin şaxên Xelwetiyan, ji bo ku murîd ji întisaba terîqetê ra bihata amadekirin, sepana xelwetê pir pêwîst

bû. Lê li gorî hin şaxên din jî sepana xelwetê divê piştî kesbkirina dereceya pêncem bihata cîbicîkirin. Her wiha dereceyên manewî yên Xelwetiyeyê ji heft meqaman pêk tên ku têkildarî wirdên bi navên Xwedê yên wekî "tehlîl, Allah, hû, heyy, heqq, qeyyûm û qehhar" kirine (Knysh, 2011, r. 251). Dîsa Knysh diyar dike ku li gorî teorînasên Xelwetiyan, ji van meqaman her çarên ewil, qonaxa amadehiyê ye û ji meqama pêncem pê ve salik dikare rasterast bi heqîqeta Xwedê ra bikeve rabiteyê. Her wiha kesbkirina meqamên mayîn jî êdî ne bi hewl û xebatê, belê bi înayeta Xwedê ve pêkan e (r. 251). Nexwe Exlatî di qonaxa amadehiyê ya rêbaza terîqetê da ev her çar helbestên li jor destnîşankirî, nivîsîne.

Ji aliyê mijara me ve jî di vir da tişta herî giring ew e ku Exlatî, nexasim jî di helbesta 7an da bi rê û rêbazeke pir resen cotepeyv çêkirine û kirine nav dîwarê helbesta xwe. Exlatî bi dengê balindeyan û her wiha bi dengê zikra salikên terîqetê hem cotepeyv çêkirine û hem jî rîtm û ahengek bi dest xistiye.

Encam

Ev xebata ku cotepeyvan digel pênase û kategoriyên wê vedikole, wan li ser kategoriyên pêşniyazkirî di *Dîwana Exlatî* de digere û xusûsen ji tekrarên di Dîwanê de hatine bikaranîn sûd werdigire. Lê divê bê gotin ku xebata me cih cihan amaje bi aliyê maneyî yê cotepeyvên Dîwan kiribe jî zêdetir berê xwe dide aliyê morfolojîk yê vê mijarê.

Li gorî lêkolîna me, di dîwanê da 106 cotepeyv hatine bikaranîn. Ji van 43 wekî navdêr, 18 wekî rengdêr, 5 wekî lêker, 28 wekî hoker û 10 jî wekî nîda hatine bikaranîn. Di *Dîwana Exlatî* da cotepeyvên ji hejmaran û yên bi "m"yê çêdibin nehatine emilandin. Dîsa di dîwanê da cotepeyvên ku ji peyvên bêwate pêk tên nehatine emilandin ku dikeve kategoriya cotepeyvên ji hêla wateyê ve. Ji aliyekî din ve ji ber ku dîwaneke klasîk e, piraniya cotepeyvên dîwanê ji mezmûn û jêderên edebiyata klasîk hatine sazkirin.

Şêx Şemseddînê Exlatî ku yek ji helbestvanên ewil ê edebiyata Kurdî ya klasîk e û li dû xwe dîwaneke nemureteb hiştiye, ji ber ku di heman demê da damezirînerê Tekyaya Brîfkanê ya li Duhokê ye, tesewifê û nexasim jî terîqeta Xelwetiyan di asteke bilind da rengê xwe daye helbestên wî. Hetta meriv vê rengvedana tesewif û terîqeta Xelwetiyeyê di wan cotepeyvan da jî dibîne ku Exlatî di dîwana xwe da emilandine. Lewra Exlatî di helbestên xwe da cotepeyvên bi wî rengî emilandine ku ji zikra murîdan û wirda balindeyan pêk tên. Anku di wan helbestên wî da yên di wextê uzlet û xelwetê da hatine nivîsîn, meriv wirdê zebanê balindeyan jî dibîne û dibihîze. Nexwe Exlatî ji xeynî cotepeyvên me beş bi beş destnîşan kirine, yên ji olandana dengê însan û balindeyan jî emilandine ku dîwana wî ji vê hêlê ve dibe xwedan resm û rûçikekî resen.

Pêvek

Cotepeyvên bi dubarebûna heman peyvê pêk tên			
ax ax	her her	qern bi qern	şeq şeq
bilbil	hey hey	qet qet	şet şet
car car	hudhud	qû qû	tex tex
çend çend	kend kend	rê rê	weh weh

dem dem	kû kû	reh reh	weş weş
dil dil	kun kun	rex rex	xeh xeh
geh geh	mû mû	seraser	xweş xweş
geş geş	pişt bi pişt	serbiser	zar zar
heb heb	pû pû	sû sû	zû zû
Cotepeyvên bi dubarebûna peyvên hemwate û nêzwate pêk tên			
‘enber û misik û bixur	‘izz û naz	agir û av û nûr	aşiq û dîwane
bê’ar û riswa	ber û daran	bêxwab û xwerd	bîş û pir
buryan birişt	cah û meqam	cerg û hinav	derd û ‘işq
dîsa ji nû	dîwane û sewda	durr û me’anî	durrguher
efgar û zar	ehd û wefa	eql û dil û dîn	êrve û wêrve
feryad û fîxan	firyad û hewar	genc û kan	genim û erzin
hûr û durişt	keştî û Nûh û necat	kûh û qifar	lehze û saet
lewh û bazî	mal û çist	mest û deng	mest û fereh
mest û rind	mest û xerab	muflis û dîwane	nadan û e’ma
nale û feryad	nehwe û zarî	nuql kebab	pêt û pereng
pîrejin	qal û hal	qebr û balîn	qerye û şar
qîl û qal	qulzem û ‘umman	rehwar û vervî	samit û lal û xemûş
sebr û qerar	sebr û taqet	ser û rîş	ser û saman
sihûf û lewh û zebûr	sirc û find	sukne û sebr	suqbe û xar
şox û şeng	tirk û zeng	waleh û mest	wecd û hal
wecd û şewq	xemr û şerab	zewq û saz	zewq û sefa
Cotepeyvên bi dubarebûna peyvên dijwate pêk tên			
leyl û nehar	muşkil û hel	nûr û zelam	roj û şev
şev ro	xadim û şah û xulam		
Cotepeyvên ji navdêran pêk tên			
agir û av û nûr	ber û daran	bilbil	cah û meqam
cerg û hinav	derd û ‘işq	durr û me’anî	‘enber û misik û bixur
eql û dil û dîn	genc û kan	genim û erzin	hudhud
‘izz û naz	keştî û Nûh û necat	kûh û qifar	lehze û saet
lewh û bazî	mal û çist	muşkil û hel	nuql kebab
nûr û zelam	pêt û pereng	pîrejin	qal û hal
qebr û balîn	qerye û şar	qîl û qal	qulzem û ‘umman
sebr û qerar	sebr û taqet	ser û rîş	ser û saman
sihûf û lewh û zebûr	sirc û find	sukne û sebr	suqbe û xar
tirk û zeng	xadim û şah û xulam	xemr û şerab	wecd û hal

wecd û şewq	zewq û saz	zewq û sefa	
Cotepeyvên ji rengdêran pêk tên			
aşiq û dîwane	bê'ar û riswa	bêxwab û xwerd	bîş û pir
buryan birişt	dîwane û sewda	durrguher	hûr û durişt
mest û deng	mest û fereh	mest û rind	mest û xerab
muflis û dîwane	nadan û e'ma	rehwar û vervî	samit û lal û xemûş
şox û şeng	waleh û mest		
Cotepeyvên ji hokeran pêk tên			
bend bend	car car	çend çend	dem dem
dil dil	dîsa ji nû	êrve û wêrve	geh geh
geş geş	heb heb	her her	kend kend
leyl û nehar	mû mû	pişt bi pişt	qern bi qern
qet qet	rex rex	roj û şev	seraser
serbiser	sû sû	şet şet	şev ro
tex tex	xweş xweş	weş weş	zû zû
Cotepeyvên ji lêkeran pêk tên			
kun kun	kû kû	pû pû	qû qû
şeq şeq			
Cotepeyvên ji nîdayan pêk tên			
ax ax	efgar û zar	feryad û fîxan	firyad û hewar
hey hey	nale û feryad	nehwe û zarî	xeh xeh
weh weh	zar zar		
Cotepeyvên bi gihanekan çêdibin			
agir û av û nûr	aşiq û dîwane	bê'ar û riswa	ber û daran
bêxwab û xwerd	bîş û pir	cah û meqam	cerg û hinav
derd û 'işq	dîwane û sewda	durr û me'anî	efgar û zar
ehd û wefa	'enber û misik û bixur	eql û dil û dîn	êrve û wêrve
feryad û fîxan	firyad û hewar	genc û kan	genim û erzin
hûr û durişt	'izz û naz	keştî û Nûh û necat	kûh û qifar
lehze û saet	lewh û bazî	leyl û nehar	mal û çist
mest û deng	mest û fereh	mest û rind	mest û xerab
muflis û dîwane	muşkil û hel	nadan û e'ma	nale û feryad
nehwe û zarî	nûr û zelam	pêt û pereng	qal û hal
qebr û balîn	qerye û şar	qîl û qal	qulzem û 'umman
rehwar û vervî	roj û şev	samit û lal û xemûş	sebr û qerar

sebr û taqet	ser û rîş	ser û saman	sihûf û lewh û zebûr
sirc û find	sukne û sebr	suqbe û xar	şox û şeng
tirk û zeng	waleh û mest	wecd û hal	wecd û şewq
xadim û şah û xulam	xemr û şerab	zewq û saz	zewq û sefa
Cotepeyvên bi daçekan çêdibin			
pişt bi pişt	qern bi qern	serbiser	

Tablo 1: Tabloya cotpeyvên dîwanê li gorî kategoriyan.

agir û av û nûr	aşiq û dîwane	ax ax	bend bend
ber û daran	bê'ar û riswa	bêxwab û xwerd	bilbil
bîş û pir	buryan birişt	cah û meqam	car car
cerg û hinav	çend çend	dem dem	derd û 'işq
dil dil	dîsa ji nû	dîwane û sewda	durr û me'anî
durrguher	efgar û zar	ehd û wefa	'enber û misik û bixur
eql û dil û dîn	êrve û wêrve	feryad û fîxan	firyad û hewar
geh geh	genc û kan	genim û erzin	geş geş
heb heb	her her	hey hey	hudhud
hûr û durişt	'izz û naz	kend kend	keştî û Nûh û necat
kû kû	kûh û qifar	kun kun	lehze û saet
lewh û bazî	leyl û nehar	mal û çist	mest û deng
mest û fereh	mest û rind	mest û xerab	muflis û dîwane
muşkil û hel	mû mû	nadan û e'ma	nale û feryad
nehwe û zarî	nuql kebab	nûr û zelam	pêt û pereng
pîrejin	pişt bi pişt	pû pû	qal û hal
qebr û balîn	qern bi qern	qerye û şar	qet qet
qîl û qal	qû qû	qulzem û 'umman	rê rê
rehwar û vervî	rex rex	roj û şev	samit û lal û xemûş
sebr û qerar	sebr û taqet	ser û rîş	ser û saman
seraser	serbiser	sihûf û lewh û zebûr	sirc û find
sukne û sebr	suqbe û xar	sû sû	şeq şeq
şet şet	şev ro	şox û şeng	tex tex
tirk û zeng	waleh û mest	wecd û hal	wecd û şewq
weh weh	weş weş	xadim û şah û xulam	xeh xeh
xemr û şerab	xweş xweş	zar zar	zewq û saz
zewq û sefa	zû zû		

Tablo 2: Rêza alfabetîk a cotepeyvên dîwanê.

Çavkanî /References

Adak, A. (2017). Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî de. Mukaddime, 8(1), 41-76.

Aktan, B. (2016). Türkiye Türkçesinin Söz Dizimi. Eğitim Yayınevi.

Baran, B. (2010). Rêzimana Kurmancî. Belkî.

Başçı, V., & Aykaç, Y. (2022). Dahûrîneke Tesewifî li Ser Qesîdeya "Çelebî" ya Şêx Şemsedînê Qutbê Exlatî. Kurdiname (7), 74-103.

Borak, M. (2014). Ferhenga Biwêjan (Çapa 2yem). Stenbol: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Çoraklı, Ş. (2001). Türkçenin Yaratma Gücü İkilemeler (I). Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, 17 (Efrasiyap Gemalmaz Özel Sayısı), 53-60.

Çürük, Y. (2016). İkilemelerin Dilbilgisel Anlamları. The Journal of Academic Social Science Studies (48), 397-411.

Demir, T. (2006). Türkçe Dilbilgisi. Kurmay Kitabevi.

Ertekin, Z. û Açar Z. (2015). Di Kurmancî da Cotepeyv û Cureyên Wan. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 1(1), 82-92.

Exlatî, Ş. Ş. (2022). Dîwan (werger û nîşe: Bedrettin Basuğuy). Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Harman Ö. F. û Kurnaz C. (1998). Hüdhüd, *İslam Ansiklopedisi, C. 18.* İstanbul: DİB Yayınları.

Hasphelmath, M., & Sims, A. D. (2010). Understanding Morphology. London: Hodder Education an Hachette UK Company.

Hatiboğlu, V. (1981). Türk Dilinde İkileme (2. Baskı). Ankara Üniversitesi Basımevi.

Knysh, A. (2011). Tasavvuf Tarihi. Ufuk Yayınları.

Korkmaz, Z. (2010). Gramer Terimleri Sözlüğü (4. Baskı). Türk Dil Kurumu Yayınları.

Serdar, B. (2015). Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî-Metn û Vekolîn. Nûbihar.

Tan, S. (2015). Rêzimana Kurmancî. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Taş, İ. (2012). Kutadgu Bilig'de İkilemeler. Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Beletten, 60 (2), 43-96.

Tenik, A. (2022). Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar (3. Baskı). Nûbihar.

Urbanczyk, S. (2024, October 5). Phonological and Morphological Aspects of Reduplication. Oxford Research Encyclopedia of Linguistics, s. 1. https://oxfordre.com/ linguistics/ view/ 10.1093/ acrefore/ 9780199384655.001.0001/ acrefore-978

Yıldırım, K. (2013). Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi Kurmanci Lehçesi (3. Baskı). Avesta.

Yılmaz, S. (2013). Dîwana Şêx Şemseddînê Exlatî-Metn û Lêkolîn. Mardin: Artuklu Üniversitesi.

Kurdiname Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

Hunerên Edebî di Dîwana Mela ‘Ebdûllahê Babnîrî da

(Literary Arts in The Court of Mela 'Abdullah Babniri)

(Molla Abdullah Babnîrî'nin Divanında Edebî Sanatlar)

Mehmet Edip ÇAĞMAR•

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatin: 11.10.2024
Accepted // Pejirandin: 15.11.2024
Published // Weşandin: 29.11.2024
Pages // Rûpel: 18-44
DOI:10.55106/kurdiname.1565616

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/

Citation/Atif: Çağmar, Mehmet Edip, Hunerên Edebî di Dîwana Mela ‘Ebdûllahê Babnîrî da, 2024, Kurdiname, 11, r. 18-44.

Plagiarism/Întîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Ev gotar li ser hunerên wêjeyî yên ku di dîwana Mela ‘Ebdullahê Babnîrî da hene ye. Babnîrî şexsîyetekî alim, nivîskar û wêjenas e. Di serî da wek beşa yekemin derbarê Mela ‘Ebdullahê Babnîrî da agahî hatîye dayîn. Di dû ra jî bi awayekî gelemperî behsa Dîwana wî hatîye kirin. Piştî van agahîyan wek beşa duyemîn li ser hunerên di dîwanê da hene hatîye rawestandin. Ji bîst heb zêdetîr huner di vê gotarê da hatîye şîrove kirin. Piştî nirxandina huneran encama gotarê tê. Dîwana Babnîrîyî ji alîyê naverokê jî û ji alîyê hunerê jî gelek dewlemend e. Mela ‘Ebdullahî helbestê ji bo çareserkirina derdên civakê û gelî gotîye. Ji sedem vê taybetîyê helbestên xwe li ser mijarên ji gel ra girîng e gotîye. Ji bo bandorê li xwendevanê xwe bike cur cur hunerên wêjeyî bikaranîye. Di nav hunerên ku wî di helbestên xwe da îcra kirîye herî pir teşbîh, îstîare, kînaye, mecaza eqlî, mecaza mursel, telmîh, mubalexe, tîbaq û cînas e. Bêyî van huneran jî hunerên edebî hene lê belê bi qasî yên me li jorê got nînin.

Peyvên Sereke: Wêje, Dîwan, Hunerên edebî, Mela ‘Ebdullah, Babnîr.

Öz:

Bu makale Molla Abdullah Babnîrî’nin Kürtçe divanında bulunan edebî sanatlar hakkındadır. Babnîrî alim, yazar ve edebî bir şahsiyettir. İlk önce birinci bölüm olarak Molla Abdullah’ın hayatı hakkında bilgi verilmiştir. Sonra da genel bir şekilde divanı üzerinde durulmuştur. Bahsı olunan konulardan sonra ikinci bölüm olarak divanında bulunan edebî sanatlar açıklanmaya çalışılmıştır. Makalede yirmiden fazla edebî sanat izah edilmiştir. Bu değerlendirmelerden sonra sonuç gelmektedir. Babnîrî divanı hem içerik hem de edebi sanatlar açısından çok zengin bir eserdir. Ayrıca dil olarak akıcı ve anlaşılırdır. Bu hususlar onun divanın değerini artırmıştır. Molla Abdullah şiiri toplumsal sorunları çözmek için söylemiştir. Bu nedenden dolayı ki şiirini halk için çok önemli olan sorunlarla ilgili söylemiştir. Okuyucularını etkilemek için çeşit çeşit edebî sanatlar divanında icra etmiştir. Onun divanında icra ettiği edebî sanatlar arasında en çok teşbîh, îstîare, kinaye, mecaz-ı aklî, mecaz-ı mürsel, telmih, mübalağa, tîbak ve cinas sanatlardır. Bunların dışında da edebî sanatlar divanında vardır. Ancak söylediklerimize oranla onlar azdır.

Anahtar Kelimeler: Edebiyat, divan, edebî Sanatlar, Molla Abdullah, Babnîr.

Abstract:

•Prof. Dr., Dicle Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi, Diyarbakır/Türkiye // *Prof. Dr., Dicle University, Faculty of Theology, Diyarbakır/Türkiye*, ORCID: https://orcid.org/0000-0001-9756-0327 e-mail: mehmetedipcagmar10@gmail.com

This article is about the literary arts that are in the court of Mullah 'Abdullah Babniri. Babniri is a scholar, writer and literary personality. In the beginning, as the first part, information has been given about Mulla 'Abdullah Babniri. Later, his Diwan was mentioned in a general way. After this information, as the second part, it has been stopped on the arts in the court. More than twenty pieces of art have been annotated in the article. After their evaluation, the conclusion of the article comes. The Babniri Diwan is very rich in terms of content and art. Mulla 'Abdullah wrote the poem to solve the problems of the society and the people. Because of this feature, he has written his poems on issues that are important to the people. He used various literary styles to influence his readers. Among the arts that he used in his poems, the most common are similes, allusions, ironies, intellectual metaphors, mursal metaphors, talmih, exaggeration, tibaq and jinas. Apart from these arts, there are also literary arts, but they are not as numerous as these.

Keywords: Literature, poetry book, literary arts, Mullah Abdullah, Babnîr.

Destpêk

Ziman nîmetekî ji terefê Xwedê ye ku wî ew daye mirovan. Ziman jî wekî Xwedî rûhan sax dimîne û dimire. Lewra ziman bi xeberdayin û lêkolînê pêşda diçe û sax dimîne. Bi vî awayî nebe ziman wenda dibe, dimire û dihere. Tiştên ku ziman zindî dihêle û pêşda dibe, yek jê edebîyat e. Edebîyat di nava tiştên ku ji vî alîyî da bi tesîr in û herî bi bandor e. Di edebîyatê da jî tiştê ku li pêş e ew jî helbest e. Lewra helbestvan hest û ramanê xwe bi zimanê xwe pirê caran bi awayekî edebî bikartîne. Ev jî ji bona zimên bandorekî erênî derdixe holê. Ev dîwana di vê gotarê da me li serê xebat kir. Hebûna wateyên cuda û hunerên cure bi cure di dîwana Babnîrîyî da bû sebeb ji bona tercîhkirina me ya vê dîwanê.

Dîwan di zimên da gelek girîng in. Lewra alîyê wan ên cuda hene. Ew jî ziman, edebîyat, ol, çand, dîrok, erdinîgarî, civak û netew in. Lê dibe ku hinek dîwan ev tişt hemûyan dihundirê xwe da ne hewînin. Lê bi piranî dîwan ji van alîyan xwedî taybet in. Dîwan li gorî serkeftina helbestvanî di dîwanê da qîmet dibînin. Mînak ji bo vê nuqteyêe herî baş û meşhûr Dîwana Melayê Cizîrî ye. Dîwana Mela ‘Ebdullahê Babnîrî jî li gorî vî zemanê me, di nav dîwanên xwedîyê asta bilind da ye. Lewra di wê da zimanekî xweru û fesîh heye. Çend cî ne tê da, cîyên din bi awayekî asan tên famkirin. Ji alîyê wateyê da jî xwedîyê nawerokekî dewlemend e û di risteyen wê da wateyên kur hene. Ji alîyê hunerê jî pir dewlemend e. Carinan di malikekî da sê-çar huner hene. Ji sedem van taybetîyan me di vê gotara xwe da giranî da ser hunerên edebî. Lewra me behsa hemû alîyên dîwanê bikira ewê ev xebat ji hudûdê gotarê derketa.

Mebeset ji vê xebatê danasîna Dîwana Babnîrîyî ji alîyê hunerên edebî ve ye. Ji sedem vê xalê ev xebat bi hunerekî tenê ve ne hatîye tehdîdkirin. Ji bo ku li vir li ser pir huneran hatîye rawestandin bi awayekî kûr huner nehatine şîrovekirin. Ji alîyê naverokê jî ji bo ku ji hunerên edebî ra bibe alikar agahî hatîye dayîn. Ji jiyana Mela ‘Ebdullahê Babnîrî bi qasî agahîyên ji bona vê gotarê lazime me li jêrê behs kir.

1. Jiyana Seydayê Mela ‘Ebdullahê Babnîrî

Seyda seyîd e. Lewra ji nesla Hz. Pêxember e. Di sala 1939an da li Babnîrê ku gundekî navçeya Kercews a Batmanê ye hatîye dinyayê. Li gorî agahîyên ku Seydayî wan da kalanê wî şesed-hefsed sal berî niha ji Duhokê hatine Heskifê, ji wir jî çûne deverên cuda. Ên ku Seyda ji nesla wan tê berîya dused salan hatine Babnîrê û li vir bicîbûne. Navê bavê Seydayê Mela ‘Ebdullahî Mela Yusif e, Kalê wî Seyîd ‘Ezîz e. Di nav kalanê wî da gelek ‘alim hebûne. Seyda gava biçûk bûyi hînî xwendina Quranê bûye. Ji dîya xwe Mewlûda Kurdî ya Bateyî, Nubihara, Biçûkan û Nehcu’l-Enam ders girtîye. Di dû ra heta çend salan qe ne xwendîye. Lê di xewna xwe da kalê xwe dîtîye. Kalê wî ew teşwîqî xwendê kiriye. Piştî vê xewnê berê xwe dide gundê Kevirzoyê dihere bal Seydayê Mela Ehmedê Kevirzoyê dixwîne. Li wir neh

meh dimîne. Ji pirtûka Îzzîyê dest pêdike. Di neh mehan da heta pirtûka Hellê dixwîne. Seyda di dû ra tiştekî pir hindik li Babnirê li cem bavê xwe dixwîne. Di dû ra diçe bal Şêx Muhemmedê 'Erebkendî li wir dest bi pirtûka Hella şerha li ser Qewaîda Îbn Hîşam dike. Li wir heft meh dimîne. Piştî Hellê jî Pirtûka *Suyûtî el-Behcetu'l-Merdîyye* dixwîne. Di dû ra diçe cem Seydayê Mela Muhemmedê Dêrîşî. Babnîrî midetekî li cem Seydayê Mela 'Ebdulwehhabê Dêrizbinî û Seydayê Mela 'Ebdullahê Xerab Reşkê jî dixwîne. Seyda xwendina pirtûkên rêzê yên medresê li bal Şêx 'Arifê Hamidî li Ehmedîyê bi dawî dike û ji wî îcazet digire. Bi vî awayî şeş salên xwe di mederseyan da dibihurîne. Di xwendina xwe da gelek di bin bandora Şêx 'Arif Hamidî da maye. Li wir ji Muxnîttullabê heta Şerha Cem'u'l-Cewami'a Subkî xwendîye. Tam çar sal li 'Ehmedîyê dimîne. Li wir û Erebkendê bandora tesewwufê li ser wî çêbûye. Seyda dibêje ku ji alîyê xessasîyeta Kurdî da ez di bin bandora Şêx 'Arîf Hamidî da me. Şêx 'Arif ji bo derd û êşên Kurdan bi wî ra axfîye. (Babnîrî, hevpeyvîn, 22 Îlon, 2024).

Mela Ebdullahê Babnîrî di dema melatîya xwe da car carina Mela Sedreddîn Yüksel (w.2004) li Îstanbulê ziyaretkirîye û jê di meseleyên îlmî da îstîfade kirîye. Mela Sedreddîn Yüksel di derbarê Kurdan da ji wî tiştekî pirsîye. Wî jî du malikên Kurdî carekî bi tenê jê ra gotîye. Lê Mela Sedreddîn piştî pênç salan jê ra ev malik tekrar kiriye. Li gorî agahîyên Seyda Seydayê Mela Sedreddîn di dawîya umrê xwe da hemû zimanan ji bîkirîye. Lê Kurdî ne bi awayekî temam be jî ji bîrnekirîye û daîm malika jêrê tekrar kirîye. (Babnîrî, hevpeyvîn, Îlon, 2024).

Nê ji me sûc û xeta tên û sitem Lê ji te îhsan û xufran û kerem (Bateyî, 2018: 8).

Di dîwanên Seyda da behsa heft berhemên Seyda hatîye kirin. Hinek ji wan hîna nehatîye weşandin. (Babnîrî, 2012: 4; Babnîrî, 2021: 6). Pirtûkên wî:1-Dîwan (Kurdî), 2-Divan (Tirkî) 3-Çağlar Boyu İslam Fıkhı, 4- Mezhepler ve Sistemler 5-Şeyh ve Müteşeyyih, 6-Dengeyi Bozanlar 7-Fethu'l-Celîl Fetvalar (ev werger e). Bêyî van berheman nivîsên Seyda di rojnameyên Batmanê hatine weşandin.

Babnîrî piştî temam bûna xwendina xwe, li gundên Batmanê û Wiranşehrê da û navenda Batmanê da melatî dike. Çend salan li Îzmîrê jî dimîne. Seyda daîm bi tehsîlê da ketîye. Gelek xwendekar ji wî dersan girtine. (Babnîrî, hevpeyvîn, 22 Îlon, 2024). Niha seyda malnişîn e û li Batmanê rûdinê.

Seydayê Mela 'Ebdullahê Babnîrî dixwaze Kurd bi awayekî azad û rahat bijîn, mafê xwe bidestxin û ji dîn xwe durnekevin. Dibêje ku ji bo van armancan demoqrasî çare ye. Ji wan ra demoqrasî minasib e.

Demoqrasî çare ye, ji bo Kurdo rewa ye (Babnîrî, 20012: 71).

2. Dîwana Babnîrî Ji Alîyê Hunerên Edebî ve

Dîwana Babnîrî ji alîyê wateyê jî û huneran jî gelek dewlemend e. Di sernîvêsên jêrê da derbarê van her duyan da agahî tê dayîn.

2. 1. Agahî Derbarê Dîwana Wî da

2.1.1. Hinek Agahîyên Gelemperî

Bi Seydayê Mela Ebdullahê Babnîrî ra tebîetê helbestê heye. Wî ji panzdesalîya xwe helbest gotiye. Helbestên wî bi Kurdî, Erebî û Tirkî ne. (Babnîrî, hevpeyvîn, 22 Îlon, 2024). Ev dîwana ku mijara gotara me ye di sala 2012'dan ji alîyê weşanxaneya Nubiharê li Îstanbulê cara yekem hatîye weşandin. Dîwan ji alîyê Mela Huseyinê Êsê û Huseyînê Şemrexî ve ji bo çapê hatîye amadekirin. Li gorî agahîyên me ji Seydayî bi xwe girtin keda Seyadayê Mela Husyinê Êsê di çapa vê dîwanê da pir e. Ji sed û dozdeh rûpelan pêk tê. Çil û penç helbest di vê dîwanê da hene. Ji van helbestan çil û yek heb bi zimanê kurdî ne. Çar heb ji wan jî bi zimanê Erebî hatîye nivîsandin. Ji van çil û yek helbestan du helbest ên Seyda nînin. Di dîwana Seyda da li

dora hezar û çarsed riste hene. Seyda û feqîyê wî Mela Huseyinê Êsê dibêjin helbestên wî pir bûne. Lê kemîyetek pir ji helbestên wî wenda bûne. (Babnîrî, hevpeyvîn, 22 Îlon, 2024; Mela Huseyinê Êsê, hevpeyvîn, 22 Îlon, 2024).

2.1.2. Naverok

Dîwana Mela ‘Ebdullahê Babnîrî ji alîyê naverokê ve gelek dewlemend e. Lewra bi qasî ji helbestên di dîwana wî da ne tê famkirin ku behsa pir mijaran hatîye kirin. Naveroka Dîwanê ji me ra dide nîşan dayîn ku Seydayê Mela ‘Ebdullahî helbest ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakê û kul û derde xwe bîne ziman bikaranîye. Ne ji bo huner û zewqê bikaranîye. Mijarên dîwana wî bi awayekî gelemperî mijarên dînî, netewî, evînî, zanistî û civakî ne. Behsa terîqatan, hinek şêxan, murîdan, melan jî di dîwana wî da cîyekî girîng digire. Ev mijar jî beşekî mijara dînî ye. Carinan ji bo wan mijaran serînivîsên xusûsî bikaranîye; carinan jî çend mijar bi hev re anîye ziman.

Di vê dîwanê da mijarên yekem mijarên olî ne. Lewra helbestvanê me çawa ku ji navê û ji perwerdetîya wî tê famkirin şexsîyetekî olî ye. Mela ‘Ebdulahê Babnîrî hem ji sedem bawerîya xwe ya olî hem jî ji sedem oldarîya gelê Kurd di dîwana xwe da dîn xalek girîng dîtîye. Lewra wî hinek beş ji helbestên xwe ji bo mijarên dînî cuda kirine. Dînê Xwedê nîşanî mirovan daye û ji wan bicîanîna dînê Xwedê xwestîye. Di meselên dînî da berîya her tiştî behsa pesnê Hz. Pêxember, şerîatê û mirinê dike. Seyda sernivîsek helbestên xwe ji bo Hz. Pêxember cuda kiriye û wekî din jî behsa Hz Pêxember dike. (Babnîrî, 2012:11). Risteyên jêrê jî ji bona tiştên em dibên mînak in.

Ey hebîbê ‘Erebî! Ey şehînşahê medenî
Ki dibê muşrîk û kafir ta ji bo te nekenî
Her di ber emrê te şahî van zewatê bi fenî
Bes di hellaqê efendim zikr û tesbîh û benî
‘Erze halê xwe nivîsî me resûlê ‘Erebî
‘Erze halê min qebûl ke şehsûwarê Medenî! (Babnîrî, 2012: 10).

Babnîrî di destpêka helbesta xwe da Hz. Pêxember ji xwe ra kirîye mixateb û bêjeyên hezkirin û medhê bikaranîye. Bi awayekî kînayî gotîye yê ku ne mutî‘ê te be kafir e. Helbestan ji bona xwestinên xwe wekî erze halê pêşkêş kirîye.

Behsa mirinê jî dike û risteyên jêrê dibêje. Di wan da dibêje “Mala dawîyê gor e. di du ra gorê ji xwe ra dike mixateb û bi rêya telmîhê bi lavatî ji ra dibêje ku tu qedrê min nizan bî, ez ê Hz. Pêxember bikim şefeatkar ji bo xwe û ew ê ji te nefret bike.”

Xanyê kesan bircê belek xana wî çêkir merqedê
Îkrama mêhvan wacibe gava hatim bibe xwedî
Eger tu îkram nekî ser min mêhvanê wek sekî
Ehmed ji te nefret bikî ji te re dibêjim pirsekî (Babnîrî, 2012: 23).

Risteyên jêrê jî derbarê şerîatê da ne.

Li ber rojê di havînî li min reş wek şeva tarî
Di nava deşta Xabûr im, li min da bahôza sarî
Li ber behrê gelek tî me zuwa bû kanîya carî
Li zozanê bilind im li min naxê sira barî
İro şer‘a te bû wunda, li min dinya dibû ‘eks e
Gelo kengî serfîraz bim, di dil de fin fin û tirs e (Babnîrî, 2012: 72).

Babnîrî bi hevokên wate dijber behsa halê xwe derdê xwe dibêje. Sebebê vê mubalexa wî bal kişandina merivan bi bal halê xwe ye.

Babnîrî Kurdan ji bo tiştên dînî şiyar dike û risteyên jêrê dibêje. Lewra wî xwestîye ku bi ve mani‘ ji bo êşa manewî ya ku ji dîn durketin e.

Kurdo! Tu nebêje ev çi dîn e çi terîq e
Lewra ev îman pir kevn e kevnekî wekî ‘eqîq e
Were ber barê dînê xwe da bibim ji te re refîq e
Hemîyet tevlî dîyanet her wekî şurba sewîq e (Babnîrî, 2012: 37).

Ji bil van hemû tiştên olî, behsa şêxan, meleyan, feqîyan, murîdan dike. Ev jî mijarên dînî ne. Babnîrî ji sedem ku helbestvanekî cîvakî bûye û xwestîye civak pêşda here malikên jêrê gotîye.

Ket me nav şêx û murîd e
Werin kuhdar bin ji nû de
Şêxê baş pak û ferîd e
Kes pê re nadê cerîde
Dermnaê qelbê murîd e
Kevn nabê her dem cedîd e
Hamide hemde hemîd e
Paşê şivan e pez umîd e (Babnîrî, 2012: 96).

Di risteyên jêrê da jî di der heqqê şêxên xerab da malûmat dide. Dibêje qe xêr li cem wan tune ye û wan wek qertel dibîne. Lewrra ew li ku derê fayde dibînin hucûm dikin û guhdarî tu rêbazî nakin.

Lê belê şêxê ne baş e
Tev ‘efar e pûç û laş e
Qertel e li ser termê laş e
Kore bê mijak û qaş e
Qelbê wî tev de xerab e
Rewşa wî tek cubb û şaş e (Babnîrî, 2012: 96).

Babnîrî di dîwana xwe da pir behsa mijarên netewî jî kiriye. Ji bo vê meqsedê çend helbest gotiye. Wî helbestek bi navê kurdo, yek jî bi navê Kurdê ‘Îraqê, yek din jî bi navê welat nivîsîye. Di di hinek helbestên xweda şîretan li kurdan kiriye. Hinek risteyên wî yên netewî li jêrê derbas dibin:

Ey ciwanê milletê min! Ey hefadê Rustem e
Yek ji we nabit serok, qey gavanê ji bo we me?
Ma heta kengî li paş bit, qey ji te re xîret nema?
Qey nizanî ey birader ev çi şîn û gumgum e (Babnîrî, 2012: 41).
Ey Kurdo! Tu sultanî ye sultanê me be
Li ber mal û li ber Dîn û li ber Axa xwe be
Herkes bi te ye îro tu jî tu bi xwe be
Tu jî wekî mêran tim li ber koma me be (Babnîrî, 2012: 35, 36, 37).

Risteyên jêrê nîşan didin ku li cem Seyda Babnîrî ol jî netew jî gelek girîng e. Di malikên jêrê da Babnîrî dibêje “Ez li dû tu kesê naçim. Lê belê bi fikra xwe wekî şêxan im û bi îtîdal im. Dev ji dînî xwe jî û ji netewê xwe jî bernadim.”

Ne murîdê kesî me ez, lê belê qelbê min şêx e
Dawa dîn û millîyyet tu lokizê li dîwanê pêxe
Her du dawa kî neke yek tu bi vî şurê xwe lêxe
Lewra yek dawa pir rinde tu çira her duka vêxe (Babnîrî, 2012: 37).

Seydayê Mela ‘Ebdulahê Babnîrî çiqas bibêje jî “ez ne ‘aşiq im ne me‘şûqûm” jî di dîwana xwe da helbestên ku naveroka wan evîn e gotiye. Risteyên jêrê ji bona helbestên wî yên evînê mînakek e:

Ez ne şaş im min xezalek dî di bexçê Îremê
Medh û ewsafê wê îro kete sere qelemê (Babnîrî, 2012: 7).
jî ber ‘işqê zelûl um ez
ji bo Ehmed melûl um ez. (Babnîrî, 2012: 21).

Îlmî û civak jî di nav mijarên dîwana Seyda da ne. Mijarên “medrese û mektebê, çima feqî xwendin terk kir, halê me yê berê û werine rastê” hemû mijarên civakî û îlmî ne. Ev çend malikên ku li jêrê ne tiştê em dibêjin îfade dikin.

Sal bi sal xwezîya bi par e ehlê hucrê çû ‘edemê
Ka te‘llûm kanê te‘lîm ka diwît ka qelemê
Seltenet tev destê me da bû baxê me tev yasemîn bû
Îro mala me bê fêkî bûye tijî hemm û xemê
Dergehê me dergehê hukm û îdarê bû ji dil
Bûne îro em sitûxwar ber qanûn û mehkemê (Babnîrî, 20012: 61).

2.1.2. Hunerên Edebî di Dîwana Wî da

Di vê dîwana Babnîrîyî da mînakên ji bo hunerê pir in. Li jêrê li ser huneran heb bi heb hatîye rawestandin.

2.1.2.1. Teşbîh

Teşbîh rêyek e bi wê merama ji gotinê baştir tê famkirin. Ew di heman demê da eslê hunera îstârê ye. Helbestvan an jî pexşannivîs carinan hunerê teşbîhê bikartîne ji bo ku meqseda xwe bi awayekî xweşik û bi tesîr ji xwendewanê xwe ra an jî ji guhdarên xwe ra bêje. Babnîrî jî di helbestên xwe da teşbîhê bikaranîye. Xwestîye ku ramanên xwe bi awayekî zelal bîne ziman.

“Teşbîh, şibandina tişteki bi tiştekî din ve di wesfekî da bi daçekekî” ye. (Qazwînî, 1997: 375; Cîhanî, 2013: 40; Çağmar: 2023: 103, 108). Îhtîyacîya hunerê teşbîhê bi bal çar tiştan ve heye. Ew ji muşebbeh, muşebbehun bîh, wechê şebehê û daçeka teşbîhê ye. Carinan wechê şebeh an jî daçeka teşbîhê nayê bikaranîn. Lê wateya daçekê dîsa tê famkirin. (Tibî, 1416/1996: 341; Ocek, 2019: 71-73). Mela ‘Ebdullahî di dîwana xwe da gelek cureyên teşbîhê bikaranîye û wî di teşbîhan da herî pir daçeka “wekî” û “wek”ê emilandiye. Lê di dîwana wî da daçeka “wekî”yê ji ya “wek”ê pirtir heye. Bêyî van her du daçekan carinan daçeka “mîna”yê bikar anîye. Daçekên din min di dîwana wî da ne dîtin. Di minakên jêrîn da daçekên “wekî”yê û “wek”ê hene. Mînakên di wan da “wek û wekî” derbas bûye. Pirê caran di wan da wechê şebeh nehatîye bilêvkirin. Lê belê ji sedem muşebbehun bîh meşhûr e, wechê şebeh eşkere ye. Musa, ‘İsa, Hessan (w. 60/680), İbn Farid (w. 632/1235), Ferhad hwd., mînak in ji bo muşebbehun bîh in meşhûr. Lê carinan jî

Teşbîhên Dîwana Babnîrî di cî da ne û edebî ne. Lê hinek caran pirsgirêk xuya ye. Mînak:

Mu'cîzat ez qet nedîm her wekî ayatê tu (Banîrî, 2012: 33).

Di vê rîsteyê da "ayat" bi wateya ıstılahî pirsgirêk heye. Lê bi wateya ferhengî be pirsgirêk nîne. Ev dibe ji bo mubalexê be jî. Li gorî ev tişta jî pirsgirêk namîne.

Di risteya jêrê da mebest ji Taha Hz. Pêxember be teşbîh minasib xuya nake. Lewra yek jê lutfa Xwedê ye û bê tekoşîn e. Ya din mirov xesb kirine ji wan tê sitandin.

Bide pey heqqê xwe bistê her wekî Taha sitand (Babnîrî, 2012: 41).
Ji bêndera xwe mehrûm im keda sala mi tev bû ka
Wekî Fîrozî bindest im ji nezana re bûm seyda (Babnîrî, 2012: 25).
Kahwe di nîvê meclisê qebqeb dikê mîna kew e (Babnîrî, 2012: 60).
'Ubeyd im ez ji Babnîr im
Ji hevalan re wek bîr im (Babnîrî, 2012: 49).

Di teşbîhên ku di van malikên li jorê da ne "wek" û "wekî" hatine bikaranîn û wechê şebeh jî nehatîye gotin. Ji sedem van her du taybetîyan li vir ji teşbîhê re teşbîha mursel û mucmel tê gotin. "Keda sala min tev bû ka" jî teşbîha belîx e. Di rîsteya pêncemin da wechê şebeh xwedî wateyekî fireh e. Lê di risteya duyemin da wechê şebeh ji alîyê wateyê kûr nîne. Carinan Babnîrî daçeka teşbîhê bilêvnekirîye. Ev teşbîh jî teşbîha muekked e.

Ji xeyrê te hebîba dil ez im masî di bin avê (Babnîrî, 2012: 16).

Di teşbîha jorê da wechê şebeh nehatîye gotin û bi awayekî hesan nayê famkirin.

Di teşbîhên jêrîn da wechê şebeh "feryad" û "efxan" e û ji wan ra teşbîha mufessel tê gotin.

Wekî bulbul bi Efxan im. (Babnîrî, 2012: 48).
Eger xewwas nebit min re di behrê de ez ê nûq bim
Wekî Zî'n-nû bikim feryad ji kalîn û ji axa vî (Babnîrî, 2012: 16).
Şeytan e dizan im çî ku ew qîza neyar e (Babnîrî, 2012: 78).

Di van risteyan da daçeka teşbîhê, di teşbîha yekem da nehatîye. Lê di ya duyem da daçek hatîye. Teşbîha yekem û ya duyem jî teşbîha mursel e. Lewra daçeka teşbîhê hatîye. Di ya siyem da jî teşbîha belîx heye.

Babnîrî di dîwana xwe da, îzafa teşbîhîye jî bikaranîye. ji bo vê teşbîhê mînak hatîye dayîn. Di te'bîra "şehsuwarê"yê da teşbîha îzafî heye. Lewra mebest jê "suwarê wek şah" e.

'Erze halê min qebûl ke şehsûwarê medenî (Babnîrî, 2012: 14).

Lewra "fabrîqa ecel" bi wateya "ecelê wekî fabrîq"ê, "behra girî" "girîyê wekî behrê" û "şêxê xwunmij" jî "xwûnmijê wekî şêx" e. Li gorî vê şîroveyê ev her sê mînak jî îzafa teşbîhîyye ye. Lê belê li vir îhtîmalê din jî hene.

Fabrîqa ecel ji nû ve kefenkî min diristî (Babnîrî, 2012: 76).
Ez im xem xwarê we bi'l-lahî çemê min behra girî
Ez hevalê we me weqtê dara tûba nebirî (Babnîrî, 2012: 83).
Eya şêxê xwunmij! Ne hevalê te me
Li ser te şûrê min dikî zimzim e (Babnîrî, 2012: 64).

Hinek teşbîhên Babnîrîyî jî teşbîhên temsîlî ne. Mînakên jêrê ji wê ne.

Ev bihara tev nîrgiz tev çîçekî rengînî
Wek Îrem e, pir rind e, herkes ewî dihebînî (Babnîrî, 2012: 94).
Wek nokî tev bi peqijin tef ketine rêka sefere (Babnîrî, 2012: 80).

Li vir muşebbeh ji çend tiştan pêk tê û bûye wek sûretekî û muşebbehun bîh jî ji çend tiştan pêk tê. Lewra baxçê îrem ji pir tiştan pêk hatîye û tev bi hev ra bûye wek sûretekî.

Şêx Se'îd û Ehmedê Xanî û Mele Mustafa
Tevde wek Nûrsî zelal bûn ser ce'da Pexemberî (Babnîrî, 2012: 81)

Li vir alîyên teşbîhê hissî, meşhûr û mutlaq in. Yanê her du alî jî bê qeyd in. Lê di risteya jêrê da muşebbeh muqeyed e. Lewra bêjeya "tarî" qeyd e. Li vir muşebbehun bîh jî mutlaq e.

Şeva tarî şefa tarî li min reş bû wekî qîr (Babnîrî, 2012: 84).

Di teşbîha jêrê da teşbîha mefrûq heye. Lewra du teşbîh bi hev ra hatine. Minasebeta wan bi hev ra tuneye. "Dilêm jar e" û "zindan e wekî bîr" du teşbîhên ji hev cuda ne.

Dilêm jar e, li min sar e dizîndan e di zîndane wekî bîr (Babnîrî, 2012: 82).

Di malika jêrê da teşbîha cem'ê heye. Muşebbehun bîh ji yekê zêdetir e. Ew jî "efar, pûç û laş e.

Lê belê şêxê ne baş e
tev 'efar e pûç û laş e (Babnîrî, 2012: 96).

Di hinek teşbîhan da muşebbeh ne hatîye gotin. Di malika jêrê da du teşbîh hene. Di yekê ji wan da muşebbeh nehatîye. Di risteyên jêrîn da teşbîha teswîye heye. Lewra muşebbeh ji yekê zêdetir e. Lê muşebbehun bîh "Firdews" bitenê ye.

Ev diyar û ev mekan û teht û axa Mekkeê
Tev ji mir Fîrdews e hem nûr e cîhatê qibleê (Babnîrî, 2012: 12).
Me go hinarekê rû digo ew gul in
Me go zulf û kakil digo sunbul in (Babnîrî, 2012: 107).

Alîyên teşbîhan pirê caran hissî; carinan jî eqlî ne. Li jêrê her du jî eqlî ne.

Sofî bêje şêxê xwe ye ev dîn ne wek kêfa te ye (Babnîrî,, 2012: 58).

Carinan alîyekî teşbîhê an jî du alîyê wê mecazî ye. Ev tişt di risteya jêrê da heye.

Eger carek xuya bit ew şeva tarî bibî wek roj

2.1. 2.2. Îstîare

Îstîare bi eslê xwe teşbîh e. Lê di îstîareyê da yek ji alîyên teşbîhê, daçeka teşbîhê û wechê şebehê nayê gotin. Ji bo îstîareyê pênaseyên cuda hatine gotin. Lê li vir em ê behsa pênasekî bi tenê bikin. Îstîare ji bo bikaranîna bêjeyê an jî hevokê di wateya mecazî da tê gotin. Di vê bikaranînê da eleqe teşbîh e. Digel eleqeyê qerînekî ku mani e ji bona qesdkirina wateya heqîqî jî di mînakên îstîareyê da tê bikaranîn (Qazwînî, 1997: 381; Haşimî, 1434/2013: 276; Çağmar, 2023: 44-47).

Te dîsa da me ber kêr e
Gelo qetla mi qey xêr e (Babnîrî, 2012: 21).

Lêkera "da ber"ê muşebbehun bîh e. Muşebbeh jî "mêzekir, nêrî" ye. "Kêr" jî qerîne ye. Li gorî vê şîroveyê li vir îstîareya tesrîhîyye û tebeîyye heye. Di vê mînakê da wekî din jî îstîare mimkun e.

Mela 'Ebdullahê Babnirî di îcrakirina îstîareyan da di helebstên xwe da helbestvanekî gelekî bihêz e. Lewra carinan di malikek bi tenê da çend îstîâre bi hev ra hatîye îcra kirin û carinan jî hevokek an jî bêjeyek di xwe da îhtîmla çend îstîareyan dihewîne. Malikâ jêrê ji bo vî tiştî mînak e.

Keskî nahêlêd bexçe da ne'j hermel û ne'j sosinê

Tevde dikî pûc û zuwa berba dixî ji darê dinê (Babnîrî, 2012: 23).

Li vir dibe ku ev malik ji bona îstâreya temsîlîyye mînak be. Lewra halê dinê û mirovan hatîye şibandin bi halê baxçeyekî û bi tiştên di baxçe da ne. Li vir dibe ku îstâreya temsîlîyye tune be jî. Wê gavê baxçe, hermel û sosin muşebbehun bîh in, Dinya, mêr û jin an jî îxtîyar û ciwan jî muşebbeh in. Ev jî îstâreya tesrîhîyye û eslîyye ye. Risteya dudiyan da "*dikî pûç û zuwa berba dixî"* mulaîmê muşebbehun bîhê ye. "*Ji darê dinê"* jî mulaîmê muşebbehê ye. Li gorî vê agahîya di vê malikê da îstâreya mutleqa heye. Mebesta Mela 'Ebdullahê Babnîrî ji vê malikê: "Dinya wek baxçeyekî ye di serî da ji halê tunebûnê geş û xweş dibe û suretekî pir bi bandor derdikeve holê an jî baxçe û her tiştên tê da pir xweş dibin. Lê di dû ra mirin hêdî hêdî wê xweşikîyê dibe û tiştek namîne."

Di malika jêrê da jî îstîare heye. Lewra derb muşebbehun bîh e û zehmet û kul û derd jî muşebbeh e. Li gorî vê şîroveyê îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Felek jî qerîne ye û ji alîyekî din jî istiareya meknîyye û texyîlîyye heye. Lewra felek bi wateya heqîqî nabe mixateb. Babnîrî wek gelek helbestvanan felekê ji xwe ra kirîye mixateb. Ev tiştê helbestê kurdî de meşhûr e. Ji sedem vê bala guhdaran hatîye kişandin.

Derba te êşandim felek!
Mecrûhê wan tîrê te me (Babnîrî, 2012: 28).

Di malika jêrê da jî îstîare heye. Lewra şerab muşebbehun bîh e û hezkirîn û eşq jî muşebbeh in. Dest ji mulaîmê mueşebbehun bîhê ye. Di nîvê duyem da jî dinya bi bêjingê hatîye şibandin.

Ji destê te şerab kêş im
Cîhan li serê min bêjing e (Babnîrî, 2012: 31).

Di risteyên jêrê da jî îstîareya tesrîhîyye û eslîyye heye. Lewra bar muşebbehun bîh e. Wezîfe an jî zehmetî jî muşebbeh e. Qerîne jî eqlî ye. Bêjeyên xwurşîd û hîvek jî îstâreyên eslîyye û tebeîyye yin. Qerîne bêjeyên "eyb û şerm" in. Di risteya yekem da şikayet û aciztî heye. Di ya duyem da jî pesnê memduhê heye.

Ev çi bar bû li ser milê min pir giran e, ey bira! (Babnîrî, 2012: 32).
'Eyb û şerm e piştî xwurşîdê ku hîvek bi derê (Babnîrî, 2012: 8).

Risteyên jêrê îstîareyên ciwan di nava xwe da dihewînin. Di hemû risteyan da em dikarin bibêjin bi lêkeran îstîayerên tebeîyye û tesrîhîyye hatine îcrakirin. Bêyî vê şîroveyî dibe ku qerîna wan bibe îstîare jî. Li gorî vê şîroveyê li vir bêjeya derdê muşebbeh e û av an jî tiştekî wek wê muşebbehun bîh e. Ji vê şîrovê tê famkirin li vir îstîareya texyîlîyye û meknîyye heye. Ev risteyên jêrê xwedî wateyên gelek kûr in.

Kurdo! Tu were carekê derdê xwe birêje
Li cîhanê serê te kete bin yasa serêş e
Xanî terikî, çiya herikî xercî birêje
Ji Babnîrê tu bistî, evê dersa xwe bipêje (Babnîrî, 2012; 55).

Seyyîd 'Ebdullahê Babnîrî li vir ji kurdan ra dibêje "Derdê xwe bibijên, li dinyayê hûn di halekî xerab da ne. Cî û warê we ji destê we diçe û belayên wekî çiyayan li ser we dibarein, hûn tedbîra xwe bigirin û ji gotinên Babnîrî îstîfade bikin."

Di risteyên jêrê da jî Seydayê Mela 'Ebdullahî mînakên îstîareyên pir îcra kirîye. Wî qelemê her wekî mirovan hesabindîye û ji xwe ra kirîye. Li cem wî derd û kul wek birînan in. Baş bûna wan birînan di nivîsandina helbestan da dîtîye. Di dû ra behsa bar dike. Lê pir

munasibê qelemê nîne. Ji qelemê ra dibêje tu bi awayekî bê hudûd binîvsîne. Behsa kul û derdên xwe û mesûliyeta xwe ya giran dike. Di te'bîra *"Qelem tu were"*yê da jî istâreya meknîye û texyîlîyye heye. Xîtab qerîne ye. "Serxweş bibe" jî ji sedem ku mulaimê muşebbehun bîhê ye îstâreya terşîhîyye ye. Lê di "birîn" û "bar"ê da îstâreyên eslîyye û tesrîhîyye hene.

Qelem tu were dîsa serxweş bibe
Birînê in min kevn in bira nû nebe
Barê min giran e nakim taqet e
Di bin vî barî pir kêşim zehmet e (Babnîrî, 2012: 65).

Ey axayê pir 'eşîr û ey gurê tim dev bixwîn
Ma tu nanêrî ku mêrkûj pêşîka te ket kemîn (Babnîrî, 2012: 40).

Di malika li jorê da îstâreya tesrîhîyye, eslîyye û terşîhîyye heye. Lewra gur muşebbehun bîh e û navekî darijtî nîne. Dev bixwun ji mulaîmê muşebbehun bîh e. Di vê malikê da tenkîtkirin û nesîhet bi hev ra ne. Ev jî alîyê uslûbê wek pirsgirêk xuya dike. Lê pirtir bala mixateb dikşîne.

Di dîwana Babnîrî da mînakên îstâreyê pir in. Di meseleyên netewî û dînî da îstâre pirtir heye. Di vê dîwanê bêyî mînakên îstâreyê yên me li vir gotin mînakên îstâreyê yên din jî pir in.

Îstîareyên Mela 'Ebdullahî pir caran ji bo mijarên girîng û bi derd in hatîne bikaranîn.

2.1.2.3. Kînaye

Di pirtûkên belaxetê da derbarê kînayê da pir pênase hene. Li gorî yek ji wan pênaseyan "di kînayê da digel qesda wateya mecazî qesda wateya heqîqî jî mimkun e." (Teftâzânî, 1416/1996: 407; Carim-Emin, 1428/2007: 167). Ev huner sê cûre ye. A yekê kînaye ji sifetê, ya dudiyan kînaye ji mewsûfê û ya sisiyan jî kînaye ji nisbetê ye. Îbnu'n-Nazim, 1989: 146-147; Çağmar, 2022: 394). Hunerê kînayê di dîwana Mela 'Ebdullahê Babnîrî da pir hatîye îcrakirin. Malika jêrê mînakek ji kînayê ye. Tê da kînaye ji mewsûfê heye. Lewra mebest ji çardarê tabut e. Kînaya bi çardarê di vê dîwanê da di çend ciyan da derbas dibe (Babnîrî, 2012: 18). Li vir dibe ku mebest ji çardarê mirin be jî. Lê bi çardarê tabût bê qesdkirin tevî ku pirê caran tabût tê qestkirin wate xweş nabe. Lewra mirin bê qestkirin xweştir e.

Gava çar dara min derket
li ser milkê xwe min deyne (Babnîrî, 2012; 30).

Min digo ez tu cara nakevim nava nivîna
Mi digo ji ber tîra ebed nakim enîna (Babnîrî, 2024: 25).

Di malika jorê da risteya yekem ji nexweşînê kînaye ye û nisbet e. A duyem jî tîr e ji mirinê kînaye ye û nakim enîna jî nisbetê kînaye ye. Mebest jê "ez ê acizîyê nekime" ye. Lê vîr îşaret bi bal ciwanîyê û ne qebûlkirina însanan tiştên zeîf e. nnnn

Malika jêrê kînaya ji sifetê ye. Lewra "destê puç û zuwa" kînaye ji bêxêr bûnê ye.

Ger tu negirî destê minê puç û zuwa 'Eraf jî tune

Di malikên jêrê da çend kînayê ji nisbetê hene. Lewra helbest van dibêje ku "ew li ciyên xweş e, Lê tevî vî halî jî tu kêf û zewqê nagir e. Ji emelê xwe mehrûm bûye û keda wî heba çûye. Wekî Fîrûz ji serbixwebûnê mehrûm um û nezan li dora min in. Ev hemû kînayeyên ji nisbetê ne.

Li zozanê bilind im ez, lê li min naxî sira ba

Di nav bax û baxçan im, sera pa bû me derd û da
Ji bêndera xwe mehrûm im, keda sala mi tev bû ka
Wekî Fîrozî bindest im, ji nezana re bûm seyda (Babnîrî, 2012: 25).
Gelek xwedîyê bênderan ser bi tac û hecî ne (Babnîrî, 2012: 51).

Risteya jêrê xîtab bi bal gelê Kurd ve ye. Ji wan ra dîbêje ku li ser rûyê erdê herkes bûye xwedîyê welat, îmkan û desthilatdarîyê. Lê hûn bê cî û îmkan û desthilatdarî mane. Li gorî vê wateyê li vir kînaye heye.

Herkes hatîye malê tu ji derve nahewî (Babnîrî, 2012: 35).

Di malika jêrê da ji bo kurdan bi rêya te'rîzê kînaye hatîye îcrakirin. Lewra ji wan ra dibêje ku hemû mirov gihîştine meqsed û mirada xwe. Hûn çima ji bo meqsed û miradên xwe tiştekî nakin. Ev kînaye bêyî fikrekî kûr nayê famkirin. Ji sedem vê taybetîyê ji xwendekaran ra giran tê. Lê ji alîyê wateyê bi bandortir bûye.

Her zumre bi hev re ketine zewq û mehebbet
Ma qey tu bê parî? ji te re qet tune ucret
Kurmanc mu'minin kufran ji wan re tehlî ye (Babnîrî, 2024: 107).

Di malika jorê da tehlî ji xerabîyê kînaye ye. Di malika jêrê da bi rêya te'rîzê kînaye hatîye îcrakirin. Lewra ev riste ji bo Mela 'Elîyê Zîlayî bersîv e û tiştê wî gotiye qebûl nake. Lê belê bi nazikî û bi awayekî kînayî bersîva wî dide. Lewra ê tekfîra kesî nekirîye Bedîuzzaman e. Seydayê Mela 'Elîyê Zîlayî ji daîm pirtûkên wî xwendine û ji guhdarîkirin li gotin û kirine ustad dixwaze. Mebest ji Kurdî Bedîuzzaman e.

Ne kir tekfîra yek kurdî
Ne kir tenfîr ne kir teberrî (Babnîrî, 2012: 49).

2.1.2.4. Mecaza Mursel

Mecaza mursel hunereka zanista beyanê ye û pirê caran di bêjeyê da tê îcrakirin. Ev huner ji bo "bikaranîna bêjeyê an jî hevokê ji sedem eleqeyê di wateya mecazî da tevî qerînekî ku manê wateya heqîqî ye" tê gotin. (Metlûb, 1996: 602). Eleqe ji bo mecaza mursel pir in. Hinek ji wan sebebiyyet, musebbebiyet, kulliyyet, cuziyyet, halliyyet, mahallîyyet, lazimiyyet, melzûmîyyet in. Di mecaza mursel da şibnadin nabe eleqe. (Besyûnî, 1994: 70; Aslanoğlu, 20019;137-144). Mecaza mursel jî di dîwana Babnîrî da hatîye îcrakirin. Ji bona mecaza mursel di Dîwana wî da mînak pir in. Mecaza mursel bi eleqeyên cuda hatîye bikaranîn. Ev sebebîyyet, musebbebîyet, cuzîyyet, kullîyyet, xusûsîyyet, umûmîyyet, îtîbar-ı ma yekûn, halliyyet û mehelliyyet in.

Carinan minakên mecaza mursel minakên xerîb in. Her du risteyên jêrê ji bo vê tiştî minakên. Di risteya jêrê da mecaza mursel bi bêjeya "keska"yê hatiye îcrakirin. Lê eleqe hal an jî sebeb e kifş nîne. Di risteya duyemîn da jî "dîn kete jêra zemîn" da mecaza mursel zor tê famkirin û îht^^imal eleqeyên cuda heye.

Seyyîdê bi şewqe bi fikre bû keska te qetandî (Babnîrî, 2012:41).
Piştîwî Şahê Bedî' dîn kete jêra zemîn (Babnîrî, 2012: 34).

Di risteyên jêrîn da du car mecaza mursel hatîye îcrakirin. Du caran bi bêjeya destê hatîye bikaranîn. Li vir dest hatîye gotin. Lê mebest jê şexis bixwe ye. Bi vê cuziyyet hatîye gotin û mebest jê şexsê mixateb e.

Ma heta kengî ji destê te bikim zar û enîn
Qey ne şerm e ji wî destê teb huzn û şîn û bigirîn

Rûh û canê xwe fida ke bo ‘eşîr û ferdîya (Babnîrî, 2012: 40).

Mecaza mursel a din jî bêjeya “mirîya” ye. Mebest jê zemanê bê ye. Ne zemanê berê ye. Çiqas jî yên behsa wan tê kirin mirî nebin jî, ewê di zemanê bê da bimirin. Ev jî îtibar-i yekûnu ye.

Xwendevan be bibe hekîm li milletê xwey miriya (Babnîrî, 2012: 40).

Di risteya jêrê da bi bêjeya “sing”ê mecaza mursel hatîye îcrakirin. Lewra mebest ji singê dil e. Li gorî vê şîroveyê mehel hatîye gotin û hal hatîye qesdkirin.

Birîna li singê qatile wek pezika kofî me ez (Babnîrî, 2012: 28).

Li jêrê bi bêjeya “jiyan”ê mecaza mursel hatîye bikaranîn. Lewra ji wê “min” hatîye qesdkirin. Li vir eleqe musebbebiyet e. Lewra yê ku jiyan pê derdikeve holê mirov e. Ji sedem vê taybetî jiyan ji mirovan ra dibe wek netîcê.

Bilîlî nim wekî zendê
Jiyana min nexwe cengê (Babnîrî, 2012: 30).

Di risteya jêrîn da di du bêjeyan da mecaza mursel hene. Ew jî “dewrek mufsîd” e û “herkes” e. Di dewra mufsîdê da eleqe mehellîyyet e. Mebest jê mirov in. Di herkesê da jî eleqe umûmîyet e. Mebest jê hinek mirov bitenê ne.

Em ketine dewrek mufsîd e herkes dibe şêxê te me (Babnîrî 2012: 58).

Di risteya jêrê da jî du car mecaza mursel hatîye bikaranîn. A yekê di lêkera “dibêjî”yê da ye û ya dudiyan jî di bêjeya “dîya”yê da ye. Di dibêjî da eleqe musebbebiyyet e. Lewra qelb nabêje. Lê dixwaze. Ew jî dibe sebeb ji bona gotinê. Di dîyayê da jî eleqe xusûsiyyet e. Lewra dîya yekhejmar e. Lê mebest jê pir hejmarî ye.

Qelbê min wek ney dibêjî min ‘efû ke ji bo Xweda
Dîya kurda bi hemle ye wê meşûqa biweldîne (Babnîrî, 2012: 82, 90)

Di risteyên jêrê da jî mecaza mursel heye. Lewra di “nasbikî, seyyid, deşt û çiya, qelbê çiya” da mecazên mursel hene. Nasbikî sebeb e ji bo qebûlkirinê û bawerîyê, mebest ji seyyîdî bavê Babnîrî Mela Yûsufî ye. Seyyid umûmî ye. Lê Yusuf xusûsî ye. Mebest ji deşt û çiya jî mirovên di wan da ne. Li gorî vê şîroveyê jî eleqe mehellîyyet e.

Heçî ‘Ehmed nasbikî wî nederd e ne xem e (Babnîrî, 2012: 95)
Seyyidê bi esl û fesil, ey alime deşt û çiya
Qelbê van çiya li ser te cama cem bû şikestîye (Babnîrî, 2012:101)

Di dîwana Babnîrîyî da çiqas li gorî îstîarê û teşbîhê mînakên mecaza musrel hindik bin jî dîsa mînakên wê têra xwe hene û carinan di risteyekî an jî di beytekî da du, sê mînak hene.

Kî dibê muşrîk û kafir, ta ji bo te nekenî (Babnîrî, 2012: 11).

Di vê risteyê da musebbeb hatîye gotin, lê sebeb hatîye qesdkirin. Lewra mebest ji lêkera “nekenî”yê “kêfxweş nebe an jî nepejirîne, bawer neke” ye.

Di risteya jêrê da bi rêya mecaza mursel behsa gelên ku ew û Kurd tevî hev bûne dike. Eleqe jî xusûsiyet e. Lewra mebest ji cînavka “im”ê kurd in, ji Qeysî, Ereb in, ji ‘Akifî Tirk in û ji Şîrazî jî Faris in. Seydayê Babnîrî dibêje Kurd weki ‘Ereb, Tirk û Faris in.

Hessan im wekî Qeys wekî ‘Akif û Şîrazi (Babnîrî, 2012, 86).

2.1.2.5. Mecaza Eqlî

Mecaza eqlî beşek ji mecazê ye. Lê ev mecaz di bêjeyê da nayê îcrakirin. Bitenê bi nisbetkirina bêjeyan bi bal hev ve derdikeve holê. Pênasa jêrê ji bona mecaza eqlî hatîye gotin:

"*Mecaza eqlî* nisbetkirina lêkerê an jî tiştên ku xwediyê wateya lêkerê yin bi bal tiştekî ye ku ji alîyê wateya heqîqî di navbera wan da tu eleqe nîne." (Merâxî, 1994: 292). Di mecaza eqlî da eleqe û qerîne pêwîst e. Lewra eleq sebebê bikaranîna mecazê ye; qerîne jî mani' e ji bo qesdkirina wateya heqîqî. Ji bo mecaza eqlî şeş eleqe hene. Ew faîlîyyet, mefûlîyyet, zamanîyyet, mekanîyyet, sebebiyyet û mesderîyyet in. (Tîbî, 1416/1996: 400; Cunahî, 2006: 99). Di dîwana Babnîrî da mecaza eqlî kêm e. Ji bo vî awayî ji alîyê mecaza eqlî dîwan xurt nîne. Mînak:

Lew min xem nîne ne saxım Ehmed e dermanê min (Babnîrî. 2012: 57).

Di vê risteya jorê da "derman" bi bal Ehmedî hatîye nisbetkirin. Lê di eslê xwe da Ehmed ne derman e. Belkî dibe sebebê dîtîna derman. Li vir eleqe sebebiyyet e.

Di risteya jêrê da jî mecaza eqlî heye. Lewra roj teng nabe. Belkî mirovên tê da dijîn bîna wan teng dibe. Eleqe zamanîyyet e.

Roja teng ew rast heval e tu bi wîra bibe yek ta (Babnîrî, 2012: 55)

Hicra nehiwê, serf û fiqhê tev bi hev ra derd û himhim in (Babnîrî, 2012: 62).

Malika jorê jî dixwe da hunerê mecaza eqlî dihewîne. Lewra li gorî hebestvan terka nehw û serfe bûye sebeb ji bona derd û teşqeleyan.

Vê xurbetê ez pîr kirim

Ji bav û bira û da kirim (Babnîrî, 2012: 105).

Di malika jorê da jî mecaza eqlî heye. Lewra xurbet sebeb e. An jî eleqe zemaniyyet e. Ji bona pirkirinê û dûrxistina ji dê û bavan.

Dermanê qelbê murîd e

Kevn nabê her dem cedîd e (Babnîrî, 2012: 96).

Di vê malikê da jî mecaza eqlî heye û eleqe jî sebebiyyet e. Lewra şêx ji bona başbûna qelbê murîdî wek sebeb hatîye dîtin. Di malika jêrê da jî mecaza eqlî derbas dibe. Lê belê ev mecaz bi ravekekî 'erebî hatîye bikaranîn û tê da mubalexe heye. Mirov rojî digire. Zaman rojî nagire.

Saîmu'd-dehr bû ebed min qet nedî bê rojîye (Babnîrî, 2012: 101).

Di risteya jêrê da îhtîmala nisbeta weşandinê jî û nisbeta hamidê jî heye. Di her du halan da jî mecaza eqlî derdikeve holê. Weşandin hatibe nisbetkirin, wê gavê eleqeya mecazê mefûliyyet e. Lewra ew nawşîne. Belkî tiştê tê weşandin ew bixwe ye. Hamid hatibe nîsbetkirin wê gavê eleqe mucaweret an jî mefûliyyet e. Li gorî eleqeya yekem, ên hemd dikin li dora wê ne. Li gorî ya duyem jî dar xweşik e ji sedem vê taybetîyê tê hatîye pesindayin û medihkirin. Lê tevî vê şîrova me, li vir dibe mebest ji Hamidê seydayê Babnîrî be. Wê gavê jî em dibêjin li vir istîareya meknîyye û texyîliyye heye û weşandin jî dibe istîareya terşîhîyye.

Dara hamid yek bi yek dîsa weşandî meywe ye (Babnîrî, 2012: 83).

Mecaza eqlî li gorî mecaza mursel di dîwanê da pir nehatibe jî ji bo wê gelek minak hene.

2.1.2.6. Cînas

Cînas di wêjeyên zimanan da hunerek girîng e. Bi wê gotin tê xweşkirin ji sedem vê taybetîyê jî ji ra hunerê lefzî tê gotin. Cînas ji bo bihev ra hatina bêjeyên wateya wan cuda û lefzê wan wek hev e" tê gotin. Cureyên cînasê pir in. Cînasa tam û cînasa naqis jî ji cureyên wê ne. (Bozarslan, 2021:140, 159; Hebenneke, 2010: 485).

Banîrîyî di dîwana xwe da cînas bikaranîye. Pirên cînasên wî anîye cînasên naqis in. Carinan cînas di navbera navan da; carinan jî di navbera lêkeran da hatîye bikaranîn. Pirên cara cînasên wî di dawîya risteyan da hatine. Mînakên cînasa tam gelek kêm in. Malika li jêrê yek mînakek ji cînasa tam e. Lewra bêjeya "warim" di cara yekem da bêjeyekî tirkî ye. Lê di ya duyem da kurdî ye û bi wateya "cî" ye.

Ji bo şer'a te ez warim, belê bê mal û bê warim (Babnîrî, 2012: 72).

Di malika jêrê da jî cînasa naqis heye lewra "qemer" û "kemer" bi hev ra hatine. Dengê wan wek hev in. Lê wateya wan cuda ye.

Çûne ava di xwesûfê nema nûra qemerê
Weqta şemsa te zuhûr kir daye 'eksa kemerê (Babnîrî, 2012: 8).

Di malika jêrê da cînasa tam di navbera her du bêjeyên "werd"ê da hatîye bikaranîn.

Babnîrî were avê di vî qelbê xwe werde
Ji wî behra 'Erebkend çî ku ew wîrda re werde (Babnîrî, 2012: 88).

Di her çar risteyên jêrê da cînasa naqis di carekî da hatîye îcrakirin. Wekî risteyên jêrê di hinek ciyên din da jî cînasa naqis hatîye. Hatina bêjeya safeyê, xafeyê û dafeyê di risteyên li dû hev da ji bo vî tiştê me got mînak e.

Ez qet ne murîd im lê bele qelbê min saf e
Ser qelbê min jarî heye yek benikê xaf e
Qet zen neke benikê kul i ser qelbê min daf e (Babnîrî, 2012: 88).

Di risteyên jêrê da jî cînas heye. Lê li wir cînas bi awayekî cuda hatîye. Lewra di risteya yekem da her du bêjeyên ji bo cînasê hatine bikaranîn li dû hev hatine. Bêjeya pêşîyê nav e. Lê bêjeya duyem jî wesf e. Di dû ya duyem da sê bêje û dengê wan jî wek hev e. Lê wateya wan heman tişt nîne.

Ey şebabê! Nesla hamid, hemîd leqeba we ye (Babnîrî, 2012: 83).
Rabe topa ji furoka bavêl ser serê serseri ye (Babnîrî, 2012: 42).

Di malika jêrê da bêjeya "bav"ê sê car hatîye û bi wateya "bavê heqîqî" û "murşîd" hatîye bikaranîn.

Lew bavê mecazî ji bava efdelê bav e (Babnîrî, 2012: 88).

Di malika jêrê de jî cînasa îştîqaq hatîye îcrakirin. Lewra sê bêjeyên ku ji heman raderê ne hatine bikaranîn.

Hamid e, hemd e hemîd e
Baş şivan e pez umîd e (Babnîrî, 2012: 96).

2.1.2.7. Îstîfham

İstîfham an jî pirs di zanista belaxetê da "xwestina hînkirina agahîyêkî der heqqê tiştekî da" ye. (Metlûb, 1996: 109). Gava mebest ji pirsê hînkirina agahîyekî be, pirs di wateya heqîqî da hatîye bikaranîn û ji re pirsa heqîqî tê gotin. Lê gava mebest ji pirsê hînkirina agahîyekî nebe, ji wê ra pirsa mecazî tê gotin. (Teftazanî, 1416/1996: 226; Haşimî, 1434/2013: 79, 86; Dîb-Qasim, 2003: 295).

Babnîrî di dîwana xwe da pirê caran îstîfham bikaranîye. Li gorî tesbîta me, wî dîwana xwe da îstîfhamê di wateya heqîqî da bikarneanîye. Mebest jê hevokên wî pirê caran, tecub, teqrîr, tenbîh, tewbîx, nefîy, înkar, hwd. Ji vî tiştî jî tê famkirin ku wî îstîfham ji bo meqsedên edebî bikaranîye. Tevî dî kurdî da carinan pirs bê daçek jî dibe. Babnîrî di pirsan de pirê caran

peyvên pirsan bikaranîye. Wî ji bo pirsan peyvên qey, ma, gelo, kî, kê, kengî, kengê, çi, çima, çire, hwd. bikaranîye.

Ma gelo! Piştî vî rojê xurşîdek din wî hebî
Ma çima hûn xwar dikin vê rêka rast gelî kura (Babnîrî, 2012: 104).
Gelo! Kengî bêt hîmmeta min berê,
Da ez pê bibirim serê van şîrret e (Babnîrî, 2012: 65).

Di van malikên jorê da sê pirs hatine. Di wan da ji bona bihêzkirinê du heb peyvên pirsê bi hev ra hatine bikaranîn. Ev pirs bi wateya heqîqî ne hatine. Di pirsa yekem da îhtîmala tecubê û neyînî; di ya duyem da jî şiyarkirin heye. A sêyem jî ji bo derengketina mijarê ye.

Di risteyên jêrê da jî îstîfham hatîye bikaranîn. Di ya yekem da pirs ji bo neyînîyê; di ya duyem da, ji bo lewmê û dia; di ya sêyem da jî ji bo şiyarkirin an jî teqrîrê ye. Di ya çarem da jî îhtîmala inkarê heye. Lewra Babnîrî dibêje bira wer nebin.

Babnîr e mesken ji min re kî zanî ehwalê min? (Babnîrî, 2012: 57).
Ma heta kengî li paş bit, qey ji te re xîret nema?
Qey nizanî ey birader ev çi şîn û gumgum e (Babnîrî, 2012: 41).
Çima hinek meqreyos in çire hinek filê Rûs in? (Babnîrî, 2012: 48).

Hinek pirsên di vê dîwanê da hene, di wan da helbestvan xwe li nezanîyê danîye. Di belaxetê da jê ra tecahulu'l-'arîf tê gotin. (Subkî, 2003: 275; Qasim-Dîb, 2003: 85). Malika jêrê ji bo vî tiştî mînakekî hêja ye.

Gelo! Serxweş im weya di xew da me
Ji zulfê şekerî gerden jî şima (Babnîrî, 2012: 107).

Ji bo hinek pirsan wateya heqîqî xweştir e. Risteya jêrê ji bo vî tiştî minakek e.

Mi go selwa çiye? Di go bejna min
Mi go stêra sibê di go anîya min (Babnîrî, 2012: 109).

Pirsâ li jêrê ji bo hesretê ye. Seyda ji bo xwendina berê mehzûn dibe û dixwaze wê xwendina berê hebe.

Ka tellûm kanê te'lîm ka diwît ka qelemê (Babnîrî, 2012: 61).

Pirsa di risteya jêrîn da derbas dibe ji bo îrşadê an jî lewme ye. Lewra li vir her du îhtîmal jî hene.

Ma heta kengî tu çavê xwe bi gerînî li malê pir (Babnîrî, 2012: 40).

2.1.2.8. Îtnab

Îtnab di zanîsta belaxetê da hunerek gelek meşhûr e. Ev huner li gorî îcaz û musawatê tê tesbîtkirin. Lewra wate û gotin bi qasî hev be jê ra musawat; tevî tam famkirîna wateyê gotin kêm be, jê ra îcaz tê gotin. Lê ji ber nukteyekî gotin ji wateyê zêdetir be jê ra îtnab tê gotin. Îtnab têgehekî gelek fire ye. Lewra îtnab bi çend cureyan hatîye îcrakirin. tekîd, tekrar, zîkra xusûsê piştî 'umûmê, tezyîl, zîkra 'umûmê piştî xusûsê, îğal, îtiraz, tewşî', tetmîm hwd. (Hillî, 1992: 178; Ruknuddîn el-Curcanî, 2011; 117-134).

Babnîrî di diwana xwe da pir mînakên îtnabê bikaranîye. Carinan di îtnabên wî da bêjeyên hemwate carinan jî yên dijber hatine bikaranîn. Malika jêrê ji vî tiştî ra mînak e.

Ez ji qelb û dil disojim nar û dû ye bê hewa ye (Babnîrî, 2012: 13).

Di malika jêrê da îtnab bi anîna du lêkeran hatîye îcrakirin. Lewra "nakenim û nakim tebessum" her du jî wateyên wan wek hev in. Mela 'Ebdullahê Babnîrî bi bêjeyên jêrê jî hunerê

îtnabê bikaranîye. Zar û enîn, rehm û şefqet, rûh û can, hîle û sexte, xurt û stûr lemp û çira, dem û saet hinek bêje yin ku bi wan îtnab hatîye îcrakirin.

Ji lew ez nakenim nakim tebessum
Ji rûhê ji rewanê xwe mest im (Babnîrî, 2012: 27).

Carinan îtnab bi tekîdê derdikeve holê. Risteya jêrê ji bo vî tiştî mînak e.

Zemanê berê şêx reîsê te bû
Cemî'ê 'ewam e di emrê te bû (Babnîrî, 2012: 63).

Di malika jêrê da jî îtnab heye. Îtnab bi bêjeyên tekîdê hatîye îcrakirin. Lewra "tim" û "qet" wateyekî nu dernexistiye holê. Lê belê wateya hevokê bihêzkiriye.

Mêjî qet nemaye timî serxweş e
Li ser vî serî himhim û dibdib e (Babnîrî, 2012: 65).

Di malikên jêrê da em dikarin bibêjin tezyîl heye. Lewra di risteya yekem da wateya hevoka dudiyan wek hevoka yekem e. Ev tişt di risteya sêyem û çarem da jî heye. Ji hevokên bi vî şeklî ra dibêjin tezyîl (Tîbî, 1416/1996: 459).

'Aciz ji ber rizqê xwe ye, çare ji wî re qet nema
Da'wa wî ne dînê te ye kul û derdê wî pere ye (Babnîrî, 2012: 58).
Ji bo Ehmed kole me, li ber derî bende me (Babnîrî, 2012: 95).
Sond dixwun em te ji bîr nakin ji pey te naqetin (Babnîrî, 2012: 103).
Dêra Qîr e nêzîk e, ji Batman ne dûr e (Babnîrî, 2012: 699).

Di malika jêrê da du car bi îxalê îtnab hatîye îcrakirin. Îxal gotin tevî temam be jî ji bo tekîd an jî ji bo teşbîhê bi tiştekî zêde bê temamkirin e (Meraxî, 1371: 194). Li gorî vê şîrovê liv ir îtnab hatîye îcrakirin. Lewra di risteya yekem da "reng" û "rind" û di ya duyem da jî "gumgum e" nehatiba jî hevok temam bû. Bi hatina wan di wateyê da mubalexe derketîye holê, ev jî îxal e.

Babnîrî roja te derket bê kusûf e bi reng û rind e
Dengê vê defe bilind e, gumgum ed bajar û gund e (Babnîrî, 2012: 26).

Di risteya jêrê da jî îtnab bi zîkra xusûsê li dû 'umûmê hatîye îcrakirin. Lewra "zîkr" 'umûm e; tesbîh jî xusûs e.

Her li dû zikr û tesbîh helqe û nalîn û ta ye (Babnîrî, 2012: 13).

Di dîwana Babnîrîyî da mînakên îtnabê pir in. Îtnab bi çend curên xwe di vê dîwanê da cî girtîye. Îtnab herî pir bi bikaranîna bêjeyê hemwate hatîye îcrakirin.

2.1.2.9. Hezif

Hezif beşekî ji îcazê ye. Lewra gava bêjeyek an jî hevokek ji gotinê hatibe avêtin, jê ra hezif an jî îcaz tê gotin. Ji alîyê belaxetê sebebê hezfê girîng e. Ew jî 'umûm, îxtîsar, tehqîr, îbham, diyarbûnî, tezîm hwd. (Tetazanî, 2005: 1/ 62, 127, 164; Xelâyînî, 1994: 2/247). Di helbest û peşxanê tev da hezif meşhûr e. Lê ji bo hezîfekî di cî da, qerîne pêwîst e. Lewra qerîne bêjeya hezif bûye nîşanî me dide. Qerîne ji famkirina xelet ra dibe mani'. (Dusûqî, 1992: 2/10).

Babnîrîyî jî di dîwana xwe da hezfê îcrakiriye. Pirê caran hezfên di dîwana wî da yek ji vanên jêr in, Ketina tîba "n"yê di bêjeyên pirhejmarî da, ketina baneşana gazîkirinê, ketina pêveber û kirdeyê, ketina qertafa "da"yê ye.

'Erze halê min qebûl ke şehsûwarê medenî (Babnîrî, 2012: 14).
Sofî bêje şêxê xwe ye, ev dîn ne wek kêfa te ye (Babnîrî, 2012: 58).

Berîya bêjeyên şehsûwarê û sofîyê baneşana "ey"yê heye.

Tu di newrozê ji ber derba neyare natewî (Babnîrî, 2012: 55).
Di germa havînê sar kirim
Xistim zîndanê ker kirim (Babnîrî, 2012: 105).

Di risteyên jorê da jî hezif heye. Lewra di risteya yekem da li dû bêjeya newrozê bêjeya "da"yê ketîye. Di risteya duyem da jî "da" ketîye. Lewra eslê wê "germa havînê da" ye.

Mil, çûk û sitû tev de bi hev dî re şikestî (Babnîrî, 2012: 76)

Di navbera bêjeya milê û bêjeya çûkê da gihanek ketîye ku ew jî "û" ye.

Di malika jêrê da cînavka "ew"ê ketîye. Lewra dû bêjeya lewê pêwîst e ku ew hebe.

Babnîr cihê bav û cihê kalê me 'ezîz e
Ew bû ji mi re mesned û lew bûye lezîz e (Babnîrî, 2012: 78).

Carinan Seydayê Mela Ebdullahê Babnîrî ji bêjeyên pirhejmarî tîpa "n"yê davêje. Di malika jêrê da sê cara tîpa "n"yê ji bêjeyên pirhejmarî hatine avêtin. Li jêrê gihaneka "û"yê jî hatîye avêtin.

Hin ji nezanê sofîya ji şêxa hem ji 'amîya (Babnîrî, 2012: 58).

Di malika jêrê da kirde du caran ketîye. Ew jî cînavka "ew"ê ye.

'Ellamê zeman bû fetwagaha herkesan bû
Keşşafê cewaba î'tîmada me teva bû (Babnîrî, 2012: 84).

Di hinek cîyan de hezîf dibe ku bibe sebebê xeletîyê.Lê îhtîmla mezin sebebê tercîh kirina hezfên bi vî awayî helbest e. Lewra li vir bi qasî ji hevokê tê famkirin. "ku" û "e" ketine. Eslê wê "ku wek diyarê Uhud e" ye.

Di banê tepê wek dîyarê Uhud
Birîne serê xal wekî Hemzete (Babnîrî, 2012: 65).

2.1.2.10. Tîbaq

Tîbaq, di ilme belaxetê da ji bo hatina du heb bêjeyên dijberê hev bin û bi hev ra werin tê gotin. (Metlûb, 1996: 522; Cunahî, 2006: 255). Bi tîbaqê gotin tê xemlandin. Di navbera navdêran, carinan jî di navbera lêkeran an jî daçekan tê bikaranîn. Pirên mînakên tîbaqan bi bêjeyên dijber derdikev in holê: Lê carinan jî bi qertafên neyînîyê çêdibin. Jı tîbaqê ra tezad jî tê gotin. (Teftazanî 1996: 416; Cîhanî, 2013: 48). Mînakên tîbaqê jî alîyê hunerê helbestê xweşiktir û bi bandortir dike.

Di dîwana Babnîrîyî da mînak ji bo tîbaqê pir in. Deşt û çiya, dest û pa, şikir -kufir, rast-çep, sultan-kole, xesar-kar, derd û da, şiyar-xewar, cîwan-pîr hinek minakên ji bo tîbaqê yên ku di vê dîwanê da ne. Di risteyên jêrîn da rast-derew, zor-rehet, sax- mirî mînakên tîbaqê ne.

Sofî rast be derew neke, şêx biçûk be mezin neke
Keramet zor in rastî divê ne rehet e ne henek e (Babnîrî, 2012: 59).
Rûh û canê xwe fîda ke bû saxa ne miriya (Babnîrî, 2012: 40, 41).

Mi nizan bû tehl û şêrîn mi nizan bû jor û jêr
Mi nizan bû dûr û nêzîk tim şikestî hunerê (Babnîrî, 2012: 79).

Li jorê hemû tîbaq di nav bera navdêran da ne. Ew jî bêjeyên tehl-şêrîn, dûr-nêzîk, jêr-jor in. Lê di malika jêrê da hemû tîbaq di navbera lêkeran da ne. Pirên tîbaqên di vê dîwanê da hene di navbera navdêran da ne. Di malika jêrîn da tîbaq di navbera lêker û navdêrê da ye. Lê di malika duyem da her du tarafê tîbaqê jî lêker e.

Gah çarçav im gah nabînim wek şev û rojê me ez

Gah li jêr im gah li jor im ji ser şivan re bûme pez (Babnîrî, 2012: 25).
Eyûb im mubtela bû me
Demek hatim demek çûme (Babnîrî, 2012: 20).

Di zanista belaxetê da her du tarafê tîbaqê erênî be, ji ra tîbaqu'l-îcabî tê gotin. Lê yek jê erênî yek jî neyînî be, jê ra tîbaqu's-selbî tê gotin. Çawa ku di risteyên jêrê da tîbaq bi şiklê zanî û ne zanî, hat û nehat hatîye.

Tarîxa cîhanê tevlî kurmanca te zanî
Ê ku te ne zanî cahil e tiştek nizanî (Babnîrî, 2012: 103).
Rêça zirav bi kevir e
Hat û nehata can bire (Babnîrî, 2012: 29).

Di risteya jêrê da jî tîbaq heye. Lê ziddiyeta her du bêjeyan li vir bi sebeb îştîqaqê ye. Lewra yek ji wan ism-i fail e û yek ji wan jî ism-i mefûl e.

Di nava her kesande heye xadir heye mexdûr (Babnîrî, 2012: 39).

Hindik be jî carinan hunerên muqabeleê jî Mela 'Ebddullahê Babnîrî bikaranîye. Muqabele jî wek tîbaqê ye. Lê di tîbaqê da ziddiyyet di navbera du bêjeyan da ye. Di muqabelê da berê çend tiştên minasibên hev bi hev ra tên û di dû ra jî tiştên ziddê wan bi hev ra tên (Metlûb, 1996: 237). Babnîrî muqabelê hindik bikaranîye. Risteyên jêrê mînaka muqabelê ye.

Rastî hebê tebrîk dikim, tekya te jî pîroz dikim
Tim xwarîya tel'în dikim, ev çî murîd û humhum e (Babnîrî, 2012: 59).
Ez ne feqîrek şakir im ne sultanek 'adil im (Babnîrî, 2012: 24).

Di risteyên jêrê da berê "rastî û tebrik" û di dû ra jî; xwarî û tel'în hatîye. Ew jî muqabele ye.

Herkes ji xwer yarek didî her dem li wê dibû xwedî
Mirin evînek ji xwer nedî daîm neyar hezar sedî

2.1.2.11. Mubalexe

Di zanista belaxetê da mubalexe nisbetkirina wesfekî bi bal tiştekî ve bi awayekî ku ew nisbet mimkun nebe an jî zor be. Di hinek pirtukên belaxetê da behsa sê cûreyên belaxetê tê kirin. Ew teblîx, îxraq û xulûv in. (Teftazanî, 2005: 166; Ocek, 2019; 94-96). Di zanista belaxetê da nîqaş li ser hunerê mubalexeyê heye. Lê tevî ku hinek 'alimên belaxetê mubalexeyê qebûl nekiribe jî bi piranî wê muteber dibînin. (Elewî, 1422: 5/63).

Mela 'Ebdullahê Babnîrî ji bo meramên xwe bi awayekî bi bandor carinan hunerê mubalexê bikaranîye. Mubalaxeyên ku wî bikaranîye bi gelemperî ya ji bo tewazûyê ye an jî ji bo pesna ye.

Di malika jêrê da Babnîrî behsa xwe dike û ji bo tewazu û rehmet xwestînê ji Xwedê hunerê mubalexê bikar tîne. Lewra tiştên xwe yên baş nahesibîne. Li vir mubalexe li gorî 'eqil jî 'edetê jî mimkun e.

'erze halêm tê de nîne yek puwanek xeyrê 'eyb (Babnîrî, 2012: 14).

Babnîrî gava behsa bavê xwe dike, di her du risteyên li jêrê ne dibêje ku bavê wî daîm bi rojî bûye û dibêje gelo li dû wî ewê yekî wekî wî were an na. Ev her du tişt jî ji bo mubalexeyê hatine. Di risteya sêyem da jî di hejmarê da mubalexe heye. Ev mubalexeyên ku me got ji alîyê eqil û 'edetê mimkun in.

Saîmu'd-dehr bû ebed min qet nedî bê rojî ye (Babnîrî, 2012: 101).
Ma gelo! Piştî vê rojê xurşîdek din wî hebî (Babnîrî, 2012: 102).

Gelek ji bo ‘elbekê sed car didan selewat (Babnîrî, 2012: 51).

Di her sê risteyên jêrê da mubalexe ji alîyê eqil û ‘edet tev mimkun nîne. Lewra hênik bûna agir, ne serxweş bûna yê ku araqê vedixwe, ax xwarin ji alîyê eqil û ‘edet ne mimkun e.

Bi ter agir jî hînik tê, ji mir şevka te ‘eynê roj (Babnîrî, 2012: 72).

Şerabê dikêşî lê belê qet tune sekret (Babnîrî, 2012: 35).

Dixwum axê wekî mar im, di dûzexê sar im (Babnîrî, 2012: 72).

Di risteyên jêrê da jî mubalexe heye û ji eqil û ‘detê mimkun nîne.

Dayê mi digotî ji mir qet mirin nîna
Min digo ez tu cara nakevim nava nivîna
Min digo ji ber tîran ebed nakim enîna
Min digo ebedî nabînim êş û birîna (Babnîrî, 2012: 75).

2.1.2.12. Tewrîyye

Tewrîyye di îlmê belaxetê da hunerkî meşhûr e. Gava di xeberdayînê da di dewsa wateya nêzîk wateya dûr bê qesdkirin jê ra tewrîye tê gotin. (Haşîmî, 2013: 324; Metlûb, 1996; 433-435). Hunerê tewrîyyê Mela ‘Ebdullahî gelek pir hindik bikaranîye. Di malika jêrê da tewrîyye heye. Lewra tabîra “bê wefa”yê di serî da wateyekî neyînî tîne hişê merivan. Lê li vir ev wate tuneye. Mebest jê “hatina, peydabûna wefayê” ye.

Kêfa min tê ji bo bê wefa daîm dikim zewq û sefa (Babnîrî, 2012: 24).

Di risteya jêrê da jî tewrîyye heye, lewra Seydayê efîf ji bona herkes in bi îffet in, tê gotin. Lê li vir wî ji bo seydayê xwe bikaranîye. Lewra navê seydayê wî ‘efîf e.

Seydaê ‘Efîf çû dîsa em bê seyda mane (Banîrî, 2012: 84).

2.1.2.13. Tecrîd

Tecrîd li gorî pirtûkên di îlmê belaxetê da ne derxistina tiştekî ji tiştekî din e ku di wî tiştî da wesfekî an jî tiştekî din tê xeyalkirin. Yek jî rêya tecrîd bikaranîna raweka xîtabê ji bo mitekellimê ye. (Îbnu’l-Esîr, 1416/1995: 406; Haşimî, 1434/2013: 335). Babnîrîyî di berhema xwe da tecrîd hindik bikaranî be jî hinek mînak ji tecrîdê jî bikaranîye. Di risteyan jêrê da hunerê tecrîdê heye. Lewra Babnîrî di wan da behsa xwe dike. Lê bi raweka mitekelimê hestên xwe ne anîye ziman. Di dewsa mitekelimê da raweka xîtab û xaîbê bikaranîye. Di dewsa “ezê avê di qelbê xwe werdim” da bêjeya Babnîrîyî bi munadatîyê anîye û ji sedem vê şuxlandinê rawek bûye xîtab, Dîsa tebîra “helbestkar tim rast e”yê di dewsa “ez rast im” da anîye. Ev tişt jî dibe tecrîd. Babnîrî di şexsê xwe da şexsekî din xeyal kiriye û bi wî ra xeber daye.

Babnîrî were avê di vî qelbê xwe werde (Babnîrî, 2012: 88).
Helbestkar tim rast e
Ku şêx li heşrê bikare (Babnîrî, 2012: 90)
Ebdî ji Babnîr ser xwe re
Wî ne mecal û mefer e
Bavêje Dîclê ber here
Li pey keştîya wî nenêre
‘Umrê wî çû wî yar nedî
Kengî li malê vegere
Lê yara bi rehm û şefqet e
Ji pey şopa wî fena ger e (Babnîrî, 2012: 29).

2.1.2.14. Îltîfat

Îltîfat hunerekî ji ‘ilmê meanîyê ye. Îltîfat bê hebûna îhtîyacekî eşkere derbasbûna bi bal raweya kesanê ya cuda ye. (Tîbî, 1416/1996: 421; Hebenneke, 1996: 1/479). Îltîfat çend cure yin. Îltîfat carinan ji mitekelimê bi bal xaîbê yan jî xîtabê; carinan ji mixatebê bi bal mitekelimê an jî xaîbê; carinan jî xaîbê bi bal mitekelimê an jî muxatebê ve ye. Li gorî hinek zimannasan di îltîfatê da derbasbûna yek ji van hersêyan bi bal yekî din ve şert nîne. Lewra li gorî wan yek ji raweyên kesan di dewsa yên din ve bînî jî ji bo îltîfatê kafî ye. (Qazwînî, 1997: 104; Hebenneke, 1996: 1/479).

Qelem tu bi sekine bibe sabir e
Dilê min pir sare dikî gidgide
Mêjî qet nemaye timî serxweş e
Li ser vî serî himhim û dibdib e (Babnîrî, 2012: 65).

Ji tebîra “qelem tu”yê tê famkirin li vir raweka xitabê hatîye bikaranîn. Lê belê eslê wê mitekelim e. Ev jî nîşan dide ku li vir îltîfat ji mitekelimê bi bal xîtabê bûye. Di malika jêrê da jî îltîfat heye. Lewra helbestvan ji xaîbê derbasî xîtabê bûye.

Xanî serkevan bû hem di nîv mihraba dîn bû
Seyda tu sera pa şeyxê kurmancê murîd bû (Babnîrî, 2012: 104).

Di risteyên jêrê da îltîfat ji xaîbê bi bal mitekelimê ve ye. Lewra bêjeya “heçî” xaîb e û ya “emê” jî mitekelim e.

Heçî bibine hevalê min di seyrê
Di dîlanê emê bibine evine (Babnîrî, 2012: 27).

Di risteya jêrê da di serê wê da Ebdê Babnîrî mixateb e. Lewra Babnîrî gazî xwe kiriye. Lê di dû ra jî “wî” hatîye ew jî mitekelim e.

‘Ebdê Babnîrî dizanî xelasa wî îttîhad e (Babnîrî, 2012: 36).

Di helbesta jêrê da “tev” û “em” hatîye. Yek ji wan xaîb e; ya din jî mitekelim e.

Tev li ser pîrê quranê em li ser wechan derûb (Babnîrî, 2012: 32).

Di risteya jêrê da di serî da bêjeya “kol”ê ku xaîb e hatîye; dû ra jî cînavka mitekelimê hatîye.

Min gotiye sultan bike şefqet li vî kolî ne Hind û ne Çîn im (Babnîrî, 2012: 8).

Di malika jêrê da “resûlê ‘erebî” xaîb e. Lê “Şehsûwarê Medenî” xîtab e. Ji vî tiştê hanê ra îltîfat tê gotin.

‘Erze halê xwe nivîsî me resûlê ‘Erebî
‘Erze halê min qebûl ke şehsûwarê Medenî! (Babnîrî, 2012: 11, 12, 13, 9).
Bilîlî nim wekî zendê
Jiyana min nexe cengê (Babnîrî, 2012: 30).

Di risteya jorê da li şunda “min”ê bêjeya “jiyan”ê hatîye. Ev jî îltîfat e.

Di her çar risteyên jêrê da jî îltîfat heye. Lewra bêjeya “mirin”ê xaîb e. Lê lêkera “nahêlî, dikî”yê xîtab e.

Dad û meded dad û meded axîn dikim ji ber mirinê
Gelek ji şah a ji geda dîdê di wan ax xistinê
Keskî nahêlî di bexça da ne ji hermel û ne ji sosinê
Tev de dikî pûc û zuwa berba dixî ji darê dine (Babnîrî, 2012: 23).

2.1.2. 15. Tecahulu'l-'arîf

Tecahulu'l-'arîf di pirtukên belaxetê da ji bo mitekelim tevî ku tiştekî dizane jî xwe li nezanîyê deyine tê gotin. (Meraxî, 1431: 351). Babnîrî di dîwana xwe da hunerê tecahulê pir hindik îcra kiriye. Di risteyên jêrê da ev huner heye. Lewra pirsa wî der heqqê wî da ye. Lê belê ew bi wî tiştî dizane. Di her sê risteyan da jî Babnîrî wekî tu tiştekî nizanê be, hinek tiştan pirs dike. Lê ew mijarê dizane.

Te dîsa da me ber kêr e
Gelo qetla mi qey xêr e (Babnîrî, 2012: 21).
Gelo! Serxweş im weya di xew da me (Babnîrî, 2012: 107).
Hey hewar e hey hewar e kanî şahê min bedî' (Babnîrî, 2012: 32)

2.1.2.16. Qelb

Li vir mebest ji qelbê cî guherandina unsurên hevokê ye. Ev jî qelba mekanî ye.(Teymûr, 1422/2002: 1/87). Ev wekî cî guherandina kirde û pêveberê ye. Di risteyên jêrê da kirde û pêveber cî guherandin e. Di dî dîwana Mela 'Ebdullahê Banîrî da qelb li gorî hinek huneran hindik nîne. Lê qelba di wê da guherandina mekanî ye.

Nisbet ji Babnîrî me ez, Kuştî bi ser tîrê me ez (Babnîrî, 2012: 24).
Li ber dergehê rindê me ez
Ji bo dîtinê bekçî me ez (Babnîrî, 2012: 27).

Di her du risteyên jêr da lêker û bêjeya pi ra cî guherandine.

Her roj bi sed gavî ji dînê xwe dibî dûr (Babnîrî, 2012: 39)..
Guhdar hûn bibin bêjim evan derd û xema (Babnîrî, 2012: 89).

2.1.2.17. Tekrar

Tekrar di belaxetê da dubarekirina lefzê bixwe ye. Carinan jî dubarekirina wateyê ye. Carinan bêje tên dubarekrin û carinan jî hevok tên dubarekrin. Dubarekirina wateyê bi tekrara peyvên hemwate jî dibe. Tekrar ji bo mebestên cuda tê îcrakirin. Di nav wan mebestan ê heri girîng tekîda gotinê ye. Yanê bihêzkirina wateyê ye. Ji bil vê mebestê dîqat kişandina bi bal temamê tiştên ku di binê hikmê da ne, telezzuz, îrşad bi bal tiştên mînak in, zêdekirina teşwîqê, mezinkirina qedrê muxateb hwd. (Teftazanî, 1416/1996: 292, Haşîmî,1434/2013: 209).

Di dîwan Mela 'Ebdullahê Babnîrî da tekrar gelek heye. Bi taybetî di hinek beşan da malika tekrarê heye. Carinan jî tekrar bi hevokê an jî bi bêjeyê tenê ye. Di dîwana Seyda da 41 helbestên kurdî hene. Ji wan di neh heban da malika tekrarê heye. Malika jêrê di behsa Bediuzzaman da derbas dibe. Banîrîyî ev malik ji bo hesret û kedera xwe ya ku derbarê Bedîuzzaman da heye tekrar kiriye.

Hey hewar e hey hewar e kanî şahê min bedî'
Hey hewar e hey hewar e kanî şahê min refî'

Malika jêrê di behsa şêx û melayan da hatîye gotin. Li vir mebest ji tekrarê bal kişandina melayan bi bal ji dûrketina lewmekirinê li şêxan e.

Eya ehlê 'ilmê zema şêx meke
Bi vê zem û keydê xwe bê soz neke (Banîrî, 2012. 63, 64).

Mebest ji tekrara risteyên jêrê li gorî tesbîta me îrşad an jî teşwîq e.

Ey Kurdo! Tu sultanî ye sultanê me be
Li ber mal û li ber Dîn û li ber Axa xwe be
Herkes bi te ye îro tu jî tu bi xwe be

Tu jî wekî mêran tim li ber koma me be (Babnîrî, 2012: 35, 36, 37).

Malika jêrê jî hatîye tekrarkirin. Li vir mebest ji vê malikê eşkerekirina zeîftîyê û bêçaretîyê ye. Tekrara wê jî ji bo tekîd ye. Dibe ku ji bo bal kişandinê be jî.

Ber pêla ketim lê belê ez sobe nizanim
Ez ketm e Furatê wekî per bûme bi can im (Babnîrî, 2012: 75, 76, 77).

Mebest ji tekrara malika jêrê dibe ku zêdekirina xwestinê ji bo qebula diayê be. Lewra her cara ew hatîye tekrarkirin bûye sebeb ji bo zêde xwestina qebûla diayê.

'Erze halê xwe nivîsî me resûlê 'Erebî!
'Erze halê min qebûl ke şehsûwarê Medenî! (Babnîrî, 2012: 11, 12, 13, 9).

Tekrara malika jêrê dibe ku ji bo zêdekirina xwestina şefaatê be.

Meded Şahê di medînê de
Meded saxê di qebrê de (Babnîrî, 2012: 20, 21, 22).

Li gorî qeneata me tekrara vê malikê bal kişandin bi bal îfadekirina halê helbestvan e.

Gah çarçav im, gah nabînim, wek şev û rojê me ez
Gah li jêr im, gah li jor im ji ser şivan re bûme pez (Babnîrî, 2012: 25, 26).

Carinan di Diwana Babnîrî da tekrar bi hevokan an jî bi bêjeyan hatîye îcrakirin. Tekrar di risteya jêrê da bi tekrara bêjeyan hatîye bikaranîn. Li wir wate bi tekrarê hatîye tekîdkirin û bal kişandin bi bal wê ve.

Dinya ne heval e ne heval e ne heval e ne heval e (Babnîrî, 2012: 79).

Di risteyên jêrê da tekrar bi cînavkan hatîye bikaranîn. Lewra cînavka "ez"ê çend caran hatîye tekrarkirin. Di her çar risteyên yekem da helbestvan bi tekrarê pesnê xwe dike. Di her çar risteyen duyem da jî cînavka "ez"ê dîsa hatîye tekrarkirin.

Ser zinarê kêfê me ez
Nêçîrvanê çayê me ez
Tîra nêçîrvan kûr diçû
Tek hedefa Romî me ez (Babnîrî, 2012: 28).

Di risteyên jêrê da mebest ji tekrara cinavkê tewazu ye.

Ez bikim wesfê te Seyda lazim e Serrafî bim
Ez ji qelb û dev bibêjim tevde ez perwanî bim
Ez nikarim qet ji behra qelzemê guhdarî bim
Mame bê bav û bira piştî te ez mey xwarî bim (Babnîrî, 2012: 32).
Her roj tu bi sed gavan ji dînê xwe dibî dûr
Ma dîn ne bes e korê kurê korê kurê kor (Babnîrî, 2012: 39).
Rûh û canê xwe fîda ke bo saxa ne mirîya (Babnîrî, 2012: 40, 41).

2.1.2.18. Telmîh

Telmîh di nav hunerên belaxetê da hunerek meşhûr e. Helbestvan ji bo gotinên xwe xweşik bike, an jî bihêz bike telmîhê bikar tîne. Gava mitekelim di nav xeberdayînê xwe da îşaret bi bal hikayekî, beytekî, gotinên pêşiyan ên meşhûr an jî meselekî ku hatîye zanîn bike jê ra telmîh tê gotin. (Nuweyrî, 1423/2002: 2/127; 'Elewî, 1423/2002: 3/97).

Di dîwana Mela 'Ebdullahê Babnîrî da telmîh pir hatîye bikaranîn carinan telmîh bi bal qisekî Quran'a pîroz ve ye, carinan jî bi bal hedîsekî, şairekî, gotinên pêşiyan, alimekî hwd. Di malikên jêrê da telmîh bi bal buyer û tiştên di Quranê da derbas dibin hatîye kirin.

Ez Qîtmîr im ne xem e kes jî nebî ez he me (Babnîrî, 2012: 95).
Gah kêr im gah Îsmaîl bûm bi qurbana peder
Gah dibin bîrê me Yusif, gah Ye'qûb um bê mefer
Wekî Ye'qûb bibe tu dil ji xeyalan meke zû
Çav li rê nêrî be kengî bê Kenanê min (Babnîrî, 2012: 56).
Ji dostan nîne yek ferdek
Ji kêrê re tune berxek (Babnîrî, 2012: 21).
Xerasunê 'alem ketine nîv narê Semûdê (Babnîrî, 2012: 78).
Wekî Zî'n-nûn bikim feryad ji kalîn û ji axavî (Babnîrî, 2012: 16).
Qet nema Hudhud bigînî mektûbêj Belqîsê ye
Ba Suleyman ji lew zor dane min Efxanê min (Babnîrî, 2012: 57).

Di van malikên li jorê ne telmîh hatîye îcrakirin. Lewra di risteya yekem da telmîh bi bal hîkaya Eshabê Kehf û kuçikê wan ve heye. Li gorî tefsîran navê kuçikê wan Qîtmîr e. (Zemexşerî, 1407/1986: 2/713; Qurtubî, 1964: 10/360). Di risteya duyem û çarem da telmîh bi bal bûyera ku di navbera Hz. Îbrahîm û Hz. Îsmail da derbas bûye heye. Di risteya sêyem da îşaret bi bal mesela Hz. Yusif ve ye; Ya şeşem da telmîh bi bal ezabê ku hatîye serserê qevmê Semûd; di ya heftem da telmîh bi bal bûyera ku hatîye serê Hz. Yunis ve heye. Di her du risteyên dawîyê da jî telmîh bi bal buyera ku di navbera Hudhud, Hz. Suleyman û Belqîs derbas bûye heye. (Qurân-ı Kerîm, Nemil, 20-44; Yusif, 34-96; Saffat, 101-107; Haqqe, 5).

Rehberê 'Îsa û Mûsa pêşsuwarê enbîya
Tu şefî'ê gunehkara tu medarê 'eşqîya (Babnîrî, 2012: 13).

Ev malika jêrê telmîh e ji bo roja qiyametê ku wê rojê mirov şaş dimînin û hemû Pexemberan diçin bi bal pêxemberê me û jê ra dibêjin bibe şefaatkirox ji bo hemû îns û cinan. Ew jî li cem Xwedê ji wan re şefa'at dike. (Buxarî, 1422/2001: VIX/121).

Ji rinda re nebûm 'aşiq, lê şoxa cîhanê xwestim (Babnîrî, 2012: 26).

Bi vê ristê telmîh hatîye kirin bi bal halê Kurdan. Ji Kurdan ra dibêje hûn halê xwe û perîşanîya xwe ji bîra dikin. Tevî vê perîşanîyê hûn ji bo mafên xwe naxebitin lê ji bo netewên din dixebitin. Perîşan nikare bibe alîkarê perîşana. Dibê berê hûn xwe xelas bikin.

Ji lew ez wek herî naçîz bûdem
We lakîn ez gulê re bûme mihvan (Babnîrî, 2012: 27).
Hamid e, hemd e hemîd e
Baş şivan e pez umîd e (Babnîrî, 2012: 96).
Qula derzîyê biter meydan
Ger tu nebê cîhan tengî (Babnîrî, 2012: 30).

Di risteyên jorê da telmîh heye. Di her du risteyên di serî da ne telmîh bi bal gotinên Se'dê Şîrazî; di risteyên sêyem û çarem da telmîh bi bal Seyda û Şêxê wî Hamidî û murîd û feqîyan û risteyên dawîyê da jî telmîh bi bal malikek erebî ve heye.

Di malika jêrê da jî telmîh bi bal halê kurdan û tirkan ve heye. Lewra dibêje ku "tek hedefa romî me ez". Li vir mebest ji ezê kurd in û ji romî jî tirk in. Telmîh bi bal serokê Surîyê Esed ve heye

Tîra nêçîrvan kûr diçû
Tek hedefa Romî me ez (Babnîrî, 2012: 28).

Selama jêr dişinim

Ji durzî re bakîn im (89)

2.1.2.19. Qesir

Qesr hunerek e ku di zimanê ‘Erebî da pir tê bikaranin. Ev huner texsîsa tiştekî bi tiştekî din bi awayekî xusûsî dike. (Teftazanî, 2005: 180). Li gorî vê pênaseyê di qesrê da “tehdîd” an jî “teqyîd” heye. Di Dîwana Babnîrîyî da hindik minak jê hene. Ew jî pirê wan bi gihanekê ye.

Di risteya jêrê da qesr bi nefiy û îstîsnayê hatîye îcrakirin. Li vir li gorî mijarê qategorî ya qesrê tê guherandin. Eger mebest mijara şefa‘et be. Qesr heqîqî dibe. Di risteya “tek hedefa romî me ez”ê da qesir bi bêjeya “tek”ê hatîye îcrakirin. Li vir qesr mecazî ye.

Xeyrê te Ehmed tunîne keskî bê berbarê min (Babnîrî, 2012: 57).
‘erze halêm tê de nîne yek puwanek xeyrê ‘eyb (Babnîrî, 2012: 14).
Tîra nêçîrvan kûr diçû
Tek hedefa Romî me ez (Babnîrî, 2012: 28).
Belê şikur ez mu‘min im ne ji yah û bahê kafir im (Babnîrî, 2012: 24).

Di risteya jorê û di du risteyên jêrê da jî qesr heye. Li vir qesr bi bêjeya “ne”yê hatîye bikaranîn.

Rûh û canê xwe fîda ke bo saxa ne miriya (Babnîrî, 2022: 40).
Ev xiyala min ‘Urûc in qet kîbr û ne futûr (Babnîrî, 2012: 15).

2.1.2.20. Îstîdrak

Îstîdrak pirê caran wek mijarekî rêzamanî hatîye dîtin. Lê carinên di nav mijarên belaxetê jî hatîye qebûlkirin. Îstîdrak rakirina famkirina şaş e ku ew ji peyva derbasbûyî derdikeve holê. (Curcanî, 1984: 21).

Di Dîwana Mela ‘Ebdullahê Babnîrî da hunerê îstîdrakê ne pir be jî heye. “Lê” û “lakîn” ji bo îstîdrakê hatîye bikaranîn. Di dîwana wî da pirê caran lê ji bo îstîdrakê ye. Belkî carinan zâid e. Di risteyên jêrê da jî “lê” zaîd e. Lewra peywendîya her du risteyan bi hev ra tuneye. Ji sedem vê xalê tiştek bê rastkirin jî tuneye ku em jî bibêjin li vir îstîdrak heye.

Mijarên îstîdrakê yên ku Mela ‘Ebdullahî bikaranîye pirê caran mijarên civakî ne û gelê kurd bi salan ji wan mijaran zarar dîne.

Ez heval im ne neyar im xîzmetkar im qet ne bar im
Lê selama ji padişaha hêstirê çavê min e (Babnîrî, 2012: 92).

Di risteya jêrê da behsa Şêx Muhemmedê ‘Erebkendî dike. Dibêje ku herkes pêşda diçe û biserdikeve. Lê ne wek wî. Lewra ew pir jihatîye û pêşda çûye.

Her teyr di firin, lê ne wek perwazê dibazî (Babnîrî, 2012: 87).

Di jêrê da jî îstîdrak heye. Tê da tekîda zemmê bi tiştên dişibihin medhê ve jî heye.

Tek bi şikil Musilman bûm, lê belê rûh kotî ye (Babnîrî, 2012: 91).

Mela ‘Ebdullahê Babnîrî di risteyên jêrê da jî îstîdrak bikaranîye. Lewra behsa kurdan dike dibêje îmkanê we tune be jî, hûn bi esl in û wirek in. Di risteya duyem da jî dibêje ku ez ne murîd im, lê qelbê min şêx e.

Destê te kin e lê esl û cergê te dirêj e (Babnîrî, 2012: 35).
Ne murîdê kesî me lê belê qelbê min şêx e (Babnîrî, 2012: 37).

Dîsa gava behsa mirovan dike îstîdrak bi kar tîne. Dibêje di nav her qewmî da yên zalim û ê mezlûm hene. Lê ne wek kurdan e. Di malika duyem da jî dibêje ku şêx murşîd be. Ez wî

qebul dikim. Dibê lê çavê wî li malê miletê be û li ser navê dîn mirovan ji bona meqsedên xwe bi şuxlîne ez ji wî dur im.

Di nava her kesan de heye xadir heye mexdûr
Lakîn ne wekî kurda di bin bîra binî kûr (Babnîrî, 2012: 39).
Eger tu murşîd bî bira, tu ji min re bav û kur e
Lakîn tu xwun mij bî here, ne hevalê hîlê te me (Babnîrî, 2012: 59).

Li hinek cîyan îhtîyac bi bal îstîdrakê ve nîne. Lê dîsa îstîdrak hatîye bikaranîn. Di risteyên jêrê da ev tişt eşkere ye. Lewra berîya bêjeya "lê" tiştekî îstîdrakê bixwaze derbas nabe.

Ew di pey sifra mêhvana pir ji mere edeb e
Lê belê weqta ku qehwe bête der meclisê hudûr
Qet ji bo çayê namînê reng û qîymet û leb e (Babnîrî, 2012: 60).

Encam

Seydayê Mela 'Ebdullahê Babnîrî mirovekî 'alim, helbestvan û nivîskar e. Lewra xwedî Dîwan û berhemên hêja ye. Bi kurdî, erebî û tirkî nivîsîye. Tevî van tiştan di rojnameyên Batmanê da nivîsên wî derketîye. Ji malbatekî ehlê îlmê û seyyid e. Bi salan li gundê Batmanê, Bismilê û Stewrê xwendîye. Piştî xwendina xwe li Batman û gundên wê û li wêranşehrê melatî û muderristî kiriye. Wekî pirên melayên herêmê ji alîyekî bi îlmê, tedrîsê û telîfê ve meşxûl bûye ji alîyekî din jî di nav gel da maye û wan îrşad kirîye.

Îrşada gel di dîwana wî da gelek eşkere ye. Seyda bi tenê behsa îman, îbadet û exlaqê nekirîye. Belkî gelek bûye şahide perîşanîyê û xwestîye ku ji alîyê civakî, sîyasî û netewî jî gel şiyar bike. Ji van alîyan da li gorî qenaeta me tiştên seyda kirîye dişibihe tiştên ku Bedîiuzzaman di dema Seîdê Kurdî da kirîye. Lewra her duyan jî îrşadê ji alîyê dînî jî û ji alîyê netewî jî tev kirine. Dîwana seyda ji alîyê naverokê bi te'bîrek gelemperî dînî û mîllî ye. Lewra dixwaze ku Kurdan ji alîyê netewî ve şiyar bike û ji wan hemûyan dixwaze bi hev ra bin û xwedî îtîdal bin û ew jî bibin wek gelên din. Ji wan dibêje ji dîn dur nekevin û tevgera we li gorî dîn be. Ji alîyê hunerê jî dîwana Seyda dîwanek dewlemend e.

Tevî ku derdê Babnîri kêmanî û nexweşînê gelî derxe holê ye jî dîwana Babnîrî ji pirên huneran gelek mînak dixwe da dihwîne. Bi taybetî hunerên teşbîhê û îstîareyê. Ji bo ev her du huneran gelek minak hene. Mînakên tê da ji teşbîh û îstareyê cureyên wan ên cuda di nav xwe da digirin. Di dîwana wî da mînakên teşbîha belîx, teşbîha mursel, teşbîha mucmel û mînakên teşbîhên din hene. Di Dîwana Babnîri da kînaye û mecaza mursel jî pir hatîye bikaranîn. Lê bi qasî teşbîh û îstîareyên nînin. Di mînakên mecaza mursel da 'eleqeyên cuda hene. Mecaza eqlî jî hatîye îcrakirin. Lê numûnê wê jî û eleqeyên wê jî hindik in. Di dîwana Babnîrî da mînakên cînasê, îtnabê, tekrarê, telmîhê, tîbaqê, hezfê, mubalexeyê û îstîfhamê jî heye. Ev hemû di dîwana Babnîrî da pir in. Bêyî van huneran wekî din jî huner hene. Ew jî qesir, îstîdrak, qelb, îltîfat e. Lê mînakên wan zêde nînin. Hinek huner jî di dîwana Babnîrî da bi yek an jî bi çend mînakan tên temsîlkirin. Ev texlîb, tewcîh, îqtîbas, tewrîyye, tezyîl, îxal, tecahul û tecrîd e. Ji alîyê meqseda peyvê jî dîwana Babnîrî bal kêş e. Îrşad, teeccûb, bihêzkirin, hişyarkirin, neyînî, tewbîx, teqrîr, înkar û îstîrham hinek ji wan in.

Çavkanî / References

Aslanoğlu, O., (2001). Di Mem û Zînê da Hunerên Mecazî, e-şarkiyat İlmî araştırmalar Dergisi, 11/1

Babnîrî, A., (2012). Dîwana Babnîrî. (Kurdî). İstanbul: Nûbihar.

Babnîrî, A.. (2021). Dîwan (Tirkî).

Bateyî, H., (2018). Mewlûd. Amedekar: Şemrexî, İstanbul. Nubihar

Besyûnî, A. F., (1418/1998). ‘Îlmu’l-Beyan, Qahîre, Daru’l-Muxtar.

Bozarslan, M. E (2021). Di Edebiyata Kurdi û Folklora Kurdi da Huner, Amed: Weşanên Deng.

Buxarî, M., el-Ccami‘u’s-sahîh, Beyrut, Daru’Tawqî’n-Necat.

Carim-Emîn, A.-E., (1428/2007). el-Belâxetu’l-wadîha, Dimeşq: Daru Qubai.

Cîhanî, P. (20133). Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Îstanbul, Nûbihar.

Cunahî, H. (2006). el-Belaxetu’s-Safîyye, Qahîre, el-Mektebetu’l-Ezherîyye.

Curcanî, S. Ş., (1403/1983). et-Te‘rî fat, Beyrut: Daru’l-Kutubî’l-‘Îlmîyye.

Çağmar, M. E. (2022). Alıştırmalarla Belâxet, İstanbul: Ensar Yayınevi.

Çağmar. M. E., (2023). Mewlûda Nebî Bi Hunerênn Edebî, Şarkîyat Yayınları: (https://www.sarkiyat.org/team-4). 05.10.2024.

Dîb-Qasim, M.-M.A. (2003). ‘Ulûmu’l-Belaxa, Trablus: el-Muessesetu’l-Hadîse.

Dusûqî, M., (1412/1992). Haşîyetu’d-Dusûqî ‘ela muxteserî’l-me‘ânî. Beyrut: Muessesetu Darî’l-Beyanî’l-‘Erebî.

‘Elewî, Y., (1423). et-Tîraz., Beyrut: el-Mektebetu’l-‘Esrîyye.

Habenneke, A. M., (1431/2010). El-Belaxetu’l-‘Erebîyye. Dimeşq: Daru’l-Qelem.

Haşimî, A. (1434/2013). Cewahîru’l-Belaxa, Talîq, Suleyman Salih, Beyrut: Daru’l-Me‘rîfe.

Safîyuddîn el-Hîllî A., (1412/1992). Şerhu Kafîyeti’l-Bed‘îyye, Beyrut: Daru Sadir.

Îbnu’l-Esîr, D. N., (1416/1995). el-Meselu’s-saîr, Beyrut, el-Mektebetu’l-’asrîyye.

Îbnu’n-Nazim, B., (1989). el-Mîsbah fî’l-Meanî ve’l-Beyan ve’l-Bedî‘, Dimeşq.

Xalayînî, M., (1414/1994). Cami‘u’d-Durûsi’l-‘Erebîyye, Beyrut: el-Mektebetu’l-‘Esrîyye.

Meraxî, M., (?). Ulûmu’l-Belaxa.

Metlûb, A., (1996). Mu‘cemu Mustalehatî’l-Belaxîyye ve Tetawwuruha, Beyrut: Mektebetu Lubnan.

Teymûr, A., (1422/2001) Mu‘cemu Teymûr el-Kebîr fi’l-Elfazi’l‘Amiyye, Qahire, Daru’l-Kutubi’l-Wesaîqî’l-Qawmîyye.

Nuweyrî, A., (1423/2023). Nîhayetu’l-Îreb fî Funûnî’l-Edeb. Qahîre: daru’l-Kutub we’l-Wesaîqî’l-Qewmîyye.

Ocek, N., (2019). Dersên Edebîyata Kurdî, Wan: Sîtav.

Qazwînî, M., (1997). el-Îdah, Beyrut: Daru’l-Cîl.

Qur‘an.

Qurtubî, M. (1964), el-Camî‘u’l-lî ehkamî’l-Quran, Qahîre, Daru’l-Kutubî’l-Mısrîyye.

Rukneddîn el-Curcanî H., (1432/2011). el-Îşarat ve’t-tenbîhat, Beyrut. Dar Kutubi’l-‘Îlmîyye.

Teftazanî, S., (2005). Muxtesaru’l-me‘anî, Dimeşq: Mektebetu’s-Sahabe.

Teftazanî, S. (1996). el-Mutawwel, Qûm. Mektebetu’d-Dawerî.

Tîbî, Ş., (1416/1996). et-Tîbyan fi’l-beyan, Beyrut, Daru’l-Cîl.

Zemexşerî, M. (1407). el-Keşşaf, Beyrut: Daru'l-Kutubî'l-'Erebîyye.

Hevpeyvîn:

Seydayê Mela 'Ebdullahê Babnîrî (Dîrok: 22 İlon 2024).

Seydayê Mela Huseynê Esê: (Dîrok: 22 Îlon 2024).

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

Bandora Kanalên asimanî yên Kurdî Liser hevnizîkirina zaravayên zimanê Kurdî (TRT Kurdî - Sahar Kurdish - Rudaw)

(The role of Kurdish satellite channels in approximating the dialects of Kurdish Language (TRT Kurdî - Sahar Kurdish - Rudaw)

(Kürtçe Uydu Kanallarının Kürtçe'nin lehçelerinin Yakınlaşmasına Etkisi TRT Kurdî, Sahar Kurdish, Rudaw)

Hunar Muhammad Hussein*

Reber Hussein Abo**

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatin: 11.10.2024
Accepted // Pejirandin: 12.11.2024
Published // Weşandin: 29.11.2024
Pages // Rûpel: 45-74
DOI: 10.55106/kurdiname.1565125

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/

Citation/Atif: Hussein, Hunar Muhammad û Abo, Reber Hussein, Bandora Kanalên asimanî yên Kurdî Liser hevnizîkirina zaravayên zimanê Kurdî (TRT Kurdî - Sahar Kurdish - Rudaw), 2024, *Kurdiname*, 11, r. 45-74

Authors Contributions/Rêjeya Nivîskaran: Data Collection: Author-1 (%70), Author-2 (%30), Data Analysis: Author-1 (%65), Author-2 (%35), Submission and Revision: Author-1 (%75), Author-2 (%25)

Plagiarism/Întîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Ev lêkolîna me bi navê (Bandora Kanalên asimanî yên Kurdî Liser hevnêzîkirina zaravayên zimanê Kurdî (TRT Kurdî - Sahar kurdish - Rudaw))ye. hilbijartina van sê kanalan ji bo çend sedemekan vediger e. Em behsa sîyaseta kanalan nakin lê belê cemawer bi piranî temaşe dikin, lezgînîya kanalan û bikaranîna zaravayên cuda di bernameyên xwe de û vekirîbûna wan û derketina kanalan li ser çend heyvên çêkirî wisa kir ku em van kanalan hilbijêrin. ev lêkolîn bi rêya Forma rapirsîyê bi şêweyekî online bi ser hemwelatîyên kurd ên her çar paçeyên Kurdistana mezin de hatîye belavkirin. Bi zaravayê kurmancîya jorîn (kurmancî) bi tîpên latînî û bi zaravayê kurmancîya jêrîn (soranî) bi tîpên aramî hatîye belavkirin. Her wiha bi e-mailê jî hatîye şandin û piştî tijîkirina wê ji hêla kesekî ve, xala şandinê heye ku yekser di nav çend çirkeyan de bersivan digihîne lêkoler.

Ev lêkolîn li ser van xalan hatîye avakirin: çalakkirina stratêjîya pêşveçûna ziman, çawanîya ji hevfamkirina zaravayên kurdî bi rêya medyayê, standartbûna zaravayan û aşinabûna hemû kurdan bi zaravayên kurdî,her wiha çalakkirina zaravayan ji bo pêkanîna zimanê yekgirtî, kêmkirina dûrahîyê, parastina peyvên gelek nirxdar û cîyawaz û hevbeş û avakirina jihevfamkirina zêdetir.

Kilîtbêje: Zimanê kurdî, Kanalên asimanî, zaravay zimanê Kurdî, Medya.

Abstract:

This research, titled "The Role of Satellite Media Channels in Bringing Kurdish Language Dialects Closer," focuses on the choice of three channels (TRT Kurdî, Sahar Kurdish, Rudaw) and the reasons behind their selection. We will not address the political stance of these channels, but they attract a large audience. The speed of these channels, the diversity of dialects used in their programs, as well as their broadcast and presence in the field, were factors that influenced our decision to choose them. This research has been made available in an online survey format to all Kurdish citizens across the four major parts of Kurdistan. It has been published in the Northern Kurdish (Kurmanji) dialect using the Latin script and in the Southern Kurdish (Sorani) dialect using the Aramaic

* Asst.Lect. Hunar.M.Hussen,, Cihan University - Erbil, Department of Translation / College of Arts and Letters Iraq, hunar.m.hussein@cihanuniversity.edu.iq , ORCID: 0000-0002-1139-3175.

** Asst.Lect. Reber Hussein Abo, Ministry of Finance and Economy / Iraq, reber.aboo@gmail.com,ORCID: 0009-0003-4206-6091.

script. It has also been sent via email, allowing individuals to complete it and send direct feedback to the researchers.

This research is built upon the following principles: activating the strategy of language development, working to bring Kurdish dialects closer and fostering mutual understanding through media, standardizing dialects, and ensuring that all Kurds are familiar with Kurdish dialects.

Additionally, it aims to promote dialects to achieve a unified language, reduce divisions, and protect valuable, distinct, and shared terms from the risks of loss due to political, economic, and social changes occurring in Kurdistan. It also focuses on building a stronger understanding through authentic Kurdish sources and minimizing misunderstandings within the media, addressing external issues through media, and particularly focusing on Kurdish social media.

Keywords: Kurdish dialects, Unification, Social media, Communication, Standardization.

Özet

Bu araştırma, "Kürt Dil Lehçelerinin Yakınlaştırılmasında Uydu Medya Kanallarının Rolü" başlığını taşımakta olup, üç kanalın (TRT Kurdî, Sahar Kurdish, Rudaw) seçilme nedenlerine odaklanmaktadır.
Bu kanalların siyasi duruşlarını ele almayacağız, ancak geniş bir izleyici kitlesine hitap etmektedirler. Bu kanalların hızlı yayın yapması, programlarında farklı lehçeleri kullanmaları, saha çalışmaları ve yayınlarının bulunması, onları seçmemizin sebeplerindendir. Bu araştırma, Kürdistan'ın dört büyük bölgesindeki tüm Kürt vatandaşlara çevrimiçi bir anket formatında sunulmuştur. Kuzey Kürtçesi (Kurmancca) lehçesi Latin alfabesiyle, Güney Kürtçesi (Soranice) lehçesi ise Arami alfabesiyle yayımlanmıştır. Ayrıca e-posta yoluyla gönderilmiş olup, katılımcıların anketi doldurarak doğrudan araştırmacılara geri bildirim göndermelerine olanak tanınmıştır.
Bu araştırma, dilin geliştirilmesi stratejisini harekete geçirme, Kürt lehçelerini yakınlaştırma ve medya yoluyla karşılıklı anlayışı sağlama, lehçeleri standartlaştırma ve tüm Kürtlerin Kürt lehçelerine aşina olmasını sağlama gibi ilkeler üzerine kuruludur. Ayrıca lehçeleri destekleyerek tek bir dil oluşturmaya ulaşmayı, bölünmeleri azaltmayı ve Kürdistan'da meydana gelen siyasi, ekonomik ve sosyal değişimlerden kaynaklanan kayıp riskine karşı değerli, farklı ve ortak terimleri korumayı amaçlamaktadır. Çalışma ayrıca, otantik Kürt kaynakları aracılığıyla daha güçlü bir anlayış oluşturmaya, medyadaki yanlış anlamaları en aza indirmeye ve medya yoluyla dış sorunlara, özellikle Kürt sosyal medyasına odaklanarak çözüm bulmaya yönelik çalışmalar içermektedir.

Anahtar Kelimeler: ehçele, Birleştirme, Kitle iletişim araçları, Sosyal medya, Dil.

Forma rapirsîyê

Ev rapirsî bi çend qonaxan hatîye amadekirin. Ewil reşnivîsek hatîye çêkirin û paşê bi sûdwergirtina ji wan lêkolînên ku berî niha di vî warî de hatine kirin çendîn pêdeçûn tê de hatine kirin. Her çend lêkolînên di vî warî de gelek kêm bin jî, lê belê ji bo serkeftina her lêkolînekê pêwîst e ewil lêkolîneke zelal li ser lêkolînên berî xwe hebe.

Şêwaza rapirsîyê

Ev lêkolîn bi *Google Forms* hatîye çêkirin. %100 elektronîk e û bi online bo e-mail, WhatsApp, Facebook û hwd hatîye şandin. Piştî tijîkirinê ji hêla kes ve, xala şandinê heye ku yekser û bi çirkeyekê bersivan digihîne lêkoleran. Dîyar e bandora vê şêwazê hebe ku em dikarin xwe bigihînin hemû çîn û tebeqeyên civakê. Dabeşkirina online di sînorên Kurdistana mezin de hatîye kirin. Li çar parçeyan bi ser hemwelatîyên kurd ên her çar parçeyên Kurdistana mezin de hatîye dabeşkirin.

Sînorên rapirsîyê

Rapirsî bi zaravayê kurmancîya jorîn bi tîpên latînî li bakur û rojavayê Kurdistanê hatiye kirin û bi zaravayê kurmancîya jêrîn jî li başûr û rojhilatê Kurdistanê hatîye kirin.

Çawanîya dabeşkirina rapirsîyê

Ev lêkolîna bi navê Bandora Kanalên asimanî yên Kurdî Li ser hevnêzîkirina zaravayên zimanê Kurdî (TRT Kurdî - Sahar kurdish - Rudaw) di nav sînorên Kurdistana mezin de hatîye

çêkirin. Lêkoler xelkê başûrê Kurdistanê ne û serdana meydanî ji bo piranîya bajar û bajarokên başûrê Kurdistanê kirîne û her wiha di meha 10an a sala 2019an de du caran serdana bakur û rojhilatê Kurdistanê kirîne û li gel çendîn çîn û tebeqeyên bajar û bajarok û gundan hevdîtin encam dayne û rapirsîn li wan dabeş kirîne (bi şêweyê online bo e-mail, WhatsApp, Facebook û hwd). Her wiha lêkoleran di maweya encamdana vê lêkolînê de ji bo gihîştina bi çînên edebî, hunerî û folklorî yên kurd beşdarî çendîn panel û semînerên edebî bûyne. Der barê vê lêkolînê de fikra piranîya wêjekar û zimannasên kurd û nekurd wergirtîne û li ser lêkolînê û şêwaza wê ya dabeşkirinê danûstandina fikirî kirîye û fikra wan wergirtîye. Çunku rapirsî bi du zaravayan hatîye çêkirin: kurmancîya jorîn bi tîpên latînî li bakur û rojavayê Kurdistanê, bi kurmancîya jêrîn bi tîpên erebî li başûr û rojhilatê Kurdistanê. Lewma hemwelatîyên Kurdistanê bi hêsanî ji rapirsîyê fam kirin û gelek bersiv jê re hatin.

DESTPÊK

Zimanê kurdî jî bêpar nîn e ji wê dabeşbûna zaravayî ku bi ser her zimanekî zindî de hatîye. Ev yek jî vedigere bo berfirehîya wê herêmê ku kurd li ser nîştecih in. Siruşta herêmê, ku bi piranî herêmeke çîyayî ye, bûye asteng li ber peywendî û çûn û hatinê di navbera wan de. Her wiha ji ber bandora wê dabeşbûna sîyasî ya ku bi ser herêmê de hatîye, zaravayên cuda cuda jê derketine û ev zarava bi şêweyekî berbiçav bûne sedema pêşveçûna zimanê kurdî.

Li ber ronahîya dahûrandina peywendîya navbera medya û ziman, em dibînin ku li gorî têgihîştina medyayê bo amrazên medyayê, ziman amrazeke peywendîyê nîn e. Berevajî vê yekê, peywendîkirin yek ji erkên ziman e. Ji ber ku em nikarin karê zimên bi çarçoveyeke peywendîkirin yan tenê derbirîna ramanan kurt bikin. Lê belê pêwîst e nêrîna me bo ziman ew be ku karekî civakî ye û yek ji karên wî peywendîkirin e, ango peywendîkirina bi rêya dezgehên medyayê.

Bi şêweyekî giştî medya çalakîya wan peywendîyan li xwe digire ku armanca wê gihandina rastîyê û nûçeyên rast e bo cemawerê li ser bûyer û babetan. Encama wê jî afirandina bilindtirîn pileya hişyarî û zanyarîyê ye li cem wan kesan ku ji medyayê bandorê digirin, bi taybetî ji hêla zimanî ve ku li vir mebesta me ye.

Nexwe çêdibe ku em bêjin peywendîyek di navbera ziman û medyayê de heye. Ev peywendî li ser wekhevî û xeteke hevterîb naçe, ango her du alî merc nîn e ku bi heman pile bandorê li hevdu bikin. Ji ber ku ragihandin alîyê bihêztir e, lewma li gorî bandora ziman li ser medyayê bandora medyayê li ser ziman di asteke bilindtir de ye.

Niha kanalên asimanî wek girîngtirîn amrazên peywendîya cemawerî (mass communication) tên qebûlkirin û tu malek bêpar nîn e ji bandora vê amrazê. Ev yek wê mesafeya bandorê zelal dike ku kanalên asimanî ew çêkirîye.

Li gel serhildana dahênana her amraz û cureyeke medyayê, ji rojnameyê bigire heta îro ya ku jê re tê gotin medyaya nû û medyaya civakî, bandora wan li ser ziman hebûye û bûne amrazine girîng ji bo geşepêdana ziman û dewlemendkirina wî. Hetta gihîştîye wê astê ku pêşveçûna ziman û çandê bi rêya amraz û cureyên medyayê sînorên xwe derbas bikin, bi şêweyekî ku ne tenê di nav zaravayên cîyawaz ên zimanekî de, her wiha di navbera zimanên cîyawaz de jî cureyeke aşinabûnê çêkin. Belgeya vê yekê jî cîhanîbûna hin terman e ku di gelek zimanên zindî de jî heman wateyê didin. Lewma jî li gorî hin kesan, bi hatina medyaya nû, bi taybetî bi

serhildana înternetê, rol û bandora medyaya nerîtî (traditional) kêm bûye. Li hember vê jî, li gorî hin kesan, televîzyon û radyo hîna amrazên girîng û karîger ên medyayê ne.

1.Bandora medyayê li ser ziman

Medya bi hemû cureyên xwe ve desthilateke wê ya zêde li ser jîyana mirov heye. Berî hemûyan jî bandora wê li ser ziman e. Çunku diçe nav her malê û bi hêsanî bandorê li hizr û çanda zimanê wergir dike.

Medya "Nûçeyên rast, zanyarîyên durist, rastîya neguhêrbar dide xelkê da ku bikarin fikreke durist li ser bûyerek ji bûyeran yan li ser pirsgirêkek ji pirsgirêkan îfade bikin. Ev fikr bi awayekî derbirîneke objektîf a mentiqî ya xelkê û araste û arezûyên xelkê ye." (Hemze, 1984, r. 75). Zanayê almanî Otogrot wiha wê pênase dike: "Tevî arasteyên cemawerê, di heman demê de derbirîneke objektîf a eqlî û ruh û daxwaza cemawerê ye." (Veguhêzer: Eşref, 1979, r. 16)

Ziman yekem kanal e ku mirov hest pê kirîye û nas kirîye di warên peywendîkirinê de. Her dema ku mirov ji dayik bûye, keresteyên wî yên zimanî jî pê re ji dayik bûne ku di şêweya amaje, sembol, deng, wêne, rêziman, nexş û derbirînên lêkirî de derdikeve. Dr. Emîr El-Huseynî dibêje "Medya mezintirîn çalakîya civakî ye ku ziman bi kar tîne." (El-Huseynî, 2005). Ev yek jî dibe ku bi nivîsînê be yan bi gotinê be.

Hemû ew şêwazên peywendîkirinê pêwîstîya civakî û pêwîstîya aborî ya mirovbûnê ne ku rêxweşkerê derketina van amraz û şêwazan in. Ev şêwaz wek amrazên derbirînê ji hêla wan kesan ve ji bo rêkxistina reftarên jîyanê di nav wan civakan de ku tê de dijîn hatine bikaranîn.

Ev şêwazên peywendîkirina zimanî berî niha jê re "ziman" nehatîye gotin. Lê belê di gel vê jî yekemîn amraz e ku mirov nas kirîye ji bo derbirîna pêwîstî, reftarên civakî, nirx û arasteyên xwe. Hemû sazî û dezgehên ragihandinê di gihandina peyamên xwe de bi temamî piştê bi ziman ve girê didin. Her wiha ew kesên ku bi peywendîkirinê radibin, wê amrazê bi kar tînin ku ji bo armancên wan digunce.

Armanca ziman li cem Aristo bidestxistina peywendîyê ye di navbera mirov û mirov yan zanîna mirov bo tiştan de. Dibe ku wek amrazek di perwerdeyê de yan di warek ji warên çalakîya mirov de were bikaranîn (Hîlal, 1989, r. 42).her wiha ziman li cem Aristo "Sîstemeke axaftina dîyarkirî ye ku di encama rêkkeftina navbera hin komên mirovî de serî hildaye." (Veguhêzer: Eşref, El-Îlam we Lûxet-el Hedare, 1971).wate ziman li cem Aristo sembolên fikran e û cîyawazîyê di navbera mirov û ajalan de çêdike. Axaftin û hizir li cem Aristo bi hev re ne û axaftin taybetmendîya mirov e û bêyî ziman ne hizr ne zanist berdest dibe (Hîlal, 1989, r. 42).li ser derhatina ziman jî "Ziman hêdî hêdî çêdibe, bi yekcarî dernayê. Berfirehbûn û belavbûna wî jî bi qasî radeya pêşxistin û pêwîstîyên mirov e. Yekemîn gotin ku mirov pê qise kirîye, pêk hatibûye ji tabîrkirina wan tiştên nêzîk ku li dorhêla wî hebûne û çavên wî ew ferq kirine." (Selman, 2011, r. 114).

Nexwe bi hêsanî dikare were zanîn ku ji serdema pêkhatina civakê ve girîngtirîn mijara jîyana civakî ya mirov, damezirandina peywendîyan e li gel hemcinsên xwe. Her wiha girîngtirîn amraz jî ji bo vê peywendîyê berdewam ziman bûye. Tevî ku têgeha zimanê medyayê berbelav e, lê belê di gel vê yekê jî pênaseyeke dîyarkirî ji bo vê têgehê nîn e. Di gelek pênaseyan de zêdetir ji rêgez û hêmanên dîyarker ên cîyawazîyên wî, behsa taybetmendî û xisletên wî tê kirin. Wan kesên ku behsa zimanê medyayê kirine, dibêjin ku

zimanê medyayê ew ziman e ku di çarçoveya cemawera giştî de di berfirehtirîn fezayê de derdikeve ku mezintirîn xala hevbeş e di hemû şaxên zanistên civakî, çandî, pîşesazî û wêjeyê de. Çunku medya di derbirîna li ser civak û jîngehê de rêgezên xwe ji huner û zanistê werdigire.

Her wiha Brown û Yul erkên ziman di du termên giştî de nîşan didin. Erka "veguhestin"ê yanî ew erka ku zimên ji bo derbirîna naverokê bi kar tîne û erka din jî bi derbirîna peywendîyên civakî û riwangehên takekesî ve girêdayî ye ku wek erka "hevkarî"yê wesf kirine (Brown & Yule, 1983).

Zimanê medyayê zimanê şaristanîyetê ye. Karekî siruştî ye ku medya sûdê ji taybetmendîyên zimanê kurdî werbigire û guherînên mezin bi dest bixe. Medya bi tengkirina mewda(mesafe)ya dinavbera zimanê axaftin û zimanê nivîsînê derî li ber kurdîyeke xwerû vedike û wisa dike ku ev kurdîya xwerû bikeve nav hemû cih û waran û di derbirîna medyayê de serdestîya wê kurdîyê hebe.

Ziman jî amrazê medyayê ye yan ew bername ye ku pê peyam ji şander bo wergir tên veguhestin. Zimanê amaje, nîşandan, wêne û sînemayê hemû amraz in ji bo gihandina peyamê (Eşref & Nîda, 2004, r. 13-14).

Her wiha fikra Dr. Mihemed Seyîd Mihemed wisa ye ku kategorîya hevbeş a dinavbera ziman û medyayê ya di peywendîya dinavbera derbirîn û wateyê de, kategorîya amajekirinê ye. Zanayên ziman girîngîyê didin "zanista amajeyan" û zanayên medyayê girîngîyê didin çarçoveya hevbeş a dinavbera şander û wergirê xwe da ku medya bikeve çarçoveya hevbeş a şander û wergir ne ku bikeve derveyî vê kategorîyê. Di vir de jî derbirîn dibe xala hevbeş di vê kategorîyê de; ango kategorîya amajeyan di navbera ziman û medyayê de ye.

Nexwe em dikarin bêjin ku di navbera ziman û medyayê de peywendîyek heye. Li gorî Çolî Esed peywendîya navborî li ser wekhevî û xeteke hevterîb naçe. Ango her du hêl merc nîn e ku bi heman pileyê bandorê li hevdu bikin. Çunku hêla medyayê bihêztir e. Lewma li gorî bandora ziman li ser medyayê, bandora medyayê li ser ziman di asteke bilindtir de ye (Esed, 2013).

Eger em wek nimûne welatên Ewropayê wergirin, em dibînin ku zimanekî jevfamkirina medyayê heye û cîyawaz e ji zimanê warên din. Vê yekê wisa kirîye ku medyakar berî ku bibe medyakar, pêwîst e zimanê medyayê bixwîne û fêrî zimanê medyayê bibe. Bi vê yekê jî fêrbûna wî zimanê standart jihevfamkirina çêdike û desthilat, erk û nirxên medyayê berfirehtir dike.

2.Peywendîya medyayê di gel rastnivîsê

Rastnivîs şêwe û şeklê nivîsînê ye. Ji bo ku her peyvek ku çawa tê gotin wisa jî bê nivîsîn, divê em pabendî çendîn rê û rêzikan bibin û jê averê nebin. Ji vê pabendbûn yan averêbebûnê re rastnivîs tê gotin.

Dr. Ewrehmanî Hacî Marif (1940 – 2007) dibêje "Rastnivîs pêk tê ji komek rêzik ku bi alîkarîya wan axaftina me pê tê nivîsîn. Ew kes ku dinivîse, eger ji rêzikan averê bibe, şaşîya rastnivîsê dike. Ew cure şaşî jî hin astengîyan derdixin ber rêya xwendina tekstê. Ew astengî jî bala xwîner ji têgihîştina naverokê kêm dikin." (Marif, 1986). her wiha Mesut Mihemed (1919 – 2002) dibêje "Rastnivîs sênîka nivîsîn, xwendin û çandê ye û xirabkirineke biçûk di wê de derzekê vedike li ber berfirehbûna mesafeya neguncana nivîskaran li gel hevdu." (Mihemed

M., Ziman û Rênûsî Kurdî, 2011).li gorî Cemal Nebez jî, rastnivîs nivîsîna wêneyên dengên ziman e (Nebez, 1976). Rastnivîsa her zimanekî yan alfabeya her zimanekî taybetmendîya xwe heye. Lewma çênabe ku rêzikên rastnivîsa tu zimanekî bi ser zimanekî din de were sepandin yan cîbicîkirin.

Li Kurdistanê jî rastnivîs îro pirseke yekcar girîng a medya û çanda kurdî ye, nexasim li başûrê Kurdistanê. Ji bo ku medyakar û rojnameger wisa bikin ku xwîner yan guhdar û temaşevan baş ji wan fam bikin, divê şarezayê rê û rêzikên rastnivîsê bin. Tiştê ku rastnivîsê rêk dixe û dike yek, rê û rêzikên rêziman û alfabeya wî zimanî ne, ne ku peyivîn yan devoka navçeyekê ne. Nexebitandina rastnivîsa yekgirtî jî ne tenê mewdaya navbera nivîskar û şander ji hêlekê ve û mewdaya navbera xwîner û wergir ji hêleke din ve berfirehtir dike, her wiha hetta dikare derzeke mezin bixe navbera nivîskaran jî.

Beşeke wan mijar û gotarên ku di medyayê de tên belavkirin, bi rastî naveroka wan dewlemend û tijî zanyarî ye û tiştên taze dibexşin xwîner. Lê belê ji ber ku li gorî ya pêwîst merc û rêzikên rastnivîsê li ber çavan nayên girtin, beşeke wan nirxên ciwan ku di mijar yan gotarê de heye winda dibe. Çunku rastnivîs divê şêwazê deng û cureyên peyvan îfade bike; wisa ku ew kesê ku peyvekê dixwîne hetta eger wateya peyvê fam neke jî, bikare peyvê bi ciwanî bixwîne.

Bo nimûne raport-nûçeyekê ku rojnamegerek dinivîse û dide bêjerekê da ku di radyo yan televîzyonê de bixwîne, divê ew raport-nûçe bi awayekî bê nivîsîn ku (cudakirin, pêkvezeliqandina peyvan, xalbendî, sernavê sereke, sernavê layekî, kevanek, vekît û hwd) pêwîstîya bêjer bi rave û zelalkirina raportnûsê nebe û çawa hatîye nivîsîn wisa bixwîne.

Yan bi awayekî din rojnamegerek raportekê ji bo dahûrandina bûyerekê dinivîse û di rojnameyekê de belav dike, di vir de divê ew raport ji hêla rastnivîsê ve ew çend têr û temam be ku her kesê ku bixwîne problemek jê re dernekeve û pêwîstî bi tu zelalkirin û ravekirineke zimannasekî tune be. Eger na, her çend raporteke bihêz û dewlemend be jî, beşeke hêz û dewlemendîya wê ji ber xirabîya rastnivîsê yan liberçavnegirtina mercên rastnivîsê dimire.

Rast e pêşxistin û ravekirina rêzikên rastnivîsê erka zimannas û pisporan e. Dr. Ewrehmanî Hacî Marif dibêje “Her wek çawa atom beşek e ji fîzîkê, rastnivîs jî beşek e ji zanista ziman. Çunku di her zanistekê de erka peydakirin, geşepêdana û çespandina tiştan di stûyê zana û pisporan de ye. Her bi vî awayî rastnivîs jî karê zimannasan e.” (Marif, 1986).

Yan wek Mesud Mihemed dibêje:

“Ew kesê ku dixwaze mijûlî alfabe û rastnivîsê be, li ser wî ferz e ku pisporê rêzikên bingehîn ên dengsazî, peyvsazî, rêziman bi temamî û rêzimana zimanê xwe bi taybetî be. Çunku peywendîya tîpan yekser bi deng û her taybetmendîyeke wan ve heye. Peywendîya pevbestin û jiheveqetandina peyv û destewaje(tabîr)an bi peyvsazî û rêzimanê ve heye.” (Mihemed M. , Ziman û Rênûsî Kurdî, 2011).

Lê belê cîbicîkirin, pabendbûn, fêrbûn û zanîna wan rêzikan erka wan hemû kesan e ku destê wan qelemê digire û dinivîsin û belav dikin.

Tevî hemû hewlan ji bo çaksazîyekê di rastnivîsa zimanê kurdî de, di medya, perwerde û dezgehên fermî yên hukûmetê de li ser rêziman, term, ferhengsazî û zimanê standart hin pirsgirêk hene ku gengaz e ku beşeke wan di siberojeke nêzîk de çareserkirina wan mehal be. Lewma mayîna kêşeyên rastnivîsê li tenişt giriftên din rewşê aloztir dike û ber bi cihekî xirab dibe (Mihemed M., Berew Rasteşeqamî Axawtinî Kurdî, 1978).

Nexwe divê her nivîskar û medyakar bi qasî wê hindê agahdarê rastnivîsê bin û qet nebe şaşîyên beloq ên zimanî nekin. Lê belê merc nîn e ku rojnameger bibin zimannas û pisporê warê rastnivîsê. Çunku peywira medyakaran di warê zimannasî û dewlemendkirina ziman de girîng e û her medyayêkê jî taybetmendîyeke xwe di cîbicîkirina vê erkê de heye. Çêkirin û nêzîkkirina zaravayên zimanekî jî dikeve nav sînorê vê erkê.

3. Zimanê kurdî û têkelbûna wî di gel kanalên asimanî

Girîngîya ziman ji bo lêkoleran di hemû warên jîyana mirovî de derdikeve, di warê medyayê de jî bi taybetî. Lewma ziman ji hêla lêkoler û pisporan ve girîngî pê hatîye dayîn.

Bi derketin û dahênana her amraz û cureyeke medyayê ji rojnameyê bigire heta îro ya ku jê re medyaya nû û medyaya civakî tê gotin, bandora wan li ser ziman heye û ew bûne amrazine girîng ji bo geşepêdana ziman û dewlemendkirina wî; wisa ku gihîştîyê wê astê ku pêşketina ziman û çandê bi rêya amraz û cureyên medyayê sînorên xwe derbas bikin. Medyayê bi awayekî ku ne tenê di nav zaravayên cîyawaz ên zimanekî de, her wiha di navbera zimanên cîyawaz de jî cureyeke aşinabûnê çêkirîye. Nimûneya vê yekê jî gerdûnîbûna hin terman e ku di gelek zimanên zindî de jî heman wateyê didin.

Ji ber vê yekê jî li gorî hin kesan bi hatina medyaya nû nexasim bi serhildana înternetê rol û bandora medyaya nerîtî kêm bûye. Li hember vê yekê li gorî hin kesan televîzyon û radyo hîna jî amrazên girîng û karîger ên medyayê ne.

Her wiha xuya bû ku ziman ew amrazê medyayê ye ku dikare têgeh û wateya peyamê derbibire û li gorî armanc û arasteyên şander wê bigihîne wergir. Lewma ziman amrazek e ji bo "gotûbêjkirin, danûstana çandî, veguhestina zanyarîyan, parastina dîrokê û kanalek e ji bo çalakîyên civakî û hwd." (Eşref & Nîda, 2004, r. 13-14).

Ziman her wiha roleke girîng di parastina çand û nerîtên civakî de dilîze. Ji hêleke din ve Karolin Diana Louice di pirtûka *Rûmalkirdinî Hewal bo Telefizyon* de dibêje "Dûr be ji sîfet û belaxet û ciwanbêjîya nepêwîst." (Louice, 1993).

Bi ravekirina vê destewajeyê zelal dibe ku zimanê televîzyonê zimanekî giştî ye û pêwîst e zimanekî hêsan be ku ji hêla piranîya xelkê ve tê bikaranîn. Bi heman mebestê romannivîs û rojnameger Ernest Hemingway şîret li nivîskarên ciwan kirîye û gotîye ku heta hûn dikarin zimanê nivîsên xwe ji alozîyê paqij bikin, sade û rasterast binivîsin, wan peyvan bi kar bînin ku bi kêmtirîn vekîtê wateya wan dide û pirtirîn kes jê fam dikin (Hilliar, 2008). Ev yek jî wê yekê ji me re dibêje ku peydakirina asteke ziman erka medyakaran e da ku peyama wan bigihîje pirtirîn kesan.

Her wiha girîngîya ziman di fêrkirina takekesan de xuya dibe. Çunku ziman bi reftar û nerîtên wê civakê re derdikeve ku takekes tê de ye.

Her wiha li gorî zimannasê navdar Buhler sê kar û erkên sereke yên zimên hene ku pêk tên ji wan pîşeyan ku zanayê rûs Jacobson bala xwe daye wan û ew cext kirine:

1. Erka derbirînê: Tê de nivîskar yan axêver bêyî ku guh bide bersivandinê hestên xwe pê derdibire. Ev pîşe jî di helbest, stran, edebîyata çîrok û şanoyê de; di beyannameyên fermî de yên wekî belgenameyên sîyasî yan qanûnî; û di karên felsefî û zanistên belgeyî de derdikeve.
2. Erka ragihandinê: Naveroka vê erkê li alîyê derve ye yan rastîya mijaran yan ew rastîyên ku dikevin derveyî ziman û di metnên ragihandinê yên wekî bernameyên xwendinê û raportên hunerî de derdikevin; yan jî di gotarên rojnamegerî, rûpelên lêkolînan, tezên master, doktora û yên din de derdikeve.

3. Erka axaftinbêjîyê: Kakilê vê erkê jî komek xwîner û ew kes in ku axaftin bo wan hatîye kirin. Peywendîya vê erkê bi wê axaftinê re heye ku ji xelkê re tê kirin ji bo ku karekî encam bidin. Girîngtirîn tişt jî di vê erkê de karvedana guhdaran e (Eşref & Nîda, 2004, r. 19-20).

Yek ji teorîyên berbelav û girîng a warê medya û peywendîkirinê teorîya bandorkirina bihêz e ku bi awayekî rasterast lêkolînê li ser bandora dezgehên medyayê ya li ser civakê dike; yek ji wan waran jî ziman e.

Teorîya bandorkirina bihêz, ew teorî ye ku di salên bîstî yên sedsala bîstem de di gel peydabûna îstasyon û belavbûna eywanên sînemayê û pêşveçûna civaka (çêkirî) ku navê civaka cemawerî (mass society) lê hate danîn peyda bûye. Her wiha ew teorî wek teorîya gulle jî tê binavkirin. Li gorî vê teorîyê amrazên medyayê bandoreke wan a bihêz û rasterast heye. Lewma di salên bîstî de girîngî bi îstasyon û fîlmên sînemayê dihate dayîn. Hingî bernameya "Wilsin" (Lerner, 1958) tirseke zêde di nav xelk û nişstecihên New Yorkê xistibû. Her wiha ji ber ku hemû çînên civakî berê xwe danê, liv û tevgerek hate eywanên sînemayê; bi vê re jî têgeha civaka cemawerî peyda bû ku tê wateya takekesên goşegîr ji hevdu û ew kesên ku hevgirtina wan a civakî û çandî lawaz û xav e. Lewra takekes bi tena serê xwe li ber amrazên medyayê rawestîyaye û ev yek jî bandoreke bihêz li ser çêdike.

Medya û zanista medyayê jî bi taybetî ji bo bidestxistina karên xwe yên sereke hewl dide: nûçe, medya, ravekirin, araste û rênîşandan, xweşî-bexşîn, reklamkirin, fêrkirin û medya civakî. Ev kar hemû tên bîra medyakar û erka wan jî dibe ew yek ku van hemûyan bigihîne bîra xelkê.

Heye ku pênaseya civaknasan a bo ziman di gel wê pênaseya ku pêwîstîya medyakarn di zimanê medyayê de pê heye bigunce; yan taybettir di gel wê pênaseyê bigunce ku medyakar dema ku peywendîyê bi cemawerê re çêdike pêwîstîya xwe pê çêdibe.

Di nav wan pênaseyan de ku ji bo medya û ziman hatin kirin di gel peywendîya navbera wan, ji ber ku amrazek e ku siruşteke wî ya mirovane heye, tenê di nav mirovan de tê dîtin. Her wiha amrazeke hevbandorkirinê ye. Çunku her alî hewl dide ku bandorê li ser yê din çêke û lewma jî hevbandorkirin proseyeke bi liv û tevger a berdewam e. Bi paldan bi vê hêla hevbandorkirinê hin kes hene ku pênaseyên peywendîyê kirine û dibêjin ku peywendî ji wê hevbandorkirinê pêk tê ku bi axaftina di navbera şander û wergir de ji şander bo wergir û ji wergir bo şander tê veguhestin; hewlek e ji bo pevguherandina cihê çêkirina bandorê.

Ji ber ku ziman ayidî civakê ye, lewma çend erkên wî yên sereke hene: Bi rêya çend dengên axaftinê dibe amrazek ji amrazên peywendîkirin, gihandin, veguhestin û derbirînê. Tiştê ku ziman digihîne yan vediguhêze yan derdibire bi giştî ji hizir, wate, arezû û hêrsbûnan pêk tê (El-Se'ran, 1963, r. 12).

Lê belê erkên ziman çênabe ku tenê bi "amrazeke peywendîkirinê ye" bê sînordarkirin. Çunku lêkolîna "erka gotinan" di zimanek ji zimanên zindî de piştgirîya pênaseyên bi vî rengî nake. Lewma pêwîst e were gotin ku ziman karekî peywendîyê dike yan bi gotineke din peywendîkirin yek ji karên zimên e.

Bizava berbelav a kevn ew yek dupat dikir ku ziman, êdî te divê peywendîya wî bi mijarên eqlî re hebe yan te divê bi hest û arezûyên mirov re, lixwegirê hiziran e û karê wî jî derbirîna hizirên mirovan e. Heçî nûxwaz in ew yek li cem wan meqbûl e ku peywira ziman bi peywendîkirinê ve sînordar bikin (Şeref D. E., 1989, r. 347).

Cîyawazîya navbera her du bizavan mezin nîn e. Kevn û nû, riwangeha wan a ziman "derbirîn" û "peywendîkirin" e. Bi temaşekirinê derdikeve ku ji her du hêlan ve erka wî karê peywendîkirinê ye, nexasim eger em bizanin ku ragihandin proseya pexş û pêşkêşkirinê ye û van li xwe digire: rastî, nûçe, mijarên bihûrgilî, rastîyên dîyarkirî, fikrên mentîqî û fikra cemawer bi qalkirina çavkanîya wê.

Li ber ronakîya dahûrandina peywendîya navbera medya û ziman, em dibînin ku li gorî têgihîştina medyayê bo amrazên ragihandinê, ziman tenê amrazeke peywendîkirinê nîn e; berevajî vê yekê peywendî yek ji peywirên ziman e (Şeref D. E., 1989, r. 347).

Çunku em nikarin peywira zimên bi peywendîkirin yan tenê derbirîna fikran kurt bikin. Lê belê pêwîst e nêrîna me bo ziman ew be ku ziman karekî civakî ye û yek ji karên zimên jî peywendîkirin e, peywendîkirin bi rêya dezgehên ragihandinê.

Her ji destpêka derketina medyaya kurdî ve zaravayên kurdî çûne nav medyayê. Bo nimûne eger em çavekî bi nav wan rojname û kovaran de bigerînin ku di destpêka medyaya kurdî de belav bûne, em ê bibînin ku bi çend zaravayan nivîs û belavkirin hene; nexasim bi her du zaravayên kurmancî û soranî.

Di radyoyên kurdî de ev dîyarde tê dîtin, bo nimûne *Radyoya Bexdayê* ku di sala 1939an de cara yekem dest bi kar kirîye. Ji bilî kurdên Başûr, kurdên parçeyên din ên Kurdistanê jî tevkarî li vê radyoyê kirine. Bo nimûne Cegerxwîn ku xelkê bakurê Kurdistanê ye hevkarî li vê radyoyê kirîye. Her wiha stranbêjên parçeyên din ên Kurdistanê stran di vê radyoyê de pexş kirine, wekî Hesen Zîrek, Meryemxan, Hesen Cizîrî û hwd.

"Radyoya kurdî ya Bexda û ya Êrîvan pişka kurdî li Radyoya Qahîre û pişka kurdî li Radyoya Urmîye û Tehran û êzgeyê Kirmaşanê roleka êkcar mezin dîtîye ji bo belavkirina rewşenbîrîya kurdî û parastina sedan deqêt folklorê kurdî û çandina vîna zimanê kurdî yê şîrîn di dilê hizareha xortêt Kurdistanê da" (Ridênî, 2011, r. 13).

Prof. Dr. Refîq Silêmanî de li ser zelalî, zimannasî, bikaranîna peyvên ciwan û puxt û danîna peyvan bi awayekî rêk û pêk di senaryoyên fîlm, televîzyon, radyo, şano, sînema û derbirînên din de dibêje ku ev yek wisa dike ku zarava ciwantir û xoşewîsttir bin û hander bin ji bo jihevfamkirin, fêrbûna zêdetir û hilweşandina dîwarên jevfamnekirinê. Ev yek jî wisa dike ku kesek bikare çend zaravayên cîyawaz û zimanên cîyawaz biaxive û şîroveyên mijaran zanistîtir be (Sleman, 1998, r. 63).

Nimûneyeke zindî li pêş me ye ku jineke temen 70 salî,ku li bajarê Hewlêr di rûne bi rêya rêzefîlmekî koreyî yê dublajkirî ji bo soranî fêrî vî zaravayî bûye ku esasen bi zikmakî axêvera kurmancî ye û nişteciha rojavayê Kurdistanê ye.

Nexwe medya dikare heta radeyeke baş levnêzîkkirinê di navbera zaravayên kurdî de bike. Heinrich Löffler li ser hewlên nêzîkkirina zaravayên zimanekî amaje bi wê yekê dike ku tevî hewla dezgehên akademîk û sazîyên zanistî, dezgehên medyayê jî roleke wan a berbiçav di nêzîkkirinê de heye (Löffler, 2006, r. 16).

4.Kanalên (Rûdaw, TRT Kurdî, Sahar Kurdish)

Karê me di çarçoveya vê lêkolînê de ku pêşveçûna ziman û çawanîya levnêzîkkirin û hevfamkirina zaravayên kurdî li xwe digire ew e ku em bi rêya dîyarkirina bandora medyayê ya li ser ziman, standartbûn û aşinabûna hemû kurdan bi zaravayên kurdî destnîşan bikin ku ji bo berfirehbûna ziman û çalakkirina zaravayan bi mebesta hilberandina zimanê yekgirtî yê

kurdî, kêmkirina dûrahîyê, windabûna peyvên giranbiha û cîyawaz û hevbeş û ji bo avakirina jihevfamkirina zêdetir di bin siha hemû wan guherînên sîyasî û civakî de ku li Kurdistanê rû didin, sûd ji zaravayên kurdî were girtin. Ev yek jî bi piştgirêdana bi wan çavkanîyên li ser ziman û zaravayên resen ên kurdî û komkirina ramanên medyayê çêdibe û paşê jî mirov dikare dîyardeyên bîyanî bi rêya medyayê bigihîne civakê.

Niha kanalên asimanî wek girîngtirîn faktorên peywendîya cemawerî tên hesibandin û tu malek nîn e ku ji bandora vê amêrê dûr be û mirov dikare pesna wê mesafeya bandorê bide ku kanalên asimanî çêdikin.

4.1.Sedema hilbijartina kanalên (Rûdaw, TRT Kurdî, Sahar Kurdish)

Hilbijartina dezgehekê yan kanaleke medyayê ji zehmetî û westana kanalên din kêm nake. Bêguman ji destpêka destpêkirina kanalên asimanî yên kurdî heta niha çendîn hewlên din ên serkeftî hebûne. Hilbijartina van dezgehan têkilîya wê di gel çend sedeman heye. Hinek ji wan sedeman ew in ku ev dezgeh giştgîr û berfireh in. Ev kanalên asimanî bi pêşkeftîtirîn sîstemên teknîk kar dikin û li ser gelek heyvên çêkirî bernameyên xwe pexş dikin. Lewma bi asantirîn şêweyî di hemû dinyayê de tên dîtin, bi taybetî di sînorên Kurdistana Mezin de; û hebûna van kanalan di heyvên çêkirî yên Tirkîyeyê de wisa kirîye ku gelek bi asanî li bakurê Kurdistanê berdest bin. Ev kanal li Başûr, Rojava û Rojhilat jî bi heman şêweyî berdest in. Ev yek jî yek ji wan sedeman e ku hiştîye ev kanal gelek temaşevanan bo xwe bi dest bixin. Di vê lêkolînê de em behsa sponser û xwedîtîya van dezgehan nakin û her wiha behsa ajandaya sîyasî ya van kanalan jî nakin. Berevajî vê yekê, tiştê ku di vê lêkolînê de girîngî pê hatîye dan, ew plan û hewla van dezgehan a bikaranîna zaravayên cuda yên zimanê kurdî ye ku bandora wê di warê pêşveçûna zimanê kurdî û nêzîkkirina zaravayên wî de heye.

4.2.Kanala TRT Kurdî

Ev kanal girêdayî sazîya *Türkiye Radyo Televizyon Kurumu* [Sazîya Radyo û Televîzyonê ya Tirkîyeyê] ye ku ev sazî jî ser bi dewleta tirk e; yanî kanaleke hukmî ye.

TRT Kurdîyê li 25ê meha kanûna yekem a 2008an bi şêweyê têst dest bi weşana xwe kir. Kanalê li 1ê meha 1em a 2009an dest bi weşana xwe ya normal kir. Li 11ê meha kanûna duyem li sala 2015an navê TRT Şeş hate guhertin ji bo TRT Kurdî. Ev kanal weşana xwe bi 24 demjimêran dike û li Tirkîyeyê bê peyk tê temaşekirin. Her wiha li ser heyvên destkird ên wekî Nilesat, Hotbird, Turksatê weşana xwe dike. Ev yek alîkar e ji bo ku bêtir ev kanal bê temaşekirin.

Ev kanal weşana xwe bi her sê zaravayên kurdî (kurmancî, zazakî û soranî) dike. Lê piranîya programên wê bi zaravayê kurmancî ne. Programên wê programên hemecor in (civakî, dînî, hunerî, muzîkî, folklorî, edebî, tenduristî, belgefîlmî û hwd).

Rola kanala TRT Kurdîyê di nêzîkkirina zaravayên zimanê kurdî de, ji bilî bikaranîna her sê zaravayên ku me amaje pê dan, hinek program hene ku xizmeta dewlemendkirina zimanê kurdî dikin. Wekî programa *Hûn Dibêjin Çi?* Ev program peyveke zimanê kurdî werdigire û wekî pirs arasteyî temaşevanan dike ku her deverek ji vê peyvê re çi dibêje. Bo nimûne peyva “mirov” her deverek li gorî şêwezarê xwe dibêje “mirov, merif, meriv, morof, murov, mirhov, merov, merû …” Ev yek jî zimanê kurdî dewlemend dike.

Programa *Kurdî Hîn Dibim* bi rêya vê programê tîpên zimanê kurdî bi rênivîsa aramî ji bo kurdên Bakur tên nasandin. Her wiha TRT Kurdîyê di malpera xwe de wiha nivîsîye: "TRT Kurdî bi hewalên soranî di navbera kurdên Êraqê û kurdên Tirkîyeyê de dibe pirek."

Ev gotin wê yekê bo me ron dike ku ev kanal dixwaze bi rêya bikaranîna zaravayên cuda cuda yên zimanê kurdî peywendîyeke zimanî û çandî û civakî di navbera kurdan de bi taybetî di navbera kurdên Bakur û Başûr de çêke. Bêguman bikaranîna her sê zaravayên zimanê kurdî (kurmancî, zazakî û soranî) di vê kanalê de rêxweşkerek e ji bo wê yekê ku kurd zaravayên hevdû nas bikin û xwe hînî zaravayên zimanê kurdî bikin û agahîya wan ji jiyana civakî ya hevdû hebin.

Egerên hilbijartina kanalê bo wê yekê dizivire ku kanala TRT Kurdî kanalek e û ji alîyê dewletê ve tê birêvebirin û piştgirîkirin. Ev yek jî dibe eger ku programên wê dewlemend û giştgîr bin. Her wiha programên wê girêdayî jîyana rojane ya xelkê ne û li ser çend heyvên destkird weşana xwe dike. Ev yek jî rêjeya temaşekirinê zêde dike.[1]

4.3.Kanala Sahar Kurdish

Tora Cîhanî ya Seher yekemîn tora televîzyonên îranî ye ji bo derveyî sînorên Îranê bi navê "*li derveyî sînor deng û rengê Komara Îslamî ya Îranê*". Li 16ê tişrîna duyem ya sala 1997an dest bi weşana xwe kirîye. Ev tor bi çend zimanên cîyawaz pexşa xwe dike. Ji wan jî: kurdî, azerbeycanî, ûrdûyî û balkan.

Kanala Seher Kurdî li jêr diruşma "li derveyî sînor deng û rengê Komara Îslamî ya Îranê" li tişrîna duyem a sala 2014am dest bi weşana xwe kirîye. Ev kanal ser bi dewleta Îranê ye û ser bi *Tora Cîhanî ya Seherê* ye. Di kanala Seher Kurdîyê de her du zaravayên kurdî (soranî û kurmancî) têne bikaranîn. Ango ev her du zaravayên serekî yên zimanê kurdî têne bikaranîn. Bi rêya bikaranîna van her du zaravayên zimanê kurdî cureyek levnêzîkbûnek di navbera van her du zaravayên zimanê kurdî de peyda dibe. Bikaranîna van her du zaravayan ji bo wê yekê vedigere ku piranîya kurdan bi van her du zaravayan dipeyivin û tê digihên.

Programên wê corawcor in: civakî, malbatî, dînî, çandî, hunerî û hwd. Bi rêya van programan dixwazin bala piranîya temaşevanan ji bo xwe rakêşin. Ev kanal li ser çendîn heyvên destkird tê pexşkirin ku ew jî ev in: Nilesat, Hotbird, Badr, Iransat. Ev yek jî rêxweşkerek e ji bo ku weşana wê bêtir bigihê temaşevanan.

Egerên hilbijartina vê kanalê ji bo vekolîna me bo çend sedeman vedigere, ji wan jî her wekî me amaje pê da, programên wê corawcor in û ev kanal ji hêla dewletê ve tê birêvebirin û ev yek jî dewlemendîyekê dide kanalê ku bikare li her dera welatî bê asteng bigere û programên xwe çêke û bêtir zanyarî û agahîyan wergire. Kanal her du

zaravayên serekî yên zimanê kurdî bi kar tîne û her wiha li ser çendîn heyvên destkird pexşa wê tê weşandin.

4.4.Tora Medyayî ya Rûdawê

Tora Medyayî ya Rûdawê (TMR) komeke medyayî ya serbixwe û azad a kurdî ye. Kanal di warên medyaya dîtbar û bihîstbar de (bi awayê kaxiz û deng û reng û elektronîk) berhemên xwe pêşkêşî xelkê dike. Li gorî wan zanyarîyên ku ji dezgeha TMRyê hatine wergirtin, ev tor

[1] Ji bo agahîyên bêtir li ser bandora TRT Kurdîyê li ser ziman û kurdên Bakur, bnr.: Ergin öpengin, *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkîyeyê*, weşanxanea Avesta, Stenbol, 2011, r 147- 150.

kompanyayeke kar-nexwaz e. Kanal gihandina rastîyê û beşdarîkirina li çespandina bingehên azadîya raderbirînê girîngtir dizane ji qazanca madî. Her wiha di belavkirin û gihandina berhemên xwe de xwe bi sînorekî cografyayî yê dîyarkirî ve girê nade û nêrîneke wê ya cîhanî heye ji bo xebatkirinê.

TMR dixwaze ku berhemên xwe yên medyayî bigihîne zêdetirîn kesan. Her wiha dixwaze ku komên nû jî peyda bike ku heta niha medyayên kurdî peyda nekirine û negihîştine wan. Çunku çi qas ku bikarhênerên berhemên medyayî yên TMRyê zêdetir bin, şansê pêşxistin û baştirkirina berhemên wê jî zêdetir dibe; ev yek jî bi rêya wergirtina reklamên zêdetir û peydakirina sponser û çavkanîyên dahatî yên bihêztir çêdibe.

Felsefeya xebata TMRyê wek komeke medyayî ew e ku pirtirîn komên bikarhênerên cuda sûdê ji pir-rengîya berhemên wê wergirin. Ji bo bidestxistina vê stratêjîyê û gihîştina bi wê hejmara berfireh a bikarhêneran, TMR dixwaze ne tenê kar li ser pir-rengîya berhemên xwe bike, her wiha ji bo wê girîng e ku ji hêla çawanîyê ve jî berhemên wê di rêza pêş de bin û bi berawird di gel medyayên kurdî yên din her tim di pileya yekemîn de bimîne. Bandora vê yekê jî li ser bidestxistina bawerîya zêdetir a bikarhêneran dibe û asta bikaranîna wê jî bilindtir dike.

Cîbicîkirina vê stratejîyê li gorî mekanîzmeyekê dibe ku xebatkarên TMRyê çêdikin û plana cîbicîkirinê jê re datînin.

4.4.1.Beşên Tora Medyayî ya Rûdawê

Radyo, ku ev jî du radyoyên heta radeyekê taybet in. Çunku pêk hatine ji radyoya nûçeyan û radyoya mûzîkê. Radyoya nûçeyan %60 ji bernameyên wê berhemên wê bi xwe ne û %40 ji televîzyonê werdigire. Bernameyên nûçeyî û bernameyên şîrovekirinê tê de hene. Radyoya mûzîkê jî taybet e bi bernameyên hunerî di gel mûzîk û stranan.

Pexşa van her du radyoyan ji bilî heyvên çêkirî dikarin rasterast bi rêya înternetê jî bêne guhdarîkirin tevî hebûna pexşa navxweyî li ser pêlên FM.

Kanala televîzyonî ya Rûdawê televîzyoneke asimanî ye û li ser heyva çêkirî bernameyên xwe pexş dike. Televîzyona Rûdawê nûçeyên ji hemû cîhanê bi zimanê kurdî belav dike. Her wiha Şeklekê wê ya karkirina nûçeyan heye. Pirtirîn girîngî bi nûçeyan tê dan û paşê bernameyên wê yên taybet bi nûçeyan hene. Her şev, ji bilî şevên înî û şemîyê, *Rûdawa Îro* şîroveya nûçeyên rojê dike ku maweya wê saetek e. Yên din dikevine çarçoveya gotûbêjkirinê di gel çarçoveya zanyarîyan.

Her wiha kanala Rûdawê xwedî bernameyeke dînî ye bi mebesta aşinakirina dînan bi hevdu û xelk aşinayî hevdu bibin û wan dînan bizanin, lihevçûnîyên wan çi ne û li Kurdistanê ew dînên cîyawaz çawa li hev dikin û pêkve dijîn û encama wê çi ye. Ev bername li wê toleransê vedikole ku li Kurdistanê heye û çawa dikare ev tolerans bê berbelavkirin û berdewamkirin. Armanc dike ku xelkê Kurdistanê şarezayî wan rêzikên dînî be û bizane bê ka ew rêzik li cem mesîhîyan çawa ne, li cem êzîdîyan çawa ne û yan li cem misilmanan û li cem kakeyîyan çawa ne û şarezayîya wan hebe li ser wan hemû dînan ku li Kurdistanê hene.

Portala TMRyê xwedî portala xwe ye. Di gel vê portalê jî bi rêya hesabên xwe yên li ser torên civakî (Facebook, Twitter, Instagram û YouTube) berdewam e li agahdarkirina girseya xwe ji nûçe û mijarên nû.

Ev portal jî ji çend beşan pêk hatîye. Portal ji bilî beşa xwe ya kurdî, ku pêk tê ji her du zaravayên kurmancî û soranî, çend zimanên din jî li xwe digire. Wek îngilizî, tirkî û erebî.

Ji hêleke din ve jî beşa çapkirinê rojnameya Rûdawê derdixe ku rojnameyeke heftane ye û her roja duşemî derdikeve. Di gel vê yekê jî rojnameyeke werzişî jî derdixe ku rojên sêşemî yên her hefteyê derdikeve ku tîraja wê ya niha 8 hezar e lê belê tîraja rojnameya sîyasî ji vê hejmarê kêmtir e.

Rojname tenê li başûrê Kurdistanê tê belavkirin. Lê belê di destpêka derketina rojnameya Rûdawê de li Ewropayê jî çapa wê hebû ku destpêkê çapa Ewropayê ya rojnameyê li sala 2010an li Elmanyayê dest pê kir.

4.4.2.Zaravayên bikarhatî di Tora Medyayî ya Rûdawê de

Bi şêweyekî giştî du zaravayên serekî ku bi kar tên "kurmancîya jorîn û jêrîn" in, yên ku ji wan re botanî û soranî jî tê gotin. Geştên nûçeyan wekî hev in. Ango hejmara geştên kurmancî wekhev e di gel hejmara geştên soranî. Lê belê hin bernameyên zaravayê kirmanckî jî hin caran hene.

Dîsan di kanala Rûdawê de ji bilî geştên nûçeyan ku yek ji wan li saet 19:00an e û ji bo rojavayê Kurdistanê ye û ya din jî li saet 18:30an e û ji bo rojhilatê Kurdistanê ye. Demên din jî di hemû geştên nûçeyan de nûçeyek ji bo her çar parçeyên Kurdistanê heye.

Li ser bikaranîna têkelîyeke rênivîsê, rêveberê berpirsîyar ê kanala Rûdawê behs dike ku bi her du şêwazên nivîsîna kurdî dinivîsin ku hin caran nûçeyeke Amedê bi şêweyê tîpên erebî û latînî dinivîsin û berevajî vê yekê jî nûçeyeke taybet bi Silêmanyê bi her du şêwazan dinivîsin. Bi vê yekê re jî dîsan jihevfamkirin di şêwaza nivîsîna zaravayan de zêde dibe. Pê re jî berfirehîya girseya TMRyê zêdetir dibe û her wiha em dûr in ji sepandina zaravayekî dîyarkirî û giştandina wî bi ser girseya dezgehê de. Her wiha li gorî zanyarîyan TMR sîyaseta zimanî ku bi kar tîne, bandoreke wê ya zêde çêdibe li ser pêşveçûna zimanê kurdî. Çunku tu li her ku dera vê dinyayê bî, ji bo bidestxistina zanyarîyan, ku ta radeyekê jî peywendîya wê bi kurdan re heye, tu dikarî ji TMRyê bi dest bixî û piştê bi çavkanîyên derekî girê nedî.

Li gorî zanyarîyan niha ji ber nebûna reqabetê li bakur û rojhilatê Kurdistanê, TMR bi taybetî kanala televîzyonê ya Rûdawê pêşeng û bê rikaber e. Li Başûr jî kanalên televîzyonê hene ku dixwazin reqabetê bikin. Ev yek jî vedigere bo serkeftîbûna sîyaseta karkirinê, xwedî kiwalîteke bilind û teknîkeke bihêz. Heta radeyekê yekemîn kanala nûçeyî ya kurdî ye ku bi sîstema HD kar dike. Medyaya Rûdawê jî mebesta wê ew e ku radeya jevfamkirina temaşevanên kurd zêde bike û bi şêweyekî sertaserî wan li Kurdistanê bigerîne bo nav medyaya kurdî.

5..Encamên rapirsîyê

Ev lêkolîn bi *Google Forms*ê hatîye encamdan. %100 elektorînîk e û bi şêweyê online hatîye şandin. Piştî ku mirov tijî dike, xala şandinê heye ku bersivan yekser û bi çend çirkeyan digihîne lêkoler. Dîyar e bandora vê şêwazê hebe ku em dikarin xwe bigihînin hemû çîn û tebeqeyên civakê. Dabeşkirina online di sînorên Kurdistana mezin de hatîye kirin.

Encamên rapirsîyê bi vî şêweyî bûn: 967 formên online hatin kurmancîkirin û 781 formên online hatin soranîkirin. Tevahîya giştî ya forman bi her du zaravayan gihîşte 1748 forman. Bi vê rêyê li kîjan welatekî bin yan kîjan zaravayê kurdî bi kar tînin bila bînin me karî em xwe bigihînin piranîya hemwelatîyan.

116 form di lêkolînê de ji ber kêmasîyên di formê de hatin feramoşkirin. Lewma em dikarin bêjin ku bi rêjeya %6.6 şaşî di tijîkirina forman de hebûye. Ji ber vê yekê 1632 form tên ravekirin û şîrovekirin.

Forma rapirsîyê li ser hemwelatîyên kurd ên her çar parçeyên Kurdistana mezin hatîye belavkirin ku bi şêwaza elektronîk û bi zaravayê kurmancîya jorîn bi tîpên latînî li bakurê Kurdistanê û li rojavayê Kurdistanê hatîye belavkirin û bi zaravayê kurmancîya jêrîn li başûr û rojhilatê Kurdistanê hatîye belavkirin.

6.Şîroveya Encaman

6.1.Tewerê Yekem: Pêzanînên giştî

Têbînî: Destpêkê dixwazîn behsa wê yekê bikeyin ku 1748 kes beşdarî vê rapirsîyê bûne. Lê belê tenê 1632 form hatine analîzkirin. Her wiha 116 form di lêkolînê de ji ber kêmasîya di bersivan de hatine feramoşkirin. Lewma em dikarin bêjin ku bi rêjeya %6.6 şaşî di tijîkirina forman de hebûye.

Pêzanînên giştî

Pirsiyar		Jimareya beşdaran	Rêje (%)
Zayend	Nêr	902	55.3%
	Mê	730	44.7%
Temen	18 - 35	879	53.9%
	36 - 60	552	33.8%
	61 - 90	201	12.3%
Asta xwendinê	Derçûyê seretayî	87	5.3%
	Derçûyê navincî û diwanavincî	183	11.2%
	Derçûyê zanîngehê û peymangehê	899	55.1%
	Master	306	18.8%
	Doktora	157	9.6%
Rewşa aborî	Baş	330	20.2%
	Navincî	1181	72.4%
	Xerab	121	7.4%
Pîşe	Karê azad	296	18.1%
	Xwendekar	409	25.1%
	Fermanber û mamoste	777	47.6%
	Bêkar	150	9.2%
Cihê nîştecîbûnê	Bajar	1123	68.8%
	Bajarok û nahiye	338	20.7%
	Gund	171	10.5%
Rewşa civakî	Zigurd (selt)	739	45.3%
	Xêzandar	893	54.7%

Tablo 1: Wesfa analîza amarên birgeya yekem

Di vê Şekla jor de tewera yekem zelal dibe ku tê de rêjeya beşdaran li gorî her heft kategorîyan hatîye dabeşkirin. Rêjeya her beşekê beramber kategorîya xwe hatiye nivîsîn ku piştre em ê analîz bikin.



Şeklê 1: zayend

Dîyar e li gorî rêjeya beşdarbûnê jin û mêr hemû endamên civaka kurdî lê beşdar bûne. Lewma dikare were gotin ku her du zayend lê beşdar bûne. Bi rêjeyên cîyawaz derdikeve ku zêdetir mêr di warê medyayê de kar dikin. Lê belê cîyawazî gelek nîn e. Nexwe em dikarin bêjin ku li Kurdistanê her du zayend nêzîkî hevdu cemawera kanalên televîzyonê yên taybet in.



Şeklê2: Temen

Ew rastîya ku li her civakekê çîneke çalak heye ku di piranîya warên civakî de beşdar in, li Kurdistanê jî çîna ciwanan ku dikeve navbera 18-35 salan, beşdar in li çalakîyên civakî. Nexwe ev yek jî bi raya min ciwanên niha ji ber globalîzm û pêşkeftina teknolojîyê zêdetir têkelî hevdu bûne. Lewra jî xwedîyê bilindtirîn pileya çalakîyên civakî ne di civakê de.



Şeklê3: Cihê nîştecîbûnê

Ya ku cihê girîngîyê ye berdewam di bajaran de beşdarîya cemawerê di çalakî û bidestxistina zanyarîyên nû de berî bajarok û gundan e. Ev yek jî vedigere bo wê yekê ku li bajaran teknolojî û înternet û globalîzmê zêdetir reng vedaye. Lewra em dibînin ku beşdar di navenda bajaran de zêdetir bûne.



Şeklê4: Asta wendinê

Eger em li vê encamê hûr bibin, di hemû astên xwendinê de beşdar di rapirsîyê de bi rêjeyên cîyawaz hene.



Şeklê5: Rewşa aborîyê

6.2.Bandora Ragihandinê li ser Zaravayên Zimanê Kurdî

Di Şeklê duyem a analîzkirina datayan de derdikeve ku rêjeya dengderan beramber her kategorîyekê cîyawaz e. Rêjeya beşdarbûnê li gorî bersivên pirsan piştre bi cuda tên ravekirin.

Pirsiyar		Jimare ya dengderan	Rêje (%)
Q8	Bakurê Kurdistanê	518	31.7%
	Başurê Kurdistanê	540	33.1%
	Rojhilatê Kurdistanê	301	18.4%
	Rojavayê Kurdistanê	273	16.7%
Q9	Kurmancîya jorîn	711	43.6%
	Kurmancîya jêrîn(soranî)	590	36.2%
	Lorî	149	9.1%
	Goranî û zazakî	182	11.2%
Q10	Belê	1078	66.1%
	Kêm	494	30.3%
	Nexêr	60	3.7%
Q11	Rûdaw	601	36.8%
	NRT	224	13.7%
	Kurdistan TV	36	2.2%
	Spêde	17	1.0%
	Kurdsat	53	3.2%
	Zagros	27	1.7%
	Gelî Kurdistan	43	2.6%
	Sahar Kurdish	276	16.9%
	TRT Kurdî	355	21.8%
	Kenaleke dîtir	0	0.0%
Q12	Têdigehî ji aliyê zimanvaniyê ve	183	11.2%
	Rûniya dariştina babetan bi zimanekê zanistiyane ye	241	14.8%
	Rastbêjiya bername û zanyariyan	305	18.7%
	Nêzîk e li rê û boçûn û întîmaya siyasî	119	7.3%
	Ji ber bernameyên wê yên hemecur di hemû biwarên jiyanê de	251	15.4%
	Bo zanîna bûyerên cîhanî	205	12.6%
	Lezatiya gihandina nûçeyan û meydanîbûna kanalî	275	16.9%
	Egerên dîtir	53	3.2%
Q13	Bernameyên aborî	248	15.2%
	Bernameyên ayînî (dînî)	156	9.6%
	Bernameyên tenduristîyê	123	7.5%
	Bernameyên werzişî (spor)	132	8.1%
	Nûçe û bernameyên sîyasî	491	30.1%

	Bernameyên dariştin û dokumêntarî	51	3.1%
	Bernameyên zanistî û fêrkarî	154	9.4%
	Bernameyên civakî û rewşenbîrî (çandî)	277	17.0%
Q14	Belê	887	54.4%
	Ta radeyekê	574	35.2%
	Nexêr	171	10.5%
Q15	Belê	550	33.7%
	Ta radeyekê	933	57.2%
	Nexêr	149	9.1%
Q16	Rênivîsa latînî	882	54.0%
	Rênivîsa erebî (aramî)	750	46.0%
Q17	Belê	822	50.4%
	Ta radeyekê	752	46.1%
	Nexêr	58	3.6%
Q18	Rûdaw	532	32.6%
	NRT	211	12.9%
	Kurdistan TV	0	0.0%
	Spêde	35	2.1%
	Kurdsat	91	5.6%
	Zagros	24	1.5%
	Gelî Kurdistan	47	2.9%
	Sahar Kurdish	242	14.8%
	TRT Kurdî	309	18.9%
	Kanaleke dîtir	141	8.6%
Q19	Belê	892	54.7%
	Ta radeyekê	653	40.0%
	Nexêr	87	5.3%
Q20	Belê	1096	67.2%
	Ta radeyekê	381	23.3%
	Nexêr	155	9.5%
Q21	Kurmancîya jorîn	837	51.3%
	Kurmancîya jêrîn (soranî)	741	45.4%
	Lorî	18	1.1%
	Goranî û zazakî	36	2.2%
Q22	Bikaranîna zaravayekîbi tenê	163	10.0%
	Têkelkirina diyalêkan û kirina wan bi awayê yek zarava	97	5.9%
	Bikaranîna hemû zaravayan di demên cuda cuda de	999	61.2%
	Bikaranîna hemû zaravayan di demekê de	373	22.9%

Tablo 2: Wesfa analîza amarên birgeya duyem



Şeklê 6: Gelo bi piranî li kîjan kanalên asimanî yên kurdî temaşe dikî?

Dîyar e ku temaşevanên hemû kanalên kurdî hene. Lê belê bilindbûna *Rûdaw*ê bi eşkere dîyar e ku hemwelatîyên her çar parçeyên Kurdistanê bi rêjeyeke berbiçav lê temaşe dikin û li hêvîya nûçe û zanyarîyên wê ne. Piştî kanalê *Rûdaw*ê, *TRT Kurdî* bi rêjeya %22 tê û piştî wê jî *Sahar Kurdish* tê. Bi raya min piranîya nûçegihanan li hemû bajarên girîng ên Kurdistana mezin û pirbûna bernameyên zindî li ser babetên girîng û aktuel vê rêjeya zêde ya temaşevanan dibexşe van kanalan. Her wiha rola berfirehî û hêza maddî û mirovî ya van kanalan di vê yekê de heye. Li gorî vê rapirsîyê ew yek jî berbiçav dibe ku kêmtirîn temaşevan ên *Spêde*yê ne.



Şeklê7: Çawa dizanî ku baştirîn kanal e? Bi çi pîverekê?

Ev tablo wê yekê derdixe ku hemwelatîyên kurd girîngîyeke zêde bi rastbêjî û destnîşankirina rastîyane didin û serekîtirîn pîver e ji bo dîyarkirina baştirîn kanalên kurdî. Her wiha lezgînîya gihandina nûçeyan û ew zaravayên kurdî ku pê nûçe hatine gotin jî pîverên girîng in. Ango ew kanalên ku zêdetir ji zaravayekî bi kar tînin, temaşevanên wan zêdetir in. Axêverên zaravayên kurdî yên cîyawaz bi awayekî ku ji nûçeyan fam kirin û bi zaravayê xwe bû, ev yek dibe sedema temaşekirina kanalan. Lewra divê girîngîyeke zêde bi zaravayên bikarhatî di zimanê medyayî de were dayîn. Çunku ev yek dibe alîyekî karîger ji bo rakêşana temaşevanan bo temaşekirina bernameyan.



Şeklê 8: Gelo çi cure rênivîsa kurdî pêbaşe di ragehandinê de bikar bihêt ku mifa hebe ji bo pitir hevtêgehiştinê di navbera zaravayên zimanê kurdî de?

piranîya beşdaran li gel bikaranîna rênûsa latînî ne. Ji ber vê yekê bi raya min divê li ser vê babetê rawestan were kirin da ku ber bi bikaranîna rênûsa yekgirtî em biçin ku hemû parçeyên Kurdistanê bi kar bînin û li ser li hev bikin.



Şeklê 9: Bi boçûna te kîjan ji kanalên asimanî karîne têkiliyekê durist bikin di navbera zaravayên kurdî de?

Li ser Şeklê 9 beşdar bi rêjeya %33 hemfikr in ku kanala Rûdawê karîye bandorê li ser têkelîçêbûna navbera zaravayên kurdî bike ku wek pirtirîn rêje tê hesibandin. Piştî wê kanala TRT Kurdî îcar Sahar Kurdish û paşê NRT tê ku ev çar kanal em dikarin bêjin bandora wan a serekî li ser têkelbûna zaravayên kurdî heye. Lewra pêwîst e bê gotin ku hemû kanalên asimanî divê heman rêya van kanalên xwedî zêde temaşevan bişopînin da ku di maweyeke kurt de em bigihîjin wê xalê ku piranîya kurdan ji zimanê hevdu fam bikin û pê xeber bidin.



Şeklê 10 : Bi boçûna te hevtêkelkirina di navbera zaravayên zimanê kurdî de ku di kanalên asimanî yên kurdî de dihête kirin, pêşxistinê di zimanê kurdî de dike û bandorê li ser nêzîkkirina zaravayên zimanê kurdî durist dike?

Di Şeklê 10ê de rêjeya bandora têkelbûna zaravayan li ser pêşvebirina zimanê kurdî rêjeyeke berbiçav û bilind e. Wekî ku mirov dibîne beşdar bi rêjeya %55 hemfikr in ku bandora berdewam û rasterast a têkelkirinê heye û %40 bi wê yekê re ne ku hin caran bandor heye. Ango bi awayekî giştî %95 hemfikr in ku têkelbûna zaravayên kurdî bi rêya kanalên asimanî bandoreke wê ya berbiçav di pêşveçûna zimanê kurdî de heye. Dîyar dibe ku piranîya mezin a hemwelatîyên kurd ji her çar parçeyên Kurdistanê bi dilê wan e û wek zerûret dibînin ku êdî ew rewş berdewam nebe û em bibine xwedî zimanekî yekgirtî yan qet nebe hemû kurd li her ku dibe ji kurdekî din fam bike û pê re xeber bide.

Şeklê 11: Gelo li cem te baş e têkhelkêşiya zaravayên kurdî di zimanê bikaranînê yên kanalên kurdî de bihête kirin?

Wekî ku di Şeklê 11ê de tê dîtin, beşdar bi rêjeya %67 pêşnîyara têkhelkêşana zaravayan dikin bo kanalên asimanî, bi awayekî giştî bi hemû bernameyan. Lê belê %23 bi wê yekê re ne ku hin caran ev têkhelkêşan were kirin. Tevahîya giştî %90ê beşdaran li gel wê fikrê ne ku di kanalên asimanî de ev yek were kirin. Ango hemwelatîyên kurd li hember zaravayê xwe fanatîk nîn in. Berevajî vê yekê bi dilê wan e ku fêrî zaravayekî din bibin yan jî qet nebe ji hemû zaravayan fam bikin.

<u>Naveroka pirsîyarên jimare (10, 14, 15, 17, 19 û 20)</u>

10- Gelo li kanalên asmanî temaşe dikî?

14- Gelo çi zaravayê zimanê kurdî cuda ji zaravayê xwe fêr bûyî ji aliyê têgehiştinê ve bi rêya ragihandinê?

15- Gelo çi zaravayê zimanê kurdî cuda ji zaravayê xwe fêr bûyî ji aliyê axaftinê ve bi rêya ragihandinê?

17- Gelo bi boçûna te, baş e bikaranîna peyv û destewajeyên lokalî (xwecihî) yên bajarên cuda cuda yên Kurdistanê di kanalên asimanî yên kurdî de?

19- Bi boçûna te hevtêkelkirina di navbera zaravayên zimanê kurdî de ku di kanalên asimanî yên kurdî de dihête kirin, pêşxistinê di zimanê kurdî de dike û bandorê li ser nêzîkkirina zaravayên zimanê kurdî durist dike?

20- Gelo li cem te baş e têkhelkêşiya zaravayên kurdî di zimanê bikaranînê yên kanalên kurdî de bihête kirin?

Ji bo ku em bizanin di amarên me de cîyawazî di temaşekirina kanalên kurdî de heye yan na, yan jî em bêjin ev her girîmane serbixwe ne yan serbixwe nîn in ku me girîmaneya xwe wek pirsîyara 10 û pirsîyara 11 wergirtîye, destpêkê ji bo pirsîyra 10 ku dibêje gelo li kanalên kurdî temaşe dikî, em bi dataya "belê"yê rabûne ji bo hemû "belê"yan û her wiha "nexêr" ji bo hemû wan rewşan ku bersivên wan "nexêr" yan kêm bûye. Ji bo pirsîyara 11 ku dibêje gelo li kanalên kurdî zêdetir temaşe dikî, ew yek bi "belê" û "nexêr"a pirsîyara me ya 10an ve hatîye girêdan. Niha bi nirxandina *Pearson Chi-Square Test* di navbera pirsîyara 10 û pirsîyara 11an de wek di Şeklê jimare 4 de em dibînin, nirxa P-Value>0.05 ango encama nirxandinê bihadar e. Bi gotineke din cîyawazî heye di temaşekirina kanalên kurdî de wek di Şeklê jimare 4 de mirov dikare encaman bibîne yan jî di jimare 15an de.

Kanal		11- Gelo bi piranî li kîjan kanalên asimanî yên kurdî temaşe dikî?									Tevahî	Pearson Chi-Square	P-Value
		Rûdaw	NRT	Kurdistan TV	Spêde	Kurdsat	Zagros	Gelî Kurdistan	Sahar Kurdish	TRT Kurdî			
10- Gelo li kanalên asimanî temaşe dikî?	Yes	565	223	34	17	53	25	43	274	338	1572	29.447	0.001
	No	6								7	60		
Tevahî		01	24	6	7	3	7	3	76	55	1632		

Tablo3: Chi Square Test

Ango ji bilî wê yekê ku di Şeklê 6 de derket, cîyawazîya rêjeya temaşekirina kanalên kurdî heye. Wekî ku em dibînin rêjeya temaşekirina kanala Rûdawê bi zêdetirîn rêjeyê derdikeve ku %37 e. Paşê rêjeya temaşekirina kanala TRT Kurdî tê ku rêjeya wê jî %22 ye. Bi vî awayî heta digihîje kêmtirîn rêjeya temaşekirina kanala Spêdeyê ku %1 e. Lê belê bi alîkarîya nirxandina Pearson Chi-Square ev cîyawazî hatîye selmandin.

Jimareya "belê"yan di pirsîyara dehem de ku dibêjin belê li kanalê kurdî temaşe dikim 1572 kes in di tevahîya 1632 kesan de. Ango tenê 60 heb bersivên "nexêr" û kêm hene ji bo

temaşekirina kanalên kurdî. Lê belê wekî ku berî niha me îşaret pê kiribû, ji bo pirsîyara dehem "nexêr" û "kêm" wek "nexêr" tê hesibandin. Îcar ji bo guhêrbarîya duyem ku pirsîyara 18em e dibêje kîjan kanala asimanî karîye têkelîyê di navbera zaravayan de çêbike, em dibînin ku bi jimareya "belê"yan di Şeklê 7 de kanala Rûdawê zêdetirîn "belê" ber wê ketin û di tevahîya 1572 belêyan de 529 wergirtine ku ev jî dike %34. Bi heman awayî ji bo kanalên din jî jimareya "belê"yan mirov dikare di heman Şeklêê de bibîne. Ji bo rêjeyên wan hûn dikarin li Şeklê 19 temaşe bikin da ku hûn bikarin bizanin ka hêza kanalên kurdî di çêkirina têkelîya zaravayan de çawa ye.

Ji bo vê mebestê bi rêya nirxandina Chi Square Testê, ku nirxa wê 164.75 (0.001=P-Value) biçûktir e ji 0.05, em dibînin ku cîyawazî di hêza têkelbûna kanalan de heye ku ji hêla wan kesan ve ku kanalên asimanî temaşe dikin.



Şeklê 12: cîyawazî di hêza têkelbûna kanalan de heye ku ji hêla wan kesan ve ku kanalên asimanî temaşe dikin

6.3.Tewerê Sêyem: Rol û bandora tora medyayî ya Rûdawê li ser nêzîkirina diyalektên zimanê kurdî

Pirs û bersiv		Jimare	Table Valid N %
Q23	Belê	1018	62.4%
	Ta radeyekê	443	27.1%
	Nexêr	171	10.5%
Q24	Televîzyon	768	47.1%
	Radyo	234	14.3%
	Rojname	64	3.9%
	Multîmedya	566	34.7%
Q25	Nûçe û bernameyên siyasî	909	55.7%
	Bernameyên tenduristîyê	110	6.7%
	Bernameyên civakî û rewşenbîrî (çandî)	311	19.1%
	Bernameyên werzişî (spor)	73	4.5%
	Bernameyên aborî	116	7.1%
	Bernameyên dariştin û dokumêntarî	113	6.9%
Q26	Gelek	764	46.8%
	Ta radeyekê	688	42.2%
	Kêm	127	7.8%
	Nekiriye	53	3.2%
Q27	Belê	667	40.9%

	Ta radeyekê	806	49.4%
	Nexêr	159	9.7%
Q28	Kurmancîya jorîn	774	47.4%
	Kurmancîya jêrîn (soranî)	858	52.6%
Q29	Kurmancîya jorîn	696	42.6%
	Kurmancîya jêrîn (soranî)	936	57.4%
Q30	Belê	809	49.6%
	Ta radeyekê	720	44.1%
	Nexêr	103	6.3%
Q31	Belê	659	40.4%
	Ta radeyekê	782	47.9%
	Nexêr	191	11.7%
Q32	Belê	424	26.0%
	Ta radeyekê	848	52.0%
	Nexêr	360	22.1%
Q33	Rênivîsa latînî	1064	65.2%
	Rênivîsa erebî (aramî)	568	34.8%
Q34	Belê	783	48.0%
	Ta radeyekê	632	38.7%
	Nexêr	217	13.3%
Q35	Bikaranîna zaravayekîbi tenê	143	8.8%
	Têkelkirina zaravayan û kirina wan bi awayê yek zarava	189	11.6%
	Bikaranîn hemû zaravayan di demên cuda cuda de	931	57.0%
	Bikaranîna hemû zaravayan di demekî de	369	22.6%

Tablo 4: Analîzkirina amaran ji bo birgeya sêyem

Pirs û bersiv		Jimare	Table Valid N %
Bi boçûna te Tora Medyayî ya Rûdawê û Sahar Kurdish û TRT Kurdî bi çi şêwazekê zaravayên kurdî bi kar bîne?	Bikaranîna zaravayekîbi tenê	143	8.8%
	Têkelkirina zaravayan û kirina wan bi awayê yek zarava	189	11.6%
	Bikaranîn hemû zaravayan di demên cuda cuda de	931	57.0%
	Bikaranîna hemû zaravayan di demekê de	369	22.6%

Tablo 5: Bi boçûna te Tora Medyayî ya Rûdawê û Sahar Kurdish û TRT Kurdî bi çi şêwazekê zaravayên kurdî bi kar bîne?



Şeklê 13: Bi boçûna te Tora Medyayî ya Rûdawê û Sahar Kurdish û TRT Kurdî bi çi şêwazekê zaravayên kurdî bi kar bîne?

Beşdar bi rêjeya %57 hemfikr in ji bo ku her sê kanalên kurdî yên Rûdaw, Sahar Kurdish û TRT Kurdî hemû zaravayên cuda bi kar bînin di demên cuda cuda de. Her wiha hemû beşdar

li dijî bikaranîna yek zaravayî ne. Lewra bi rêjeyeke zêde kêm hemfikr in li gel fikra bikaranîna tenê yek zaravayî ku tenê dike %9.

Analîzkirina amaran ji bo kanalên Rûdaw, Sahar Kurdish û TRT Kurdî

Di tewera sêyem a rapirsîyê de kar ji bo analîzkirina rol û bandora kanalên Rûdaw, Sahar Kurdish û TRT Kurdî li ser pêşveçûna zimanê kurdî tê kirin. Ji bo vê mebestê jî bi rêya analîzkirina amarên nirxandina *One Sample T Test*ê hatîye çêkirin. Ji bo vê yekê ew pirsîyar û girîmaneyên ku sê bersivên wan hene, wek pirsîyarên jimar 23, 27, 30, 31, 32 û 34, hatine hilbijartin ku nirxa testê wekhev e bi 2yê ji bo girîmaneya 0Hyê. Ango girîmaneya lêkoler wekhev nîn e bi 2yê wek girîmaneya 1H. Bi gotineke din girîmaneya alternatîf e. Lewra em bi girîmanekirina nirxa 1yê ji bo hemû "belê"yan rabûne û jimare 2 ji bo "ta radeyekê", jimare 3 ji bo "nexêr"ê Nirxandina amaran ji bo hemû wan dengderan ku li her sê kanalan temaşe dikin.

Pirs û bersiv		Q23			Pearson Chi-Square	P-Value
		Belê	Ta radeyekê	Nexêr		
Q24	Televîzyon	536	225	7	211.22	0.001
	Radyo	168	20	46		
	Rojname	49	10	5		
	Multîmedya	265	188	113		
Q25	Nûçe û bernameyên siyasî	721	188	0	746.733	0.001
	Bernameyên tenduristîyê	39	70	1		
	Bernameyên civakî û rewşenbîrî (çandî)	121	153	37		
	Bernameyên werzişî (spor)	32	24	17		
	Bernameyên aborî	56	8	52		
	Bernameyên dariştin û dokumêntarî	49	0	64		
Q26	Gelek	543	191	30	410.663	0.001
	Ta radeyekê	386	252	50		
	Kêm	67	0	60		

	Ne kiriye	22	0	31		
Q27	Belê	496	61	110	409.55	0.001
	Ta radeyekê	465	341	0		
	Nexêr	57	41	61		
Q28	Kurmancîya jorîn	684	90	0	444.325	0.001
	Kurmancîya jêrîn (soranî)	334	353	171		
Q29	Kurmancîya jorîn	597	99	0	308.209	0.001
	Kurmancîya jêrîn (soranî)	421	344	171		
Q30	Belê	376	354	79	636.332	0.001
	Ta radeyekê	609	89	22		
	Nexêr	33	0	70		
Q31	Belê	525	38	96	530.112	0.001
	Ta radeyekê	413	369	0		
	Nexêr	80	36	75		
Q32	Belê	424	0	0	995.21	0.001
	Ta radeyekê	456	392	0		
	Nexêr	138	51	171		
Q33	Rênivîsa latînî	826	187	51	331.462	0.001
	Rênivîsa erebî (aramî)	192	256	120		
Q34	Belê	778	0	5	1659.22	0.001
	Ta radeyekê	156	443	33		
	Nexêr	84	0	133		
Q35	Bikaranîn 1 dîyalêkt bi tenê	143	0	0	1184.325	0.001
	Têkelkirina zaravayan û kirina wan bi awayê yek zarava	61	0	128		
	Bikaranîna hemû zaravayan di demên cuda cuda de	445	443	43		
	Bikaranîna hemû zaravayan di demekê de	369	0	0		

Tablo 6: Nirxandina Chi Square Test ji bo hemû wan dengderan ku li her sê kanalan temaşe dikin û radeya hêza pêşvebirina zaravayên zimanê kurdî ji hêla van her sê kanalan ve destnîşan dikin.

Di tewera duyem de derket ku rol û bandoreke serekî ya van her sê kanalan di pêşveçûna zimanê kurdî de heye. Di vir de cîyawazî di navbera van her sê kanalan de heye. Gelo van kanalan heman bandor heye yan bandoreke cîyawaz heye di nêzîkkirina zaravayên kurdî de? Di Şeklê jimare 9 de nirxa Chi Square Test (0.001=P-Value) kêmtir e ji 0.05. Bi gotineke din girîmaneya serbixweyî yan cîyawazîya navbera boçûnan bihadar e; ango em di hêza van sê kanalan de cîyawazîyê dibînin ji bo nêzîkkirina zaravayên kurdî. Wek di Şeklê jimare 21 de dîyar e.



Şeklê 14: Bi boçûna te Tora Medyayî ya Rûdawê û Sahar Kurdish û TRT Kurdî ta çi qas karîne pêşxistinê di zaravayên zimanê kurdî de biken?

7.**Şîroveya Şeklan**

Ev lêkolîn hewldanek e ji bo destnîşankirina bandora medyayê di pêşvçûna zimanê kurdî û zaravayên wî de û peydakirina çarerêyekê ye ji bo lihevnêzîkkirina zaravayên kurdî û rêxweşkirin e ji bo edilandina zaravayên zimanê kurdî. Çunku bi raya me bi yekxistina zaravayan em gaveke mezin diavêjin ji bo çêkirina zimanekî kurdî yê fermî. Nexwe em dikarin gava yekem ji zaravayan dest pê bikin û vê yekê bikin bingeha lihevnêzîkkirin û yekxistina zaravayên zimanê kurdî. Em dikarin medya ya kurdî ji bo encamdan û hêsankirina vî karî bi kar bînin.

Her wiha di vê lêkolînê de îşaret bi wê yekê jî hatîye kirin ku çênabe bi tu awayî zaravayek ji zaravayên zimanê kurdî were feramoşkirin û girîngî pê neyê dan. Çunku li gorî ceribandina gelên din derketîye ku hebûna van zaravayên cuda hebûna zincîreya zimanî ye. Lewma divê sûd ji vê zincîreyê bê wergirtin û zimanê fermî pê were dewlemendkirin.

Yekxistina zaravayan û wek hev bikaranîna wan di navbera hemû takekesên zaravayên cuda de sûda wê ya lihevnêzîkkirin û yekxistina takekesên civakê û zaravayên wê heye. Ev lêkolîn ji bo vê serdema niha gaveke girîng û karîger e eger bi awayekî pratîkî were tetbîqkirin. Bêguman tu zimanek nîn e ku zaravayên xwe nebe yan ji çend zaravayan pêk nehatibe. Hetta li gorî hin zanayên ziman her takekesekî her civakekê zaravayekî wî yê serbixwe heye. Çunku di her civakê de takekesan şêwazeke wan a taybet bi xwe heye û wan ji takekesên din cuda dike.

Li ser zimanê kurdî û yekxistina zaravayên wî, divê bi awayekî zanistî û akademîk mamele li gel were kirin. Çunku danîna zaravayekî wek bingehek ji bo zimanê nivîsînê gava yekem e û paşê bi xwe rêya siruştî digire ber xwe û sînorê xwe yê teng derbas dike. Wexta ku mirov li şêwaza pêşketina asta çandî û zanistî ya welat û civakên cuda dinêre, dibîne ku medya di dîroka mirovahîyê de roleke wê ya mezin di hişyarkirina takekesên civakê û avakirina şaristanîyetên cîyawaz de hebûye.

Ziman ne tenê navendeke têgihîştin û jihevtêgihîştinê pêk tîne, her wiha ziman bi xwe hin hest û soz û xoşewîstîyan li xwe digire. Dema ku mirov di nav neteweyên din de bi kar tîne, hingî hest bi vê yekê dike. Lewma ziman tê wateya hebûn û nasnameya neteweyekê. Gelek caran pirsa ziman ji pirsa axê zêdetir nebe kêmtir jî nîn e.

Forma rapirsîyê bi awayê elektronîk ango bi e-mailê çûye û bersiv jî hatine dan. Ev yek jî cureyekî nû ye ku di lêkolîneke zanistî ya warê zimanê kurdî de ku li başûrê Kurdistanê tê kirin. Pirsîyar bi e-mailê tên şandin û piştî tijîkirinê xala şandinê heye ku bi çend çirkeyan yekser bersivan digihîne lêkoler.

Bi şîrovekirina vê rapirsîyê ku beşdarên wê hemû endamên civaka kurdî ne çi jin çi mêr, em dikarin bêjin ku her du zayend bi rêjeyên cîyawaz beşdarî rapirsîyê bûne û derdikeve ku

mêr ji jinan zêdetir bi van karan mijûl in. Lê belê cîyawazî zêde nîn e. Nexwe em dikarin bêjin ku li Kurdistanê her du zayend cemawera kanalên televîzyonê ne. Ew rastîya ku li her civakekê çîneke çalak heye ku di piranîya warên civakî de beşdar in, li Kurdistanê jî çîna ciwanan ku dikeve navbera 18-35 salan, beşdar in li çalakîyên civakî. Nexwe ev yek jî bi raya min ciwanên niha ji ber globalîzm û pêşkeftina teknolojîyê zêdetir têkelî hevdu bûne. Lewra jî xwedîyê bilindtirîn pileya çalakîyên civakîn di civakê de.

Eger em li vê encamê hûr bibin, em ê bibînin ku di hemû astên xwendewarîyê de, her ast bi rêjeyeke cuda, beşdarî rapirsîyeke wiha dibin. Ev rapirsî wê yekê nîşanî me dide ku hemwelatî di asta aborîya mamnavend û baş de zêdetir hînbûyîyê temaşekirina kanalên ragihandinê ne. Başbûna rewşa debarê zêdetir geşe bi beşdarbûna cemawerê dide da ku li zanyarî û fêrbûnê bigerin.

Her wiha li gorî nêzîkîya encaman heta radeyekê, em dikarin bêjin ku pîşeyên cîyawaz rêgir nîn in ku cemawer ta çi radeyekê beşdar bin di bidestxistina berhemên civakî de. Ya ku cihê girîngîyê ye berdewam di bajaran de gerîn û beşdarîya cemawerê di çalakî û bidestxistina zanyarîyên nû de berî bajarok û gundan tê. Ev yek jî vedigere bo wê yekê ku li bajaran zêdetir teknolojî û înternet û globalîzmê rengê xwe daye. Lewma em dibînin ku beşdarên ji navendên bajaran zêdetir in.

Dîyar e azebbûn wek her neteweyên din dema zêdetir dibexşe hemwelatîyan da ku agahîya wan zêdetir ji dinyaya derve hebe û zêdetir girîngî pê bidin. Çunku dibe ku berpirsîyarî kêm be û dema zêdetir di dest de tune be.

Tevî cîyawazîya di jimareya rûnîştîyên parçeyên Kurdistanê de, her çend rêjeya beşdarbûnê heta radeyekê nêzîkî hev in jî, mebesta me li her çar parçeyên Kurdistanê gelê kurd bûye. Lewra rêjeya beşdaran ji hemû parçeyan nêzîkî hev in. Ji ber vê yekê em dikarin bêjin ku ev zanyarîyên ku me bi dest xistine giştgîr in.

Dîyar e ku piranîya miletê kurd bi zaravayê kurmancî diaxive û piştre jî bi soranî. Her du bi hev re piranîya herî zêde ya axêverên miletê kurd pêk tînin. Cihê girîngîyê ye ku rêjeyeke berbiçav bi rêya kanalên kurdî sûdmend in ji wergirtina zanyarîyên wan. Bi gotineke din %70 ji beşdarên vê rapirsîyê temaşevanên kanalên kurdî ne ku ev rêje jî rêjeyeke baş e.

Berfirehbûna warê ragihandinê û pêwîstîya hemwelatîyan bi nûçe û zanyarîyên lezgîn, bandor li pêşveçûna temaşevanên kanalê asimanî kirîye. Dîyar e ku temaşevanên hemû kanalan heye. Lê belê kanalên Rûdaw, Sahar Kurdish û TRT Kurdî bi eşkere dîyar e ku hemwelatîyên her çar parçeyên Kurdistanê bi rêjeyeke berbiçav wan temaşe dikin û li hêvîya nûçe û zanyarîyên wan in. Bi fikra min pirbûna nûçegihanan li hemû bajarên girîng ên Kurdistan mezin û pirbûna bernameyên zindî li ser babetên girîng ên aktuel ev rêjeya zêde ya temaşevanan dibexşe kanala Rûdawê, her wek çawa di destpêka vê beşê de me îşaret bi berfirehî û hêza maddî û mirovî ya Tora Medyayî ya Rûdawê kir.

Her wiha ev rapirsî wê yekê derdixe ku hemwelatîyên kurd girîngîyeke zêde bi zaravayên medyayê didin. Çunku pirbûna bersivan di vî warî de bûye û bi awayekî ku têgihîştina ji nûçeyan ku bi zaravayê xwe bûye, bûye sedema wê yekê ku kanalan temaşe bike. Lewra divê em girîngîyeke zêde bi zaravayên bikarhatî yên di medyayê de bidin. Çunku alîyekî karîger e li ser rakêşana temaşevanan bo temaşekirina bernameyan.

Dîyar e ku bûyerên herêmê û rewşa sîyasî ya nearam ku her çar parçeyên Kurdistan tê re derbas dibin û hebûna şer li du parçeyên Kurdistanê rewşa nearamîya du parçeyên din xirab

kirîye û peydabûna kêşe û qeyranên yek li pey yekê li herêmê wisa kirîye ku hemwelatîyên kurd gelek girîngîyê bidine nûçeyên sîyasî yên navçeyê û hemû cîhanê.

Di vê lêkolînê de derdikeve ku girîngîya medyayê bi gştî û kanalên asimanî bi taybetî li ser pêşveçûna zimanê kurdî û nêzîkkirina zaravayên kurdî heye. Gelo heta çi radeyekê medyayê girîngî bi vî alîyî daye? Gelo ta çi radeyekê me pêwîstî pê heye ku em kanalên asimanî yên taybet ava bikin ku kar li ser zimanê kurdî bikin û zaravayên kurdî li hev nêzîk bikin. Çunku li gorî encaman bandoreke berbiçav a medyayê li ser ziman û lihevnêzîkkirina zaravayan heye. Ango medya ya nû bêyî ku haya xwe jê hebe zimanê yekgirtî çêdike û vê yekê jî tenê bi medya ya bi hemû zaravayan dike da ku tu kurdek hest neke ku bê par e ji vî welatî û hesta ayidîyetê li ba çêbibe.

Bêzarîya hemwelatîyên hemû parçeyên Kurdistanê ji çanda erebî ku bi muhra dînî hatîye têkelkirin, wisa kirîye ku bêzarbûn di bikaranîna rênûsa aramî de biqewime ku bi rênûsa erebî navdar e. Lewra em dibînin ku piranîya beşdaran li gel bikaranîna rênûsa latînî ne. Ji ber vê yekê bi raya min divê li ser vê babetê rawestan were kirin da ku ber bi bikaranîna rênûsa yekgirtî em biçin ku hemû parçeyên Kurdistanê bi kar bînin û li ser li hev bikin.

Dîyar e ku bi dilê hemwelatîyan e ku zimanê medyayê zimanekî sade be û peyv û qalibên lokal tê de bi kar werin ji bo ku takekes zaravayê xwe û devoka xwe, eger bi çend peyvan be jî, tê de bibîne. Ev yek jî dîyar dike ku kanalên Rûdawê, Sahar Kurdish û TRT Kurdîyê roleke wan a mezin ji hêla zimanî ve heye. Pêwîst e hemû kanalên asimanî heman rêya Rûdawê bişopînin da ku di maweyeke kurt de em bigihîjin wê xalê ku piranîya kurdan ji zimanê hevdu fam bikin û pê xeber bidin.

Dîyar dibe ku piranîya zêde ya hemwelatîyên kurd li her çar parçeyên Kurdistanê bi dilê wan e û bi zerûret dibînin ku êdî ew rewş berdewam nebe û em bibin xwedîyê zimanekî yekgirtî yan qet nebe her kurd li her ku dibe ji kurdekî din fam bike û bi hev re bi kurdî xeber bidin.

Li gorî datayan derket ku hemwelatîyên kurd li ser zaravayê xwe fanatîzmê nake, berevajî vê yekê, bi dilê wan e ku fêrî zaravayekî din bibe yan qet nebe ji hemû zaravayan fam bike.

Li gorî amaran derketîye ku rêjeyeke zêde ji hemwelatîyên kurd dixwazin ku guhê wan li hemû zaravayên kurdî bin û şarezahîya wan hebe û hewla famkirinê didin. Ev yek jî zengek e ji bo hemû kanalên medya yê ku hemû zaravayan bi kar bînin û tu zaravayekî bi hinceta rêjeya axêveran feramoş nekin. Ji ber vê yekê divê haya me ji vê xalê gelek hebe û bi baldarî em danûstandinê pê re bikin da ku tu takekesekî kurd zaravayê xwe bi kêm nezane. Bi gotineke din hemû takekesên kurd xwe di nav kanalên medyayê de bibînin.

Sedema hilbijartina Tora Medyayî ya Rûdawê ew e ku rêjeyeke berbiçav ji hemwelatîyên kurd li vê kanalê temaşe dikin. Dîyar e vê kanalê karîye bandora xwe di nav cemawera Kurdistanê de çêbike. Her wiha piranîya xelkê di wexta bêhnvedanê de li mala xwe wexta xwe zêdetir li ber televîzyonê derbas dikin ji bo wergirtina zanyarî û nûçeyan.

Dîyar e ku rewşa sîyasî ya her çar parçeyên Kurdistanê ne aram e û şer heye; vê faktorê jî wisa li wan kirîye ku takekesên kurd her tim li pey nûçe û bernameyên sîyasî bin.

Derdikeve ku bi raya piranîya beşdaran Tora Medyayî ya Rûdawê bi rêya bikaranîna du zaravayên serekî bandoreke zêde bi taybetî li ser zaravayên kurdî û bi gştî li ser zimanê kurdî kirîye. Pêwîst e di siberojê de hemû zaravayan bi kar bîne ji bo ku xizmeta zimanê kurdî bike. Her wiha ew hemwelatîyên ku fêrî zaravayekî din bûne gelek in. Lewra ev yek jî rêyekê nîşanî

me dide da ku em bikarin geşe bi zimanê kurdî bidin û zaravayan fêr bibin. Ev rê jî bi rêya medyayê ye ku wek baştirîn kanala peywendîyê û levnêzîkkirina zaravayan e.

Lewma jî di rapirsîyê de dîyar e ku rêjeyeke zêde fêrî zaravayê kurmancîya jêrîn ango soranî bûne. Ji ber ku rêjeya axêverên kurmancîya jorîn zêdetir in, lewma rêje bi vî awayî derketîye. Ev yek jî nîşaneyek e ku tu zaravayek dijwar nîn e ji bo fêrbûnê. Çunku bingeha zimanê kurdî her yek e û piranîya peyvan dişibin hev, tenê fonetîka wan cuda ye. Li gorî wan encamên ku derketine, dîyar dibe ku bandora hemû kanalan li ser zimanê kurdî zêde berbiçav e. Lewma bi raya me divê girîngî gelek bi vî alîyê bê dan. Her wiha lidarxistina panel û civînan yan dibe ku rêzefîlmek zêdetir bandorekê çêbike. Bi me panel, civîn û semîneran gelek kêm bandor li ser pêşveçûna ziman kirîye.

Her çend Tora Medyayê ya Rûdawê li Hewlêre ku hemwelatîyên wir bi soranî xeber didin- pexşa xwe dike, lê belê li gorî bersivên beşdaran Rûdawê karîye hevsengîya navbera zaravayên serekî biparêze.

Dîyar e di vê rapirsîyê de piranîya axêverên zimanê kurdî bi her du zaravayên kurmancîya jêrîn û jorîn xeber didin. Çunku ev kanal bernameyên xwe bi her du zaravayan pexş dikin û pirbûna temaşevanên her du zaravayan di asta her çar parçeyên Kurdistanê de wisa kirîye ku di bersivên wan de li ser dabeşkirina kanalan razîbûn hebe. Lê belê bi fikra me her sê kanalan ji hêla temaşekirinê ve karîne serkeftineke baş bi dest bixin. Tevî vê yekê divê bi wan her du zaravayên din jî bernameyan pêşkêş bikin.

Her wiha di vê rapirsîyê de derdikeve ku hemwelatîyên kurd bertekê nîşanî rênûsa aramî (erebî) didin. Bi gotineke din ew rênûsa ku li her du parçeyên Kurdistanê, rojhilat û başûr, tê xebitandin. Bi raya me ji ber ku miletên ereb û faris bi vê rênûsê dinivîsin, hemwelatîyên van her du parçeyan dixwazin bêjin ku em kurd in ne ereb û faris in û em dixwazin ji bin rikêfa wan derkevin û rênûsa wan jî em naxwazin.

Her wiha bi xwendina bersivan derdikeve ku hinek fanatîzm di bersivan de heye ku dibêjin tenê bila yek zarava were bikaranîn. Xweşbextane ev yek fikra kêmîne ya hemwelatîyên kurd e, piranîya hemwelatîyên kurd dixwazin fêrî zaravayên kurdî yên cuda bibin yan jî qet nebe naxwazin zaravayên cuda bê par be ji nûçe û zanyarîyên bi zaravayê xwe. Ev rewş jî cihê kêfxweşî û serfirazîyê ye ku hişyarîya neteweyî ya gelê me li hember vê meseleyê heye û bi baldarî reftarê pê re dike. Em bi hêvî ne ku hemû kanalên medyayê li her çar parçeyên Kurdistanê rêya Rûdawê bigirine ber xwe, her wiha ji Rûdawê baştir bikarin hevsengîya navbera bikaranîna zaravayên kurdî biparêzin û bi kar bînin da ku sînorên cudakirî yên welatên cuda bandora wan li ser çêbûna zimanê jihevfamkirinê yê neteweya kurd nebe ku ew ziman jî zimanê rewan û şîrîn ê kurdî ye.

Encam

Tevî cîyawazîya di jimareya rûniştîyên parçeyên Kurdistanê –lê rêjeya beşdarbûnê ta radeyekê nêzîkî hev in- mebesta me gelê kurd ê li her çar parçeyên Kurdistana mezin bûye. Lewra rêjeya beşdaran ji hemû parçeyan nêzîkî hev in û em dikarin bêjin ku ev zanyarî giştgîr in û di dawîya vê lêkolînê de em gihîştin çend encaman ku yên herî girîng ev in:

1. Rêjeyeke berbiçav bi rêya kanalên kurdî sûdmend in ji wergirtina zanyarîyan. Bi gotineke din teqrîben %70 ji beşdarên vê rapirsîyê temaşevanên kanalên kurdî ne. Dîyar e ku temaşevanên hemû kanalan hene lê belê bilindbûna her sê kanalên Rûdaw, Sahar Kurdish û TRT Kurdîyê

berbiçav e ku hemwelatîyên her çar parçeyên Kurdistanê bi rêjeyeke berbiçav li van kanalan temaşe dikin û li hêvîya nûçe û zanyarîyên wan in. Bi fikra min pirbûna nûçegihanên kanala Rûdawê li hemû bajarên girîng ên Kurdistana mezin û pirbûna bernameyên zindî li ser babetên girîng û aktuel vê rêjeya zêde dide kanala Rûdawê ku digihîje %36 di tevahîya gîştî ya beşdaran de.

2. Piranîya hemwelatîyên kurd li her çar parçeyên Kurdistanê zerûret dizanin ku em bibin xwedî zimanekî yekgirtî yan qet nebe hemû kurd li her ku dibe ji kurdekî din fam bike ku diaxive. Li gorî amaran derketîye ku %75 ji hemwelatîyên kurd dixwazin ku guhê wan li hemû zaravayên kurdî bin û şarezahîya wan hebe û hewla famkirinê didin. Ev yek jî zengek e ji bo hemû kanalên medyayê ku hemû zaravayan bi kar bînin û tu zaravayekî bi hinceta rêjeya axêveran feramoş nekin. Ji ber vê yekê divê haya me ji vê xalê gelek hebe û bi baldarî em danûstandinê pê re bikin da ku tu takekesekî kurd zaravayê xwe bi kêm nezane. Bi gotineke din hemû takekesên kurd xwe di nav kanalên medyayê de bibînin. Her wiha me pêwîstî pê heye ku kanalên asimanî yên taybet em damezirînin ku kar li ser zimanê kurdî û nêzîkkirina zaravayan bikin. Çunku dîyar e ku bandora kanalan li ser levnêzîkkirina zaravayan heye. Lewma bi raya min divê gelek girîngî bi vî alîyê bê dan. Her wiha li şûna lidarxistina panel û civînan yan dibe ku rêzefîlmek zêdetir bandorekê çêbike. Bi min panel, civîn û semîneran gelek kêm bandor li ser pêşveçûna ziman kirîye. Bi gotineke din medyaya nû bêyî ku hay jê hebe zimanê yekgirtî çêdike.
3. Di vê rapirsîyê de derdikeve ku bi rêjeya %56 bi dilê hemwelatîyên kurd e ku kanal rênûsa latînî bi kar bînin û bertekê nîşanî rênûsa aramî (erebî) didin. Bi gotineke din ew rênûsa ku li her du parçeyên Kurdistanê, rojhilat û başûr, tê xebitandin. Bi raya me ji ber ku miletên ereb û faris bi vê rênûsê dinivîsin, hemwelatîyên van her du parçeyan dixwazin bêjin ku em kurd in ne ereb û faris in û em dixwazin ji bin rikêfa wan derkevin û rênûsa wan jî em naxwazin. Bêzarîya hemwelatîyên hemû parçeyên Kurdistanê ji çanda erebî ku bi muhra dînî hatîye têkelkirin, wisa kirîye ku bêzarbûn di bikaranîna rênûsa aramî de biqewime ku bi rênûsa erebî navdar e. lewra em dibînin ku piranîya beşdaran li gel bikaranîna rênûsa latînî ne. Ji ber vê yekê bi raya min divê li ser vê babetê rawestan were kirin da ku ber bi bikaranîna rênûsa yekgirtî em biçin ku hemû parçeyên Kurdistanê bi kar bînin û li ser li hev bikin.
4. Bi raya piranîya beşdaran kanalên Rûdaw, Sahar Kurdish û TRT Kurdîyê bi bikaranîna her du zaravayên serekî bandoreke zêde li ser nêzîkkirina zaravayên kurdî yên serekî kirîye ku piranîya axêverên zimanê kurdî bi her du zaravayên kurmancîya jêrîn û kurmancîya jorî xeber didin. Di vê navberê de rêjeyeke zêde bi rêya kanalên medyayê fêrî kurmancîya jêrîn ango soranî bûne ku digihîje %28.

Ev yek jî nîşaneyek e ku tu zaravayek dijwar nîn e ji bo fêrbûnê. Çunku bingeha zimanê kurdî her yek e û piranîya peyvan dişibin hev, tenê fonetîka wan cuda ye. Her wiha derdikeve ku pêwîst e di siberojê de hemû kanalên kurdî hemû zaravayên kurdî bi kar bînin da ku xizmeta zimanê kurdî bikin. Tevî vê yekê ew hemwelatîyên ku fêrî zaravayekî din bûne gelek in. Lewra ev yek jî rêyekê nîşanî me dide da ku em bikarin geşe bi zimanê kurdî bidin û zaravayan fêr bibin. Ev rê jî bi rêya medyayê ye ku wek baştirîn kanala peywendîyê û levnêzîkkirina zaravaya

Çavkanî / References

Brown, G., & Yule, G. (1983). *Discourse Analysis.* Cambridge: Cambridge University Press.
el-Huseynî, D. E. (2005). *Fennu'l kitâbeti'l izaa we't-telefizyon.* Beyrut: Daru'l nehda-l 'Arabiyye.
el-Se'ran, D. M. (1963). *el-Lûġat we'l meuḫtemî': Ray we menhecu'l-İskenderiyye.* Kahire.
Esed, Ç. (2013). Silêmanî: Çapxaneya Kemal.
Eşref, D. E. (1971). *el-'İlam we lûġatu'l ḥadâre*. Lisânu'l Arabiyye, *11*(1), 247.
Eşref, D. E. (1979). *el-Madḫal ile wesaîli'l 'ilam.* Beyrut: Daru'l kitabi'l-binani.
Eşref, S., & Nîda, D. E. (2004). *el-Lûġatu'l 'ilamiyye: el-Mefâhim, el-Esâs, el-Tatbiḳât.* Kahire: Camia'tu'l Kahire.
Hemze, D. E. (1984). *el-'İlam we'd-daâya* (2 b.). Kahire.
Hîlal, D. M. (1989). *en-Naḳdu'l edebiyyeti'l ḥadis.* Kahire: Mektebet-u Nehzeti Misir.
Hilliar, R. L. (2008). *Writing for Television, Radio, and New Media.* Boston: Cengage Learning.
Lerner, D. (1958). *The Passing of Traditional Society: Modernizing the Middle East.* New York: The Free Press.
Louice, K. D. (1993). *et-Taḫtiyâtu'l aḫbâriye lî't-telefizyon.* Kahire: El-Mektebet el-Akademiye.
Löffler, H. (2006). *Dialekt und Standard im Medienzeitalter.* Mannheim: Dudenverlag.
Marif, D. E. (1986). *Nûsînî Kurdî be Elfûbêy Erebî.* Bexda: Çapxaneya Ela.
Mihemed, M. (1978). *Berew Rasteşeqamî Axawtinî Kurdî.* Bexda: Weşanên Kora Zanyarî ya Kurd.
Mihemed, M. (2011). *Ziman û Rênûsî Kurdî.* Hewlêr: Weşanxaneya Aras.
Nebez, C. (1976). *Zimanî Yekgirtûy Kurdî.* Almanya: Weşanên Yekîtîya Xwendekarên Kurd li Ewropayê.
Ridênî, W. H. (2011). *Radyo û Telefizyonêt Kurdî: 1939-2003.* Dihok: Çapxaneya Zana.
Selman, D. E. (2011). el-Farabî we arauhû el-leġeviye fî kitâbi'l ḥurûf. *el-Mevrûd, 18*(1), 114.
Sleman, P. D. (1998). *The Category of Anteriority.* Chisinau.
Şeref, D. E. (1989). *Wesâilu'l 'ilam we lûġatu'l ḥidara.* Kahire: Müessesatu'l muḫta lî neşr ve't-tevzi.

Kurdiname Akademik
Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jiyan û Hunera *Kilamcî* Elî Dore

(Between Tradition and Technology: The Life and Art of the *Kilamci* Elî Dore)

(Gelenek ile Teknoloji Arasında: *Kilamci* Elî Dore'nin Hayatı ve Sanatı)

Sevim HATUN SÜRÜCÜ •

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatin: 20.08.2024
Accepted // Pejirandin: 17.10.2024
Published // Weşandin: 29.11.2024
Pages // Rûpel: 75-95
DOI: 10.55106/kurdiname.1536260

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/

Citation/Atif: Hatun Sürücü, Sevim, Di Navbera Nerît û Teknolojiyê da: Jiyan û Hunera Kilamcî Elî Dore, 2024, *Kurdiname*, 11, r. 75-95

Plagiarism/Întîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Çanda devkî, bîra hevpar a civakê ye, ev bîra civakî di merhaleyên dirêj da ava dibe û bi saya serê îcrakarên devkî tê parastin. Bi taybetî di nav wan civakên ku çanda wan a nivîskî zêde pêş neketiye, erf û edet û herwiha qewamên civakî û dîrokî sing bi sing tên veguhastin. Di edebiyata kurdî ya devkî de hilgirên vê peywirê, bi navên xwe yên cuda dengbêj, sazbend, kilamcî, beytbêj û aşiq dertên pêşberî me. Çanda devkî di gelek merheleyan ra derbas dibe û bi demê ra vegêr û vegêran jî ji guherînên demî û civakî muesir dibin, herwisa bi îcrakariyên nû ra vediguhere û berdewam dike. Bi pêşketina alavên teknolojiyê ra, çanda devkî ya ku bi têkiliya hoste-şagirt va bi rengekî adetî dewam dikir, rastî guherînên mezin hatin û vê yekê diyardeyên nû di vê çandê de peyda kirin. Elî Dore jî yek ji nûnerê vê çandê ye. Ev xebat ku xwe dispêre hevpeyvînên qadê, di çarçoveya çanda devkî ya herêma Berferatê da, bala xwe dide jiyan û berhemên Elî Dore. Di vê çarçoveyê da xebat, li ser jiyan, çavkaniyên wî yên çanda devkî û afirîneriya wî hûr dibe. Bi vê armancê kilamên aidî wî û kilamên li ser daxwazên cimaetê hatine amadekirin tên destnîşankirin. Herwiha, tevî beşek piçûk ji Dewrêşê Ewdî hinek kilamên wî û bi taybetî jî kilama wî ya bi nave Weqasê Gundê Kiligê wek mînak hatine dayîn.

Peyvên Sereke: Folklor, Edebiyata Devkî, Elî Dore, Kilam, Semsûr.

Abstract

Oral culture is the collective memory of society, formed over lengthy periods and preserved through key oral transmitters. Particularly in societies with underdeveloped written cultures, traditions, customs, social values, and historical narratives are passed down individually. In Kurdish oral literature, those who uphold this cultural heritage are identified by various titles, such as dengbêj, stranbêj, kilamci, beytbêj and şair. Oral culture undergoes multiple phases, adapting to temporal and social changes while maintaining continuity with new practices. With the advent of technological advancements, the traditional master-disciple dynamic within oral culture experienced significant transformations, introducing new elements to this culture. Elî Dore is a notable representative of this tradition. This work, based on field interviews, examines the life and contributions of Elî Dore within the oral culture of the Berferat region. It examines his life, sources of oral poetry, and creative output. To this end, it documents community-related anecdotes and compositions associated with him. Additionally, it features several of his original poems, including the renowned kilam named "Waqasê Gundê Kiligê," along with an excerpt from Dewrêş Evdî.

•*Xwendekara doktorayê ya Ziman û Wêjeya Kurdî, Enstîtuya Zimanên Zindî, Zanîngeha Bîngolê,Turkiye, sewimhatun@gmail.com /// PhD student of Kurdish Language and Literature, Institute of Living Languages, University of Bingol, Turkiye,* ORCID: 0009-0008-9970-9242

Keywords: Folklore, Oral Literature, Elî Dore, Kilam, Semsûr.

Özet

Sözlü kültür toplumun ortak hafızasıdır, bu toplumsal hafıza uzun aşamalar halinde oluşur ve sözlü icra sayesinde korunur. Özellikle yazılı kültürün fazla gelişmediği toplumlarda gelenek ve göreneklerin yanı sıra sosyal ve tarihi değerler de birer birer bu yolla korunup aktarılmaktadır. Sözlü Kürt edebiyatında bu görevin taşıyıcıları farklı isimlerle; dengbêj, hozan/ozan, kilambêj, aşiq, kilamci, sazbend şeklinde karşımıza çıkar. Sözlü kültür birçok aşamadan geçerek toplumsal değişimlere uyum sağlamakta, değişip dönüşerek varlığını sürdürmektedir. Teknolojinin gelişmesiyle birlikte geleneksel bir şekilde usta-çırak ilişkisiyle aktarılan sözlü kültür, büyük değişimlere uğramış ve bu da bu kültürde yeni olguların ortaya çıkmasına neden olmuştur. Elî Dore bu kültürün önemli temsilcilerinden biridir. Saha görüşmelerine dayanan bu çalışma, Elî Dore'nin Berferat bölgesinin sözlü kültüründeki yerini ve katkılarını inceliyor. Çalışma Dore'nin yaşamını, kaynaklarını ve kendine ait eserleri ile birlikte ierisinde yaşadığı toplum isteği üzerine yazılan eseri inceleniyor. Ayrıca, "Waqasê Gundê Kiligê" adlı ünlü kilam da dahil olmak üzere orijinal şiirlerinden birkaçını ve Dewrêş Evdî'den bir alıntıyı içeriyor.

Anahtar Kelimeler: Folklor, Sözlü Edebiyat, Elî Dore, Kilam, Adıyaman.

DESTPÊK

Elî Dore, bi navê xwe yê di nasnameyê da Ali Korkmaz (j. 1952), yek ji kilambêjên serdemê yê herêma Berferatê[1] ye. Dore li ber pêsîra dayikek kilambêj û şair mezin dibe û piştî bîst saliya xwe ew jî kilaman dibêje. Ew him ji çanda hoste-şagirt sûd werdigre him jî ji teknolojiyê. Lewra ji aliyekê va guhê xwe dide kilamên diya xwe ji aliyê din va li cem Ema Sazbend perwerde dibe. Herwiha teknolojî derfetê dide ku Dore kilambêj û dengbêjên kurd Cemîl Horo, Elî Tico, Baqî Xido û aşiqên tirk Aşiq Mehzûnî Şerîf, Aşiq Gülabi û Elî Nûrşanî guhdarî bike û him bi Kurmancî him bi Tirkî bistrê. Ev jî rê dide ku kilambêjiya Dore ziman, çand û erdnigarıya lokal derbas bike, ew bibe kilambêjekî pirhêl û pirziman.

Li herêma Berferatê di nav da Elî Dore jî kilambêjên navdar yên weku Ema Sazbend, Remtaş, Hemsor, Mahmud Çinar, Ayzerî Hesenkî, Ûsivê Baronekî, Mehmed Canê Selem, Xefariyê Kor gihane. Dore, di nav çanda dengbêjiyê ya herêmê da bi pirhêlî û repertûara xwe ya fireh va navekî girîng e. Dore him di peywenda hoste-şagirt da gihaye him jî ji teknolojiyê sûd wergirtiye. Armanca vê xebatê ew e ku jiyan û kilambêjiya Dore lêbikole ku ew li herêma lokal baş tê naskirin, li ser mecrayên medyaya civakî jî navdar e û kilamên wî bi milyonan tê guhdarîkirin.

Ji bo pênasekirina hunera Dore termên weku "kilamcî[2], aşiq, sazbend û dengbêj" tên bikaranîn. Yek ji sedemên binavkirinên cuda bikaranîna enstrumanê ye. Bo nimûne, ji kilambêjên herêma Berferatê, Remtaş li ribabê dide; Hemsor, Ayzerî Hesenkî û Ûsivê Baronekî li tembûrê didin û wekî sazbend û kilambêj tên binavkirin. Lê belê hin kilambêjên li herêmê her çiqas li sazê nedin jî weku sazbend tên binavkirin. Yek ji wan Ema Xecê ye, herçiqas weku “Ema Sazbend” bi nav û deng bibe jî ew li sazê nade. Dîsa ji kilambêjên herêmê Dore ku îroroj li platformên dijîtal weku “dengbêj” tê anonskirin li gundê lê dimîne weku “kilamcî”, “aşiq” tê

[1] Ji ew bajar, bajarok û gundên ku dikevin hewzeya Çemê Feratê ra Berferat tê gotin. Bajarê Meletî, Elezîz, Semsûr û Efrînê dikevin vê hewzeyê û wekî Herêma Berferatê tê binavkirin.

[2] Peyva “kilamcî”yê ji peyva “kilam”ê ya kurmancî û ji paşgira “-cî”yê ya tirkî pêk hatiye ku ev paşgir ji tirkî rasterast derbasî kurmancî bûye û wan kesan nîşan dide ku wî karî dikin. Kilamcî ango kesê/kesa ku kilaman dibêje.

binavkirin (Dore, 2023). Dore dibêje ku berê jê ra digotin "*kilamciyê gundê me*". Bi gotina Dore, wî ev peyva "dengbêj"ê van salên dawîn, bi derketina ser ekranê ra hîn bûye (Dore, 2023). Ji ber ku Dore li herêma lokal wek "kilamcî" tê binavkirin, ew jî xwe wekî "kilamcî" bi nav dike, me jî di xebata xwe da ji bo binavkirina Dore terma "kilamcî" tercîh kir.

Îroroj jiyan û berhemên Dore bi hûrgilî nehatibin lêkolînkirin û nivîsandin jî kilamên wî li ser platformên medyaya civakî hatine belavkirin, bi taybetî "Kilama Weqasê Kiligê" bi milyonan tê guhdarîkirin (Ahuri Köyü, 2013; Klay Muzik, 2021; Ali Döre - Topic, 2023). Bernameyên televîzyonan bi Dore û Ema Sazbend ra hevpeyvîn çêkirine. Dore di van bernameyan da behsa jiyan û kilamên xwe dike û kilaman dibêje, Ema Sazbend jî him behsa jiyana xwe him jî behsa Dore dike (Köylünün Sesi Tv. PROGRAMI, 2023a; Köylünün Sesi Tv. PROGRAMI, 2023b).

Wekî li jorê jî hate behskirin, di lîteraturê de xebatên derbarê Dore da kêm in. Bi qasî me tesbît kir, di kovara *Nûbihar*ê da bi kurtasî behsa kilama "Şehîn"ê ya Dore tê kirin (Hesqera û Yoldaş, 2018). Axirî, vê dawiyê bi giştî li ser jiyan û sermiyana dengbêj û kilambêjan lêkolîn hatibin kirin jî (Güneş û Şahin, 2023; Güneş û Şahin, 2022; Aras, 2022; Güneş û Şahin, 2021; Delikaya û Ertekin 2021; Celîl û Celîl, 2013; Akyol, 2011a; Akyol, 2011b; Akyol, 2011c; Berbir, 2007) derbarê yên herêma Berferatê da û herwiha derbarê Elî Dore da kêm agahî hene. Digel wê, di çarçoveya xebatên li ser sazbendên herêmê da em dikarin bêjin ku di berhemên lêkolîner Barbara Sträuliyê da derbarê sazbendên li Deşta Sirûcê da agahî hene (Sträuli, 2017; Sträuli, 2021).

Ev xebata berdest xwe dispêre hevpeyvînên rûbirû yên sehayî ku bi Elî Dore ra, li Rihayê hatin kirin û ji vî alî va jî xwedî taybetiyeke xweser e. Ji bo nivîsandina jiyan, kilambêjî û berhemên Elî Dore ewil derbarê kilambêj da agahî hatin komkirin, piştra pirsên weku Elî Dore kî ye, çend salî ye, hosteyên wî kî ne, çend berhemên wî hene û hwd. hatin amadekirin. Ji bo hevpeyvîna rûbirû peywendî hat danîn. Agahiyên derbarê Dore da ewil hatin nivîsandin peyra hatin analîzkirin û di vê peywendê da jiyana wî hat nivîsandin. Ev xebat jiyan, kilambêjî û kilamên aidê wî, çêkirina kilaman, mexlas, bandora teknolojiyê, kilam û destanbêjiya Dore dihewîne.

1. Jiyana Elî Dore

Elî Dore an jî bi navê xwe yê di nasnameyê da "Ali Korkmaz", di sala 1952yê da li Çomaxê ji dayik bû. Navê diya wî Zeynep (Zeynê), navê bavê wî Duran e. Du bira û sê xwişk in, Dore mezinê xwişk û birayan e. Li gundê Çomaxê nişтecih e. Çomax gundekî navçeya Bêsnî/Behiştiya (Besni) Semsûrê ye. Zaroktî û ciwaniya wî li vir derbas dibe û herwiha hê jî li vê derê dimîne. Ew debara xwe bi çandiniyê dikin, milkê wan, bîrên wan hene û erdê xwe bi ava bîran av didin. Misir (gilgil), îsot, pembû, genim, ceh diçînin. Tu carî feqîrî nedîtine, her tim çandinî kirine û hê jî dikin (Dore, 2023).

Elî Dore nexwenda ye, weku wî behs kir li gundê wan wê demê dibistan tune ye. Dore, beriya ku here eskeriyê[3] dixwaze bizewice, ji bavê xwe ra dibêje min bizewicîne. Li gundê wan qîzxwestin, zewac piranî di nav eqrebayan da ye. Ji bo wî xwazgîni diçin qîza eqrebayekî wî,

[3] Leşkerî.

dergîstî dibin, lê paşê ev naçe serî, mala qîzikê gustîlê paşva vedigerînin. Peyra bi gotina Dore, bi qîzeka xerîb ra dizewice ku ev xanima wî Fatma Durmaz e. Ji vê zewacê lawek û şeş qîzên wî tên dinyayê.

Dore di sala 1972yê da diçe eskeriyê. Bîst mehan eskeriyê dike, nêzî terxîsê, "Herba Qibrîsê"[4] rû dide. Ji ber herbê, maweya terxîsê ya eskeriya Dore sê meh paşva dixin û sê meh dereng vedigere malê, di vê navberê da nikare xeberê bide malbata xwe ku ji ber herbê wê dereng vegere malê. Bavê wî wisa zen dike ku Elî şandine Qibrîsê herbê û ew di herbê da miriye, ji ber miraqan wefat dike. Dore, wextê ji me ra behsa vegera xwe ya ji eskeriyê kir kelogirî bû û got ku wî ji bavê xwe pir hez dikir û dewam kir:

> "Li Enqerê mi eskerî kir. Li Enqerê yetmîş dortê (1974) da Herba Qibris, Ecevît başbaqan/serokwezîr bû wê çaxê… Ez esker bûm li Enqerê, mi teskere sitand, go merin, go teskere tine, çito? Herba Qibrîs bûye go. Milet, hevalên mi gî ketin herbê zanî. Neyse li wê dera mi sê mehan teskere berda. Yanê bîst meh bûn, bîst meh şûnda tekrer mi eskerî kir. Sê mehan mi fazle kir. Bavê min pir meraq kir. Bavê min gotiye were ku Elî ketiye herbê, ê di herbê da Elî bikujin, were kuştibin, sê meha nehatime ya pir meraq kiriye" (Dore, 2023).

Wextê Elî vedigere gund, hîn dibe ku bavê wî wefat kiriye. Bavê wî ji Semsûrê dibin nexweşxaneya Entabê, meha remezanê ye, doxtor dibêje ku roviyên wî li hevdu piçikîne, ji hevdu venabin. Elî dibêje:

> "Ez ji eskeriyê hatim hevalekî min go keko ez çenteyê te dest bikim. Nav gund da terime çenteyê mi li bin çengê wî ye, here ba dayika min e mijdeyeka xwe jê bistîne. E çûm, dayika min ê devê qapî da westiya ye. Go tu hatî yawrim erê, ez sarilmîşê bûm. Go te eskeriya xwe xilas kir, mi go qedand. Go maşela maşela di ber ra girî da. Ber ra girî da meşiya çû. Ez ketime şopê mi go çirr bû, mi go xwengina min mirin, mi go doxrî bê El mir Fat mir?.. En sonî mi carkê dî ku boxça bavê min a kinca danî ber mi, go bavê te bîst ro ne ku wefat kiriye. A wê çaxê ez bîrva çûm…" (Dore, 2023).

Wextê Elî bi ser xwe va tê dibîne ku wî xistine nav cihekî û hemû gund li dora wî kom bûye. Wiha bi wefata bavê xwe dihese. Diya Elî, Zeynê jî di 84 saliya xwe da wefat dike. Ew ji bo diya xwe van gotinan dibêje:

> "Diya min pira bi aqil bû. Ellah rehmet eylesîn. 84 salên xwe dî mir. Wê deh û sê salan (sêzdeh sal) rojiyê sê mehan girtiye. Hîna qîzik bûye li malê bavê xwe da limêya xwe li wir kiriye. Pir dîndar bû" (Dore, 2023).

2. Kilambêjî û Kilamên Elî Dore

Kilamcî Elî Dore, li ber pêsîra du jinên ku kilam û helbestan dibêjin mezin dibe. Ji vana yek diya wî Zeynê ye ku "zêmar", bi gotina wî "kilamên şînê" gotine; ya din hevala diya wî Ema Xecê[5] (Ema Sazbend) ye ku wê jî Elî mêjandiye. Dore dibêje, "Ev dengbêjiya me ji damarê me va tê, ev qabîleta me ji dayikê tê." Ku mirov wextê bala xwe dide malbat û civata ku Dore lê mezin dibe, mirov baş serwext dibe ku di nav çanda kilambêjiyê da û li ber destên kilambêjan gihaye. Elî Dore bi xwe dibêje, "Dayika min diçû şîna, li ser her kesekî ne, mîna kesekî Malê Bozan Axa dereka belî, dayika min şîna wî dikir" (Dore, 2023).

---

[4] Bi tirkî: Kıbrıs Harekâtı. Komara Tirkiyeyê di sala 1974ê da leşkerên xwe şandiye Girava Qibrisê.

[5] Herçiqas Emê bi navê "Ema Sazbend" bê zanîn jî Dore weku Ema Xecê wê bi bîr dianî, me jî di xebata xwe da ev nav derxist pêş. Navê wê Emine Avşin e, di 1936ê da ji dayik bûye. Bi kilam û helbestên ku gotiye li herêmê deng daye. Di sala 2021ê da wefat kir.

Ema Xecê wê demê li gundê Hecxelîl[6] yê ser Besniyê rûdinişt. Emê carinan tê Çomaxê mala Elî. Îja li gor gotina Elî, Emê şîr daye wî.

> "Ew hatiye gund cem diya min. Ez jî li ber dê bûme. Diya min gotiye Êmê e nikarime vî lawikî têr bikime, tu nikarî hebkî şîrê xwe bi vê dî. Hînganê Êmê e rakirime mêjandime. Paşê gotiye şîrê min kete zikê wî ew jî dengbêj bû. Yanê min şîrê wê xwar a" (Dore, 2023).

Ev çûn û hatin dewam dike, carina Elî diçe gundê Emê carinan Emê tê dibe mêvana wan. Dore dibêje:

> "Êmê dihate gund. Va gunda gî diçû dorê rûdinişt. Dihat hema dest bi kilamên xwe dikir. Ji wan ra kilam digotin. Ê kilam bigotana bigotana... Dihate malê min, tema e jî sazbend bûm, mi kilam digotine ya. Nediçû malê kesî dinê" (Dore, 2023).

Kilambêjî berê bi têkiliya hoste-şagirt va dimeşiya. Ev peywend di navbera Emê û Elî da jî tê dîtin ku Elî bi xwe jî dibêje: "*Mamosta min Ema Xecêye*" (Dore, 2023). Him gotinên Elî him jî helbesta ku Emê li ser wî gotiye li ber çavan radixe ku di navbera wan herdu kilambêjan da, danûsitandineke xurt heye û ev hê jî dewam dike, lewra weku şagirdekî hê jî berhemên hosteya xwe vedigêre. Li gorî gotina lawê Emê yê bi navê Huseyno[7], Emê berî wefata xwe dibêje: "*Elî Dore barê me yê kilaman rakir. Ji Elî rindtir kes kilamên me nabêje*" (Dore, 2023). Giringiya helbesta navborî ew e ku Emê di dawiya her çarînê da peyva "ana"yê bi kar aniye ku wê, Elî weku lawê xwe qebûl kiriye û ev jî meseleya şîrdayina wê û peywendiya di navbera wan da piştrast dike. Ev helbesta li jêr ku Dore jê ra şiîr dibêje, têkiliya di navbera Êmê û Dore piştrast dike.

Şiîra ku Êmê li ser Elî Dore gotiye:

Mi gotiye **Elî** carekî bê were
Mehremetke carekî were
Çavên min bejnê te yê şîrîn keve
Zivistana min biye bihare

E te ber qapiyê xelkê diwînime
Mi da têne gurcê sar e
Elî sewê te der bi der e nayê mal e
A **Elî carkî ana** biwê

Diwêm min bana te kir ji wê da hatî
Law Elî mîna hîvekî tu li min helatî
Li vê dinyê soniya **Elî Dorê** ku natî
Elî sonî wê barke here ji vî welatî

[6] Gundê Hecxelîl (Hacıhalil) û Çomax (Çomak) cîran in, navbera wan 3,5 km e. Berê gundî peyatî ji gundê xwe çûne gundê cîran.
[7] Huseyno û Dore hevalên hevdu bûne.

A **Elî ana** biwê

Elî diwê bi ser çiya da bi ser çiya da

Guliyê morê têne bi ser piya da

Elî birê tê xewê xwe nayê di nav ciya da

Elî ana biwê[8] (Dore, 2023).

Weku ku li jorê jî hat behskirin, Dore li cem du jinên kilambêj mezin dibe; lêbelê heta bîst û du saliya xwe li tu derekê kilamekê nabêje. Piştî ji eskeriyê vedigere, ew û hevalekî xwe diçin daweteke li gundê cîran, lê heta digihên gund dawet belav dibe. Elî, li der û dora xwe dinêre kesekî nas tune, di nav xerîban da ye, ew bi xwe dibêje:

> "Li wir, min xwest ez kilaman bibêjim. Min piştê xwe da dîwêr min va kilama got, hin mirovên li wan derana rûniştine, hinganên wan bi min keniyan, hina jî bi min kire girî. Mîna ku li guca wan hat, li zora wan hat. Mînanî lawo van meriyan ewqasî kepeze bûn" (Dore, 2023).

Dore, kilama ewil "Ez Li Ber Dîwar im" li vê derê dibêje ku paşê navê vê kilamê dide kaseta ewil a ku tê weşandin.

2.1. Çêkirina Kilaman

Elî Dore yek ji wan kilambêjan e ku him ji bo îfadekirina hestên xwe hem jî ji bo êş û elema civata di nav da dijî kilam çêkirine. Kilama Weqasê Kiligê yek ji wan kilaman e. Bi çîroka vê kilamê ra, li ber çavan tê raxistin ku kilambêjek li ser meseleyekê kilaman çawa çêdike, gel çawa diçe jê daxwaza çêkirina kilaman dike, herwiha bûyerên ku di nav gel da olan didin li ser kilambêjan çawa bandor dikin. Wextê yek ji Dore dixwaze ku li ser kesekê/kesekî an qewamekê kilamek çêbike, ji wan hin tiştên derbarê qewamê da, yên weku nav, bûyer, cih, wext û hwd. pirsan dike û van agahiyan di bîra xwe da bi cih dike û paşê dike kilam. Dore dibêje:

> "Meriyekî bana min dike, min dike mêvan li malê xwe. Yanê Elah başa vermesin tabi ki, ya bir deprem de ya bir qezede ya bir trafîk qezasin de ya bi qansêr de gitmîş gençtir. Ez defterê didime pêşîyê xwe, yazî dikim dikim dikim... A li ser wî merîyî, anlatmîşê min dike tabî dibê min hanî kir, min bir xestexanê Entabê nebû min bir ya Enqerê, pênc sale me çare nedî... Tabî min qarşî yazmiş kiriye bira va ye, dê va ye, xweng va ye, ê ku miriye jî navê xwe va ye, kîjan mezelî... Dibên hela hela va merî bi vî merî ra geriyaye ya kiriye kilam e." (Dore, 2023).

Helbet kilambêj li ser her kes û qewaman kilaman çênakin. Dore, derheqê vê mijarê da dibêje:

> "Yanê ez ne mecbûr im, ez radikim ku li xweşî min neyê e nabêm. Yanê ez ne mecbûr im. Were hikmê pera jî e nawêm. Ê mîna Bozan Axa, Weqasê Kiligê ku derake belî ne, mi gotiye. Tabî kî ev çiqas xweş biye ku mi gotiye, kok û binyati belî, kokenegî belî. Ema mêrikê ku heq nekiriye e li ser nawêm, deh milyara bidine mi jî dîsa e nawêm" (Dore, 2023).

[8] Ema Xecê ev helbest li ser Elî Dore gotiye (Elî Dore jê ra dibîje şi'îr).

2.2. Mexlesa Dore

Di çanda kilambêjiya kurdî da bikaranîna mexlesan berbelav nîne, piranî bi navê dê an bavê xwe hatine nasîn weku Ema Xecê. Lê Dore ji xwe ra mexlas çêkiriye. Ali Korkmaz yanî Elî Dore navê bavê xwe Duran ji xwe ra kiriye bernav. Ewil Duran e, "Duran" bi demê ra dibe "Dore/Dure/Durê/Durre" û bi navê "Elî Dore" navdar dibe û di nav gel da bi vî navî tê naskirin.

2.3. Bandora Teknolojiyê li ser Kilambêjiya Dore

Teknolojiyê hin aliyên xweş ên weku şevbuhêrk, avêtina ber hevdu, çanda hoste-şagirt ku ji bo gihandina nûner û îcrakirina çanda devkî giring in, ji holê rakiribe jî gelek derfetên din bi xwe ra anîne. Bo nimûne, teknolojiyê derfet daye ku kilambêjên kurd kilambêj/aşiqên tirk ên li coxrafyaya ku lê dijîn nas bikin, guhdarî bikin û kilamên wan veguhêzin. Herwiha, derfet daye ku kilambêjeke/î kurd a/ê li derweyî welêt guhdarî bike, wê/wî weku hoste ji xwe ra hilbijêre û berhemên wê/wî veguhêze, "*Meriv dikare bibêje ku teknolojî di perwerdehiya dengbêjan da roleke berbiçav lîstiye û bûye pireke veguhastin û dewamdariya kilaman ji nifşekê ji bo nifşeke din*" (Delikaya, 2023: 384). Elî Dore yek ji wan kilambêjan e ku ji aliyekî va dengbêjên kurd ên li welatên din, ji aliyekî va jî aşiqên tirk guhdarî dike û kilamên wan vediguhêze. Ji aliyekî va behsa Cemîl Horo (1934-1989), Elî Tîco (1930-2012) û Baqî Xido (1913-2009) ku li Sûriyeyê ne, ji aliyê din va jî behsa Seyfettin Sucu, Mehzûnî Şerîf, Aşiq Gulabi, Elî Nûrşanî, İzzet Altınmeşe û Îzollu Memet dike ku bi tirkî distrên.

Ev taybetî nîşan didin ku Dore him ji çanda hoste-şagirt sûd wergirtiye him jî ji teknolojiyê; kilambêjekî pirhêl û pirziman e, ji aliyekî va guhê wî li ser kaset û bandên dengbêjên kurd e (Cemîl Horo, Elî Tico, Baqî Xido û hwd.), ji aliyê din va guhê wî li ser aşiqên tirk e (Aşiq Mehzûnî Şerîf, Aşiq Gülabi, Elî Nûrşanî û hwd.). Dore, hunera xwe bi ziman, çand û coxrafyayê sînor nake; guhê xwe dide deng, ziman, çand û coxrafyayên cuda, kilamên ku li ser hest û giyanê wî bandor dikin dike malê xwe. Elî Dore ji hin aliyan va dişibe Mihemed Elî Tico (1950-2012). Lewra Dore jî weku Elî Tico li cem diya xwe hînî kilaman dibe, kilamên kurt distrê. Tico bi kurdî, erebî û tirkî zanibûye ku ev hiştiye zêdetir hunermendên kurd ên li aliyê Tirkiyeyê nas bike. Bi taybetî stran û meqamên devera Entabê hîn bibe (Yaş, 2016: 47). Dore dibêje:

> "Ez tirkî jî dibêjim, kilamên tirkî ne yên min in yên xelkê ne. Ez Seyfettin Sucu pir hez dikim. Kilama wî ya 'Ağrıyor Başım Damla Damla Gözyaşım' ev min van nêzîkana go. Ê Mehzûnî Şerîf 'Değme Tebib Yaralarım Sızlıyor'. Ez Aşiq Gülabi pir hez dikim, min ê wî digotin. Elî Nûrşanî, min kilamê wî digo, hez dikim biwêm, diwêm jî" (Dore, 2023).

Dore him kilamên hosteya xwe "Kilama Bûkê" ku ya Êma Xecê ye, him jî kilamên kilambêjên ku guhdarî kirine straye weku "Sênca Gula" ya Cemîl Horo. Herwiha, Dore him kilam jixweber gotine him jî yên hosteyên xwe gotine. Digel kilaman helbest û destan jî gotine ku ev pirhêliya wî nîşan dide.

2.4. Kilamên Dore

Elî Dore him bixwe him digel hosteya xwe û kilambêjên din kilaman çêdike û kilamên kilambêjên din jî vedigêre. Kilamên "Li Ber Dîwar im, Hesen Lawo, Yazma Serê Te Hêşîn e, Defaka li Gundê We Lêdikevê, Bajarê Adiyamanê Bişewite Çîmilî Têda, Berfek Li Min Barî (Sê ro û sê şeva li min venekir), Entab (Makînê Xalo Tê Giran Giran e), Erdhej" û hwd. kilamên

xweser ên Dore ne. Kilama “Sênca Gula” ya Cemîl Horo, kilama "Bûkê" ya Ema Xecê û kilama “Xelo Lawo” ya diya Ema Xecê ye. Kilama “Weqasê Kiligê/Weqasê Gundê Kilikê” digel Huseyno çêkiriye, lêbelê Huseyno kilam daye Dore. Dore dibêje:

> “Tatlîses bi ayaxinde qundere bû Tatlîses, mi go Letif Doxan bi Kustimê bû Latif Doxan, mi go Îzollu Mehmet şitileka xwe derxist go lêv şitila min ê bi wê menşûr bû. Mi go Elî Durê jî bi Weqasê Gundê Kilikê menşûr bû. Îlk deng kete wê kilamê. Ez bi wê meşhûr bûm, bûme Elî Dore” (Dore, 2023).

2.4.1. Kilama “Ezi Bardiwarim e”

Lê lê min go defeka li gundê we ooo woo ooo

Lê lê lêdikevê êêê

Lêlê te ma Elî mîna mêrikê dîno devê xwe dide rê yo oo hooo

Lê zalimê terime nîvê şevê êêê

Lê lê e digerime li vê govendê êêê

Lê li wê dîlanê êêê

Lê çavê mino xelkê minê kî vaaa

Defê govendê lê nakevêêê

Ez na ku da herimmm

Ez xerîbê vî welatîîî

Şev im va tê nîvê şevêêê

Lê serê Elî balifa yastixaaa

Lê orxinê qe nagireeeêêê

Wê de were wereee were were eee

Lê bakî tê yooo çi bakî sar e

Min go belkê çavê mino li te keve eee

Bejna te ya şêrîno ooo

Lê ta kîbar eee eee

(...)[9] lê (...)[10] tirba pozê mezela aaa

Lê qizim çi bikim axa sar eee

De were were were were

[9] Nehat famkirin.
[10] Nehat famkirin.

Lê lê kîbarê min têr nedîîîî

De were were were were

Lê lê kîbarê min têr nedîîîî (Dore, 2023).

Qasî ku ji axaftina Elî Dore hat famkirin, ev meseleyeke evînî ye û ev kilam kilameke evînî ye û jixweber (*doğaçlama*) dibêje. Elî Dore nexwest li ser vê meseleyê biaxive, ji ber vê yekê ne navê gund da ne jî got ku ew daweta kê bû ye (lê qasî ku me fam kir, ev daweta dergistiya wî ya ewil bûye), bi hestewarî behsa wê rojê kir, got em heta gihan gund dereng bû, hew mi dî hevalê min got ku bûk bi rê kirin. Dilê min bi halê min şewitî min ev kilam got:

> "Min wer nihêrî kî hin dikine girî hin jî dikenine, biwên xêr e va çi mesele ye. Va kilama hin mi li wanê got û e li wê şûn da min kilam gotin. Berê min hin caran hê kilam negotibûn… Wê çaxê dilê min bi min şewîtî. Niha dilê yekî şewitî tek kilam nizabe dîsa wê yeka xwe biwê. Ez wextê vê kilamê xwe diwêm girî bi çavên mi dikeve" (Dore, 2023).

Elî, ji vir kor û poşman vedigere welatê xwe, li vir jê dipirsin ku wê şevê li ku derê bû, li ku derê ma? Behsa serpêhatiya xwe nake. Ji vir şûnda êdî kilaman distre. Paşê jê ra dibêjin were em grûbekê ava bikin (Dore, 2023).

Dore, digel hevalên xwe Huseyîn, Fadil û Şêx Mihemed grûbeke bi navê "Elî Dore Grubu" ava dikin. 15 salan bi hev du ra dibêjin, diçin dawetan, gund bi gund, dawet bi dawet digerin. Hevalên wî sazbend in, ew jî kilambêjê grûbê ye. Heta carcaran weku sazbend tê binavkirin lê li gorî gotina wî tu carî li sazê nedaye û nizane lêde jî. Piştî ku ev kom belav dibe jî Dore dewam dike. Di sala 1987ê da li mala kekê Bekir dibêje û qeyd dikin, ev banda wî ya ewil a nefermî ye. Dûra di sala 1992yê da li Entabê li fîrmayekê kaseta ewil a fermî tijî dike. Di vê kasetê da şeş kilam hene, sisêyên wan li aliyekî, sisê jî li aliyê din ê kasetê ne. Navê kasetê "Ez Li Ber Dîwar im" e (Dore, 2023).

2.4.2. Kilama "Weqasê Gundê Kiligê"

Her kilam li ser qewamekê tê çêkirin. Kilama "Waqasê Kiligê" kilama serpêhatiya Waqasê 33 salî ye ku ji ber qansêrê wefat dike. Di nav gelê herêma Berferatê da ev bûyer weku serpêhatiyekê tê vegotin. Dore, behsa qewamê kir.

> "Wextê ku va bi vê kulê xirab diveke, kulê qansêrê. Wê çaxê salê xwe sû û sisê ne. Pismamê xwe ye dotmam e. Ê Elah yardim ke, zarok jî tine ne. Koracaxa wan e ware winda ne. Ê radikine diwine bajarê Enqere ye. Qawişê ku lê *dorduncu* qawiş e. Qawişa çar a ye. Ê hînganê dotmam dere ser e, bi tenê ye, riya nizane, xerîw e, dike girî e. Diwê ez hatime bajarê Enqerê, Enqere serî xwediya bixwe ecaba va kîjan qawîş e, kîjan xestexane ye. Xestexanê Weqas jê ra diwêne, va dere... Jê ra qapî dorduncu qawişê vedikin. Ê kula xerab e, li bejnê hatiye, zeîf biye, çavên wî ketina kendêlan nas nekiriye. Gotiye tu Weqas bi xwe yî, gotiye erê. Gotiye malê min ji te ra bişewite, ez hatime ser te. Weqas çavên xwe vedike dinêre ku dotmam e. Diwê dotmam bigrî bigrî kulê min a xeraw e. Diwê li ezîxana îlacê min nate dînê, diwê aperotora dixtora kulê te qansêr e. Bavekî min li min şûnda ma ye, heftê sal e heştê sal e. Piştê xwe da dîwêr e diwê de'wê min qediya. Dotman diwê de rake em herin mal. Diwê gundê Kiligê palê xwe kirine, (wê çaxê pale hebûn). Riya mixtarê xwe dipê ne, him mixtarê gundî tu, rake em herin mal. Diwê dotmam di vî halî da min nebe malê. Nivî gundê dost e, nivî min ra neyar e, min newe mal. Ji min ra tirbekî bikole li pozê mezelî xerîwa, mi bide axa sar û here mal. Ê diwê wextê ku li te pirs kirin gotin tu hatî malê dotmam ka pismam li ku ye lê? Diwê hînganê biwê min da axê sarî li welatê xerîba ez hatime malê. Va kilama bi vê biçimê ye... De ne dar e, ne dergûş e, bermaliya heft salan e..." (Dore, 2023).

Ji ber ku di nav miletê da ev kilam weku kilameke "bêyom" tê qebûlkirin, xwediyên mala ku Elî Dore lê mêvan bû destûr nedan ku ev kilam li mala wan bê vegêran. Dore, piştî ku behsa çîroka kilamê kir got: "*Elî Dore bi vê kilamê pir meşhûr bû, Elî Dore bi vê kilamê pir xemgîn bû*" (Dore, 2023).

2.4.3. Kilama "Bûkê"

Kilama "Bûkê" ya Elî Dore distrê ya Ema Xecê ye. Weku ku tê zanîn di çanda kilambêjiyê da ji nû va vegêrana kilamên hosteyan, xwediyê cihekî girîng e ku Dore jî kilamên Xecê distrê û helbestên wê dixwîne. Piraniya kilaman piştî qewamekê hatine honandin ku kilama "Bûkê" jî yek ji wan kilaman e. Elî Dore derbarê kilamê da got

> "Êmê digo, mîvanek hatiye li min bûye mîvan e, mi go keko ti ji kî derêyî, go ez ji Bazarcixê me. Ê mi go ti hênî gêncî, va diranê te xêre tine ne? Lê go ku Êmê, ana min, diranê min li qapî xelkê ne. Bûkeke li min hez kir gotiye, mi tew hay ji xwe tine biye. Gotiye wê bûkê diran devê min da nehiştin. Ê gotiye nevê te çi ye? Ê gotiye nevê min Mistefeya, mi ra diwêne Mistiko. Ez î Bazarcixî me. Mi go Mistiko çito bûkê li te hez kir, lê gotiye mi tew hay ji xwe tine bû, bûkê ji mi hez kir, gotiye mi li ser bûkê kilamek go, gotiye Êmê e ji te ra wê kilamê ser bûkû biwêm. Ê gotiye biwê..." (Dore, 2023).

Kilama Bûkê:

Lê bûkê şar li serî te didine

Bûkê yeka serî yeka li ser û yeka li bin e

Bûkê rakir dev deq kir xwe (...)[11]

Lê bûkê te ma wele e çi zanime dilê te î li min e lê

Te dostê min î lê kirî dijmin e

Talê min û te ra Xwedê û ker û xweyî zalim e

De lê lê lê de lê lê lêlê de lêlê lê lê bûkê lêlê

Lê lê bûkê gundê me o gundekî firk e

Tema nîvî xwe Ereb e nîvî Tirk e

Lêlê bûkê were vê zivistanê yarê li min sewir ke

De lê lê lê de lê lê lêlê de lêlê lê lê bûkê lêlê

De lê lê lê de lê lê ji xelk û 'alemê giya rindtirê bûkê lê lê

Bûkê mi xwewnek dîwû ji xwe te ra ji xwe û te ra

Bûkê mi xwewnek dîwû îşev ji xwe te ra

Lê lê dilê min î bi keder û bi delga ra

Dalga minê bi dora dilê te ra dilî te ra

Bûkê qederê te ji berê da reş e

Mîna mangê golik (...)[12]

Lê yarê post di ber da

[11] Peyvek nehat fêmkirin.
[12] Peyvek nehat fêmkirin.

Wey de lê lê lê lê bûkê lê lê

Wey de lê lê lê lê rindê lê lê

Bûkê were ez û te va herin navî reza navî baxa

Me gilî û gazincê xwe kirin zikê xwewa va

Lêlê bûkê ti yê min î lo wele ez yê te me

Wele li te înan nakim wele berdîlkî min tune ye

Weylê delêlê delê lê lê lê bûkê lê lêêê (Hevpeyvîn, 2023).

2.4.4. Kilama "Şahînê Min"

Elî Dore dibêje ku ev kilama ku li herêm û ser mecrayên teknolojîk berbelav e, wî digel Ema Sazbend çêkiriye (Hesqera û Yoldaş, 2018: 78-9). Ev serpêhatiya Şahînê Ûsivê Bêzkî li hêla Semsûrê, navçeya Bêsniyê û Arebana qeza Entabê, sed sal berî niha qewimiye.

De bê ro helato, mehkûmê mi(n) li yanî yanî

Sewqê da kor-**Semsûr**ê, bajarê **Adiyaman**ê

Ezê bi diyarê bajarê şewtî ketim,

Nalîna nexweşekkî derd girano

Li qapiyê ezaewî, li binê hepisxanê

Çavê **Şahînê min** ê li rêyan e, rêya tayînê, (Hesqera û Yoldaş, 2018: 78-9).

2.5. Destanbêjî

Destan ew cure ye ku him dirêj in him jî îcraya wan zehmet e, ji ber van taybetiyan tenê dengbêjên hoste dikarin vegêrin (Kardaş, 2017: 30-1). Elî Dore ku zêdetir bi kilamên xwe yên di nav gel da tê naskirin, hin qismên destana Dewrêşê Evdî zane (Dore, 2023). Dore dibêje ku wextê biçûk bûye diya wî Memê Alan jê ra gotiye, "*Cemîl Horo, Memê Alan pir xweş digo, diya mi digo ez te ra Memê biwême. Ev kilama Memê ji bapîrê me da tê ye. Ez Dewrêşê Evdî diwême*" (Dore, 2023).

Delaaalê min ay delala delalê min ay delal delalê min ay delal

E nemînin lo lo delalo e ji te ra qe nemînim

Ezê pey te va tu dema tu dewrana negerînim

Pê birîndarê qurşînê va negerînim way delal

Delalê min siwar bû li derê mala bavê min peya bû

Lo kekê delalê min siwar bû li derê mala bavê min peya bû" (Dore, 2023).

Encam

Di encama vê xebatê da derket holê ku Elî Dore yek ji kilambêjên pirhêl û pirziman ê herêma Berferate ye, li herêma lokal û li ser mecrayên teknolojiyê tê naskirin. Dore him di peywenda hoste-şagirt a qedîm da perwerde bûye him jî ji kaset, radyo, televîzyon û mecrayên teknolojiyê yên din sûd wergirtiye. Ji ber vê taybetiyê Dore dikare di navbera çanda kevneşopî ya dengbêjiyê û dijîtalbûnê da weku pirekê bê qebûlkirin.

Jixwebergotin nîşaneya behrewaniya kilambêjan e. Elî Dore bi xwe kilam çêkirine (Serê Te Hêşîn e, Ez li Ber Dîwar im), kilamên hosteya (Bûkê, Şahînê Min) xwe û kilambêjên din (Cemîl Horo - Sênca Gula) vegêraye. Ew kilambêj, stranbêj, aşiq û şairên serdema xwe nas dike ku digel Ema Sazbend, İzollu Memet, Kidişli Cimo, Hüseyin Ekinci, Mehmet Reşat Kaçan kilam gotine.

Kana afirîneriya Dore hestên wî yên şexsî, bûyerên civakî û siruştî ne. Mijarên sereke yên kilamên Elî Dore, hezkirin û zewaca bêdil e, lê belê li ser babetên jiyana rojane ku li ser civakê bandor kirine bi xwe yan li ser daxwazê kilam çêkirine. Kilama “Ez li Ber Dîwar im” li ser hezkirin û miraznekirinê ye ku Dore wextê hevpeyvînê behs kiribû ku ji ber hin sedemên civakî nikaribûye bi hezkiriya xwe ra bizewice. Kilama “Weqasê Kiligê” li ser ciwanekî sî û sê salî ku bi nexweşiya pençeşêrê dikeve û dimre, li ser daxwazê hatiye çêkirin. Dîsa kilama “Şahînê Min” li ser kuştin û qaçaxçîtiyê, destana “Dewrêşê Evdî” li ser evîn û qehremaniyê ye.

Zimanê Dore sade, fêmbar û herikbar e. Weku her kilambêjî Dorê zimanê serdemê yê civaka ku di nav da dijî bi kar tîne. Zimanê Elî Dore devoka herêma Berferatê ye. Hema hema di hemû berhemên bernivîsandî (Kilama Li Ber Dîwar im, Weqasê Kiligê, Kilama Bûkê, qismek ji Dewrêşê Evdî û kilama Şahinê Min) da xisûsiyetên devokê tên dîtin. Dore di şûna tîpa "b"yê da tîpa "w"yê bi kar tîne (dibîne-diwîne, dibêm-diwêm, sebê-sewê û hwd.); di kilamên wî da peyvên tirkî hene (qapî, qizim, bûyrin û hwd.); hin peyvên ku li herêma Berferatê tên bikaranîn ên weku “hinganê, hina” bi kart îne.

Dore îroroj digel dawet û sinetan li mecrayên medyaya civakî yên weku YouTubeyê, li kanalên televîzyonê yên wek TRTKurdî, Gtv, Mercanê derdikeve ser dikê, digel sazbend û orkestrayê hunera xwe îcra dike.

Pêvek

Kilama Weqasê (Gundê) Kilig(k)ê

Felekêêê dotmama ronedîîî

Çavê (...)[13] ban kir

Go were lo lo lo lo lo lolo

Bi gêncî westiyayo ji hevalo mayo

Bê îlac û bê dermano serî dotmamê xwe qurbawo pismamo lawooo

De were lo lo looo

Mi go de dêr e lawo westiyayê de dêr eee

Xwudanê kula qansêrê de dêr eee

Tayê bi tenê min de dêr eee

Dotman bi qurbawo de dêr eee

Feratê Bîrecikêêê qetlemê barê çiqasî sar e weku kêr e

Gundê Kiligê mi ti ro lê nedî ser berjêrî li berwêrî

Go mafî vî kurî were bajarê Bîrecika şewitî serî darî têl e

Li bajarê Enqerê li qapî dorduncu qawişê

Halê xirab da xwedanê kula qansêrê î dinale nizame ku xêr e

De were lo lo lo lolo lo lolo lo de were lo lo

Mi go bi gêncî westiyayo ji hevalo mayo bê îlac û bê dermano serî dotmamê xwe qurba

Pismamo lawooo de were lo lo

Siwedaaa li berî berbangêêê

Li dore dorê cotkariya li hewa hewa seydvaniya li kile kila dewkula

Min devî xwe geranda li bajarê Enqerê

Lo ez xerîw im ez xerîw im

Rê û baniya nizameeeee mi gulî gulî mi çav hêsirî

Mi ro nedîîî

Ela bîn bajarê Enqerê serê xwediya bixwî

Ozel xestexana xwe kîjan ji van e

Teker teker çûme destê bêlik û xedem û doxtora

Mi ra vekirin qapiyê dordunci qawişê

Di halê xeraw da doşeka hêsîr da

Mi rakire çarşefê nexweşê teqilê çavê reşê ketine kendêl e

[13] Peyvek nehat fêmkirin.

Go de bigrîîî bigrî bigrî dotmam bigrîîî
Pismam bi qurbanê bigrîîî
Bi gotinê doktor operator go kulê te kemîk werem e qansêr e
Go mi heftê salî şûnda bavê extiyarê piştê daye dîwêr e
Ezxana îlacê min natebînin go kulê te kemîk werem û qansêreee
Lo go de rawe de rawe ku em herînî mal e de rabe ku em herînî mal e
Xerîbo rawe ku em herînî mal e
Gundî koylî palê xwe kirine şixrê xwe kişandine riya begî xwe dipêne
Go were di vî halî da mi mewe mal e
Xwedanê kula qansêrê bi xwe ra mewe
Bejnê zirava kêlekê demançê dilê qelema zendê saeta
Li pozê mezelê xerîwa bide weşar û kendêla here male de were lo lo lolo lo
Bi gêncî westiyayo ji hevalo mao
Bê îlac û bê dermano
Axx dotmam bi qurbaaa wooo
Go ezê çiyayê Qizildaxê ketim çiya lêlandiii wele li çiya lêlandin
Li boxazê Çeneqelê Fîsê Maxosê teskeraciya teskera xwe sitandin
Nexweşa nema li binê xestexanê îlacê xwe dînî
Law kur û kulfetê gêndî vegerandin
Çima tayê bi tenê li bînî xestexanê xu û apê xwe terikandiiinnn
Mi go hevalê mi (...)[14] xelqê
Te darê bêşîka ji kêfa dilê xwe ra
Gerdanê xeliyayî berdayî ser darê bêşîka
Bêşîkê xweyî dilorandin dimêjandin
Mi ne dar e ne dergûş e
Bermaliya te ya heft sala me
Çar odê kilîd in Şêxoyê extiyar e
Min li heftê salî bi şûnda bavê extiyara pişte daye dîwêr e
Min hêstirkê xwînê di ser hev da dibarandin
De were lo lo lo lo lo lo lo lolo lo lolo lo de were lo lo lo
Bi gêncî westiyayo ax ji hevala maooo

Kilama "Şahînê Min"

De bê ro helato, mehkûmê mi(n) li yanî yanî

[14] Peyvek nehat fêmkirin.

Sewqê da kor-Semsûrê, bajarê Adiyamanê
Ezê bi diyarê bajarê şewtî ketim,
Nalîna nexweşekkî derd girano
Li qapiyê ezaewî, li binê hepisxanê
Çavê Şahînê min ê li rêyan e, rêya tayînê,
Kevçiya qerewanê
Hikûmeta şewitî sê emîr tewqîf danê
Tekrar rakirine birine xestexanê
Go "va nelînexşa peyê ku derê ye?
Go, çavê dayika wî birjin,
Va Mehkûmê Deşta Arebanê..."
Menal menal menal... halê min girano...
Mena menal lo, ma dayika te binale...
De bê li yan e, li yan e mehkûmê mi li yan e,
Li ser Şahînê min î bilmezo, têlek dane
Bê 'Ewê Malê 'Ewê Husê Bekê' bertîl dane
Çima gi(şt) yê (li) tala Şahînê mi ra bê bext û bê ûcdan e
Şahînêm kirne qula Şikefta Gazê
Bîst û çar saetan (ji) xwe ra ar dadane...
Mi go "M(ey)ê der, m(ey)ê der, m(ey)ê der
Şahînêm m(ey)ê der, qarşiya ye şêniyê çar gundan e
Îmdadê bixwaze (ji) Ûsivê Bezkî
Devê devenîşana cendirm(ey)an e...
Mi go de banî banî, lo bêkeso banî
Mi go belkî Mala Hûsê Bekê, koma dijmin lê rast anî
Te dî Çiyayê Qizildaxê dengê sîlehan dinê tev hilanî
Mi go belkî heft sala şûnda heyfa bavikê xwe hilanî
Ê lê Zeynewê çavê te nemînin...
Dibê ji pî jê kirin, anîn teslîm kirin filînta Alemanî...
De bê ez nemînim, ez nemînim lo te recalî...
Law bê bişewite Binyana Belê
Ar têkeve nerindên gundê me,
Îllam nabe Mala Awî Xelê
Qetleke derew kirine istûyê mi bêkesî, mi kirne belê
Qefesa mi deranî barûta arê qurşûnê

Menal menal... bila meta te binale...

Çiyayê Qizildaxê bişewite şev e, şev e...

Lo mehkûmê mi şev e, şev e...

Bila dar û berê Qazîentaba şewitî,

Para dilê min û te ra, ma gî li hev keve

Hevalno ez (li) ber mirina xwe neketim

Xebercî yê xeberê li mala dijmin kin, li gundê Soqî

Bên, lawê Ûsivê Bezkî li Qzîentaba şewitî

(Di) binê xestexanê (de) wefat kiriye

Hele bê "Ma dijmino îşev têr rakeve..."

Menal menal menal

Bila meta te binale... (Hesqera û Yoldaş, 2018: 79).

Destana Dewrêşê Evdî (Wextê ku Edûl tê ser jê ra çi diwê):

Delaaalê min ay delala delalê min ay delal delalê min ay delal

E nemînin lo lo delalo e ji te ra qe nemînim

Ezê pey te va tu dema tu dewrana negerînim

Pê birîndarê qurşînê va negerînim way delal

Delalê min siwar bû li derê mala bavê min peya bû

Lo kekê delalê min siwar bû li derê mala bavê min peya bû

Lo delaaal destê mina ser agirê çiqaxê fîncana dor (...)[15] hetanî destê şafaqê..

Qîzeka cîrana nebire xeberaka xêrsizê dane min e

Lêlê çav rijyayê gulî birê delalê dilê te qera dîsa berî mal mal bû

Lo hêsirê çavê mino ba û baran e, barê sûretê min da (...)[16] delal

Ez nemînim lo lo e nemînim lo delalooo

Mi go delal delal, delal delal, delalê mi delal delalê mi delal

Lo delal îşav were mala bavê mino keko Bekiro bi mêvanî delalo îşev were mala bavê mino bi mêvanîîî

Ezê ji delaliyê malê rakim xalîkî (...)[17] sorî

Ezê ji te ra şerjêkim berxê berkozê dolê wî beranîîî

Wextê ku bavê minê extiyar go lê çavrijyayê kanî miya ser zera ser beranî

Ezê bêm şivanê me ne mîna şivanê xelkê yooo

Te dî bire çolê berf û baranî gura xwarî kekê Bekir ji wê da neanî

[15] Peyvek nehat fêmkirin.
[16] Peyvek nehat fêmkirin.
[17] Peyvek nehat fêmkirin.

Ez nemînim lo lo de lolo ez nemînim lo Dewrêşooo

Delal hay delal haaay delal hayyy

Mîna def û duguna kekê Bekiro dida defek û digunekê ku li mehela me tê kutayê

Ezê bi qurbana bejn û bala va delalî malê bavê xwe bim egîtê mala bavê mino ketî serî pêşî lo delal baz didayêêê

Qizik bûkê keçikê gundê me xort nemane, dane xemla giran e, terine vê govendê vê dîlanê

Lo de bes e de bes e ji min ra delaliyê min meke dûma delala qut e, dûmê delala xêrê nare ser û serî nayêêê

Delal delaaal delaaal delalê egîtê mala bavê min ra li wê dinê li vê dinyê qe nemînim lo delal

Ê lo dengê te têêê

Demê devê şekirekî şekirê şamê devê te tê

Bira (...)[18]

hêlekê xwe da ... cinetê hêlekê xwe da textê sûretêêê

Lê lêêê Edûlê de bes e (...)[19] çeke Kurmancî (...)[20] çeke taximê li sîng bera li bejna te tê

Wele kekê şixlê meriya bi dilê meriya be zewaca meriya li vê dinê bi dilê meriyabe

Gure gura arê cehenemê, beroşê qetrenê dinya walî lê Sewîm Xanim li bîrê kê tê ooo wayê (Dore, 2023).

[18] Dewama hevokê nehat famkirin.
[19] Peyvek nehat fêmkirin.
[20] Peyvek nehat fêmkirin.

Wêne 1: Elî Dore li Mala Bekir Beg û Serpil Xanimê, (02.12.2023) Riha.

Wêne 2: Elî Dore li Mala Bekir Beg û Serpil Xanimê, (02.12.2023) Riha.



Wêne 3: Wêneyê kaseta ewil “AZI BARDİVORIM” Ali Döre

Çavkanî / References

Akyol, H. (2011a). *Antolojiya Dengbêjan:1.* Stenbol: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê.

Akyol, H. (2011b). *Antolojiya Dengbêjan:2.* Stenbol: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê.

Akyol, H. (2011c). *Antolojiya Dengbêjan:3.* Stenbol: Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê.

Aras, A. (2022). *Evdalê Zeynikê (Şairê Kurda yê Efsanewî)*. Çapa Sêyem. İstanbul: Nûbihar.

Aslan, M. (2019). Taybetmendiyên Hunera Dengbêjiya Kurdî. İ. Baz û yd. (Ed.), *Uluslararası Dengbêjlik Kültürü ve Dengbêjler Sempozyum Bildirileri.* Birinci Baskı. Şırnak: Şırnak Üniversitesi Yayınları.

Berbir, H. (2007). *Destan û Çîrokên Kurdî (Ji Denbêj Fadilê Kufragî).* Diyarbakır: Enstîtuya Kurdî ya Amedê.

Celîl, O. û Celîl, C. (2013). *Zargotina Kurda -1*. Çapa Sêyem. İstanbul: Aram.

Celîl, O. û Celîl, C. (2013). *Zargotina Kurda -2*. Çapa Sêyem. İstanbul: Aram.

Delikaya, Ö. û Ertekin, M. Z. (2021). "Li Geliyê Çatê Tav Diziriqî: Topogeny û Nexşeya Devkî di Kilama Elî Xarza de", *Kurdiyat,* 3, 11-25.

Delikaya, Ö. (2023). Aşiqê Eşqê: Dengbêj û Sazbend Xalidê Xendeqa. O. Bozan û yd. (Ed.) *Cumhuriyetin 100. Yılında Ergani: Din-Eğitim-Kültür*. Bursa: Ekin Basım Yayın Dağıtım.

Dore, E. (2023, Kanûna Pêşîn). Hevpeyvîna ji aliyê Sevim Hatun Sürücü va. [hevpeyvîna rûbirû].

Güneş, Ö. û Şahin, İ. (2021). *Antolojiya Dengbêjan 3: Dengbêj Huseyno.* Çapa Yekem. İstanbul: Nûbihar.

Güneş, Ö. û Şahin, İ. (2022). *Antolojiya Dengbêjan 1: Dengbêj Reso.* Çapa Sêyem. İstanbul: Nûbihar.

Güneş, Ö. û Şahin, İ. (2023). *Antolojiya Dengbêjan 2:Dengbêj Şakiro*. Çapa Pêncem. İstanbul: Nûbihar.

Hesqera, E. û Yoldaş, E. (2018). Kilama Şêhîn. *Kovara Nûbihar*. Jimar:145. sal:26. cild:22.

Kardaş, C. (2017). *Aşığın Sazı Dengbêjin Sesi*. Ankara: Eğiten Kitap

Ong, W. (2020). *Sözlü ve Yazılı Kültür*. Yedinci Basım. İstanbul: Metis Yayınları.

Sträuli, B. (2017) - Dewrêşê Evdî - Dewresh, Son of Evdi A Kurmanji Epic as Performed by the Berazi Singer Baqî Xido. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.

Sträuli, B. (2021) "Our Steppe is Vast ...": Kurdish Epics and Tribal Stories from Urfa, 1906 Collected by Oskar Mann. Wiesbaden: Harrassowitz Verlag.

Yaş, Z. (2016). Elî Tico. *Folklora Kurda*. Jimar: 7. r. 46-49.

Çavkaniyên Dîjîtal

Ahuri Köyü. (2013, Sibat 21). Ali DORE TRT 6 [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=TytWtn7uExE

Ahuri Köyü. (2013, Sibat 21). Ali DORE TRT 6 [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=TytWtn7uExE

Ahuri Köyü. 2013. "Ali DORE TRT 6." YouTube.

Ali Döre - Topic. (2020, Nîsan 15). Buke Le [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=gPpxWajEl2o

Ali Döre - Topic. (2023b, Cotmeh 5). Şahinemın [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=WRzactHs6yw

Ali Döre - Topic. 2023. "Depreme Ağıt (Yeni)." YouTube.

Klay Muzik. 2021. "Ali Döre - Delal (2021)." YouTube.

Köylünün Sesi Tv. PROGRAMI. 2023a. "Ali Döre (Emâ SAZBEND ANISINA) #Alidöre #Alidore #Köylününsesi #Adıyaman #Dengbej." YouTube.

Köylünün Sesi Tv. PROGRAMI. 2023a. “Ali Döre Dengbejî Adıyamanê Havolê Ema Sazbend Ali Döre #Alidöre #Köylününsesi #Emasazbend #Emaxace.” YouTube.

Köylünün Sesi Tv. PROGRAMI. 2023b. “Alî Dörê Û Ema Sazbend.. #Emasazbend #Alidöre #Alidore #Köylününsesi #Adıyaman.” YouTube.

Mehmet Can ê Sêlem. Yükleyen: Mehmet MAMAŞ. (2021, Çiriya Paşîn 27). 28 Kasım 2021 [Video]. YouTube. https://www.youtube.com/watch?v=NYaENP2LsdM

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

Şopên Ziman û Edebîyata Kurdî di "Seyahatname"ya Ewlîya Çelebî de*

(Traces of Kurdish Language and Literature in the "Seyahatname" of Ewlia Celebi)

(Evliya Çelebi'nin "Seyahatname"sinde Kürt Dili ve Edebiyatının İzleri)

M. Zana KARAK *

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatin: 15.10.2024
Accepted // Pejirandin: 22.11.2024
Published // Weşandin: 29.11.2024
Pages // Rûpel: 96-117
DOI: 10.55106/kurdiname.1568201

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/

Citation/Atif: Karak, M. Zana, Şopên Ziman û Edebîyata Kurdî di "Seyahatname"ya Ewlîya Çelebî de, 2024, *Kurdiname*, 11, r. 96-117

Plagiarism/Întîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

Kurte

Kurd yek ji neteweyên qedîm ên Rojhilata Navîn in û bi ereb, fars, ermen û tirkan re cîrantîyê dike. Ji ber vê yekê çavkanîyên Rohjilata Navîn di serî de di gelek çavkanîyên neteweyên din de jî agahîyên derbarê kurdan de tên dîtin. Bi taybetî jî têkilîyeke xurt a van netewên cîran bi kurdan re çêbûye. Di encama vê têkilîyê de van gelên navborî di çavkanîyên xwe yên nivîskî de derbarê dîrok, çand, erdnîgarî, ziman û edebîyata kurdan de jî agahî dane.

Seyahatname an geştname ew berhem in ku ji alîyê gerokan ve hatine nivîsîn û di wan de gerokan behsa cihên dîtine û lê gerîyane kirine. Ewlîya Çelebî jî gerokekî navdar ê tirkan e û di jîyana xwe de li gelek bajar, welat û deverên cuda gerîyaye û di dema gera xwe de tiştên ku dîtîne nivîsîne. Ewlîya Çelebî di encama gerên xwe de berhemeke 10 cîldî ya bi navê "Seyahatname" bi tirkîya Osmanî nivîsîye.

Ewlîya Çelebî di ger û geştên xwe de li heremên kurdnişîn jî gerîyaye û kurd ji nêz ve nas kirine. Çelebî bi taybetî di cildên sêyem û çarem ên Seyehatnameya xwe de cihekî berfireh daye kurdan û di van herdu cildan de behsa ziman, erdnîgarî, bawerî, adet û tore, çand û edebîyata kurdan kiriye.

Di vê xebatê de dê li ser şopên ziman û edebîyata kurdî ya ku di Seyehatnameya Ewlîya Çelebî de derbas dibe dê bê rawestîn û ev berhem dê weke çavkanîyeke bîyanî bê nirxandin.

Kilîtbêje: Kurd, Seyehatname, Ewlîya Çelebî, Çavkanîyên Bîyanî, Ziman û Edebîyata Kurdî.

Abstract

Kurds are one of the ancient nations of the Middle East and are neighbors with Arabs, Persians, Armenians and Turks. Therefore, information about the Kurds can be found primarily in the sources of the Middle East in many sources of other nations. In particular, these neighboring nations have a strong relationship with the Kurds. As a result of this relationship, these mentioned public have provided information about the history, culture, geography and literature of the Kurds in their written sources.

Travelogues are works written by travelers in which they describe the places they went and visited. Evliya Çelebi is also a famous Turkish traveler, and he traveled to many cities, countries and different places throughout his life and wrote down what he saw during these visits. As a result of his travels, Ewliya Çelebi wrote a 10-volume work called " Seyahatname" in Ottoman Turkish.

* Ev gotar pala xwe dide teblîxa konferansa navneteweyî ya bi navê "Kurd û Kurdistan di Belgeyên Biyaniyan de" ku di 29-30yê Cotmeha 2023yan de li Zanîngeha Helebçeyê hatibû pêşkêşkirin.

**Xwendekarê Doktorayê, Beşa Çand û Zimanê Kurdî, Enstîtuya Zanistên Civakî, Zanîngeha Dîcleyê, m.zana47@gmail.com (ORCID: 0000-0003-1681-4917). (PhD Student, University of Dicle, Kurdish Language and Culture).

Ewliya Çelebi has also traveled to Kurdistan regions in his travels and got to know the Kurds closely. Çelebi, especially in the third and fourth volumes of his travelogue, gave the Kurds a wide space and in these two volumes, he talked about the language, geography, beliefs, customs and networks, culture and literature of the Kurds.

In this work, there will be stop on the traces of Kurdish language and literature that is mentioned in the Travel of Ewliya Çelebi and this work will be evaluated as a foreign document.

Keywords: Kurds, Travelogue, Ewliya Çelebi, Foreign Sources, Kurdish Language and Literature.

Özet

Kürtler Ortadoğu'nun kadim milletlerinden biridir ve Araplar, Farslar, Ermeniler ve Türkler gibi halklarla komşudurlar. Bu nedenle Ortadoğu kaynakları başta olmak üzere diğer milletlerin birçok kaynağında da Kürtlerle ilgili bilgilere rastlanılmaktadır. Özellikle bu komşu ulusların Kürtlerle güçlü bir ilişkisi vardır. Bu ilişkinin bir sonucu olarak adı geçen bu milletler yazılı kaynaklarında Kürtlerin tarihi, kültürü, coğrafyası ve edebiyatı hakkında bilgiler vermişlerdir.

Seyahatnameler, seyyahlar tarafından yazılan ve seyyahların gittikleri ve ziyaret ettikleri yerleri anlattıkları eserlerdir. Evliya Çelebi de Türklerin ünlü bir seyyahıdır ve hayatı boyunca pek çok şehir, ülke ve farklı yerleri gezmiş ve bu ziyaretleri sırasında gördüklerini kaleme almıştır. Evliya Çelebi, yaptığı geziler sonucunda Osmanlı Türkçesiyle "Seyahatname" adlı 10 ciltlik bir eser kaleme almıştır.

Evliya Çelebi, gezileri sırasında Kürt bölgelerini de gezerek Kürtlerle görüşüp onları yakından tanımıştır. Çelebi, özellikle Seyahatname'sinin üçüncü ve dördüncü ciltlerinde Kürtlere geniş yer vermiş ve bu iki ciltte; Kürtlerin dilinden, coğrafyasından, inançlarından, örf ve adetlerinden, kültür ve edebiyatından söz etmiştir. Bu çalışmada Evliya Çelebi'nin Seyahatnamesi'nde bahsi geçen Kürt dili ve edebiyatının izleri üzerinde durulup eser yabancı bir kaynak olarak değerlendirilecektir.

Anahtar Kelimeler: Kürtler, Seyahatname, Evliya Çelebi, Yabancı Kaynaklar, Kürt Dili ve Edebiyatı.

DESTPÊK

Seyahatname di warê çand û edebîyatan de xwedî cihên giring in. Di seyahatnameyan de derbarê erdnîgarî, dîrok, civaknasî, bawerî, folklor, ziman û edebîyatê de gelek agahî û dane hene. Yek ji wan berheman jî Seyahtnameya Ewlîya Çelebî ye ku di sedsala 17em de weke 10 cîld hatiye nivîsîn.

Ewlîya Çelebî (1611-1684?) gerokekî tirk e û di sedsala 17em de erdnîgarîya Osmanî di serî de li gelek welatên weke Qefqas, Ewropa, Iraq, Sûriye, Misir, Sûdan, Hebeşistan û li parzemînên Asya, Ewropa û Efrîqayê gerîyaye.

Çelebî di vê gera xwe de cihên lê gerîyaye û tiştên ku bihistiye bi zimanekî herikbar û çîrokvanî nivîsîye. Cureya berhema wî ya ger û geştê "Seyahatname" ye, navê wê jî weke "Seyahatnameya Ewlîya Çelebî" û di hin nusxeyan de jî weke "Tarîh-î Seyyah" hatiye nasîn (Alpaslan, 2014: 13).

Mirov dikare ji gelek alîyan ve ji vê berhemê îstîfade bike. Tê de derbarê gelek cî û miletan de agahîyên cur bi cur hene. Herweha tê de derbarê kurd û warên wan de jî gelek zanyarîyên giring hene. Ewlîya Çelebî di vê ger û geşta xwe de bi îfadeya wî li "Kurdistan"ê an ku li bajar û cihên kurdnişîn jî gerîyaye. Wî ev ger û geşta xwe ya li cihên kurdnişîn bi piranî di cîlda sêyem û çarem a berhema xwe de anîye ziman. Mirov dikare di berhemê de agahîyên derbarê dîrok, erdnîgarî, folklor, edebîyat, çand û tore, xwarin û vexwarin, cil û berg, bawerî û jîyana civakî ya kurdan bibînin. Ev berhema Çelebî dikare weke xebata sosyolojîk a derbarê kurdan de bê hesibandin (Bruinessen, 1985: 15).

Çelebî li bajarên kurdan ên weke Diyarbekir, Wan, Bedlîs, Meletî, Elezîz, Riha, Mêrdîn, Hewlêr, Şengal, Îmadîye û Hekkarîyê gerîyaye. Çelebî di gera xwe ya li medreseya Qubehanê de ku li Îmadîyeyê ye behsa maweya xwe ya li nav kurdan jî dike di berhema xwe de dibêje: "Ez 11 salan li diyarê Kurdistanê gerîyame" (Ahmed, 2017: 83; Çelebî, 2010: 706).

Ewlîya Çelebî ji bo erdnîgarîya ku kurd lê dijîn carna dibêje "Kurdistan", carna jî îfadeya "Diyarê Kurdistan"ê bi kar anîye (Bnr. Pêvek: 1, 3). Herweha ji bo dewleta Eyûbîyan ku li Misr û Sûrîyeyê ava bûye jî gotiye "Dewleta Ekradîyûn" û gava behsa bajarekî Kurdistanê jî kiriye, gotiye "wîlayeta Kurdistanê" an jî "qesebeya Kurdistanê" (Akbaş, 2015: 46-47). Weke mînak ji Bedlîsê re gotiye "welatê kurdan" û "Bedlîs bajarê Kurdistanê ye", ji bo bajarê Wanê gotiye "Wana dîyarê Kurdistanê" (Akbaş, 2015: 49-51).

Li gor wî herêma kurdan welatekî mezin e û ji bo Osmanîyan jî ev erdnîgarî roleke giring bi cî tîne, çunkî di navbera Osmanî û Iraqa Ereb de 6 hezar eşîrên kurd hene û ev yek nahêle qewmên ecem erda Osmanî dagir bikin. Dîsa li gor Çelebî ji diyarê Erzirom, Wan, Hekkarî, Cizîr, Îmadîye, Mûsil, Şehrezor, Herîr, Erdelan, Bexdad, Derne, Derteng û heta bi diyarê Besrayê li 70 waran mirovên kurdîaxêv hene (Pêvek: 3).

Di vê xebatê de heta ji dest hat çavkanîyên resen ku ji destxetan pêk tê[1] hat bikaranîn û berhemên muktedîr ên vê qadê jî nehatin îhmalkirin. Di xebatê de fokûs şopên edebîyata kurdî di Seyahatnameya Ewlîya Çelebî de bû. Lêbelê ji ber ku ziman û edebîyata kurdî di berhema Çelebî de bi hev re û têkelhev hatibûn dayîn, hewceyî bi behsa ziman jî hat dîtin û bi kurtasî di vê xebatê de bi binbeşekê behsa zimanê kurdî jî hat kirin da ku nêrîn û giringîya xebata Çelebî baş bê fehmkirin.

1. Li gor Ewlîya Çelebî Zimanê Kurdî

Gerokê Osmanî Ewlîya Çelebî di vê berhema xwe ya ger û geştê de hem behsa jîyana civakî ya kurdan kiriye hem jî wekî zimanzanekî amator cî daye bêje û hevokên kurdî û li bin van bêje û hevokan jî cî bi cî wergera wan a bi tirkîya Osmanî daye (Pêvek 1, 3, 7, 8). Lêbelê hin bêje û hevok hem ji alîyê rastnivîsînê hem jî ji alîyê wergerê ne durust in. Di navbera nusxeyên destxet de jî hin nehevgirtin hene. Di vir de amatorîya wergêrîya Çelebî derdikeve holê. Tevî kêmasîyên biçûk jî ev peyvên ku Çelebî di berhema xwe de dane ji bo lêkoleran bi qiymet e.

Herweha derbarê devok û zaraveyên kurdî de jî gelek agahî dane. Çelebî derbarê zimanê kurdî de gava behsa Meyafarqînê ango Sîlwana Diyarbekirê dike weha dibêje: "Lîsanê kurdî ji Melîk Kurdîm ku ji ummeta Hezretî Nûh e, maye. Lêbelê ji ber ku wilayeta Kurdistanê çiyayî, keviristan û deştên bêserûber in tê de 12 cure lehçeyên kurdî hene ku gelek qewmên wê gotinên hev du yên taybetî fehm nakin û bi rêya tercumeyê hev du têdigihêjin." (Pêvek: 1, 3). Lê li vê derê tê fehmkirin ku Çelebî di hin xalan de ketiye nav xeletîyê û hin devok û şêwe jî weke zarave û ziman dest nîşan kiriye û ew bi awayê şaş veguhestine. Çelebî dibêje zimanên cuda yên kurdan heye û Çelebî li gor xwe wan zimanan weha rêz dike: Zazakî, Lolokî, zimanê Cîloya Hekkarîyê, 'Ewnîkî, Mehmûdî, Şîrwanî, Cizrewî, Pisanî (Pîsyanî), Sincarî, Herîrî, Erdelanî, Soranî, Xaltî, Çekvanî, Îmadî (Amedî) û Rojikî ne (Pêvek: 1, 3). Ji vî alî ve Ewlîya Çelebî ligel tirkologîya wî ew wekî kurdologekî jî dikare bê naskirin (Okumuş, 2008: 205). Çelebî di vê berhema xwe de behsa 12 lehçeyan dike, lêbelê li vê derê navê 16 heban daye. Bruinessen

[1] Ji bo peydakirina destxetên Seyahatnameya Ewlîya Çelebî em spasdarê mamoste Yûsif Balûken in.

derbarê van navên ku Çelebî weke lehçe û ziman daye, dibêje: Avnîk li rojhilatê Erziromê navê herêmekê ye, Şîrvan herêmeke Behdînanê ye, lehçeyên Cîzrewî û Îmadîyeyê jî yên bajarên Cîzir û Amedîyê ye, Herîr herêmeke li başûrê Rewandizê li ser ava Zapê ye û lehçeyeke di navbera lehçeyên bakur û başûr de ye, Pîsyanî, Halîtî (Xaltî) û Çekvanî jî weke komên Zaza û Loloyan e ku Ewlîya Çelebî li zozanên Çewligê rastî wan hatiye (Bruinessen, 1985: 18-19). Herweha Çelebî jî derbarê fesîhbûn û têgihiştina zimên a di navbera van komên kurdan de hin agahîyên hûrgilî jî dane (bnr. Pêvek: 9). Ev navên ku Çelebî ew weke lehçe (zarava) dane hemû ne zarava ne û piranîya wan şêwe an ku devok in, heta ev navên ku wî rêz kirine bi piranî navên eşîrên kurdan in û wî ev weke lehçe û ziman anîne ziman. Ev nêrîna Çelebî tenê ne ji bo kurdî, lêbelê wî ji bo tirkî jî anîye ziman. Munevver Tekcan derbarê vê mijarê de dibêje Ewlîya Çelebî di seyahatnameyê de zimanên komên ku di nav sînorê Osmanî yê fireh de ji hev dûr bi cî bûne; di bin navên "lîsan, lîsan-i fesahat, lîsan-i istilahat, lehçe-i mahsûsa û istilahat-i ibarat"[2] de dane û Çelebî li vê derê bêjeyên "lîsan" û "lehçe"yê bêyî ferqê têxe navberê li şûna hev bi kar anîne (Tekcan, 2005: 68).

Çend sedemên vê tevlihevîya wî ya ziman, lehçe (zarava) û devokan hene. Yek dibe ku ji ber têgihiştina termînolojîya vê qadê ye ku di pênaseyê de hevgirtinek tune ye, ya duyem jî dibe ku ji ber wê heyama wî ye ku nêrîneke cuda di vê mijarê de hebe. Di nav van 16 nav ango zimanên ku Çelebî li jor rêz kiriye zazakî û soranî bi nêrîna îro weke zarava tê qebûlkirin ên din jî bi piranî navên dever û elên kurdan in ku Çelebî bi xwe jî van navan wekî eşîrên kurdan jî anîye ziman. Jixwe gava çavkanîyên li ser êlên kurdan, bên kontrolkirin dê di çavkanîyan bê dîtin ku ev nav di heman demê de navên êl û eşîrên kurdan in (Ji bo navan bnr.: Alçıtepe: 2021; Bozkurt, 2022). Nîqaşa ziman, lehçe û devokan meseleyeke dirêj e ku lihevkirineke teqez li ser wê tune ye, lewra nîqaşa kîjan ziman e an zarava û devok e dê li vir neyê kirin.

Çelebî dibêje li herêma Hemedanê kurd û tirk bi hev re jîyane û li Qezwînê jî kurd, ereb û ecem bi hev re jîyane. Derbarê Sokeya navçeya Aydinê de jî dibêje gundekî kurdan heye û hemû gundî ji kurdên soran in (Çelebi, 1935: 150). Dîsa li gor Çelebî kurdîya Badînan, Hekkarî, Îmadîye, Duhok, Cizîr û Şîrwanê kurdîyên fesîh in. Çelebî dibêje tirkmenên ku li ser erdnîgarîya kurdan dijîn ew jî bi kurdî dizanin, mesela tirkmenên Hemedanê. Li gor Çelebî di nav kurdan de 100 hezar lehçeyên xisûsî hene û ligel vê yekê 24 zimanên kurdî hene (Çelebî, 2010: 710-712). Dîsa li gor Çelebî hemû kurdên Mûsilê her cure kurdîyê dizanin. Çelebî ji bo tirkmenan jî nêrîneke bi vî awayî anîye ziman û dibêje 100 cure lehçeyên wan ên xisûsî hene ku bi rêya tercumeyê hevdu fehm dikin (Bnr. Hirik, 2023: 225).

Ewlîya Çelebî di vir de jî an ku di mijara ziman û lehçeyan de şaştî kirine û rewşeke bi vî awayî ku ew vediguhizê tune ye. Di neqilkirina wî de şaştîya termînolojîyê heye û ev hemû agahîyên Çelebî durist nayê qebûlkirin. Ji bo termînolojîyê di nava gel de jî bêjeya "ziman" tê bikaranîn û ev bikaranîn her çiqas weke ziman were lansekirin jî qest ji vir ne ziman e, lêbelê belkî şîve û devokên herêmî û êlan in. Mîsal gava tê gotin ku "zimanê Behdînî xweş e", mebest ne ew e ku Behdînî zimanekî serbixwe û ji kurdî cudatir e, lê mebesta ku tê fehmkirin ew e ku ev devokeke kurmancî ye ku ji alîyê kurdên devera Behdînan ve tê axaftin. Tiştê ku di vê berhema Çelebî de hatiye veguhestin jî bi piranî şîve û devokên herêmî û eşîrî ne ku bi

[2] Wateyên van termên zimên weha dikare bê rêzkirin: lîsan: ziman; lîsan-i fesahat: zimanê fesîh, sade û negirîft; lehçe-i mahsûsa: zaravayê xisûsî û taybetî; istilahat-i ibarat: hevokên rastkirî û nûjenkirî (têgihên bêje û peyvan / îbareyên rastkirî).

bikaranîna terma zimanî ve bi şaşî weke ziman hatiye lansekirin û di eslê xwe de ev termên ku ew behs jê dike ne ziman in, lêbelê şîve û devok in.

Çelebî di berhema xwe de gelek bêje û hevokên kurdî tevî wergera wan a tirkîya Osmanî daye û bi vê yekê weke ferhengeke biçûk lîsteyek ji bêje û hevokên kurdî bi meraqdaran re parve kiriye. Ev liste ji 3 nusxeyên destxet tevî hin sererastkirinan di tabloyekê de li gor rêzkirina Çelebî, derbasî latînî hat kirin (Bnr.: Tablo: 1). Çelebî di serê vê lîsteyê de dibêje "ewwela lîsan-i ekrad-i Soran" û paşê bi rêzê hin reqem, hevok û bêjeyên kurdî nivîsîne, lêbelê bi qasî tê fehmkirin ev bêje û îfade ji kurmancî hatine wergirtin. Bruinessen jî ji bo van bêjeyên ku Çelebî dane dibêje xuyaye ku ev lîste wek ji gelek lehçeyan têkel e û soranîya ku Çelebî behs jê dike jî zimanê herêma Meyafarqînê (Sîlwan) ye û ev ne soranîya lehçeya Başûr a mîrektîya Soranê ye, ev ya xelkê devera Çemê Batmanê ye ku ew jî Kurmanc in (Bruinessen, 1985: 19-22). Tevî xeletîyan dîsa jî ev lîsteya bêjeyan ji bo lêkoleran biqîmet e.

Di Seyahatnameya Çelebî de dîsa ji bo zimanê kurdî agahîyeke giring derbas dibe ku ew jî belgeyeke bi kurdî ye, li gor Çelebî ev fetihnameyeke li ser fetha Diyarbekirê ye û bi navê " Fetha Selîm Han bi destê Ebu'ş-şevarib Muhammed Paşa bi 'ianeta Mela Îdrîs" ve ketiye bin qeydê (Öncü, 2013:42). Ger ev belgeya ku Çelebî tîne ziman bê dîtin dê hem ji bo dîroka kurdan û herêmê û hem jî dê ji bo zimanê kurdî bibe belgeyeke gelekî giring.

2. Di Seyahatnameyê de Edebîyata Kurdî

Edebîyata kurdî edebîyateke qedîm e ku roj bi roj nimûneyên wê derdikevin holê. Di çavkanîyên biyanî yên rojavayî û rojhilatî de jî şopên edebîyata kurdî tên dîtin. Di van çavkanîyan de mirov rastî berhemên edebîyata kurdî jî tên ku di dîroka edebîyata kurdî de ev berhem roleke mezin pêk tînin.

Di seyahatnameya Ewlîya Çelebî de jî şopên edebîyata kurdî tê dîtin û hin nimûne jî ji alîyê vî gerokê meşhûr ve hatine dayîn. Bi saya wî cara yekem navên nû yên şair û alimên kurd tên dîtin ku Mela Remezanê Ebbasî û Mela Mihyedînê Cizîrî (1594-1647?) du kes ji wan in. Di seyahatnameya Ewlîya Çelebî de dê sê nimûneyên cuda yên edebî bên dayîn. Ev nimûne ji helbest û stranan pêk tên.

Li gor Çelebî kurdîya xelkê Cizîrê jî kurdîyeke fesîh û hunerane ye. Çelebî dibêje hunermendên dengxweş hin stran an jî murebe xwendine û 3-4 bend jî ji straneke kurdî ku bi "Çûme Cizîrê" ve dest pê dike daye (Bnr.: Pêvek: 2, 7, 8). Li devera Cizîrê jî li ser Rûbarê Xabûrê bi kelekan hatûçûyîn hatiye kirin û li ser vê yekê helbest an ku stran jî hatine gotin. Ewlîya Çelebî ev helbesta jêr ku di nav gel de weke stran[3] jî hatiye gotin di seyahatnameya xwe de weha daye:

Çûme Cizîrê, kelek berdanê

Çûme Xebûrê xîvet[4] vedanê

Ayayaya oyoyoyoyo oyoyoyoyo

Eman muruwet ezîzim, bo çi kelendû[5] (neqarat)

[3] Ji bo vê strana ku hêj di nav gel de tê îcrakirin bnr. : https://www.youtube.com/watch?v=8qqU6hBlTxs

[4] Xîvet/xêvet: Kon, çadir.

[5] Kelendû: Ev bêje tam nehat fehmkirin.

Şa murwet î şa murwet î
biroy biroy î biroy biroy î
Eman muruwet ezîzim, bo çi kelendû (neqarat)

Îro du roj e mekan dûr e
Bejnek zirav e, xal zihûr e
Ayayaya oyoyoyoyo oyoyoyoyo
Eman muruwet ezîzim, bo çi kelendû (neqarat)

Îşev çi şev e şeveke tarî
Çehvên te reş e baran dibarî
Ayayaya oyoyoyoyo oyoyoyoyo (Bnr.: Pêvek: 2, 7, 8).

Çelebî derbarê Hemedanê de jî di berhema xwe de cî daye bendeke şairê kurdên Hemedanê. Li Hemedanê ji bo çiyayê Elwendê helbest hatiye nivîsîn, Ewlîya Çelebî jî yek ji wan çarîneyan weke mînak daye:

Elwendê ma lewendê ma
Badaş yarê xarê ma
Yek cam bede în bade ra
Ferzendê kûh Elwendê ma (Bnr.: Pêvek: 4).

Di qada edebîyatê de nimûneya herî giring ku Ewlîya Çelebî daye, xezeleke Mela Remezanê Ebbasî[6] ye ku ew jî derbarê işqê de ye (Pêvek: 9, 10). Di nav çavkanîyên dîrokî de ku li ber dest in, tenê Çelebî di berhema xwe de behsa vê helbestê kiriye. Ev helbest ji 9 malikan pêk tê, bi kêşa erûzê hatiye ristin û qalibê wê jî Mustefʿilûn / Faʻilûn / Mustefʿilûn / Faʻilûn e. Mexlesa şair jî navê wî Remezan di malika dawî de derbas dibe. Li gor Çelebî kurdên Îmadîyê tevî biçûk û mezinên xwe di şahîya newroza sûltanî de derdikevin geştê û şair jî di rojên newrozê de helbestên xwe dixwînin. Herweha Çelebî dibêje "îro gelek beyt û muselles, murebbeʻ, muxemmes, museddes, musebbeʻ, musemmen, ebyat, eşʻar û qesîdeyên wan hene (Pêvek: 9). Ev helbesta Mela Remezan ji du nusxeyên destxet ên cuda hat latînîkirin.

Xezela Mela Remezanê Ebbasî

1. Rayê li Asif diken walih û heyranê ʻişq
Dersê Eristo diden serxweşê sekranê ʻişq

[6] Îhtîmal e ku Mela Remezanê Ebbasî û Mela Remezanê Cizîrî (sedsala 17em) heman kes be, lewra serdema ku tê de jîyan e û mintiqeyên ku lê mane ne dûrî hev in.

2. ‘Eqlê kul er bête nîv mektebê ‘işqê demek
Dê bibitîn mezhekê[7] tiflê hewesxwanê ‘işq

3. Def'ê heraret diket ma ji dilî zemherîr
Layezela germiya ateşê sûzanê ‘işq

4. Dê besujet ‘alemê ahê şererbarê[8] dil
Ger hebitin gavekê mani‘ê tûfanê ‘işq

5. Min heseda kufrê bû daxê li îmanê lew
Serger û pêxwas diçûm damenê ruhbanê ‘işq

6. Daxê nihanî me lew aşkere zahir kirin
Emrê çiraxan kirê Xusrewê xûbanê ‘işq

7. Geh ji zemîrî bi xwe xûn ku terennuh[9] diket
Dîde dibit me‘denê le‘lê bedestanê[10] ‘işq

8. Xunçe’ê bustan eger bende niqabê veket
Lal(i) dibit bêguman murxê gulistanê ‘işq

9. Faş meke zarê xwe ey Remezan(i) ger dikey
Şubhê Nesîmî[11] dibî tazî û ‘uryanê ‘işq
(Pêvek: 9, 10)

Ji vê helbestê tê fehmkirin ku Mela Remezanê Ebbasî xwedî pênûseke xurt bûye û îhtîmal e ku di siberojê de hin helbestên wî yên din jî derkevin hemberî me.

Mela Remezan di vê helbestê de li ser eşqê sekinîye û dibêje tiştê ku eşq bike ti kes nikare bike, heta ne Asifê şêwirmendê Silêman pêxember ku kesekî zana û jîr bû nikare bike û ne jî

[7] Mezhek: Pêkenîn.
[8] Şererbar: Agirbar.
Terennuh: Pêlpêlî, bipêl, pêldar. [9] Di nusxeya (pêvek:9) din de: bedexşan e. Bedexşan: Kanza, madeneke bi qîmet e.
[10] Bedestan: Sûka sergirtî ye û di vê sûkê de maden û amûrên nirxdar peyda dibin.
[11] Nesîmî: Derbarê Nesîmî (w. 1417) de agahîyên zêde tune ne, li gor hin tezkîrenûsan li Diyarbekirê an jî li Bexdayê hatiye dinê û di sedsala 14.-15. de jîyaye. Nesîmî şairekî di fikra wahdeta wucûdê û hurûfîtîyê de bûye û di vê fikrê de helbest nivîsîne. Di encamê de ji ber fikr û gotinên xwe yên cuda çermî wî hatiye gurandin û kuştin. Bi farisî, tirkî û erebî zanîbûye û bi van zimanan dîwanên wî hene (https://islamansiklopedisi.org.tr/nesimi).

Arîstoyê fîlozof û mutefekîr dikare bike. Eşq mirovan dikare bike pêlîstoka zarokan jî dikare bi agirê dilî ve alemê jî bişewitîne. Herî dawî şair bangî xwe dike û ji xwe re dibêje ya di dil û zimanê xwe de aşkere neke û nebêje, ger tu bikî tu yê jî mîna Nesîmî bibî. Di vê helbestê de ji bo bûyera Nesîmî telmîhek heye ku Nesîmî ji ber gotinên xwe çermî wî hatibû gurandin û kuştin.

Ewlîya Çelebî derbarê Bidlîsê de jî gelek zanyarî dane û gava behsa kurdên Rojkî dike ji bo wan dibêje ew bi lîsanê ekrad an ku bi zimanê kurdî diaxivin. Herweha ji bo Ebdal Xan (di navbera salên 1617-1665an de desthilat bûye) jî dibêje kesekî gelekî bi bandor e û ew şair, muellîf û musennîfekî baş bûye û bi kurdî û tirkîya Osmanî hin helbestên wî hene. Çelebî heta ji muxemmeseke 7 bendî jî nimûneyek ji helbesta wî ya bi Osmanî daye (Pêvek: 1, 6).

Çelebî di berhema xwe de ji bilî van kesan navên alimên weke Mela Seyîd Efendî, Seyîd Ebdurrehman Efendî û Şêx Mihemed îbn Cezerî eş-Şafiî jî dane û dibêje di ilmê tecwîdê de bi navê "Kîtab-i Cezerî" pirtûkeke Şêx Mihemed îbn Cezerî eş-Şafiî ku ji 16 beş û 109 malikan pêk tê heye û herweha dîsa tîne ziman ku bi sedan pirtûkên muteber ên Şêx Mihemed îbn Cezerî eş-Şafiî hene (67-69). Lê mixabin Çelebî ji berhem û helbestên wan ti nimûne parve nekiriye. Yek ji wan navan jî Mela Mihyedînê Cizîrî[12] ye. Herweha Çelebî dibêje di encama şerê di navbera Melek Ehmed Paşa û mîrê Bedlîsê Ebdal Xan de ku Ebdal Xan têk diçe, nêzî 40 barên hêstiran pirtûkên destxet ji Bedlîsê hatine birin û hin ji wan di bazaran de hatine firotin. Îhtîmal e ku di nav wan pirtûkan de gelek destxetên kurdî jî hebin.

ENCAM

Ewlîya Çelebî li gor ku behs dike derdora 11 salan li deverên kurdnişîn gerîyaye û di berhema xwe de derbarê kurdan de gelek agahîyên derbarê dîrok, ziman, bawerî, çand, erdnîgarî, mîmarî, folklor, terza jîyanê û hwd. nivîsîne. Li gor wî kurd di nav xwe de bi gelek lehçeyan diaxivin û ji ber ku ji hev dûr in, bi piranî bi awayekî hêsanî ji hev du fehm jî nakin. Çelebî di berhema xwe de weke lehçe an jî ziman ev nav dane: Zazakî, Lolokî, zimanê Cîloya Hekkarîyê, 'Awnîkî, Mehmûdî, Şîrwanî, Cizrewî, Pisanî, Sîncarî, Herîrî, Erdelanî, Soranî, Xaltî, Çekvanî, Îmadî (Amedî) û Rojikî.

Çelebî di berhema xwe de gelek bêje û hevokên kurdî tevî wergera wan a tirkîya Osmanî daye û bi vê yekê weke ferhengeke biçûk lîsteyek ji bêje û hevokên kurdî bi meraqdaran re parve kiriye. Çelebî ji bo vê lîsteya bêje û peyvan dibêje ji lehçeya soranî ne, lêbelê bi qasî ji lîsteyê tê fehmkirin ev bêje ji kurmancî hatiye wergirtin. Tevî kêmasî û xeletîyan dîsa jî ev lîsteya bêjeyan ku weke ferhengokeke biçûk a yekem jî dikare bê hesibandin ji bo lêkoleran biqîmet e.

Çelebî derbarê ziman û lehçeyên kurdî de agahîyên şaş jî dane û hejmara lehçeyan zêde nîşan daye an ku gelek şîve û devokên eşîrên kurdan weke lehçe nîşan daye. Lebelê tevî ku Çelebî ne kurd e û ne jî pisporê zimanê kurdî ye dîsa jî agahî û daneyên biqiymet derbarê kurdan de di berhema xwe de bi cî kiriye. Çelebî behsa fetîhnameyeke bi kurdî jî dike û ger ev belge bê dîtin dê ji bo dîroka kurdan û ji bo zimanê kurdî bibe belgeyeke gelekî muhîm û sûdewar.

Herweha mirov di seyahatnameya Ewlîya Çelebî de derbarê ziman û edebîyata kurdî de jî rastî gelek agahîyan nû tên. Bi saya wî cara ewil navên nû yên şairên kurd tên dîtin ku Mela

[12] Ji bo agahîyên derbarê Mela Mihyedînê Cizîrî de bnr.: (Baluken, 2022: 5-18).

Remezanê Ebbasî û Mela Mihyedînê Cizîrî ji wan kesan in. Dîsa bi rêya vê çavkanîyê tê dîtin ku helbestên kurdî û tirkîya Osmanî yên Ebdal Xan jî hebûne. Lêbelê li gor ku Çelebî demeke dirêj li nav kurdan maye û gerîyaye nimûneyên derbarê edebîyata kurdî de û agahîyên ku dane kêm in. Tevî xeletî û hin agahîyên ji zanista zimanî dûr jî dîsa ev agahîyên ku Çelebî parve kirine ji bo lêkoleran gelekî kêrhatî û sûdedar in. Lewra lêkoler dikarin kurdîya niha û ya wê heyamê bi saya vê lîsteyê bide ber hev du, dîsa asta helbesta şairên wê heyamê jî dikare bê vekolîn û ji alîyê edebî û tesewifî ve helbest bêne nirxandin. Herweha berhemên hin şair û alimên kurd ku Çelebî behsa wan kiriye, gava bên peydakirin dê fêdeyeke mezin bide ziman, dîroka edebîyata kurdî û xebatên di van qadan de. Divê li ser Seyahatnameya Ewlîya Çelebî bi berfirehî û bi hûrgilî bê rawestan û xebateke bitenkît bê amadekirin da ku hîmên xebatên bên kirin saxlemtir bin.

TABLO Û PÊVEK

Tablo 1: *Hin Reqem, Bêje û Hevokên Kurdî ku di Seyehatnameya Çelebî de Derbas Dibin.*[13]

REQEM	Wergerên Tirkî yên Ewlîya Çelebî
Yek, do, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yazndeh, dazdeh.	1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12.
HEVOK	
Lo kurmancî were rûnê.	Sen Kürt gel otur.
Selamet hate, halê te çi ye, xweş î, qelawî?	Sağ geldın, nedir halın, iyi hoşum.
Here şuxlê xwe.	Gid kendi işine.
Hespê siwar be. (Pêveka 3, 8)	Ata bin.
Were rûn.	Gel otur.
Were xwar.	Gel aşağı.
Here jor.	Git yukarı.
Here bîn.	Git getir.
Heye nan? Heye.	Ekmek var mı? Var.
Ceh hebe bîn.	Arpa varsa getir.
Mirîşk heye bîn.	Tavuk varsa getir.
Nizanim mirîşk.	Bilmem tavuğu.
Tu derew dike. Heye çendek, nizanim her bîn.	Sen yalan söylersin. Vardır satarsin Bilmem git götür.
Radibim serê te çar ta dikim. Bi serê xanê te.	Kalkarım başını dört yerde yararım. Han başı içun.
Were rûnê Kurmanc, bi serê mîrê te.	Gel otur Kürt, beg başi içun.
BÊJE	
Were	Gel
Here	Git
Rabe	Kalk
Zanim	Bılurum
Nizanim (Pêveka 3, 7)	Bilmem

[13] Ji bo destxeta van metnan bnr.: (Pêvek 3, 7, 8).

Nan	Ekmek
Av	Su
Goşt	Et
Hingivî	Bal
Dibs (Dims)	Pekmez
Tirihê Malê	Üzüm
Zebeş	Karpuz
Hejîr	İncir
Pez	Koyun
Bizin	Keçi
Sêw	Elma
Şikok	Emrut (Armut)
Mewîj	Kuru üzüm
Gûz	Ceviz
Şabik heye?	Şalık var mı?
Heye (di)firoşî	Var satarsin?
(Di)firoşim	Satarım
Bi çend (di)froşin?	Ne çeye satarsin?
Çarîk	Kuşak
Gopal	Çevgan
Lekan	Karda yürümek içun
Taxok	Kızak
Xêvet	Çadırlar

Pêvek 1: *Ji Nusxeya Wîenê Rûpelek ji Seyahatnameya Ewlîya Çelebî.*



Pêvek 2: *"Çûme Cizîrê" û Hin Nimûneyên Bêje û Hevokên Kurdî ji Seyahatnameya Çelebî.*

Pêvek 3: *Agahiyên Derbera Lehçeyên Kurdî de Du Rûpel ji Seyatnameya E. Ç.*



Pêvek 4: *Çarînek ji Helbesta Şairên Hewreman ji Seyahatnameya Çelebî.*

Pêvek 5: *Hin Agahîyên Derbarê Tirkmen û Kurdên Hemedanê de.*

Pêvek 6: *Helbesta Ebdal Xan û Agahîyên Derbarê Lehçeya Rojîkîyan de.*



Pêvek 7: *Hin Hevokên Kurdî ji Seyahatnameya E. Çelebî.*



Pêvek 8: *Hin Bêjeyên Kurdî ji Seyahetnameya E. Çelebî.*



Pêvek 9: *Xezela Mela Remezanê Ebbasî ji Seyahetnameya E. Çelebî.*

Pêvek 10: *Xezela Mela Remezanê Ebbasî ji Seyahetnameya E. Çelebî (Nusxeya Topkapiyê)*[14]



[14] Ev nusxeya destxet ji pirtûka Doskî ya bi navê Baxê Îrem hatiye wergirtin, ji bo agahîyên zêdetir bnr.: (Doskî, 2020: 256).

Çavkanî / References

Ahmed, B. O. (2017). Evliya Çelebi Seyahatnamesi'ne Göre Musul, Şehrizor ve İmâdiyye. Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Sakarya Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü. Sakarya.

Akbaş, M. (2015). Evliya Çelebi'nin Gözüyle Kürtler ve Kürdistan, Artuklu Akademi | Journal of Artuklu Academia, 2(1), r. 45-58.

Alçıtepe, A. G. (2021). Kürdistan ve Kürd Aşiretleri, Peywend Yayınları, Van.

Alpaslan, M. (2014). Evliya Çelebi Seyahatnamesi'nde Kürtler. Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı. Mardin.

Baluken, Y. (2022), Mihyeddîn el Xetîb el Cizîrî (el qirnê 11. h. / 17. m) Min Xilal Muelîfat we Mextûtat, Govarî Benkey Belgandin û Lêkolînewey Jîn, Jimare: 13, (r. 5-18)/, . الخطيب محيالدين الجزري(القرن ١١هـ١٧/م) من خالل مؤلفاته ومخطوطاته

Bilgin, A. A. (2007). Nesîmî, TDV İslam Ansiklopedisi, https://islamansiklopedisi.org.tr/nesimi (18.11.2024).

Bozkurt, İ. (2022). Aşiretler Tarihi, Nûbihar yayınları (Genişletilmiş 2. Baskı), İstanbul.

Bruinessen, M. V. (1985). Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebinin Notları. Studia Kurdica. Hejmar 1-3. r. 13-38.

Çelebi, E. (1935). Seyahatname Anadolu-Suriye-Hicaz (1671-1672). (Cilt 9). İstanbul Devlet Matbaası, İstanbul.

Doskî, T. (2020). Baxê Îrem -Geştek li Nav Şi'ra Kurmancî ya Klasîk- (Amd. M. Zahir Ertekin), Dara Yayınları, İstanbul.

Evliya Çelebi (2010). Evliya Çelebi Seyahatnamesi, Cilt 4. (Haz. Yücel Dağlı-Seyit Ali Kahraman). İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

Gülenç, A.(2022). Evliya Çelebi'nin Seyahatname Adlı Eserinde 17. Yüzyıl Cizre Ve Çevresine Dair Gözlemler. Şırnak Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi 28, r. 53-75.

Hirik, E. (2023). Diller, Lehçeler Ve Ağızlar Bağlamında Evliyâ Çelebi Seyahatnâmesi. Karadeniz Araştırmaları, 20(77), 215-236.

Okumuş, E. (2008). Evliya Çelebi'nin Seyahatnâme'sinde Tatvan ve Çevresi. Selçuk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Dergisi, (24), 187-216.

Öncü, M. (2013). -Evliya Çelebi'nin Seyahatnamesinde Kürtler-, Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler, Uluslararası Sempozyumu, Bingöl Üniversitesi Yay. Bingöl, 38-46.

Seyehatnameya Evliya Çelebi, Nusxeya Destxet a Zanîngeha Stenbolê, Pirtûkxaneya Berhemên Nadîr, Destxetên Tirkî, no:3234, rûpel 489b, r. 491.

Seyehatnameya Evliya Çelebi, Nusxeya Wien Austria, No: Cod. H. O. 193, Tārīḫ-i Seyyāḥ, Evliya Çelebi, 83.

Seyehatnameya Evliya Çelebi, Pirtûkxaneya Suleymaniyeyê, Beşa Hecî Beşîr axa, no: 449, cild: 4, rûpel: 192b.

Seyehatnameya Evliya Çelebi, Süleymaniye Kütüphanesi, Pertev Paşa Bölümü, nr. 459.

Strana Çûme Cizîrê (Dema gihandina dawî: 10.10.2024): https://www.youtube.com/watch?v=8qqU6hBlTxs .

Tekcan, M. (2010). Evliya Çelebi'nin Seyahatnamesinde Diller ve Türk Lehçeleri. Atatürk Üniversitesi Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi, 11(27), 67-75.

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

مدينة "نصيبين" في مصادر العصر الآشوري الحديث (912-612 ق.م)

(The City of 'Nusaybin' in the Sources of the Neo-Assyrian Period)
(912-612 BC)
(Yeni Asur Dönemi Kaynaklarında Nusaybin) (M.Ö. 912-612)

Farouk ISMAIL*

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatin: 14.05.2024
Accepted // Pejirandin: 26.08.2024
Published // Weşandin: 29.11.2024
Pages // Rûpel: 118-129
DOI: 10.55106/kurdiname.1483897

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/

Citation/Atif: Ismail, Farouk, (The City of 'Nusaybin' in the Sources of the Neo-Assyrian Period) (912-612 BC), 2024, *Kurdiname*, 11, r. 118-129

Plagiarism/Întîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

ملخص

نُصيبين مدينة قديمة، في ولاية ماردين، جنوب شرقي تركيا. من المعروف أنه كانت من المراكز المهمة للديانة المسيحية، وبرز فيها علماء باللغة السُريانية. ولكن تاريخها الأقدم غير معروف بشكل مناسب.

يعتمد البحث على المصادر الكتابية (المسمارية) القديمة لإضاءة ملامح من تاريخ المدينة خلال الألف الأول ق.م؛ فقد كانت في البداية مركز مملكة آرامية أسستها قبيلة تيمانا في القرن العاشر ق.م، ولكنها لم تدم طويلاً، لأن ملوك آشور رأوا أنها تشكل خطراً على الحدود الغربية لمملكتهم، وتمنعها من تحقيق أطماعها في السيطرة على شمالي سوريا، ولذلك قاموا بحملات عسكرية متكررة حتى أنهوا الحكم الآرامي فيها، في 896 ق.م، وجعلوها مركز مقاطعة تابعة لآشور.

يعرض البحث تاريخ نصيبين تحت الحكم الآشوري خلال القرنين التاسع والثامن ق.م، من خلال أخبارها المذكورة في الحوليات الملكية الآشورية، التي تتضمن أخبار حملاتهم العسكرية وانتصاراتهم بشكل مفصل، وكذلك الأرشيف الرسمي للمملكة الآشورية. ويتضح فيها أن القصر الملكي الآشوري كان يعين حكام المدينة، ويتسلم منها الضرائب التي تُفرض على السكان. واللافت للانتباه أنه ليست هناك أخبار عن نصيبين في القرن السابع ق.م، ما عدا إشارة سريعة إليها في نص من سنة 612 ق.م، لدى وصف قضاء التحالف البابلي-الميدي على مملكة آشور، وهروب مجموعة من الأسرة الحاكمة إلى حرّان.

ونظراً للطبيعة الرسمية للمصادر التاريخية؛ فإننا لا نجد فيها معلومات مفيدة عن الأوضاع الداخلية العامة في المدينة، ولعل اكتشاف موقعها القديم يوفر مصادر كتابية تفيد في توضيح ذلك.

الكلمات المفتاحية: نُصيبين، تركيا، الكتابات المسمارية، الألف الأول ق.م

Abstract:

Nusaybin (Latin: Nisibis) is an ancient city, in the province of Mardin, southeastern Turkey. It is known that it was one of the important centres of the Christian religion, and many scholars of the Syriac language emerged there. But its earliest history is not properly known.

(the ology) ،ل گەل creed)- دەستورێ باوەریا مەسحیی) هەڤواتایە. هەر دەسپێکێ ب گشتی ل دروشمێ ئایینیێ و هونەرێن جوان و ب تایبەتی د شعرێدا ب کارهینایە .هەتا نوکە ل پانتایی واتاسازی و بیرکاری و لۆژیکدا، بەها و نرخێکێ هێما گەلی هەیە))(مەحموو، ۲۰۰۹،ل۱۸۸).مروڤێ دەسپێکێ ((هێما ل گەل ئێك ژیانە ودپێرابوونێن ئایینی و ئاهەنگاندا بکارهاتیە, ئەڤ هێمایە زێدەتر رویێ گیانەوەرەکێ پەرستنێ بۆ دکەن یان یێ مروڤەکی بوو))(حسن، ۲۰۱۷،ل۹) هوزان وەکی ((ئێك ژ ژانرێن ئەدەبی و ژ بۆ خۆ نەمر بهێلیت و روبەرێ بەلاڤبوونا خۆ بەرفرەهتر لێبکەت، مفایەکێ مەزن ژ ژانرێن دی وەرگرتیە. بۆ نموونە: ژ شانۆیێ تەکنیەکا کاریگەر(هێما) خواستییە تا بەرهەمێ خو پێشبێخیت, ب کارهێنانا هێما دشانۆیێدا، ب مەرەما زارڤەکەر بشێت زێدەتر ژ رولەکی د شانوگەر یەکێدا ببینیت،یان بشێت ژیانا کەسایەتێن میتولوژی بکەت، لێ د هوزانێدا،هوزانڤان ئێکبوونێ ل گەل دکەت و ب زمانێ وی دئاخڤیت, هندەك ژ سیمایێن وی وەردگریت, تا ئەو و هوزانڤان دبنە گیانەکێ نوی، نە هوزانڤانونەکەسایەتی))(RIK ZEBARI, BR Huseein, (2023).r.464) .

(ئیتس [*]) ی، هێما ژ بۆ مەرەمەکا هونەری ب کارهینا ول دەڤ ئیتسی،((هێما هەلگرێ چەندین ئەرکێن سوفیگەری و جادوگەری یە.... د شانوگەریێن وی یێن هوزانێدا، هێما رامانا بەرزەکرن و ڤەدیتنێ دبیینیت، واتە ئەرکەکێ سوفیگەری هەیە؛ لێگەریانێ ل دەروونەکێ هەڤڕێ دەروونێ خۆ دکەت)), (**حسن، 2010 ،ل ۲۳**) (ل دەڤ پاوەندی [**]) خۆدێ هوزانی د هەمان دەمدا،((کومبوونا خۆدێ هوزانڤانی ویێ کەسایەتیا دیروکی یە. هوزان نڤیسینە؛ هاتن و چوون دناڤبەرا هەر دوو خواندا هەیە, ب ڤێ ئێکێ، هوزان دهێتە ڤەگوهاستن بۆ سترانکیا زەلال.تا وی رادەیێ یا ل بەر وەرگری زەحمەتە جوداهیێ دناڤبەرا هەردوو خواندا بکەت, فرەهـ دەنگی؛ هوزانڤان دێ کەسایەتیەکا درامی یا نوی ژ کەلتورێ مروڤایەتیێ، ئەفسانە و هێمایان، دئاشوپا خۆدا ئافرینیت، دا خۆ ل پشت ڤەشێریت و نەچاردکەت ب بەتە سەردەمێ وی تا چارهنڤیسی نیشانبدەت))، (**حسن، ۲۰۱۷ل ۲۳)**دێ شێن بێژین ((کو ئەوان هێمایان کارتیکرن ل سەر ژیانا خەلکی هەبوویە و ئەو هێما دناڤ بیروباوەر و رەوشت و تیتالێن واندا بنەجهبوون و ب کارهینانا وان ژلایێ هوزانڤانانڤە نیشانا هندێ بوو کو ئەڤ هێمایە ل دەڤ خەلکی دناسیاربوون و خەلکی ب بیهستنا وان هێمایان بیر ل ئەفسانە یان چیروکان کو پەیوەندی ب وێ چەندیڤە هەبوو دکر و مەبەستا هوزانڤانی دگەهشتن))) **(خالد، 202، ل ۸۰),**ژ نموونێن هێمایێن بەرنیاس ل دەڤ مللەتان وەکی هێمایێن ((بیرکاری و فیزیا و کیمیا و هندەك زانستێن دی و ل گەل هێمایێن زمانیێن د سروشتیدا بۆ مە ماین وەکی تێکبرنا ئەنیێ هێمایە بۆ عێجزیێ و تورەبوونێ و سوربونا سەروچاڤا هێمایێە بۆ شەرمێ' هەروەسا ژ هێمایێن تیتالی و ئاینی هەیڤ هێمایە بۆئاینێ ئیسلام و خاچ هێمایە ۆ ئاینێ مەسحیەتێ، هەروەسا شێر هێمایە بۆ وێرەکیێ و کوتر هێمایە بۆ ئاشتییێ و سە هێمایە بۆ وەفادارییێ و دلسوزییێە...هتد))(**علی، ۲۰۱۷،ل ٦**.)

4.1. ئەگەرێن بکارهێنانا هێمایان:

هەتا کو ئەگەرێن دروستکرنا هێمایان بزانین، ئەم پێدڤی ب بەرسڤا ڤان پرسیارانە ((ئەرێ بۆچی ل دەمێ هوزانڤان دەربرینێ دکەت، تەکنیکا هێما ب کاردهێنیت؟ بۆچی ئێکسەر بوچونا خۆ،پێشکێش نە دکر؟ ئەگەر راستەوخو پێشێشکر بوو دا چەوا هێتە وەرگرتن؟ دا کارتێکرنا وێ چەند بیت ؟ ئەو چ ئەگەرن هوزانڤانی پالدەن، هێمایان د هوزانێدا ب کاربینیت؟))(**حسن، ۲۰۱۷ ، ل٦٦**), دێ شێین ب کورتی بەرسڤا ئەڤان پرسیارادەین: داکو خۆ پشت وان هێما ڤەشێریت ژبەر چەند هوکارەکا یا ئێکی ب دبیت ژبەر وی سەردەمی بیت یێ تێدا ژیایی، یا دوویێ بیت ژبەر ژیانا خۆ یا تایبەت بیت، ژبەر وان هوکارێن مە بەری نوکە بەحسکرین,مە بەری نوکە ئاماژە ب وێ چەندێدا کو ژبەر وی سەردەمێ تێدا ژیایی (بیت وی دەمی ئەگەر راستەوخۆ ئاماژە دا بۆ گوتنا خۆ دبیت ژیانا وی کەقتبوو مەترسیێ)،هەروەسا (ئەگەر راستەوخۆ ئاماژە دا بۆ ژیانا وی نەدڤیا کو هەمی کەس ژیانا وی راستەوخو ب بینین (ZEBARI, R.I.K , HUSEEIN. B. R, ABDULRAHMAN. L. M, AMEEN, S. T. M,(2022),r.129)، دا کارتێکرنا وێ هوزانێ یا کێم بیت خواندەڤانی چ خوشی ژێ نەدیت چونکی هێما تەمومژیێ د هوزانێدا چێدکەت ب ئەڤێ تە مومژیێ خوشێ بۆ خواندەڤانی چێدبیت, وەکی ئەڤ چەندا مە بەری نوکە ئاماژە پێدایی کو (ئەو هوکار، تەمومژی) ئەڤە دبنە ئەگەرێ هندێ کو هوزانڤان هێمایان دهوزانێن خۆدا ب کاردهینیت(Zebari, R. I. K. & Babayiğit, V. (2022).r.105)، ب کارهێنانا هێما چەند هوکارێن هەین کو ئەڤە ژی گرنگترنێن وانە:

۱/ مەبەستا ئیستاتیکی: هونەرمەند ب مەبەستا پێدانا بهایەکێ ئیستاتیکی بلند و ئاستەکێ باشێ هونەری ب بەرهەمێ خۆ و دەرئێخستنا هێزێ ئافراند هەواریێ بۆ هێمای دبەت.

٢/ مەبەستا سیاسی: هونەرمەند گەلەک جاران ب ئەگەرێ مەبەستەکا سیاسی و ترس ژ دەستهەلاتێ ل بەرهەمێن هێمایدا ب کاردهنیت ب مەبەستا گوزارشتکردنێ ژ هزروبیرێن خۆ خوپاراستن ژ زوریا دەستهەلاداران.

٣/هوکارێن کومەلایەتی:هندەك جاران هونەرمەند ب ئەگەرێن رێورەسمێن کومەلایەتی نەشێت ب ئاشکرایی هندەك تشتان دەرببریت و هێمایان ب کاردهینیت.(مستەفا، ٢٠٠٩ ,ل١٦٨)

5.1.جورێن هێما:

هێما ژی وەکی هەر بابەتەکی ژ چەندین جوران پێکدهێت مە ژی قێرە ئاماژە ب هندەك جورا داییە.

1.5.1.هێمایێن ئەفسانەیی:

هێمایێن ئەفسانەیی ئێک ژوان هێمایانە کو هوزانڤانی مفا ژێ وەرگرتی بۆ هوزانێن خۆ((گەلەك بەش ژ رویدان و کەسایەتیا و پەلەوانێن چیروکێن ئەفسانی بووینە هێمایێن شیعرێ و ژ لایێ شاعرانڤە ب کاردهێن، ب ئەگەرێ ئەوان ئیحیاو لێکدانەڤە واتایی بۆ ئەڤان رویدان و کەساییەتیان کرییە؛ ژبەر هندێ شاعیر ب نێزکیڤە و لێکچوان بۆ سەردەمی و بارودوخێ خۆ ب کاردهێن، ب ئەڤێ ژی ئەفسانە دێبیتە بەشەك ژ بنیاتێ شیعرێ))(ئەحمەد، ٢٠١٣،ل١٨٧) . هەر وەکی ((ئەلبێرکامۆ (١٩١٣-١٩٦٠) ئاماژە پێکرییە کو ئەفسانە دەلالەتەکا هێمایی ڤەشارتی تێداییە، هەر چ وەختبیت شاعری ئەڤ دەلالەتە دیتن چالاك دبیت))(**حەمەد، ل٢١٣**), هەروەسا (هێمایێن ئەفسانەیی) ((ئەو هێمانە کو ئەفسانا ملی وەردگریت و واتا دناڤ خۆدا ڤەدشێریت, وەکی (شێخێسەنعان)هێمایەبۆ(عەشقاپاك)(**ئیبراهیم،٢٠٠٩،ل٩٥**).

ل ناڤ ئەو هێمایێن کو شاعر بکاردهینین ئەوژی: ((سینباد ، سیزیف، تەموز ، ئیشتار.... هتد))(عریش وریدە ،٢٠١٥ ، ص٢٠). چەند هێمایێن دی ئەوژی :((سیزیفوس ، ئەدۆنیس، فۆنیکس، کۆترا شین))(هاجر طیبی، ص١٢.) ((سندی باد ، ئەژدەها، سیمەرخ ، هابیل و قابیل...) هەروەکی (نەسیمە بوسەلاح) دەربارەیی هێما ئەفسانەیێ دبێژیت: ئەو چوار چووڤەکێ بەرفرەە ژ ئەفسانێ وەردگریت کو لێگەریانێن وێ تێدا دلڤلڤن. واتە دەمێ نڤیسەر ئەفسانێ وەکی هێما وەردگریت بهایەکێ هونەری و جوانکاری ل سەر زێدەدکەت))(**علی٢٠١٧، ل٣٢-٣٣**).

2.5.1.هێمایێن ئاینی:

شاعر و نڤیسەران گەلەك گرنگی ب ئەڤی جوری داینە، نەخاسمە د ئەدەبێ کوردیێ کلاسیکیدا ، ژبەر کو ل سەر گەوهەرێ ئایینی هەلبەست دهاتن ڤەهاندن. ئەڤ چەندە ژی د بوو ئەگەر ، هێمایێن ئاینی مینا بن سترەکێ رولێ خۆ د هوزانێدا ب بینت. د سەردەمێن کەڤندا ب چاڤێن پیروز سەحکرنە ئاینی ، بەلێ د جڤاکێ نوخوازدا کو ئەو چ ژ پیروزیێ نزانین ئەڤێ پیروزیێ بن پێ دکەن . دئەنجامدا ئاین فاکتەرەکێ گرنگە، کۆ هێما دهێنە دارشتن د تێکستا ئەدەبیدا، ب تایبەت د ئەدەبا مللەتی ، خودان باوەراندا. وەك ئەدەبا کلاسیکا عەرەبی ، کوردی و فارس(**فەتاح، ٢٠١٦، ل ٣٨-٣٩**), ئاین دیاردەکا کومبیە. ((خودێ هوزانڤانی و گەلەکێن دی تێدا بەژدارن و ژێدەرەکێ بەرفرەهە، چونکەکەلتورێ ئاینی، ژێدەرەکێ زەنگینێ ئیلهاما ئەدەبییە، ئەدیب بابەت و نموونان ژێ وەردگرن. ئەدەبێ جیهانی پری شاکارێن ئەدەبیێن بلیمەتە کو مفا ژ ئاینی وەرگرتین ، واتە هوزانڤان لێگەریانێ ل هێمایەکێ گونجای دکەت و ئێکگرتن و پێکگوهورینا ئەزموونان ل گەل کەسایەتیێن ئاینی کرینە هێما و وەك شیانێن هونەری ل سەر هونەرێ خۆ زێدەکرینە کو ب دەمێن ژ هەڤدوور ب ناڤنیشك هلکرینە....وەك هێمایێن پێغەمبەرا و سوفیان))(**حسن،٢٠١٧،ل١١٦.**) (زۆر جار بەکارهێنانی هێما لە شیعری کلاسیکدا بۆ شردنەوەی بابەتە مەستیەکانیش بەکار هاتووە، مەبنۆشیی لە ئەدەبی کوردییدا لەلای شاعیرانی کلاسیک بە واتا عیرفانییەکەی بە واتای مەستیی و چوونە خەڵوەت و دابڕان لە شتە پووچەکانی دنیا ڕەنگی داوەتەوە، لەژێر ناونیشانی ساقینامەدا بووەتە یەکێک لە بابەتە شیعرییەکانی شاعیرانی عیرفان و سۆفییزم، ساقینامە نموونەی ئەو ئەدەبە بەرزەیە مرۆڤ لە ڕێکخراوێک کۆدەکاتەوە و مەستی خودایی ناسنامەیان پێدەبەخشێت .سەرەتای ساقینامە لە ئەدەبی کوردییدا دەگەڕێتەوە بۆ مەلاپەرێشان کەهێمایان بۆ مەی و مەی نۆشی بەکارهێناوە)(هێمن، مەریوان، ٢٠٢٣،ل ٥٩٠).

چەند نموونەیەك بۆ ڤی جوری (ئەنوەر قادر محەمەد) د شیعرا (پشکۆکانی ناخم)دا، ((کەشێکی ئایینی بە خوودی هۆنراوە بەخشیوە:کە لەم هونراوەدا ژانی مەسیح هێمایە بۆ ژانی ولات و بەشێکیشە لە خودی شاعیر، گەشبینانە

خستووتیەروو))(ح**ەمەد ١٩٩١, ل٢٥).** شاعر (هەمی دەما ب خەیالا پێغەمبەرا دژیت، هەتا کو ناڤونیشانی ژی ناینیت، موعجیزێن وان دکەتە هێما. نە مردووم زیندوو دەکردەوە و(هێما مەسیح)، نە دەچووم بۆ ئاسمان (هێمای محەمەد(د.خ)) (**حەمەد، ١٩٩١, ل٢٥٢.**). (لەئەدەبی کوردیدا چەندین شاعیرمان بەرچاو دەکەوێت، کە لە عیشقی پێغەمبەردا) د.خ (شیعریان نوسیوە، بەو پێیەی کە شاعیرە کالسیکییەکانمان پیاوانێکی دینی بوون، هەروەها شوێن کەوتەی ئەهلی تەسەوف بوون و خۆشەویستی خودا و پێغەمبەری خودا تێکەڵ بە ڕۆح و جەستەیان بووە، لێرەدا هێمای دینیان بەکارهێناوە) (پەری، سروە، بێستوون، هێمن، ٢٠٢٣، ل ٥١).

3.5.1.هێمایێن نەتەوەیی:

هەر نەتەوەیەك خودان هێما و سیمبولێن تایبەتن ، ئەڤ سیمبولە گرێدایە ب سەرکەفتن و کەسایەتیێن ناسیونالی.ئەڤ دیاردە گەلەك ل ئەوی دەمی دهێنە دەربرین ل دەمێ مللەتەك بن دەست و تەپەسەربیت(**فەتاح، ٢٠١٦، ل٤٥-٤٦),** هێمایێن نەتەوەیی((ژ کومەلگەهەکێ بۆ کومەلگەهەکا دی دهێنە گهورین، چێدبیت ژی ل سەر بنیاتێ ژ نیشکەکێڤە یان پەیوەندییێن دناڤبەرا دوو یان چەند جڤاکان، وەکهەڤییەك دناڤبەرا هێمایێن نەتەوایەتییێن واندا هەبیت، لێ ئەڤ چەندە کێم جاران رووددەت، لەورا زمانێ مللەتەکی ژ مللەتەکێ دی یێ جودایە هەروەسا د ناڤ دیالیکتان ژیدا و د ناڤ کومەلێن خەلکییێن سەر ب دیالیکتەکێ ڤە جودایی دناڤبەرا هێمایێن نەتەوەیدا هەیە))(**خالد، 202ل ١١٧).**

4.5.1.هێمایێن کەسی (تاکە کەسی):

ئەڤ جورێ هێما پەیوەندیەکا ئێکسەر ب کەسێڤە هەیە, رامانێن هێمایێن کەسی ب تنێ بۆ خودانێ هێمایێ دئاشکرانە. کومەلگەهـ چ رولێن دیارکری د درستبوونا ئەڤی جورێ هێمایێدا نابینیت(**فەتاح، ٢٠١٦، ل ٤١-٤٢**), هێما کەسی ((بیاڤەکێ ئازاد بەرامبەر ئەزموونا کەسی ڤەدکەت و دەرڤەتەکا باشتر بۆ هەلبژارتنا هێمایێن خودی، یێن نواندنا ئەزموونا کەسی ب شێوەکێ تایبەتمەندتر دکەت، ب ڤێ ڕێکێ هێما دبیتە دیارکرنا خودانی ل گەل خەونێ ژبەر کو ئەو شێوەیێ راستەقینە و نە راستەقینە هەلدگریت و بازنەیێگەهاندنێیە دناڤبەرا پالدەرێن جیاواز))(**علی، ٢٠١٧،ل٢٨-٢٩.),** هندەك جاران((بۆ مروڤی ل جهەکێ دیارکری رویدانەك دروستدبیت کو دبیت ئەڤ رویدانە ب بیتە ئەگەرێ دروستبوونا حالەتەکێ خوشی یان نەخوشییێ ل دەڤ مروڤی، ئەڤ چەندە ب تنێ بۆ وی مروڤی ریدابیە، واتا پەیوەندی ب وی مروڤی ب تنێڤە هەیە، لەورا هەردەمەکێ ناڤێ وی جهی دهێت ؛ ئەو مروڤ هەست ب خوشی یان نەخوشییێ دکەت و ناڤێ وی جهی ل دەڤ وی مروڤی دبیتە هێما بو وی هەستی و کەسێن دی کو ئاگەهـ ژ سەربوورا کەسی یا وی مروڤی نینە هەست ب چ خوشی یان نەخوشییان ناکەت و وێ پەیڤێ وەك هەمی پەیڤێن دی وەردگرین و ژ واتایا فەرهەنگییا رێککەفتی ژلایێ کومەلگەهێڤە دەرناکەڤن)))(**خالد،٢٠٠٢, ل ١١٨**). شاعر هێمایێن کەسی ب ((دوو شێوازان دروستدکەن، یا ئێکێ ب کارهێنانا نوی هێمایێن کەڤن، ئەڤ کارە ژی ژ لادانا واتایی نێزیکەت, یا دوویێ ب خولقاندنا هێما نوی، ئەڤژی لێلی زمانی شعیریی لێکدەکاتەوە))(مەحمەد عەبدولکەریم ئیبراهیم، ل٩٥.).

5.5.1.ژمارە وەك هێما :

ژمارە ژی جورەکە ژ هێمایان کو هوزانڤانی ب کارهینایں د هوزانێن خۆدا ((ژمارە وەکی هێما ل کەلتور و روشنبیرێن گەلەك نەتەوێن جیوازێن جیهانێ بووینە هێما، ل هەر سەردەم و کومەلگەهەکی و هەر ئاینەکی و هەر دابونەریتەکی ژمارە و واتا ڕەمزان یا جیاوازە))(سافیە مەحمەد ئەحمەد، ل١٩٣) نموونە (٤ وەك هێما بۆ چوار پارچەیێن کوردستانێ ، پێنج هزار وەك هێمایەك بۆ شەهیدێن هەلەبجە، (١٨٢) هزار وەك هێما بۆ ژمارانەنفالێنکوردستانێ ...هتد)(**حەمەد، ١٩٩١ ل٤٠٦.**). هەروەسا ژمارە ((بۆ مەبەستا ئاینی د هوزانا سوفیزما کوردیدا، وەکی ژمارێن رکاعەتێن نڤێژان ، وەک ژمارە (٣،٤،٢) گرنگی پێ دهاتە دان ب تایبەتی ژمارە (١) کو ڕەمزەکا بەربەلاڤە د ناڤ ئەدەبێ کلاسیکدا، ئەو ژی هیێمایەکە بۆ یەك تاپەرستنێ. ئانکو هندەك نڤیسکاران بۆ مەبەستێن ئولی و هندەکان بۆ مەبەستێن نەتەوەیی و فیلۆسوفی دناڤ دەڤێن خۆدا ب کارهیناینە))(**فەتاح، ٢٠١٦، ل ٥٠.).**

6.5.1.هێمایێن سروشتی:

هوزانڤانان گرنگیەکا مەزن ب سروشتی دایە و مفایەکێ زێدە پێ دایە، ((سروشت، ئەو گیانە یێ مروڤ ل دەمێ د گەلدا دژیت و هەست ب ئارامیێ دکەت، لەورا ل دەمێ بهێنتەنك دبیت، حەز دکەت ل گەل سروشتی بمینتە بتنێ و هەست

ب تەناهیا گیانی دکەت. هوزانڤان مروڤە و پێدڤی ب ئارامیێ هەیە. ل دەمێ دگەل سروشتی دژیت، شیان هەنە ب دەربرینەکا ژ هەژی و جودا ژ کەسێ ئاسایی، بەرهەمەکێ ژێ ب ئافرینیت و چ رێگر نینین هێما ، نوینەرێ رەگەزێن سروشتی یان پێکهاتێن وێ وەك : باژێر،دار،پر،رویبار،...هتد.بیت، واتە هوزانڤانی پێکولێ دکەت یێ کاملان و تەڤگیربیت، لەورا بۆ ب دەستڤەهێنانا هێمایێن گونجایی، ل هەمی کوژیێن ژیانێ دگەریت و هەمی دەرگەهان دقوتیت))(حسن، ۲۰۱۷،ل۱۳۵.).
هێمایێن سروشتی ((پشبەستنێ دکەتە ل سەر وەرگرتنێن نەستی و وێنەکرنا هژمارەیەك ژ شێوەیێن دەستپیکی و هزرکرنێن وێ))(**علی، ۲۰۱۷ ,ل٤١**), هێما سروشتی ((ژ کەسەکێ بۆ ئێکێ دی ناهێتە گوهورین بهایێ وێ ئێکە ل دەڤ هەموو کەسان واتا و رامانا وێ یا ژ نیشان و نیشانکری هاتی))(**حسن، ۲۰۱۷،ل۱۳۵**). نموونە (باران ب گشتی هێماییە بۆ خێر و بێر و بەرەکەتێ...هتد، پایز هێمایە بۆ پیری و نەخوشی و سیس بوون...هتد، شەڤ هێمایە بۆ تاریکی و خەم و خەفەت و ژیانی تالی و زلم ...هتد)(میڤانحسێنعلی۲۰۱۷،ل٤١).

7.5.1.هێمایێن مێژوویی:

ئەڤە ژی وەکی هەر هێمایەکا دی هوزناڤانان دناڤ هوزانێن خۆدا ب کارهینایە ((ئەو هێمانە کو ل رودانێن مێژوویی وەردگریت ئەڤجا چ ناڤێ کەسەکی بیت یان ناڤێ باژێران یان ناڤێن رودانێن دیارکری وەکی پەیماننامێن سیاسی))(**محەمەد عەبدولکەریم ئیبراهیم، ،ل۹۵.**), مێژوو((رودانێن راستی تومار دکەت کو ل بیرهاتنێن ب کومەلدا ڤەشارتینە و ناهێنە ژبیرکرن و شاعیر ئێکە ژ ئەندامێن ئەوی گروپی ، ژبەر هندێ مێژوو رودانێن خۆ د نڤیسینا شعرا خۆدا درەخسیت بۆ گەهشتنا ئارمانجێن شعرێ))(**عریش وریده ، ص۲۱**). شاعیر ژی ((مفای ل ئەڤان ژێدەران دبینین و چەندین هێما ژ مێژوویێ وەردگرین))(**سافیه مەحمەد ئەحمەد، ل۱۸۹**),(چی گیڤارا) هێمایە ژبۆ بەرخودانێ، (جەنگیزخان) هێمایە بۆ کوشتن و تالانێ ، دیسان جەنگ ژی وەك هێما ... مینا جەنگێ (چالدیران) کو هێمایەکا ئەکتیڤە بۆ مللەتێ کورد هەتاهەتایێ ناهێتە ژبیرکرن(دلێر داود فەتاح، ل ٤٣). هێمایێن دیروکی د گرنگن ((تارادێ هندەك نڤیسەر ل دەمێ پێناسا هێمایی دکەن ب هێمایا مێژوویڤە گرێددەن))(حسن، ۲۰۱۷ ل۱۲۷.). هوزانڤان((هوراتیێن رووداننێ ڤە دکێشیتە سەردەمێ خۆ و بۆ لێکدانا هزر و پەیامێن بەرهەمێ خۆ بکاردهێنیت و کەسایەتیێن دیروکی یێن ل گەل هزر و ئاریشە و خەمێن دەربرینێ ژێ دکەت هەڤدگرن، هەلدبژێریت و دکەتە هێما)) (**حسن،۲۰۱۷ ل۱۲۷**).. ژ باشیێن مروڤ و هونەرمەندان ئەوە کو ((دشێت مفای ل رویدان و شارەزایێن رابردووی د پێکهینانا تێگەهێن نویدا وەرگرن، ژبەر کو هەر پرسیارەکا مروڤایەتی یا کو مروڤتیدا د ژیت ل هەر جهەکێ ل سەر رویێ ئەردی پرسیارا هەمی مروڤێن جیهانییە، ئەڤە وێ چەندێ بۆ مە روون دکەت کو رودانێن مروڤایەتییێن جیهانی پرسیارێن هەمی مروڤانە ل سەر رویێ ئەردی و هونەرمەند د شێت ڤان کارەساتان وەکی هێمایێن مێژوویی د بەرهەمێن خۆدا بکاربهینیت، بۆ هندێ دا بیرا خواندڤان و وەرگری بزڤرینیت و ب بیتە هەولەك بۆ دووبارە نەبوونا ڤان کارەساتان، نموونە ژی کارەساتا (هیروشیما)ل یاپانێ، یانژی کارەساتا (حەلەبجە)ل هەرێما کوردستانێ، کەواتە دڤێت هونەرمەند ب تنێ خۆ ب رویدانێن ناڤخوییڤە گرێنەدەت ، ژبەرکو پرسیارێن مە نەهاتینە دابرین ژ پرسیارێن مروڤەکێ دی و ئەزموونا مێژوویێ یا بویە رویدانەك و ب داوی هاتی و زڤراندنا وێ دبیتە مەبەستەك بۆ نوکە، ئەوێ هێشتا ب دوماهی نەهاتی، هەروەسا هەلبژارتنا نڤیسەری ب هێما نموونەیا مێژوویی دڤێت یا ئاراستە کری بیت، ئەڤەژی بۆ وێ مەبەستا ئەو دبینیت کو رەنگڤەدانێ ل سەر دەمێ نوکە بکەت و روون بکەت. کەواتە هێمایا مێژوویی زڤراندنا هندەك رویدان و هەلویستێن دەستنیشانکری یێن چوویێ کو بۆ مەبەستەکا دەستنیشانکری یا نوکە دهێنە بکارهینان))(**علی، ۲۰۱۷ ل۳۰-۳۱),** هندەك نموونێن هێمایێن مێژوویی: کەسایەتین مێژوویی کوردی((شێخ عوبەیدللای نەهری، شێخ محموودی نەمر، بارزانی نەمر. هەروەسا بیێت بیانی ژی: بیێت پۆزەتیڤ: لۆمۆمبا، لۆرکامایاکۆفیسکی..هتد،بیێتنیگەتیڤ:جەنگیزخان،هۆلاکۆ،هیتلەر،نیرۆن،سەدام.....هتد)) (**میڤان حسێن علی، ل۳۰-۳۱**)، ((چەمکێ هندەك ژ رووداوێن کاریگەر و گرنگ، نموونە رووداننێن قەلا دمدم، دوانزدە سواری مەریوان ،.... هتد)) (**علی، ۲۰۱۷ ل۳۰-۳۱**), ((جهێن مێژوویی: قەلا دمدم ، قەلا هەولێر)), (علی، ۲۰۱۷ ل۳۰-۳۱).

6.1. هێمایێن مێژوویی د هوزانا کوردیدا :

1.6.1. **هێما د هوزانا کلاسیکا کوردیدا:**

کەسایەتین ئەدەبێن کەڤن ((زێدەتر هوزانڤان بوون, ئافرێنەر، کەسایەتیا هوزانڤانەکێ مەزن دکەتە هێما)) (حسن، ۲۰۱۷ ل۱۲۷), نەبوونا ئێکەتییا بابەتی((ئەگەرەکێ دی یێ سنورداکرنا هێمایێ بوو، چونکە ب کارهینانا هێمایێن دیارکری و ڤالاکرنا وان ژ واتایا فەرهەنگی و بەخشینا واتایەکی ل دیڤ رێرەوا هوزانی پێدڤی ب هوزانەکێ بوو کو ئێکەتییا بابەت تێدابیت و دەلیڤەکا زێدەتر بدەتە نەفسا هوزانڤانی و ژبەر نەبوونا ئێکەتییا بابەتی وێنێ گشتی د سنووری ئێك دێردا دهاتە سنوردارکرن و بیاڤ نەددا کو وێنێن لاوەکی دروست بین و هوزانڤان نەچار د بوو کو هێمایان دوی چوارچووڤیدا بکاربینیت و نەدشیا پەیوەندی ئورگانیزمی دناڤبەرا وان هێما و واتایێن دیتر د هوزانێدا دروست دکەت. هەبوونا کێش و سەروایێ ئەگەرەکێ دییێ سنوورداركرنا هێما بوو و بکارهینانا کێش و سەروایێ هوزانڤان نەدشیا گەلەك پەیڤێن جوراوجور بکاربین، چونکە ل گەل کێش و سەروایا هوزانێ نە د گونجان و کومەلە پەیڤێن دیارکری هەر کێشەکێ هەبوون کو زوریا هوزانڤانان ل سەر دچوون، هەبوونا مەبەستێن دیارکری، هوزانڤان ژ بکارهینانا گەلەك ژ رویدانێن وەك بابەت بو هوزانێ دویر ئێخستبوو و ب کارهێنانا کومەلە پەیڤێن دیارکری، رێ ل بەرفرەهبوونا واتایا پەیڤان و ب کارهێنانا وان وەك هێما گرتبوو. ژبەر زالبونا لایەنێ ئایینی ل سەر هوزانا کلاسیکی؛ هێما ژلایێ هوزانڤانێن ڤێ قوناغێڤە دهاتنە ب کارهێنان دکەتنە بن سیبەرا ئایینی، واتا بابەتێن هێما هوزانا کلاسیکیدا پتر ئایینێ و فەلسەفی بوون و لایەنێ فەلسەفی ژی فەلسەفا سوفیگەری بوو کو دکەڤتە بن سیبەرا بابەتێن ئایینی))(**خالد، 202، ل۱۲۲-۱۲۳.)** بۆ روونکرنا ئەڤێ چەندێ دێ چەند نموونەکا ژ هوزانێن کلاسیکی هیین، نموونە:نالی د بێژیت:

((تەبعی شەککەرباری من کوردی ئەگەر ئینشا دەکا ئمتیحانی خۆیە مەقسوودی لە عەمدا وا دەکا دڤێرەدا نالی بەرهنگاریا وان کەسا یا کری کو رەخنەیا لێگرتی کو بوچی شیعر ب زمانێ کوردی داناییە؟ کو ژلایێ رەخنەگرانڤە هەر د وی سەردەمیدا دڤێت شیعر هەر ب عەرەبی، یان فارسی ب هێنە گوتن ، نالی ژی ئەڤ دەرگەهە ڤەکری کو زمانێ کوردی ژی بینیتە رێزا زمانێن دی ، بکەتە بەلگە و هێز و دەولەمەندی، چونکی نالی باوەری ب بلیمەتی و زانین و لێهاتیا خۆ هەبوو ، باوەری هندێ هەبوو، کو ئەو ل وێ ئەزمونا مێژوویدا کو ژیانێدا کەفتیە ئیستایدا دێ سەرکەفتی بیت، ژبەر هندێ کرە هەوار.ئەڤە کارەکێ ب مەخسەتو ب هشیاریڤە دکەت، خەلك ژی ل دیڤ دەستورێ کەڤن هزرناکەت، بلا سەحکەنە ناڤەروکا شعرێن وی و بزانین ب رێکا ب کارهێنانا زمانێ کوردی چ رامان و مەبەستەکا هویر و مەزن هونەرمندیانە دەردبریت))(ئامێدی، ۲۰۰۳،ل٦٦-٦٧.). (هەروەها بەکارهێنانی هێمای قژ یان زولف بەواتای سەرگرتنی شەراب بەکارهاتووە هەموو ئەم هێمانە لە شیعری کلاسیکدا بەکارهاتوون و بوونەتە مێژووی هێما لە نێو ئەدەبتاتی کورد و فارسدا)(مالمیر، هێمن، ۲۰۲٤، ل ١٤٤)، (زۆرجار هێما لە ئەدەبی کلاسیکدا بە شێوەی ڕەوانبێژیش هێماکانیان بەکارهێناوە بۆیە هێما لەنێو بابەتە مێژووی و کلاسیکیەکاندا بەکارهاتوون)(هێمن، ڕەبیع، ۲۰۲۳، ل ٤٣).

2.6.1. **هێما د هوزانا نویا کوریدا:**

هوزانڤانێین نوی ((ب چەندین رەنگان هێما ب سادەیی بکارهینایە، ئێك ژ وان، بکارهیناناا(فلاش باك)کو تێدا هوزانڤان هێمایان ل گەل واتایا فەرهەنگی یان رویدانی ب کاردهینیت و ب هاریکاری یا وان بەرهڤ پاشڤە دزڤریت و دەمێ بەرهڤ پاشڤە دچیت(Zebari, R. I. K., & Huseein, B. R. (2023).r.57)؛ دەلالەتێن هوزانی کێم دبن و قالبێ رویدانێ دا دمینن و هێما نێزیکی قالبێ کلاسیکی دبیت و هوزانڤان نەشێت وێ ژ واتایا فەرهەنگی یان رویدانی ڤالاکەت)) (**خالد، 2002 ،ل ۸۹.)**، ل دەمێ هوزانڤان هێما د هوزانا نوی یا کوردیدا ((کەڤتیە ژێر کارتێکرنا رویدانێن سیاسی، جڤاکی، ئابوری،ئاینی...هتد ل رەوتێ وێ دەستنیشان کریە، کومەکا ڤەکولەران ئاماژە ب ڤێ چەندێ کرییە))(**نوزاد عبدالله حسن، ماسکداری د هوزانا نوی یا کوردیدا، ل۹٦)**,دەمێ بەحس ل نوکرنا هوزانێ دکەین ((ب وێ چەندێ تەماشە دکەین کو فورم و ناڤەروك پێکهاتا سەرەکی و ئورگانیا وێ هوزانییە، کو ژ ئێک جودا نابن. ئەڤ پەیوەندیە ژی بویە جهێ گەنگەشێ، وەکی کو د رەخنا گرێکیا کەڤندا بینین (ئەرستو)ی، گرنگی ب مەبەستا ئێکەتیا بەرهەمێ ئەدەبی، تایبەت روخساری و هەولا جوداکرنا وێ نەکریە، بەلکو پەیوەندی و پێکڤە گرێدانا ئێك ب یا دیڤە دیارکریە))(**غازی، ۲۰۰۸،ل۱۸)**،بو نموونە:(نەروز) ل نیك هوزانڤانێن نوی:((خەبات،ئازادی،مللەتێ کورد،روژەکانوی، سەرکەفتن،سەربەستی...هتد))(**خالد، 2002 ، ل۱۲٦).**

3.6.1. **هێما د هوزانا نویخوازا کوردیدا :**

نویخواز((نه تێگەهەکێ جڤاکی یان مێژوو یان سیاسیە، لێ دیاردەکا شارستانیە ، ژ تایبەتمەندیێن وێ هەمی ئالیێن ژیانێ ڤەدگریت دیســـان دگەل کەڤنە شـــۆپان هەڤدژە(Zebari, R. I. K., veBabayiğit, M. V., (2022).r37)، ئامادەبونا وێ د هەمی بوار و بابەتاندا هەیە،(مینـاك) دبێژیت دەولەتا نوو، یانژی تەکنولوجیا نوو یانژی ئەدەب یان هونەرا نوو))(**بەرواری، ۲۰۱۰،ل۲٦۸.**). کەواتە نوخوازی رەتکرنا هەرتشتەکی بەری خۆ دکەت و وێنێن کەڤن د شـکێنیت و یێت نوو دروسـت دکەت و هەروەسـا ئەو ب خۆ پەیامێ دروسـت دکەن و پەیوەندیا ب گشـت بوارێن ژیانێڤە هەیە. ب کارهینانا هێمایێن کەڤن ژلایێ هوزانڤانێ نویخوازڤە وێ چەندێ دگەهینیت کو ((هوزانڤانێ هەڤچەرخ پێکولێ دکەت هێما ب هاریکاریا زمانێ هێمایێن کەڤن پێك بینیت و هێما نموونەکا رەسـەنە کو دەربرینێ ژ راستیەکا مروڤایەتییا رەها دکەت و دەربرینێ ژ خودێ خۆ دکەت ئەفسـانداندا، ب رەنگەکێ کو هوزان و ئەفسـانە دبنە ئێك تشـت))(**خالد، 202،ل۱۲۹**), پەیڤا هێما ژ ((ســنووری مێژوویی تایبەتیێ خۆ دەردچیت زمانێ هوزانێ هەرچەندە ژلایێ ب کارهینانا پەیڤا و واتایا فەرهەنگیڤە یێ جودا نینە ژ زمانێ روژانە، لێ د لێکدان و دەلالەتێدا ژێك جودا دبن چونکە ،زمانێ ئاســایی ئاماژەیی بۆ جیهانێ دکەت و زمانێ شــعرێ ژی ، لەورا د هوزانا نویخوازدا گەلەك پەیڤێن ســـادە دبنە هێما ل دویڤ ب کارهێنانا هوزانڤانی و هەروەســـا ل دویڤ رێرەوا هوزانێ و چەند دەلالەتان وەردگریت. بۆ نموونە دەمێ پەیڤا (چیا) د زمانێ روژانەدا ب کاردهێت مەبەست پێ راستیەکە کو د سروشتیدایە و ژ بەران پێکهاتییە و بلندن ... واتایا وێ یا فەرهەنگی یا دیارە، بەلێ هەر ئەڤ پەیڤە دەمێ ژلایێ هوزانڤانێن نویخوازیڤە ب کاردهێت ژبلی واتایا خۆ یا فەرهەنگی کو د واتایا بەرچاڤا هوزانێدا دەردکەڤیت چەندین واتایێن دی ل دویڤ رێرەوا هوزانێ وەردگریت و دبیت دەلالەتا بەرخودان،مللەتێ کورد،نەچوونا ژێرباریّ ستەمێ،سـەرفەرازی،مەزنی و گەورەیی ،سـەرکردایەتی ، کوردستان، ...هتد. وەرگرتن و ئەڤە پشـتی واتا فەرهەنگی هاتن لێ دێ شـێین بێژین : زمانێ هوزانێ وی دەمی دەسـپێدکەت کو زمانێ فەرهەنگێ دووماهی دهێت یان ئەو هوزانە کو پشـتی خواندنا هوزانێ هوشـیاریا تێدگەهیت، ب ڤێ چەندێ تشـتەکێ ئاســاییە کو،گوهرین ژ نیشـکەکێڤە د واتا واندا بێ گوهرینا پەیڤان پەیدا دبیت، ئەڤ فرەهـــ دەلالەتە دیاردەیەکا هەرە گرنگ دناڤ هوزانێدا پەیدا دکەت ئەو دروستبوونا دژایەتییا روخسـارییە،چونکە مەبەستا هوزانڤانی د روخسـاریدا دەرناکەڤیت پێدڤییە کو خواندەڤان بچیتە ناڤ جەرگێ هوزانێدا و پەیڤان کەت.

لەورا دبینین کو ژ بۆ خزمەتکرنا هزرێ بیروکە هندەك جاران هوزانڤانی چەندین پەیڤێن د روخساریدا، زور ژێك دویر وێنەیەکێ دروست دکەت د نێرینا و سەرپێیدا دژایەتییەکا زور د ناڤبەرا وان پەیڤاندا دیاردبیت لێ دەمێ ئەو ل دویڤ دەلالەتێن وان دهێنە شلوڤەکرن؛ دیاردبیت کو لێکچواندن دناڤبەرا واندا هەیە وێنە ژی وێنەیەکێ بهێزە، لێ پێدڤی ب شارەزایی و شیانێن شروڤەکرنێیە مەبەستێن هوزانڤانی دەرکەڤن.

هەر چەندە ئەڤ کارە دبیتە ئەگەرێ دروستکرنا تەمومژییێ د ناڤ هوزانێدا ل دەڤ خوندەڤانی خودان شارەزاییەکا کێم و بێزارییێ بۆ دروست دکەت و خواندەڤانێ شارەزا خوشییێ دروست دکەت و چێژێ ژێ وەردگریت))(**خالد، 2002،ل۱۳۰-۱۳۱**)، ل سەر خواندەڤانی پێدڤیە ((سەربورێن مللەتێ خۆ بزانیت داکو ژ ئاریشان رزگاربیت و شارەزایی لسەر هەر کودەکی (هێما)یەکی ب دروستی ل سەر راوەستیت. هێما هەردەم یا ساخە و نامریت؛ چ جاران ناکەڤیتە قالبێ واتایەکا دیارکری)) (**خالد، 2002،ل۱۳3-135.**),واتە ئەڤە بۆ مە وێ چەندێ دیاردکەت کو هەر وەکی مە بەری نوکە ئاماژە پێدای کو زمانێ ئاسایی یێ د قالبەکیدا بەلێ هێما یا ئازادە د چ قالبادا نینە. هوزانا نویخواز ((بەرەڤ ئایندەیی چوو، لەورا ژ واقعیی و ئەو تشتێ ئەم تێدگەهین و رویدانێن سادە دویرکەڤت و بەرەڤ سەربورا مروڤایەتی چوو، دیتنەکا ناڤەروکی پەسەند کر، ل شوینا دیتنەکا رووکەشی. ب ڤێ چەندێ ژی نیشانکری زێدەکرن و بەرەڤ تەمومژییێ چوو)) (**خالد، 2002،ل136-137)**..(هوزانڤانێن کورد ژی هەر وەکی هوزانڤانێن بیانی (ئەروپی و عەرەبی) یاخیبوون د گشت بوارێن ژیانێدا کر، هەوەکی (محسن قوچان)ژی دبێژیت: ((هەمی دەما من ستویی خۆ ئێخستیە بەر چەقویێ، دا بەرەڤانییێ ژ وان تشتا بکەم یێن ئەز هزردکەم د بەرژەوەندیا جەماوەرییە و هەمی دەما ئەزیێ یاخی بوویمە)) (**عیماد وەیسی خالد، 2002،ل۱۳۰-۱۳۱.**)،بۆ نموونە (شێرکو بێکەس) ، د هوزانا (دلداری ناو شارێکی مردوو)

پێکرام .. لە پشتەوە .. پێکرام

هەر بەو تیغە زەنگاوییەکەی ...

كه (بەدرخان)ی پێ كوژرا ..

منیش كوژرا(**زیاب,٢٠٠٥،ل٥٣)**

ئەگەر ئەم بهێن و سەحكەینە ڤێ هوزانێ دێبینین كو چەند هێمایێن تێدا ب كارهاتین (بەدرخان : كو هوزانڤانی ئەڤ كەسایەتیە وەك هێمایەك ب كارهێنایە چونكی دە مێ هوزانڤان دبێزیت (پێكرام .. لە پشتەوە .. پێكرام) ئاماژە دەتە هندێ كو هەر كەسەكێ وی مللەتی كو (كوردە) خیانەتاكری و ژبەر ڤی ئەگەری هێما (بەدرخان)ب كارهێنایە، چونكی دەمێ (شێر یەزدان)ی خیانەت ل بەدرخانی كری و ل جهێ خۆ هاتییە دویركرن ،ژبەر هندێ دبێژیت تیغێ ژەنكی ، چونكی هەر ژلایێ مللەتێویڤە بۆ . هەروەسا نموونەكا دی : (فەرهاد پیربال) د هوزانا (شیعرێكی زور درێژ بۆ دایكم)

غەریبیت دەكەم .. **(زیاب،،٢٠٠٥،ل٥٣)**

هەروەكی مە بەری نو كە ئاماژە پێدایی، كو هوزانا نویخواز هوزانەكا ئازادە و گرنكی ب خۆبخۆیا خۆ دكەن, هەر وەكی ڤێ هوزانێ كو ناڤونیشانێ هوزانێ ژ بابەت و ناڤەروكا هوزانێ درێژترە، كو هوزانڤانی ئەو ڤالاتیا د هوزانێدا هێلای وەكی هێمایەكییە ، چونكی ئەو ڤالاهی دبێژیت: (نە شێم چ بێژم بەرامبەر غەریبیا دایكێ).

2. ژیاناما محسن قوچان:

هوزانڤان(محسن محەمەد قوچان)یێ بەرنیاس ب(محسن قوچان)ل سالا(١٩٥٤)ێ ل گوندێ(بامەرنێ)سەرب پارێزگەها(دهوكێ)ڤەژدایك بوویە خواندنا سەرەتایی، ناڤنجی وئامادەیی ل باژێرێ(موسل)ب دوماهیك هینایە،لسالا(١٩٧٦)ێ كولیژا چاندنێ،ل زانكویا موسل ب دوماهیك هینایە. هزراهوزان نڤیسینێ ڤەدگەرینە سالا (١٩٦١)ێ دەمێ خێزانا ئەوی بۆباژێرێ(موسل)ێ هاتییە ڤەگوهاستن ((هێژ ل زاروكینێ ل ئەڤی باژێری من هەست ب جوداهیێكر،كو ئەز خودان زمان،كەلتور و رەوشتەكێ جودامە ژ جڤاكاتێدا دژیام.من دڤیا ئەڤێ جوداهیا خۆ د دهۆزانێدا دەربێخم و ل سالا(١٩٦٩)ێ دەست ب ڤەهاندنا هۆزانێكر و(١٩٧٠)ێ بەلاڤكرن))(**جوقی،٢٠١٦،ل١٨٢-١٨٣**), ل سالا(١٩٧٣)((دەست ژ هەلبەستا ستوینی بەردایە و بەرەڤ هەلباستا ئازاد جوویە, كوماكا لێكولینێن وێژەیی هەنە. كوماكا گوتار و لێكولینێن رەوشەنبیری بەلاڤكرینە))(**جوقی،٢٠١٦ ، ل١٨٢-١٨٣),** هەر ژ زوو هەست و هزرا نەتەوەیی ل جەم هوزانڤانی ئاریایە ((ل سالا ١٩٦٧-١٩٦٨ ئەڤ هەستە ئاریا، كارتێكرنا ئێكێ ژ بابێ وی بوویە كو لگەل شۆرەشا١٩٤٥ێ و برایێ وی دگەل ئێكەتیا قوتابیێن كوردستانێدا بوونافبری دوو جاران ژلایێ حكومەتا عیراقێڤە هاتییە گرتن و ئەشكەنجەدان، جارەكێ ژبەر هوزانێن سیاسی وجارەكا دی ب سەر مالا ئەویدا دگریت وپەرتووكێن ئەوی دبەن ل سالا١٩٧٧ێ هاتە گرتن ب دەستێ ئەمنا عیراقێ و ل سالا١٩٧٨ ێ جارەكادی هاتەگرتن وئەشكەنجەدان،لەورا ل سالا (١٩٨٢) ێ گەهشتە رێزێن شورەشا گولانێ))))(**جوقی،٢٠١٦،ل١٨٢-١٨٣**), نافبری ((ئەندامێ ئێكەتیا نڤیسەرێن كورد – دهوك بوو بۆ ماوێ هەفت سالان ل سالا ١٩٨٥ بەرەڤ هوزانا نویخواز ڤە چوویە. ئەندامێ سەندیكا روژنامەڤانێن كوردە. ژ كوما گروپێ (نویكرن هەر و هەر) بوویە. سەرنڤیسەرێ كوڤارا (مەتینە)سەروكێ سەنتەرێ (روناكبیریێ روژ)ە, ژ دامەزرێنەرێن رێكخراو مافێن مەدەنیە، مەشق ل جنێڤ كریە ل سەر مافێن مروڤی))(**نهێلی، ل٢٧),** چەندین بەرهەم بەلاڤكرینە, دیوانێن ئەوی ئەڤەنە:

((بەفرا ل ڤێرێ (١٩٨٦),وێنە ژ فلمەكێ پرچیایی (١٩٩٤)چاڤێن ئەوێن كچكا هەنێ (١٩٩٥)ئەو روباریێ ژ خوارنا لەشێ خوتێر نەبیت، (١٩٩٧),لایێ گەرم ژ باژێری، (١٩٩٩). ئەو خەونا ل سەر فیستانێ وێ بوویم زاڤا ، (٢٠٠١), درەوەك چەپا سەریبا قاسیونی، (٢٠٠٤),بەری بەفرباریتن،خدرۆ،ستران،ل بەرسڤكامەبوفردباریت- تەڤ دیوانێن هوزانڤانینە.دیسان پەرتووكا(هنگاڤتن ژ پاشەرووژێ)كوپەرتووكەكا سایكۆلوژی-جڤاكیە ل سالا(٢٠١٠)ێ ژ عەرەبی وەرگێرایە سەر زمانێ كوردی))(جوقی، ٢٠١٦, ل ١٨٣).

د گروپێ نویكرن هەر و هەر دا (نویخازێن دهوكێ) كو (محسن قوچان) ئێك ژ كەسایەتین سەرەكی بۆ هەر وەكی ئەو ب خۆ ئاماژێ ب ڤێ چەندێ دكەت و دبێژیت: ((دەسپێكا هزرا دانانا ڤی گروپی ژ من بوویە و ئەز سەركێشێ سەرەكی یێ ڤی گروپی نویخوازی مە چونكی من داخواز ژ هەڤالان كریە كۆ پێكڤە كومبن و گروپەكێ نویخواز د بواری هوزانێدا پێك بینین، و هەروەسا پتر ژ هەمیان من كور و سمینار ل سەر هەول و بزاڤێن مەیێت نڤیسینا هوزانا نویخواز و

دانه دیارکرن بۆ مەرەم و واتایێن هوزانێ گێراینه، و هزرا دانانا بەرسڤان بۆ ئەو کەسێن هێرش دکرنه سەر بزاڤا مه یا هوزانێت نویخواز...))(**زیاب، 2005 ,ل۸۳)**

1.2. رەنگڤەدانا هێمایێن مێژوویی دهوزانێن (محسن قوچان)دا

د ڤێ پشکێدا دێ هەول دەین، بەحس ل هندەك وان هێمایێن مێژوویی بکەین ئەوێن هوزانڤانێ نویخازێ کورد ل دەڤەرا بەهدینان (محسن قوچان) ی د هوزانێن خودا ب کارهینان ژ وان ژی:

((ل "کەلا دمدم" خوین بەلاڤ دکر...

خوین ڤەدخوار

هەستیکێن میرگەهێن دێرین

د قورا چاڤێن خۆدا دهێرا ... دکره

ئار

بۆ "هۆلاکوی"ی

دا کەلا " هەڤلیرێ" بسۆژیت

خۆ دکره پر

خپ دکره دار

ل "کانی قرژالێ" مرن دپەحت

ل بالیسانێ وەکو جرداڕ ئاخێ

دەردکەت

چ چێرۆکەکا فهێتە

ناڤێ بچویکێ مه ژبیرا من بر))(**محسن قوچان، ل بەرسفکا مه بەفر دباریت، ل ۲۸۷.)**

-کەلا دمدم: کەلهەکا مێژوویيه ل پارێزگەها ئازرباجان ل ئیران ، روژئاڤا دەریاچا ورمێ ، هێمایه بۆ خۆ راگرین و بەرخودانا گەلێ کورد ، بەلێ هوزانڤانی مەرەم نه ئاڤاهیێ قەلهێ ب خۆ یه ، بەلکی مەبەستا وی ئەو کار ئەو کریارەبوون ئەوێن د قەلهێڤە هاتینه ئەنجامدان کو ، خیانەت، ئازار، کوشتن،ئەشکەنجەدان،...هتد ل کەلادم دم دهاتنه کرن.

-میرگە:بۆ دەربرینا دیروکا کوردان ، ئانکو بتنێ شینوار وان ماینه کو ئەو ژی هێمایيه بۆ هەستیێن مروڤێ کورد.

-هۆلاکو: ئەڤه هێمایێ زولم و زوردارێ و وێرانکرنێیه ، کو هوزانڤانی هەمان سیفەت یێ دایه خەلکێ خۆ کو ئەو ئاخا خۆ د فروشن .ب ڤی ئاوایی هوزانڤانی شیایه کوماکا هێمایێن مێژوویی د ڤێ پارچێدا کومڤه بکەت ژ وان ژی (کەلها دمدم، میرگەهین کوردی، هولاکو، کەلها هەولێر) هەمی ژی ب دیروکا کوردانڤه گرێدایه ل هەر دەمەکی و جهەکی کوردیێن توشی خیانەتا ناڤخویی کوشتن و خوین رشتنێ دبن، ئەڤەیه وه دکەت ژ خەمگینی و دلنەرەحەتی ناڤێ خوشتڤیێن مه ژ ببرا مه بچیت و هەردەم هزر ل وەلاتی بکەین.

هەر دیسان د نموونەکا دیتر دا دبێژیت:

((دەنگەکێ بور ئەحمەقیا وێ هشار کەتن

ڤیانا وێ ب سپیندار ڤه بەلی بیت و

هێشتا(حەمۆ) ژ راڤە کەوێ نە ڤەگەریای

سولتان(محمد فتاح) مالا وێ ژ قیراجێ بارکەت

رڤشتا سەی دزکەرە و مشۆتا وێ دێ تالان کەت))))(**محسن قوچان، ل بەرسفکا مە بەفر دباریت، ل٤٩٩..)**

هوزانڤانی ئاماژە ب ناڤێن کەسایەتیێن مێژووی کریە ژ وان ژی سولتانێ عوسمانی (محمد فتاح)ە ڤی کەسی دژیەکێ بچوکدا دەستهەلاداری کریە سەردەمێ وی مێژوویەکا زێرینە د دیروکا ئیسلامێدا ،

هەر دیسان د نموونەکا دیتر دا دبێژیت:

((فەلسەفا وان ئالا هەڤکوشتنێرادکەت

قەلا زەردەشت یێ کراندی

ئولیا رندا ئیرەمێ یا رووخاندی

سەرێ خدرۆی یێ حوچ کری

تەرمێ (علی)یێ لوچ کری

(ئەز دێ قەلەکێ کوژم

سومبلاکێ بۆ گیانێ بابێ مەزن

ل بارزان چینیم)) (محسن قوچان ، ل بەرسفکا مە بەفر دباریت، ل ٥١٨.)

هوزانڤانی ئاماژە ب کەسایەتیەکێ دیارێ کورد ل دەڤەرا بەهدینان ل باژێرێ دهوکێ کریە، ئەوژی (خدرۆ) یە وەکو هێمایێ دلپاقژی و وەفاداریێ ب کارهینایە کو د کەتواریدا کەسەکێ ژلایێ مێشکی ڤە یێ تەمام نەبوو.

پاشی بەردەوام بوویە و بەحسا (مەلا مستەفا بارزانی)کریە کو کەسەتیەکێ دیارێ شورەشگێر و رێنیشاندەرێ دوزا نەتەوا کورد بوویە کو هوزانڤانی ڤیایە قوربانیەکێ پێش کێش بکەت و هەتا هەتا ناڤێ وی ل بارزان بمینیت، پاشی هوزانڤان هاتیە (بارزانی) و (خدرو) ل گەل ئێك ب کارهینانە هەر چەندە هەردوو هەڤدەمێن ئێك ژی نینین، لێ ئەڤە واتایا هندێ ددەت کەسێن ئاسایی ژی دشێن ب پاقژیا خۆ، خۆ ب زیندی بهێلن.

هەر دیسان د نموونەکا دیتر دا دبێژیت:

((پێشەمانی

ژ نەهش دهێت خۆ دمە وەردکەت

رووبێن مە دکەت کەرخا ماچا

ژ روندکا تەر دکەت

بزاڤا مە دکەت زیندانا سەدامی و

سەردەردکەت

دناڤ کارتێن قوماری دا

تێکهەلددەت

ناڤەدەرکەتا))))(**محسن قوچان ، ل بەرسفکا مە بەفر دباریت، ل٥٢٥..)**

هوزانڤان بەحس ل هێمایەکێ مێژوویی بۆ دیروکا جیهانێ ب گشتی و کوردان ب تایبەتی دکەت ئەو ژی (سەروك کومارێ عیراقێ سەدام حوسین) کو ب خیانەتکار و خوین رژێ کوردان دهاته نیاسین، وی خوینا هەر تاکەکێ کورد ڤیا، وی دڤیا نەخشێ کوردستانێ نەهێلیت و زمانێ کوردی بنبر بکەت، شەرم و ترس و سنور وی دشکاندن ل بەرامبەری کوردان، پاشی هوزانڤان دهێت بەحس ل پێشمەرگەکێ دکەت کو وێنە وی ئازار ددەت لەورا د مێشکێ ویدا مایە، ئەو ژی شەهید بوونا پێشمەرگەکێ کو نەشیایە ب کفن و گور بکەت و بن عەرد بکەن.

هەر دیسان د نموونەکا دیتر دا دبێژیت:

((هندەك ناڤ د خوینەلونە

دخوینەلونە

چپکێن خوینێ ییێن ژێ دکەڤن

ئەڤە لڤێر

ناڤێ(حەموی)

ناڤێ(تەمەر)

ناڤێ(سلوی)

ناڤێ هەمی و هەر کەسەکێ

ژ دەرێ مالا خۆ دەرکەتی و

ل کەس و کارێن خۆ بەرزەبووی)) (**محسن قوچان، ل بەرسفکا مە بەفر دباریت، ل ۱۳۰.**) هوزانڤانی مفا گەلەك ژ کەسایەتییێن کورد وەرگرتینە یێن پارچێن جودایێن کوردستانێ، ئەڤە ژی هندێ دگەهینیت کو ئەڤ زورداری بتنێ ل پارچەکێ نەبوویە بەلکو دەولەتێن دەروبەر هەمییان ڤیایە کوردان دناڤ خۆدا ب حەلینن و هەبونا وان بەرزە بکەن.

هەر دیسان د نموونەکا دیتردا د بێژیت:

سڤورە و دارمێو.. بەروی

((رەش مێوەکا خەمل تاری

ل سەر دارەکی ل ئاقاری

سەحدکرە سڤورەکی

بەریەکا تال دڤەرنی

ژ برسادا دژەنی..دژەنی

گوتی: ((هەی ئێخسیری..ژاری

نوکە هناڤێن وی دسوژن بدژوار

ب دژواری.))

گازیکرێ : وا سڤورە

تو یێ برسی؟

ل من ببورە

نابێژی من تو یێ دینی

یان یێ کورەی من نابینی

ئەوێ بەرویێ ب هاڤێژە

هەمی تەحلاتی و قرێژە

وەرە ناڤ تاك و شاکێن من

ل بەر سیبەرا خەملا من

تلێین من دشرینن ب مێژە

سڤورەی گوت:

نە ئەز..

رەنگە تو یا دینی

نوکە خەملا تەیا ب رەوشە

یا ژ تەڤە دێ هەر هو مینی

سوبەە خودان

دێ ئویشیێت تە هەمیا دزن

بەلگێن تە دێ وەرێێن رزن

ئەگەر هات و ..

بۆ زڤستان

سەرمایەکا هار و دژوار

ڤەما .. ڤەما

نەبوو بوهار

ئەڤ قولێرا من ب ددانا چێکری.

دێ مینیتن

گەرم و زوها تەژی بەروی

زڤستانا من دێ بۆریت

بێ شەپرزەیی و بێ تەری.

ئا.. دار مێوێ

نابێژی من

تو ب چ دخوری ؟

تو بخۆ نەشێی راست شین ببی

ل هیڤیا ڤێ داریێ و دارا هه

ڤێ کەلەکێ

کەلەکا هه

ئەگەر دێ پشت ل ته خۆیل بیتن

یان دێ مری .

ئەڤجار هەڤال..

گەر تو نەشێی خۆ راگری

نابێژی من ..

ئەو چ وجه دێ ژ من گری .))(**محسن قوچان، ل بەرسفکا مه بەفر دباریت،ل۸۳ـ۸۵**)

ئاماژەیێن مێژوویی دناڤدا هەنه، بەلێ ئامێژەیێن نەراستەخونه بۆ نموونه سڤوره ئاماژه دانه بۆ پێشمەرگەیی، دار مێو ئاماژه دانه بۆ رژێمێ، بەروو ئاماژه دانه بۆ کوردستانێ، ژبەر کو پتریا جێهێن کوردستانێ دار بەروونه ژبلی ئەڤێ چەندێ، سیمایەکێ دار بەرووێ ئەوه دارەکا گەلەکا بهێزه، لەورا ژی ب کوردستانێ هاتیه لێکچواندن،هوزانڤان هەولددەت ئاخڤتنا رژێمێ دگەل یا پێشمەرگەکێ دیار ب کەت کو دبێژتێ: تەناهی و ئارامی ل وەلاتێ ته نینه وەره د ناڤ چەق و تایێت من ژبەر کو ئارامی خوشی یا تێدا هەیی و دێ تاما دەڤێ ته خوشبیتن لێ سڤوره د بێژتێ : نه بێژه من تویێ دینی و ئەز باش ته دبینم لێ ئەز ب حالێ خۆ گەلەکێ رازیمه .

هەر دیسان د نموونەکا دیتردا د بێژیت:

((هەر پێنگاڤەك ئاستەنگەکه

پری باروڤه و باهوره

هات و باته

گەر زڤریم.....

باوەربکه،

دێ((ئەکسیرا))((گەکگامش))ی

ژ مارا ستینم

بۆ ته ئینم

دا ئەز و تو..

هەمی بوهارا نوی ببین

زێندی ببین.

گەر ئەز ڤەمام ..

یان ژی نەمام

تو دەستێن خۆ نەداهێلە

چیروکامن..

ژ زاروکا را دووبارەکە،

نەدەگرە)) **(محسن قوچان، ل بەرسفکا مە بەفر دباریت، سڤك وەرە، ل ١١٦.)**

گلگامش وەك هێما هوزانڤانی ب کارهینایە، کو هێمایەکێ مێژوویە کو پاشایێ باژێرێ (وروك)ە . ئەو کەسەکێ گەلەکێ هێز و خودان شیان بۆ کو هەمی کەسێن وی باژێری ژێ ترسیان و گلگامش ، کو نەمری دگەریا دەمێ نەمری دیتی و ماری لێ خواری هنگی زڤری باژێرێ خۆ و زانی کو مرن هەر یا هەیی. ئەڤجا وەکی یادیار هوزانڤانی ئەڤ هێمایە ب کارهینایە کو د بێژیت: دێ وی (گیای ژماری ستینم)مەرەما وی، کو ئەوە وەلاتێ خۆ ژ دوژمنی وەرگرم و ئاماژە دەتە هندێ دەمێ دبێژیت: (گەر ئەز ڤەمان یان ژی نەمام..) ئانکو ئەگەر هەر نەگەهشتینە خوشی و ئازادیا خۆ بەلێ بلا هەمی کەس چیروکا مە بزانین.

ئەنجام

پشتی ب دوماهی هاتنا ئەڤێ ڤەکولینێ ئەم گەهشتینە ئەڤان ئەنجامان:

هێما بابەتەکێ زۆرێ کەڤنە و هەر ژ کەڤندا دناڤ هوزانا کوردیدا رەنگڤەدایە و بوویە رەنگڤەدانا جڤاکی.

هێما ل سەر چەندین جوران دابەش دبیت، مروڤ نەشێت ژ لایەکی ڤە ب تنێ وەربگریت، چونکی هێما د چەندین ئاستاندا دهێتە شلوڤەکرن.

د هوزانا کوردیدا ژی وەکی هەمی هوزانێن جیهانێ هێما د هوزانێن (کلاسیك، نوی، نویخواز)دا هاتیە بکارهێنان و هەر قوناغەکی ژی ل دویڤ یاسا خۆ بکارهینایە .

د هوزانا نویخوازا کوردیدا ژی گەلەك گرنگی ب هێما دایە ، ئەڤجا بۆ چ مەبەست بیت.

هێمایێن مێژوویی ئەوێن د هوزانێدا خویا دبن کو ئەو بابەتێن مێژوویی بێن کارتێرن ل هوزانڤانان کرین و دناڤ هوزانێن ئەواندا رەنگڤەداین دەربرینێ ژ خەبات و بەرخودان حەز و ئازادیا نەتەوا کورد دکەت.

محسن قوچان ژی وەکی هەر هوزانڤانەکێ کورد هێمایێن مێژوویی ب کارهینانە وڤیایە ڤێ بکارهێنانێ دناڤ هوزانا خۆ یا نوخواز دا بشێوەکێ نوی بکاربینیت.

محسن قوچان کو ئێك ژ کەسایەتیێن گروپێ (نویکرن هەروەهر)ە،کو گرنگیەکا زێدە ب ڤێ چەندێ دایە، بهایەکێ زێدە دایە هێمایان دناڤ هوزانێن خودا.

لیستا ژێدەران

ئازاد, ئەحمەد مەحموود(٢٠٠٩)، بونیاتی زمان لە شیعری هاوچەرخی کوردیدا١٩٨٥-٢٠٠٥،هەولێر

ئامێدی،عبدوڵڵا یاسین (٢٠٠٣)، پەیدابوونی رەخنەی ئەدەبی لە شیعری کلاسیکی کوردیدا تا جەنگی گێتیی یەکەم، چاپخانەی وەزارەتی پەروەردە، هەولێر

ئاسو، عومەر مستەفا(٢٠٠٩)، بەها ئیستاتیکییەکانی شیعر لای پیرەمێرد و شێخ نوری شێخ سالح و گوران، چاپخانەی خانی،دهوك

محەمەد ئەحمەد،سافیە(٢٠١٣), لادان لە شیعری هاوچەرخی کوردیدا،چاپخانا حاجی هاشم,هەولێر

ئەبو عوبەید, عەبدوللا زیاب(٢٠٠٥)، هوزانا نویخازی ل دەڤەرا بادینان ژ دەستپێکێ هەتا سالا ٢٠٠٠ێ، چاپخانا وەزارەتا پەروەردێ، هەولێر.

انتصار, نجیب جوقی(٢٠١٦)، شعر و مێژوو/ پراکتیزەکرنا میتودا رەخنا میژوویی لسەر هوزانا نوو یا کوردی دەڤەرا بەهدینان(١٩٧٠-١٩٩١)،چاپخانا ترکیا

پەخشان, سابیر حەمەد(٢٠١٢)، رەمز لەشیعری هاوچەرخی کوردی کرمانجیی خواروو کوردستان١٩٧٠-١٩٩١،چاپخانەی حاجی هاشم- هەولێر

دلێر, داود فەتاح(٢٠١٦)، سیمبول د رومانا روژێن ئێتوون دا یا رومانێیس کوڤان سندی، چاپخانا هیڤی، هەولێر.

هیڤی بەرواری(٢٠١٠ز)، رێبازێن ئەدەبی، چاپخانا هاوار، دهوك

مشەختی،کامەران ئیبراهیم(۲۰۱۱)، سیمیولوژیای زمانی سوفیگەری لە شیعرەکانی (مەلای جزیری)دا،چاپخانا خانی،دهوك

لوقمان رەئوف(2016)، دەقی شیعری کوردی لە رەوانگەی سیمیۆلۆژییەوە(۱۹۵۰-۱۹۷۵)کرمانجی خواروو، چاپخانا حەمدی

محموويد, فازيل مجيد(۲۰۰۷)،سرو مەحویی, محەمەدی (۲۰۰۸)، زانستی هێما ، واتاوواتا لێکدانەوە، زانکو سلێمانی

شت لە شیعری گۆران دا، چاپ و پەخشی سەردەم کوردستان سلێمانی

نهێلی، نعمت الله حامد(۲۰۱۳), پراکتیزەکرنا رەخنا نوو یا ئەنگلو ئەمریکی لسەر تێکستێن گروپا نووکرن هەروهەر (رەخنه و ڤەکولین)،چاپخانا هاوار،دهوك

محسن قوچان، ل بەرسڤکا مه بەفر دباریت تەڤ دیوانێن محسن قوچان، چاپخانا هاوار، دهوك

خالد، عیماد وەیسی(۲۰۰۲), جەڤەنگ دهوزانا ریالیزما کوردی دا دەڤەرا بەهدینان ۱۹۷۰-۱۹۹۱،پلاماستەرێ، زانکو دهوك

خوشناو، سەرباز مەجید(۲۰۱۹), سیمیولوژیای ناونیشان لە شیعرەکانی(نەوزاد رەفعەت)دا،هەولێر

خوشناو،نەریمان عەبدوللا ، رەمز و مەغزا لە چیروکەکانی فەرهاد پیربالدا, هەولێر

غازی،چنار صدیق(۲۰۰۸)،ئاراستێن تەکنیکی د شعرا نوی یا کوردی دا – دەڤەرا بەهدینان- بەدرخان سندی وەکو نموونە، چاپخانا حەجی هاشم-هەولێر

Çavkanî / References

Azad, Ahmed Mehmud,Bunyatî (2009) ziman le şi'rî hawçerxî Kurdîda1985-2005, Hewlêr.

Amêdî, Ebdûlla Yasîn,(2003) Peydabûna rexne ya edebî le Şî'rî Kilasîkî Kurdî de ta cengî gêtî yekem, weş: Wezareta Perwerdê, Hewlêr.

Aso, Omer Mustefa,(2009) Beha Îstatîyekanî Şî'r lay Pîrmêrd û Şêx Nûrî Şêx Salih û Goran, Weş:Xanî, Duhok.

Arsh walid, (2015) shira al ramz fi diwan asam l husin zidan risala majestar jamia muhamad xazira.

Ahmet, Safya Mohmed,(2013) Ladan le Şî'rî hawçerxî Kurdî de, weş:Hacî Haşim, Hawlêr.

Abu Ubeyît Abdulla Zîyab, (2005) Hozan Nûxazî li devera Badînan ji destpêkê heta sala 2000, weş: Wezareta Perwerdê, Hewlêr.

Ehmed, Merîwan Hama Karîm(2022) Binyatî wêney hûnerî le Şî'rî Salim de, Teza Doktorayê, Zanîngeha Silêmanî.

Întîzar Necîb Cûqî (2016) Şî'r û Mêjû, weş: Tûrkîye.

Hamad, Pexşan Sabîr,(2012) Remiz le Şî'rî hawçerxî Kurdî de 1970-1991,weş:Hacî Haşim, Hewlêr.

Fatah, Dilêr Dawûd,(2016) Sîmbûl di romana Rojên Êtûn de ya Romannivîs Kovan Sindî, Weş: Hîvî.

Hemn Karim M. Salih, & Mariwan Hussein Farhan. (2023). Analyzing and Combating Drinking Liquor in “Bartender” of Hemin Mukeriany with Two Poems of Drinking Liquor of Manuchari Damghani. *Qalaai Zanist Journal*, *8*(1), 583–606. https://doi.org/10.25212/lfu.qzj.8.1.22

Hasan,Nawzad Ebdûlla,(2017) Masikdarî di hozana nû ya Kurdî de li davara Behdînan 1961-1991, Teza Masterê, Zanîngeeha Duhokê.

Hamad, H. K. (2024). The Philosophy of Contract between Theory and Practice. Pakistan Journal of Humanities and Social Sciences, 12(2.

Hamad, H. K. (2018). Sovereign Immunity and Its Development in International Law. Qalaai Zanist Journal, 3(1).

Hajar tabi, (2013) al ramzi tarixi fi shira amal dnqal risala majistar jamia almsilya.

Hîvî Berwarî,(2010) Rêbazên Edebî, Weş: Hawar, Duhok.

Ibrahim, Mohmed Ebdulkarim,(2009) zimanî şî'rî û rexney edebî nû (ezmûnî şî'rî heştekanî Hewlêr be nûmûne), Teza Master, Zîngeha Selahedîn, Hewlêr.

Karim M. Salih, H., & Zebarı, R. (2023). لێکچواندنی شەراب و پێکهاتەکانی لە دەقە شیعرییەکانی حافز و مەلای جزیریدا. Kurdiname (8), 41-55. https://doi.org/10.55106/kurdiname.1259328

Kamaran Îbrahîm, Mişextî,(2011) Sîmyolojyay zimanî Sufîgerî le şî'rî Melayê Cizîrî de, Weş: Xanî, Duhok.

Lûqman Rehûf,(2016) Deqî şî'rî Kurdî le rewangey Sîmyolojyaywe 1950-1975, Weş: Hamdî, Hewlêr.

Mehmûd, Fazîl Mecîd,(2007) Sûrûşit le şî'rî Goranda, Weş: Serdem, Sûleymanî.

Mehwî, Mehmed,(2008) Zanistî Hêma Hêma (wata û wata lêkdanewe), zankoy Sûlêmanî.

Malmir, T., & Karim Mohammad Saleh, H. (2024). The Use of Zolf as a Wine Cap in Lyrics of Hafez. *Literature in the Iraqi period*, *5*(1), 137-156. doi: 10.22126/ltip.2024.10092.1220

Mohemed Emin, Sara Sidqi,(2010) Cemal şarbajêr rolî le niwêgerî Şî'rî Kurdî de, Teza Masterê, Zanîngeha Silêmanî.

Mahdi, L. D. M. H., Hamad, L. H. K., & Hameed, L. H. A. (2022). Preventive Methods of Administration in Protecting the Environment from Pollution-Comparative Legal Study. Journal of Juridical and Political Science, 11(2).

Mahdi, M. H., Hamad, H. K., & Hameed, H. A. (2023). The Role of The Environmental Observer and The Environmental Police in Protecting the Environment in Iraqi Law: Comparative Legal Study. Qalaai Zanist Journal, 8(3).

Nihêlî, Nahmetûlla Hamad,(2013) piractîzekirina rexna nû ya Englû Emrîkî li ser têkstên griopê nûkirin her û her, Weş: Hawar, Duhok.

Pary Omar Ali, Srwa Tahhir Ali Mohammed, Bestoon Abubakr Ali, & Hemn Karim M. Salih. (2023). Beloved in Mahwee's Poems. *Qalaai Zanist Journal, 8*(1), 37–61. https://doi.org/10.25212/lfu.qzj.8.1.2

Qûçan, Mûhsin, li bersivka me befir dibarît tev dîwanên Mûhsin Qûçan, Weş: Hawar, Duhok.

RIK ZEBARI, BR Huseein, Sufism in classical Kurdish poetry:(Poems on Hariri as a model), Qalaaı Zanıst Journal 8 (4), 461-497.

Xalîd, îmad Weysî,(2002) çeveng di hozana reyalîzma Kurdî de devera Behdînan1970-1991,Teza masterê, zanîngeha Duhok.

Xûşnaw, Serbaz Mecîd,(2019) Sîmyolojyay naw û nîşanî le Şî'rî Î" Nawzad Rafhad " de, Hewlêr.

Xûşnaw, Nerîman Ebdûll, Remiz û Mexza le çîrokekanî Ferhad Pîrbal de.

Xazî, Çinar Sadîq,(2008) Arasteyên Teknîkî di şî'rî Nû ya Kurdî de devera Behdînan Bedirxan Sindî weke Nûmûne, weş: Hacî Haşim, Hewlêr.

Zebari, R. I. K. & Babayiğit, M. V. (2021a). *Kürt Gazeteciliğin Edebiyat Eleştirisi Üzerine Etkisi: 1991-2003 Güney Irak Örneği. Mesopotamia Journal of Interdisciplinary Studies, 1*(1), 68-76. DOI: 10.29228/mjis.54692.

Zebari, R. I. K., ve Babayiğit, M. V., (2021b). Peyv" Dergisinin Çeşitli Metinlerinde Edebi Eleştirilerin İncelenmesi, *Cihanşümul Akademi Sosyal Bilimler Dergisi, 2* (3), 1-33.

Zebarı, R.I.K, Huseeın. B. R, Abdulrahman. L. M, Ameen, S. T. M,(2022).*Lêkolînek Lı Ser Rojnamegerîya Kurdî Ya Lı Başûrê Kurdıstanê,* Kurdiname, No: 7, R. 128

Zebari, R. I. K., ve Babayiğit, M. V., (2022). *Dîrok a Rexne ya Edebî ya Kurdî li Başûr*. Kadim Hikmet Uluslararasi Bilimler Dergisi, 6, 28-44.

Zebari, R. I. K. & Babayiğit, V. (2022).*Diroka Rexne ya Kurdi li Rojova*. Mesopotamia Journal of Interdisciplinary Studies, 2(2), 102-109. DOI: http://dx.doi.org/10.29228/mjis.66398

Zebarı, R. I. K. & Babayiğit, M. V. (2021). Kürt Gazeteciliğin Edebiyat Eleştirisi Üzerine Etkisi: 1991- 2003 Güney Irak Örneği. Mesopotamia Journal of Interdisciplinary Studies, 1(1), 68-76. DOI: 10.29228/mjis.54692

Zebari, R. I. K., & Huseein, B. R. (2023). The Symbolism of Nature in Faqe Tayran's Poems. Journal of University of Human Development, 9(1), 56–66. https://doi.org/10.21928/juhd.v9n1y2023.pp56-66

Kurdiname Akademik

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Uluslararası Kurdiname Dergisi
International Journal of Kurdiname

Kovara Kurdinameyê ya Navnetewî
Jimar: 11 Mijdar 2024

International Journal of Kurdiname
Issue: 11 November 2024

https://dergipark.org.tr/en/pub/kurdiname **E-ISSN**-2687-5438

شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلاهێ نەهری و هەلوێست و سیاسەتا بەریتانیا 1880-1883: خواندنەکا مێژووی و بەلگەنامەیی

The Revolt of Sheikh Obaidullah Nehri and the British Attitude and Policy 1880-1883: A Historical and Documentary Study

ثورة الشيخ عبيد الله النهري والموقف و السياسة البريطانية 1880-1883: دراسة تاريخية وثائقية

Karwan Salih WAISY•

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî
Received // Hatin: 03.10.2024
Accepted // Pejirandin: 01.11.2024
Published // Weşandin: 29.11.2024
Pages // Rûpel: 151-184
DOI: 10.55106/kurdiname.1560577

This work is licensed under the Creative Commons Attribution-NonCommercial 4.0 International License (CC BY NC)
https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/

Citation/Atif: Waisy, Karwan Salih, شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلاهێ نەهری و هەلوێست و سیاسەتا بەریتانیا 1880-1883 :خواندنەکا مێژووی و بەلگەنامەی, 2024, Kurdiname, 11, r.151-184

Plagiarism/Întîhal: This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website // *Ev gotar herî kêm ji alîyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întîhalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.*

پوختە

شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلاهێ دهێتە هژمارتن ب ئێکەمین شۆرەشا نەتەوەیی یاکو تێدا بزاڤ هاتین کرن ئێکگرتنەك کوردی ل سەر بناغێ نەتەوەیی ل دەڤەرێ بهێتەدورستکرن ژبۆ رزگارکرنا کوردستانێ. ژبەر هندێ، بایەخ زێدە گرنگ و هەستیار ب هەمی لایەنێن ئەڤێ شۆرەشێ ژلایێ دەستهەلاتدارێن دەڤەرێ و نوێنەرێن بەریتانیا هاتیە دان. ژبەر گرنگیا ئەڤێ قوناغێ، ئەڤ لێکۆلینەك دێ بزاڤێ کەتن چەندین لایەنێن باخەدار بێن گرێدایی ب شۆرەشێ ڤە ب تێروانینەك زانستی شرۆڤە بکەتن. هەلبەت بۆ ئەڤێ مەبەستێ مفا ژ هندەك ژێدەرێن گرنگ بێن ب ئەڤی ماوەیڤە گرێدایی هاتیە وەرگرتن.

ئارمانجێن ئەڤێ شۆرەشێ مەترسی ئێخستە سەر هەڤسەنگیا هێزێ ل دەڤەرێ. لەورا هەر زیکا روویدان و پێشهاتێن ئەڤێ شۆرەشێ سەرنجا دەولەتێن هەرێمی و نێڤدەولەتی، ب تایبەتی بەریتانیا ڕاکێشا و ئەڤ چەندە بۆ ئەگەرێ هندێ کو بەریتانیا ژی هەلوێستێن و سیاسەتێێن خۆ ل دۆر مەترسی و بوویەرێن وێ بۆ ڕایا گشتی یا دەڤەرێ دیار بکەن.

ئەڤ ڤەکۆلینە دێ هەولدەت بەرسڤا هندەک پرسیارێن گرنگ بێن گرێدایی ب مژارێن ئەڤێ شۆرەشێ ڤە مینا ئەو چ هۆکاربوون شێخ عوبەیدوڵڵاهێ نەهری پالداین دەست ب شۆرەشێ بکەت و هزروبیرێن بەریتانیا لدۆر چەوا بوون؟ ئارمانجێن ئەڤێ شۆرەشێ چ بوون و بەریتانیا چاوا بەرێخودا پێشهاتێن ئەوێ؟ پەیوەندیێن شێخی دگەل بەریتانیا چەوابوون و بەریتانیا ب چ شێوازێ سیاسەتێ سەرەدەری دگەل ئەوی دکر؟ هەلوێستێ بەریتانیا بەرامبەری رووداندێن شۆرەشێ چەوا بوون؟ ئایا بەریتانیا ڕۆڵ دشکاندنا ئەڤێ شۆرەشێ دا هەبوو و ڕۆلێ ئەوێ ب چ شێوە بوو؟ بدەت.

پەیڤێن سەرەکی: شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلا نەهری، کێشا کوردی، ئیران، عوسمانی، سیاسەت و هەلوێستێ بەریتانیا.

الملخص

تعتبر ثورة الشيخ عبيد الله أول ثورة وطنية تمت فيها محاولات خلق وحدة كردية على أساس وطني في المنطقة لتحرير كردستان. لذلك، حظيت جميع جوانب الثورة باهتمام أكثر حساسية من قبل السلطات الإقليمية والممثلين البريطانيين. ونظراً لأهمية هذه المرحلة، فإن هذه الدراسة ستحاول شرح عدة جوانب مهمة تتعلق بالثورة من منظور علمي. كما تم استخدام بعض المصادر المهمة المتعلقة بهذه الفترة لهذا الغرض.

كما هددت أهداف هذه الثورة توازن القوى في المنطقة. وبذلك جذبت أحداث هذه الثورة اهتمام الدول الإقليمية والدولية، وخاصة بريطانيا، التي كشفت في وموقفها و سياستها خطورة هذا الثورة للراي العام في المنطقة .

وسيحاول هذا البحث الإجابة على بعض الأسئلة المهمة المتعلقة بقضايا هذه الثورة مثل ما هي الدوافع التي كانت وراء قيام الشيخ عبيد الله نهري بهذا الثورة وما هي أفكار البريطانيين عنها؟ وما هي أهداف هذه الثورة وكيف تعاملت بريطانيا مع تطوراتها؟ ما هي علاقات الشيخ مع بريطانيا وما نوع السياسة التي اتبعتها بريطانيا معه؟ ماذا كان موقف البريطانيين من أحداث الثورة؟ فهل كان لبريطانيا دور في انهاء هذا الثورة وكيف كان هذا الدور؟.

الكلمات الدالة: ثورة الشيخ عبيد الله النهري، القضية الكردية، إيران، عثماني، السياسة والموقف البريطاني.

• Asst. Prof. Dr. Zakho University, history department, salih.waisy@uoz.edu.krd ; Orcid : 0000-0001-9116-1843

Abstract

The Revolt of Sheik Obaidullah Nehri is considered to the first nationalistic revolution, which attempted to generate a Kurdish national union in the region in order to liberate Kurdistan. Hence, the regional powers and the British took many aspects of this revolution into account so sensitively and carefully. As a result, this key stage of Kurdish history, this research attempts to show some great aspects of this revolt through a scientific approach. This research has taken advantages from some relating references and documents of this subject.

The main objective of this study is to show the effects of this revolt on the balance of power in the region. As from the beginning of this revolt the regional and great powers had paid serious attention to the development of it, particularly the British authority had taken its development seriously. As a result, the British show its policy and attitude to its events to the regional powers.

Within its process this study attempts to answer some critical questions such as what were the main reasons behind declaring this revolt and what were the British view to it? What were the main objectives of this revolt and how the British look at its developments? How was Sheikh Obaidullah's relations with the British and how the British policy evolved with him? What was the British position to events of this revolution? Did the British play a role in the collapsing of this revolt?

Keywords: Sheikh Obaidullah Nehri, Kurdish question, Iran, Ottoman, the British attitude and policy.

دەستپێک

شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلاهێ نەهری ئێك ژ شۆرەشێن گرنگێن بزاڤا رزگاریخوازا کوردی دهێتنە نیاسین. ژبەرکو ژلایەکێ ڤە، ئەڤ شۆرەشە د کاودانەکێ زۆر هەستیار و نازك دا یێ کو دەولەتا عوسمانی (1923-1299) و قاجاری(1925-1789) پێن کو خۆ ب سەر کێشێن جیهانا ئیسلامی ل ڕۆژهەلاتا ناڤین ددانایی هاتبوو ڕوویدان. ئەڤ شۆرەشە بۆ ئەگەرێ هندێ دەولەتێن زلهێز، هزرەك مەزن بوو بکەن و دئەنجامدا هەلوێستێ خۆ هەمبەری ڤێ شۆرەشێ ب شێوەیێن جودا جودا دیاربکەن. دهەمان دەمدا، ئەڤ شۆرەشە بۆ ئەگەرێ هندێ دەولەتێن زلهێزیێن ئەورۆپا و ئەمریکا پەیوندیێن دوبلۆماسی لژێر ئەجندەێن نهێنی بۆ پاراستنا دەستکەڤتێن خو پێن سیاسی و ئیینی دگەل ئیرانێ گرێدەن.

ژلایەکێ ڤە، چونکو دهزرێن وان دا بوویەر و پێشهاتێن سیاسی و لەشکەری پێن شۆرەشێ مەترسی ئێخستبوون سەر بەرژەوەندی و بزاڤێن مسیۆنەرێن ئەوان پێن بەلاڤکرنا ئایینێ مەسیحی دناڤ دەولەتا عوسمانی و قاجاری دا، ب تایبەتی پشتی بۆ نوێنەرێن دەولەتێن زلهێز دیاربووی کو ئارمانجا سەرەکی یا شێخ عوبەیدۆلاهی ئێکگرتنا کوردان، دورستکرنا دەولەتەك کوردی و خۆشکرنا پەیوەندییان دگەل وان نەتەوەێن ل کوردستانێ دژین. ئێدی بۆ وان دیار بوو دڤێتن دەست ب هندەك پێنگاڤان بکەن داکو ببنە ئاستەنگ دڕێکا بدەستڤە ئینانا ئارمانجێن شۆرەشێ. لەوڕا ئەڤێ شۆرەشێ دەولەتێن زلهێز پالدان هاریکاریا هێزێن ئیرانێ بکەن داکو ڤێ شۆرەشێ ژناڤببەن. ئەوبوو ڕۆسیا هاریکاریێن لەشکەری پێشکێشی هێزێن ئیرانێ کرن و نەمسا ب هنارتنا بسپۆرێن لەشکەری بۆ ڕێکخستنا هێزێن وی پشتەڤانینا خۆ بۆ ئیرانێ دەربری. ئانکۆ دشێن بێژین ئەڤێ شۆرەشێ دەرگەهێن سیاسی بۆ زلهێزێن ئەورۆپی ڤەکرن بهێن دناڤە دەڤەرێ دا.

ژلایەکێ دیڤە، ئەڤێ شۆرەشێ بنیاتێ هزرا نەتەوایەتی یا رزگارکرنا کوردستانا عوسمانی و ئیرانێ و سەربەخۆبوونا کوردستانێ دامەزراندنا دەولەتەك کوردی ل ڕۆژهەلاتا ناڤین دانابوو. ژبەر هندێ سەرکردەێن وێ بزاڤکرنا ئەڤێ شۆرەشێ ب چەندیین قۆناغان دەست پێبکەن داکو ئارمانجێن خۆ بدەستڤە بینن. هەروەسا سەرکردێ ئەڤێ شۆرەشێ بزاڤ کرن پشتەڤانیا هۆزێن کوردی بۆ شۆرەشێ بدەستڤە بینن. هینگێ سەرۆك هۆزێن کورد بوونە دوو پشك، پشکەکێ ئامادەبوونا خۆ دیارکر بۆ پشتەڤانیکرنا شۆرەشێ و پشکادی بیتنێ بەرێ وان ما ل بەرژەوەندیێن وان. ئانکۆ لدەمێ بەرژەوەندیێن دکەڤتنە بەر مەترسیێ دا پشتەڤانیا شۆرەشێ کەن و لدەمێ هەڤرك یان دۆژمنێن شۆرەشێ هندەك دەستکەڤت پێشکێشی وان کربان دا چن دگەل بەرێ دوژمنی و ب دژی شۆرەشێ کارکەن.

ژبەر گرنگیا دوو جەقبوونا ئەڤێ شۆرەشێ، ب پێدڤی هاتیە دیتن کو ڤەکۆلینەك لدۆر ئەڤی بابەتی بهێتە ئەنجامدان داکو ب شێوەیەکێ دورست راستیا هەلوێستێ دەولەتێن زلهێز بۆ ڕایا گشتی یا کوردی و جیهانێ هەمبەری ڤێ شۆرەشا نەتەوەیی یا کوردی دیاربتن کا ب چ ڕەنگ و شێواز هەلوێستێن خۆ بەرامبەری ڤێ شۆرەشێ داینە دیارکرن. ژبەر کو لدۆیڤ پێزانێن خۆدانێ ڤەکۆلینێ تانوکە چوو ڤەکۆلین لسەر ئەڤێ چەندێ نەهاتینە ئەنجامدان. سەرەرای هندێ د دزۆر ژێدەران دا بەحسێ ئەڤێ شۆرەشێ هاتیەکرن و هەر ئێکێ ب ڕەنگەکێ تێگەە و ئارمانجێن ئەڤێ شۆرەشێ شرۆڤەکرینە.

ئارمانجا سەرەکی و بنەرەتی ژ ئەنجامدانا ئەڤێ ڤەکۆلینێ ئەو بوویە داکو هەلوێستێ زلهێزێن نێڤدەولەتی ژ کێشا کوردی د سەردەمێ ڤێ شۆرەشێ بدەتن خۆیاکرن. ژبەرکو هەتا نوکە ئەڤ جۆرێ هەلوێستان ب شێوەیەکێ زانستی نەهاتیە دیارکرن و ئەگەر هاتبتن ژی بتنێ ب کورتی هاتیە دیارکرن. هەلبەت ئارمانجا گرنگی لڤێرێ ئەوە کو بەرێخۆبدەین

هەلۆیستێ دەولەتێن زلهێز ب چ مەرەم و مەبەست بوویە. ژبەرکو هەر دەولەتەکا هەلۆیست و نیازێن خۆ هەمبەری کاودان و پێشهاتێن دەڤەرەکێ دیار بکەتن هندەك مەبەست و ئارمانجێن نهێنی یێن ل پشت.

ئەڤ ڤەکۆلینە ژ پێشەکییەکێ، دەڕازینکەکێ، حەفت تەوەران و دەرئەنجامان پێکهاتیە. دپێشەکیێدا، روونکرن ل سەر گرنگی، ئارمانج و رێبازا ڤەکۆلینا ڤێ خۆدانێ هاتینە دان. ئەڤ لێکۆلینە د دەڕازینکا خۆ شرۆڤەکرنێ ددەتن سەر فاکتەرێن بووینە ئەگەرێن پەیدابوونا رۆلێ مالباتێن ئایینی د سەرکردایەتیکرنا شۆرەشێن کوردی دا، نەخاسمە ئەگەرێن دەرکەفتنا شێخ عوبەیدۆڵاهێ نەهری دکەتن و هزروبیرێن بەریتانیا لدۆر کەسایەتیا وی. د تەوەرێ خۆیێ ئێکێ دا، ئەڤ ڤەکۆلینە بەحسێ ئەگەرێن بووینە پالدەر درێکا روویدانا ڤێ شۆرەشێ دا، ب تایبەتی یێن ئابۆری و سیاسی دکەتن. دپێنگاڤێن خۆدا ژبو دیارکرنا بزاڤێن سەرکردەێن ڤێ شۆرەشێ، د تەوەرێ دووێ دا بەحسێ بزاڤێن شێخ عوبەیدۆڵا نەهری یێن بدەستڤەئینانا پشتەڤانن بۆ شۆرەشێ ل سەر ئاستێ ناڤخۆیی و دەرڤە دکەتن. دتەوەرێ سیێ دا، بەحسێ گرنگترین خالێن شۆرەشێ، کو ئەو ژی ئارمانجیێن سەرەکی یێن شۆرەشێ نە هاتینە کرن. د تەوەرێ خۆیێ چوارێ دا، ئەڤ لێکۆلینە روونکرنێ ددەتن سەر هێزێن شێخی ژلایێ هژمار و چەکییڤە و بوو جوونێن بەریتانیا ل دۆر هێزا وی. تەوەرێ پێنچێ روونکرنەکێ لسەر دەستپێکرنا بوویەر و پێشهاتێن شۆرەشێ ددەتن. دیسان ل تەوەرا خۆ یا شەشێدا، ئەڤ لێکۆلینە شرۆڤەکرنەکێ ددەتن سەر پەیوەندیێن شێخی دگەل بەریتانیا، دهەمان پێنگاڤێن خۆدان بەحسێ هەلۆیست و سیاسەتا بەریتانیا ژ ڤێ شۆرەشێ دکەتن. ئەڤ تەوەرە بچەقەکێ گرنگێ ڤەکۆلینێ دهێتنە نیاسین. ژبەرکو بەریتانیا سیاسەت، هەلۆیست و پەیوەندیێن خۆ هەمبەری شۆرەشێ داینە دیارکرن. دتەوەرێ خۆ یێ حەفتیێ دا، بەحسێ فاکتەرێن بووینە ئەگەرێن ژناڤچوونا شۆرەشێ، نەخاسمە رۆلێ بەریتانیا دکەڤتنا وێ دا دکەتن. دووماهیکێ دەرئەنجام، بەحسێ ئەوان ڤەدیتنان دکەتن ئەوێن خۆدانێ ڤەکۆلینێ د ماوێ دۆیڤچوون و نڤێسینا بابەتی دا گەهشتی یێ دکەتن.

هەلبەت ژبۆ شرۆڤەکرنا ئەڤی بابەتی دێ پشت بەستن ل سەر هندەك ژێدەران هێتە بەستن، نەخاسمە بەلگەنامەیان وەك (وەدیع جووید ، شۆرەشا شێخ عۆبەیدۆڵاهێ نەهری دبەلگەنامەێن ئەمریکی و بەریتانی و قاجاری دا) و (تێلی ئەمین عەلی بزووتنەوەی شێخ عوبەیدوڵڵای نەهری لەبەڵگەنامەکانی بەریتانیادا). ئەڤان جۆرێ بەلگەنامەیان تیروژ بەرداینە سەر زۆر بوویەر و پێشهاتێن سیاسی و لەشکەری یێن گرێدایی ئەڤێ شۆرەشێ ڤە. هەروەسا بەحسێ هەلۆیستێ دەولەتێن زلهێز و هەرێمی بەرامبەری ئەڤێ شۆرەشێ کری یە .دەهەمان دەمدا، ب تێرۆتەسەلی بەحسێ قۆناغ و ئارمانجێن ئەڤێ شۆرەشێ کری نە دگەل بەحسێ بزاڤێن شێخی بو ئێکگرتنەك کوردی ، خۆشکرنا پەیوەندییان دگەل کێم نەتەوەیان ، دورستکرنا پەیوەندییان دگەل دەولەتێن هەرێمی ، بدەستڤەهینانا پشتەڤانیا نێڤدەولەتی بۆ شۆرەش و کێشا کوردی کرینە.

دیسان بۆ دەولەمەندکرنا ڤەکۆلینێ مفا ژ چەندین ژێدەرێن زانستی یێن ب زمانێ ئینگلیزی مینا (Kılıç, M. F. *Sheikh Ubeydullah's Movement..*)، (Özten, S. *Early awakening of the Kurdish national sentiments in the Ottoman Empire (1880-1914)*). و (Sözbđr, H. The Nature And Characteristics of the Major Kurdish Movements: An Analysis of the Kurdish Movements From The Bedđrhan Rebellion (1847) to the Sheikh Sađd Rebellion (1925))....هتدتر و تێدا باسێ چەندین لایەنێن گرنگ یێن گرێدایی ب پێشهاتێن شۆڕەشا شێخ عوبەیدوڵڵا نەهری ڤە کرییە.

هەلبەت ژبۆ ئەنجامدانا ئەڤێ ڤەکۆلینێ رێبازەکا شرۆڤەکرنێ پێدڤییە. ژبەر هندێ رێبازا ڤەکۆلینا پێداچوون و دۆیڤچوونا بوویەرێن دیرۆکی بۆ ڤێ ڤەکۆلینێ هاتیە بکارئینان. چونکی ئەڤ رێبازە دێ هەمەرەنگیا بۆچوونان و تێگەهێن دەولەتێن زلهێز ژ شۆرەشێ دیارکەتن. ژبەرکو ئەڤ رێبازە ب کویری و ب هویری بەرێخۆددەتن هەمی لایەنێن گرێدایی ب شۆرەشێ ڤە و چەوانیا دەربرینا هەلۆیستێ دەولەتێن زلهێزی ژ شۆرەشێ و ئارمانجێن وێ دێ ب ئاشکەرایی بدەت دیارکرن.

دەرازینك

ژناڤچوونا میرگەها بۆتان ل ساڵا 1847ێ و دهەمان دەمدا بەدرخانیان بەردەوامی دا بزاڤێن خۆ ب دژی دەستهەڵاتا عوسمانیان و ل هەمان ساڵ بزاڤەک ب دژی عوسمانیان ئەنجامدا بەلێ سەرکەفتی نەبوون (Duman,2010, 24; Sözbđr, 2006,12-15) و میرگەها بابان بوو ئەوا ل ساڵا 1850ێ ژناڤ چووی بۆ ئەگەرێ ژناڤچوونا سیستەمێ کلاسیکی یێ حوکمرانیا میرگەهێن کوردی(Ghalib,2011,150). هەروەسا شکاندنا شۆرەشا یەزدین شێری ل ساڵا 1856ێ ژلایێ دەولەتا عوسمانی ڤە(Nzibari,2012; ÖKEM,2006,145). دسالێن دیڤدا دا گهورینێن بنەرەتی دبناغیێ سیاسی یێ کوردستانا عوسمانی پەیدابوون. عەشیرەت ئەوێن بەری هینگێ بخۆ بهێز کو پتریا میرێن میرگەهان هێزا وان بچاڤێن خۆ دیتبوون

بهێزەکا جودا ژ سەردەمێن بۆری هاتنە دەیدانا سیاسیدا. ژبەر پێگەهێ وان یێ بهێز لدەڤەرێ هندەك ژ وان جهێ میران گرت(Kilic,2006,57).

تایبەتمەندییێن هژمارەکا زۆرا گرنگا ئەوان کەسایەتێن هۆزەگەری یێن ئایینی بوون. دڤی دەمیدا هژمارەکا زۆرا هۆزێن کوردی گرێدایی رێبازا سۆفیگەری یا نەقشبەندی بوون کو دناڤ دا سەرۆك هۆز ب کەسایەتیەکێ ئایینی و سیاسی دهاتە نیاسین. ئێك ژ وان کەسایەتییان (شێخ عوبەیدۆللاە کورێ شێخ تەهایێ نەهری) یێ ناڤدار ب (شێخ عوبەیدۆللاە نەهری 1830_1883) بوو، کو بنگەهێ وی ل دەڤرا شەمدینا ل هەرێما هەکاری کوردستانا باکۆر بوو (Kılıç,2003,50; Ateş,2014,738). مالباتا عوبەیدۆللاهی وەك ئاغا و ماقوولێن دی یێن عوسمانی خۆدان عەردێن مەزن و بەرفرهەبوون یێن تژی خێر و بەرکەت و تارادەکێ زۆر باش پەیوەندییێن بهێز دگەل سۆلتانێ عوسمانی هەبوون و هندی ئابۆرێ وان بهێز بوو، دبەرژەوندیان دەولەتا عوسمانی دابوو پەیوەندییێن خۆرت دگەل هەبن(باقی، 55،2000). چونکو ئابۆرێ وان پشتەڤانەك بهێز بوو دەستهەلاتا عوسمانی ل دەڤەرێ. سەرۆکێن نەهریان ناڤداربوون ب بەرهەم ئینانا "تۆیتنێ". دهەمان دەمدا، پێگەهێ نەهریان ژبەر رۆلێ وان یێ ئایینی نەبتنێ دناڤ خۆیێ دەڤەرێ دا بهێز بوو، بەلکۆ هێزا وان گەهشتبوو هۆزێن کوری ل عێراق و ئیرانێ(Nzibari,2012).

ژبەر شەرێن درێژخایەن و برسایەتیێ دەڤەرێن کوردی یێن ب سەر دەستهەلاتداریا عوسمانی ڤە تۆشی کاودان و پێشهاتێن نەخۆش ببوون. دئەنجامدا بهزاران خەلك هاتنە کوشتن. ل سالێن 1870تیان دا، گرنگترین و خەمبارترین و نەخۆشترین کارەساتا پەریشانیێ ب سەر کورد و هەڤوەلاتێن دا هاتی ئەو بوو دەمێ ژبەر هشکە سالێ بەرهەم خراب بووین و ژناڤچووین. ئەڤ کاودانە وەلێهاتن تا دەولەتێن بیانی بایەخەك گرنگ پێ دابوو و دۆیڤچوونەك هویر بو وان کاودانان دکر. بەلێ یا بویەجهێ سەرسۆرمانێ ئەو بوو بتنێ وەلاتێن ڕۆژئاڤایی گرنگ ب کاودانێن ئاشۆری و ئەرمەنی و گرۆپێن دی یێن مەسیحی ددان(Nzibari,2012).

گرنگترین رووبدان هاتیە پێش رووبدانا شەرێ عوسمانی و ڕووسیا قەیسەری یێ سالێن 1877-1878ێ بوو(Kılıç,2003,1-85; Mahmoud & Farhoud, 2023) ، پشتی (عەبدۆل عەمیدێ دووێ 1842-1918)، سۆلتانێ 34ێ، یێ دەولەتا عوسمانی داخوازا جیهادێ و پشکداریا مۆسلمانا ب دژی ڕووسیا قەیسەری کری، دهەمان دەمیدا داخواز ژ شێخ عوبەیدۆللا نەهری هاتە کرن پشکداریێ تێدا بکەتن، بڤێ چەندێ شێخ ب نەچاری دگەل 300 چەکداران لدۆیڤ داخوازا سۆلتانی چوو، لدەمێ گەهشتی بەرووکێن شەری نێزیکی 5 هزار چەکداران ل سەرانسەری کوردستانێ لدەوروبەرێن شێخی کومبوون و لدۆیڤ فەرمان و بریارێن شێخی کاردکرن (باقی، 8،2010).

ئەڤ چەندا لسەری ئاماژە پێهاتە دان وەك لدەلیڤەك زێرین و گرنگ بۆ شێخی هاتیە پێش، بەلێ نەوەك یەزدین شێری شێخی دناڤ گەرماتیا شەری دا چوو تشت نەکرن بەلکۆ هزر دپەرپالکرنا شۆرەشەك نەتەوەیی یا سەرانسەری د قۆناغێن پشتی شەری دا دکرن. شەری کارتێکرنێن خراب کرنە سەر ئمبراتویەتا عوسمانی و ئەو وێرانکارییا ڕووسیا قەیسەری ب سەرێ هێزێن عوسمانی ئینایی زۆر خرابوو. چونکو هژمارەکا زۆر ژ هێزێن عوسمانی هاتنە کوشتن هەتاکو بهێن کەڤتبوو دگوندان دا(Dennis,2015,221). ئەو هێرشا هێزێن ڕووسیا قەیسەری ژلایێ قەفقاز ڤە بری یە سەر هێزێن عوسمانی ل قارس و بایەزید ترسەکا ئێکجار مەزن لدەڤ خەلکێ پەیدا کربوو. بڤێ چەندێ دەولەتا عوسمانی بەریتانیا پالدا کو فشارێ بێختنە سەر ڕووسیا کو رازیببتن ب پەیمانا ئاشتیێ ئەوا ژلایێ عوسمانیانڤە هاتیە داخوازکرن یاکو عوسمانیان رزگارکەتن ژ خرابکارییەك دژوار و تۆند، سەرەرای هندێ شەمرازی بوو بۆ عوسمانیان(Nzibari,2012).

ژ دەرئەنجامێ ئەڤا ل سەری هاتیە شرۆڤەکرن شێخ عوبەیدۆللاهی هەمی شیانێن خۆ مەزاختن و بزاڤ کرن هێزا خۆ یا ئایینی و پەیوەندییێن هۆزەگەریەتیێ بێختنە کاری ژبۆ دورستکرنا سەنتەرەکێ شۆرەشگێری ب دژی دەستهەلاتداریا عوسمانی. هەروسا بەلاڤبوونا برسایەتیێ ب شێوەیەکێ بەرفرهە و نەبوونا ئارامیێ، ب تایبەتی لدەمێ بەرپرسێن عوسمانی ئێرشەکا تۆند یا لەشکەری ژبۆ هەلسەنگاندن و خرابکرنا گوندان دکر. دڤێ قۆناغا هەستیار دا شێخ عوبەیدۆللا دەرکەڤت و داخوازا شۆرەشێ کر(Kilic,2006,57).

شێخ عوبەیدۆللا کورێ سەید تەها کورێ شێخ ئەحمەد شەهابەددینە ، ل سالا 1830 ل گوندێ نەهرێ ل دەڤەرا شەمدینان ل باکوورێ کوردستانێ ژ دایك بوویە. بابێ وی سەید تەها تەکیا نەقشبەندی ل نەهرێ دامەزراندیە و پشتی ل سالا 1853ێ، سەید تەها مری، برایێ سەید تەهای و مامێ شێخ عوبەیدۆللا نەهری، شێخ محەمەد صالح دبیتە رێڤەبەرێ تەکیا نەقشبەندی، پشتی ل سالا 1856ێ، شێخ محەمەد مری، شێخ عوبەیدوللا نەهری جهێ وی گرتیە(باقی،5،2010) ، وەك ژێدەر دبێژن شێخ عوبەیدۆللا کەسایەتیەکێ ب هێز و جهەکێ ئاینی یێ باش ل دەڤەرێ هەبوو و ئاخفتنا وی ژی جهێ خۆ و رێزگرتنەکا مەزن و تایبەتی ل دەڤ سەروك هۆزێن کوردی هەبوو(Kilic,2006,57) . شێخ عوبەیدۆلاهی 200 گوند

هەبوون و کاریگەرییەکا زۆر ل سەر هۆزێن کوردی بێن دەڤەرا شەمدینان و دەڤەرێن سەر سنۆرێ کوردستانا ئیرانێ هەبوو چونکو ل ڤی دەمیدا وەك شەریفێ مەکەهێ و سۆلتانی شێخان جهەکێ پیرۆز دناڤ خەلکێ دا هەبوو. هەروەسا ناڤبری رێزەکا تایبەتی لدەڤ دەولەتا عوسمانی و قاجاریان هەبوو (باقی،6،2010 ؛ عەلی، 147،2013).

هەرچەوابێتن، ل سالا 1872ێ ئاریشە دناڤبەرا دەولەتا قاجاری و شێخی دا لدۆر دەڤەرێن کوردی بێن پشتەڤانیا شێخی دکر ل سەر سنۆری پەیدا بوون، ئەڤێ چەندێ دەرگەهێ هەڤرکیێ دناڤبەرا شێخی و قاجاریان دا ڤەکر بوو. ژبەر هندێ شێخی بریار دا بوو هەر دەمێ دەلیڤە بۆ بهێتە پێش هێرش بکەتن سەر هێزێن قاجاریان ل دەڤەرێ. بەلێ پشتی ل سالا 1877ێ، پەیوەندی دناڤبەرا دەولەتا عوسمانی و ڕووسیا قەیسەری دا تێکچووین و شەرێن هەستیار و دژوار دناڤبەرا عوسمانی و رۆسیا قەیسەری دا روویداین، شێخ عوبەیدوڵلا نەهری بهێزەکا شۆرەشگێرانڤە دگەل هێزێن عوسمانی پشکداری د شەرێ عوسمانی و ڕووسیا قەیسەری یێ سالێن 1877-1878ێ دا کر بوو(Kılıç,2003,1-85). ژئەنجامێن شەرێن عوسمانی و ڕۆسی دا بێن سالێن 1853-1856 و 1877-1878ێ، زولم و ستەما دەولەتێن قاجاری و عوسمانی دگەل کوردان، بوونە ئەگەرێ هندێ ڕۆژ ب ڕۆژێ ژمارەکا ئێکجار زۆر ژ خەلکێ ل دەوروبەرێن شێخی کومبین، بڤێ چەندێ شێخ بو هێمایەك بۆ هێڤی و ئومێدێن کوردا، دئەنجامدا، پلە و پاێن ئایینی، جڤاکی و سیاسی بێن شێخی دناڤ کوردا دا بهێز بوون (باقی،6،2010).

قۆنسۆلێ بەریتانیا ل تەبریزێ وێلیەم ئابۆت (William Abbot) دنامەیەکێدا بۆ وەزیرێ دەرڤە یێ بەریتانیا (ئیرل گرانڤیل Earl Granville) دایە خۆیا کرن، شێخ عوبەیدوڵلا پشتی شەریفێ مەکەهێ و سۆلتانێ عوسمانی خۆ ب سییەم کەسێ خودان هێز ددانیتن، هەمی کورد دان پێدانێ پێدکەن، ب ڕەنگێ پاشایان دژیت، ڕۆژانە 500 تا 1000 ژ هەمی تەخ و چینێن جڤاکی ل مالا ئەوی دبنە میهڤان. هەروەسا ناڤ و دەنگی و کەسایەتیا شێخی جودایە ژ یا کاربەدەستێن قاجاری و عوسمانی. درێڤەبرنا کاروواران دا زۆر یێ شارەزایە و دڤێت یەکسانی و دادوەریێ پەیرەو بکەت. چونکی کەسەکێ هشیار، تێگەهشتییە، پاقژی د رەفتار و هەلوێستێن ئەوی دا دیارن. زیرەکیا ئەوی د ئاخڤتن و هەلسکەفتنێن ئەوی دا دیارە (باقی، 55،2000).

لەوڕا ئەو شۆرەشا کورد ب سەرۆکاتیا شێخ عوبەیدوڵلا نەهری پێ رابووی، دهێتە هژمارتن ئێك ژ گرنگترین بزاڤێن نەتەوەیێن کوردی ئەوا روویدایی د سەد سالا نۆزدێ دا، ژبەرکو هژمارەکا دەڤەرێن گرنگێن کوردستانێ بخوڤە دگرتبوون و ژبەر ئارمانجێن وێ بێن نەتەوەیی بێن ئاشکر و شێخی دانووستاندنێن زۆر دەربارەی پێشهاتێن سیاسی بێن دەڤەری دگەل زانایێن ئایینی کری یە. چونکو د وی وەختیدا زانایێن ئایینی پتر هایداری ل دۆر پێشهات و کاودانێن دەڤەرێ هەبوون (بێسکی، 40،2013).

هەژی یە ئاماژە بهندێ بدەین شەرێ ڕووسیا قەیسەری و عوسمانیان و پاشی غەرام و سزایێن شەری کو د پەیماننامە بەرلین یا سالا 1878ێ دا ل سەر دەولەتا عوسمانی دا هاتین سەپاندن، گەنجینا دەولەتا عوسمانی تۆشی قەیرانەکا ئابۆری یا کاریگەر و بهێز ببوو. ئەڤ چەندە بۆ ئەگەرێ هندێ دەولەتا عوسمانی نەچار بیتن ژبۆ بدەستڤەئینانا وی غەرامێ مەزن پەنایێ ببتە بەر سەپاندنا باج و گومرکێن زێدە ل سەر ئاکنجیێن خوو (Ateş,2014,740). بڤێ چەندێ ئالۆزی کەڤتە دناڤ دەولەتا عوسمانی دا و ژیارا خەلکێ ب تایبەتی یا کوردان نەخۆش بوو. لەوڕا زانایێن ئایینی بێن وەك شێخ عوبەیدوڵا نەهری بێن وی دەمی سەرکردایەتیا کێشا کوردی دکر هزر دهندێدا کرن کو مللەتێ خو ژڤێ کارەساتێ رزگارکەتن. ژبەر هندێ هزر د داریێتنا پلانەکێ دا بۆ بەرپالکرنا شۆرەشەکێ کر (عەلی، 2016، 133). وەك دبلۆماتکارێ بەریتانی، (لۆرد کرزن) دایە دیارکرن، دئەنجامێ ئەڤێ چەندێ دا پیرۆزی، ناڤ و دەنگییا شێخی دەنگڤەدا ب رەنگەکێ، کۆ هێدی هێدی بچاڤێ سەرکردەیەکێ نەتەوەیی یێ کوردی ژلایێ خەلکێ ڤە دهاتە پێش (باقی، 2000، 55)

پتشی پەیدابوونا شێخ عوبەدوڵاهێ نەهری وەك سەرکردەیەکێ نەتەوەیی و ناڤدار بوونا وی دناڤ کوردان و دەڤەرێ دا، دەستهەلاتداریا بەریتانیا دڤیا پێزانینان ل دۆر هەلوێست و رەفتارێن وی دگەل خەلکێ دا پەیدا بکەتن. لەوڕا بالیۆزێ بەریتانیا ئابۆت ل باژێرێ تەبریز بەرەڤ بنگەهێن شێخی چوو و لدەڤ بوو میهڤان، ئابۆت ب سەرنجراکێشانڤە دایە دیارکرن کو، نەریت و رێمورسمێن شێخی وەك بێن پاشا، سەرۆك و سەرکردەێن دیرۆکی بوون (Report by the British Consul on the Sheikh Ubeydullah Revolt in 1880-1881).

ژلایەکێ ڤە خزمەتکار و هاریکارییێن زۆر هەبوون، ژلایەکێ دیڤە، دبیاڤێ خۆارن، جل وبەرگانڤە د ژیانەك زۆر سادە دا دژیا، مادەێن بێهوشکەر و کحول نەدگەهشتە باشقەلا ل ویلایەتا وانێ کو دبن کونترۆلا ویڤە بوو، ناڤبری ل کوردستانێ یێ خۆشتڤی بوو، ل دەڤەرێن دبن دەستهەلاتا شێخی ڤە گەندەلی و بەرتیلکرن نەبوون، د رێڤەبرنا کاروبارێن دەڤەران دا بەرپرسان نەدشیان ژبن حوکمێ یاسایێ دەربکەڤن، هەر کەسەکێ ژ یاسایێ دیرکەڤتبایە سزایێ وی کوشتن بوو. شێخ عوبەیدوڵا زیرەك بوو، مفا ژ شارستانیەتێن ڕۆژئاڤایی وەرگرتبوو، پەیوەندییێن باش دگەل جیهانا دەرڤەیی کوردستانێ

هەبوون. دهەمان دەمیدا، ئابۆتی دایە دیارکرن شێخی شارەزاییەك باش د ئەدەب و دیرۆکا کوردی دا هەبوو(Maisel,2018,1).

1: هۆکارێن بووینە پالدەر ژبۆ رووبدانا شۆرەشێ و هزروبیرێن بەریتانیا ل دۆر:

1-1 : هۆکارێن کۆمەڵایەتی :

لدۆیف هزروبیرێن گەرد و دیپلۆماتکارێن بەرێتانی ل ئەوی دەمیدا کاودانێن کۆمەڵایەتی یێن کوردان زۆر نەخۆش ببوون، خویندارى، دزى، تالانکرن و رێگریکرن ل سەرانسەرى دەڤەرێن کوردى بەڵاڤبوو، ل گەلەک دەڤەرێن کوردى دەستهەڵاتدارێن عوسمانیان بۆ خۆ ژى پشتەڤانیا ئەڤێ چەندێ دکر، داکۆ پتر رەوشا کوردان تێکبچیت و هێزێن عوسمانى ب بهانەیا پەیداکرنا ئێمناهیێ بهێن کونترۆلێ لسەر جڤاکێ کوردى بکەن و لدۆیف ئارەزوویێن خۆ باجێن جۆاروجۆر لسەر کوردان ب سەپینن(Jwaideh, 2006). دیسان ل ئەوی دەمیدا میسیۆنەرێن بیانى مینا یێن بەرێتانى بخۆ ژى دەست دئالۆزکرنا رەوشا دەڤەرێن کوردیدا، چونکى ئەوان بەردەوام چالاکى دناڤ مەسیحیان دا ئەنجامددان و بۆ ئەوان دیار دکر کورد ئەگەرێن کوشتن و دەرکرنا ئەوان و کورد ناهێلێن ئەو دناڤ ئەوان دا بژین و ب هەر رێکەکا هەبیت دێ ئەو هەولدەن بهێن گوندێن هەوە داگیربکەن و لسەر ناڤێن خۆ تاپۆ بکەن و دەولەتا عوسمانى دئەڤێ چەندێ پشتەڤانیا کوردان دکەت، چونکى کورد موسلمانن و هەر بریارەکا عوسمانى بدەن ئەو دێ جێبەجێکەن، ب ئەڤێ چەندێ هەڤرکى و شەر دناڤبەرا کورد و مەسیحیان رووبدان، مزگینەرێن بیانى ڕاپۆرت ب شێوەیەکێ خراب لسەر کوردان دنڤیسان و دیار دکر کوردێن مەسیحیان دکوژن و پێدڤییە ئەو ژ ئەوان هێرشێن هۆڤانە یێن کوردان بهێنە پاراستن دا مەترسى نەکەڤنە سەر بەرژەوەندیێن بەرێتانیا ل دەڤەرێن کوردى(عەلى، 2016، 19-29).

ئەڤ رەوشا نەخۆشا ل دەڤەرێن کوردى هاتیە پێش شێخ عوبەیدوڵڵا پالدا هزرێ ل ئەنجامدانا شۆرەشەکێ بکەت و کونترۆلێ ل سەر ئەوان دیاردێن گرێتێن دناڤ جڤاکێ کوردیدا پەیدابووین بکەتو دئەڤى بیاڤیدا شێخ بۆ دیپلۆماتکار و قونسۆلێ بەرێتانیا ئابۆتى دایە دیارکرن دێ هەولدەین ئێکگرتنەکا جڤاکى دناڤ هۆزێن کوردیدا دروست بکەین و ب دەستێ ئاسنى دەستهەڵاتێ بکەت، داکۆ کونترۆلێ لسەر ئەوان دیاردێن گرێت بکەن و نەهێلن زیان ب چ گرۆپان دناڤ کوردان دا بکەڤن، هەروەسا دێ رێزێ ل هەمى گرۆپان کرین و خەلکێ کوردستانێ پێدڤى جاکسازییانە (Atmaca, 2017, 52).

1-1-2: هۆکارێن ئابووری و ئایینی :

1. ژ ئەنجامێ هشکە سالى، کێم بارانێ و نەبوونا دەخەل و دانى، بەلاڤبوونا برسایەتییێ، گرانى و نەخۆشیان دا ب هزاران مرۆڤێن کورد مرن. ئەڤ برسایەتییە هندیا کاریگەر بوو هەتاکو د ڕاگەهاندنا جیهانێ دا رەنگڤە دابوو، بو وێنە، ل ئادارا 1880ێ، رۆژنامە (لەندەن تایمز London Time)[1]و (مشاك Mshak)[2] یا تەفلیسى د ڕاپۆرتێن خودا ئاماژە پێدابوو.

2. سەپاندنا باج و خەرجێن زۆر ژلایێ دەستهەلاتداریا عوسمانى ل سەر هۆز و جوتیارێن کورد. ئەڤ چەندە بۆ ئەگەرێ بەرپالبوونا چەند بزاڤ و سەرهلدانێن ژلایێ هۆزێن کوردڤە یێن شێخ عوبەیدوڵڵاهێ ب ئاشکەرایى پشتەڤانیا ئەوان دکر وەك سەرهلدانا هۆزا (حەیدەرانلۆ و هۆزا گەراکلى) دەڤەر هەکارى ل شۆبات و ئابا 1879ێ(Maisel,2018,1; Duman,2010, 25).

3. بریارا شاهێ قاجارى (نصرالدین شاهێ قاجارى 1848-1896) بۆ کومکرنا باج و گومرکان ل دەڤەرێن کوردنشینێن سوونە. ژلایێ خۆ ڤە سەرۆك هۆزێن کورد ئامادەنەبوون باج و گومرکان بدەن دەستهەلاتداریا ئیرانێ. دهەمان دەمدا، کێشا سنۆرى یا دەڤەرا (کوتوور)، کو لدۆیف پەیماننامە بەرلین پێدڤیبوو ئەو دەڤەر بکەڤیت دبن کونترۆلا ئیرانێ ڤە. ئەڤ دەڤەرە ژلایێ جڤاکى و ئایینى ڤە گرێدایى تەکیا شەمدینانڤە بوون، بێگومان گرێدانا ئەڤان دەڤەران ب ئیرانێ ڤە دا زیانێن زۆر کاریگەر یێن ئابۆرى و سیاسى بدەستهەلاتا شێخێن نەهرى کەڤن(Report by the British Consul on the Sheikh Ubeydullah Revolt in 1880-1881)

4.سیاسەتا بکارهینانا ئایینێ ژلایێ دەولەتا عوسمانى و قاجاریانڤە بۆ شێخ عوبەیدوڵڵاهێ نەهرى ب باشى دیاربۆ بتنێ عوسمانى ئەڤێ چەندێ بۆ گرێدانا کوردان ب خۆڤە بکاردهینیت، چونکى عوسمانى و قاجاریيان دزانى کاریگەرییا

---

[1] ئەڤە رۆژنامەیەکا رۆژانەیا بەرێتانییە و ل 1 کانوونا دووێ 1785 ئێکەمین ژمارا ئەوێ هاتیە بەڵاڤکرن (The Time, https://www.thetimes.com/static/about-us/).

[2] رۆژنامەیەکا رۆژانە یا ئەرمەنى بوو، ل سالا 1872 ئێکەمین ژمارا ئەوێ دەرچوویە و ئەڤێ رۆژنامێ گرنگى ب ڕاپۆرتێن سیاسى ددا و تا سالا 1920 بەردەوام بوو (Movsisyan, 2022. 39-60).

ئایینی لسەر کوردان زۆرە و بتنێ دشێت ب ئەڤێ ڕێکێ بۆ ڕێگریکرنا کوردان بۆ دژایەتیکرنا دەستهەڵاتێن خۆ ل دەڤەرێن کوردی بکاربینیت، ب ئەڤێ چەندێ شێخی هەولددا کومبوونان دگەل سەرۆک هۆزێن کوردان ئەنجامبدەت و بۆ دیار بکەت ئەو سیاسەتا ئایینی یا عوسمانی و قاجاری بەرامبەری کوردان بکاردهینیت دوویرە ژ ڕاستیێ و بتنێ عوسمانی و قاجاریان دڤێت کوردان بۆ پاراستنا دەستهەڵاتا خۆ و دۆژمنێن خۆ ب تایبەتی قاجاریان بکاربینت (Ekinci, 2023, 401-405;Kılıç, 2022, 4-5) .

3-1-1: هۆکارێن سیاسی

1. بزاڤ و حەزێێن شێخ عوبەیدۆلاهێ نەهری بۆ دورستکرنا ئێکگرتنەکا کوردی و بدەستڤەئینانا سەربەخۆیا کوردستانا مەزن ل ئەڤێرێ هندەك هۆکار هەبوون کو شێخ پالدا تا داخوازییا ئێك بوونا کوردان د دەولەتەك سەربەخۆ دا بکەتن.

ا. تایبەتمەندیێن ڕەگەزی، کەلتوری و زمانی.

ب. ئەو وێرانکرن و کاڤلکرنا ژ ئەنجامێ حوکمێ ئیرانێ و عوسمانیان ل سەر کوردستانێ پەیدابووی. ئەڤ چەندە ببوو ئەگەرێ پەیدابوونا نەئارامی و نەخۆشیان و کوشتنێ. ئەڤ چەندە بۆ ئەگەرێ هندێ زیان بناڤ و دەنگیا مللەتێ کورد بکەڤتن.

ج. ئەنجامێن سەرکەفتنا ئەرمەنیان، دەرئەنجام و هووشیار بوونا هزرا نەتەوەیەتی دناڤ کوردستانێ دا(SARIKÇIOĞLU,2013, 1-35) .

2. ئەنجامێن بەندێ 61ێ یێ پەیماننامە بەرلین کو تێدا داخواز ژ دەولەتا عوسمانی هاتبوو کرن جۆرەکێ جاکسازییان د بەرژەوەندیا ئەرمەنیان دا ئەنجام بدەتن و ڕێکێ بۆ ڕێڤەبرنەك خو سەری یا ئەرمەنی ل شەش ویلایەتێن ڕۆژهەلاتا ئەندۆلێ کو دەڤەرێن کوردی بوون خۆش بکەتن. بێگومان ئەڤ چەندە بۆ ئەگەرێ نەرازیبوونا کوردان و بۆ ئەگەرێ هندێ ل ژێر سەرکردایەتیا شێخ عوبەیدۆلایێ نەهری بزاڤێ ژبۆ ڕزگارکرن و سەربەخۆبوونا کوردستانێ بکەن(SARIKÇIOĞLU,2013, 1-35).

ژلایێ خۆڤە، ل چرییا ئێکێ یا سالا 1880ێ، قۆنسۆلخانەیا بەریتانیا ل تەبریزێ، هزروبیرێن خۆ ل دۆر فاکتەرێن بووینە ئەگەرێ ڕوویدانا شۆرەشا شێخ عوبەیدۆللا نەهری داینە خۆیاکرن و دیارکری یە هندەك هزرڤان هندەك هۆکارێن دی بۆ بەرپالبوونا شۆرەشا کوردان ددەن دیارکرن کو ئەو ژی ئەجندەێن پشتەڤانیکرنا ئیسلامێ ژلایێ ئمبراتوریەتا عوسمانیڤە، گەشەکرن و بەرفرەهبوونا هەڤکرێ دناڤبەرا شیعە و سونەیان دا، بلندبوونا هەستێ نەتەوایەتێ دناڤ کێم نەتەوێن نەموسلمان دا و چالاکیێن مزگینەرێن مەسیحی دناڤ دەڤەرێ دا(Nzibari,2012).

هەروەسا دایە دیارکرن کو دیرۆکنڤیس نەئێك بۆجوونێن دگەل هندێ کو شۆرەشا شێخ عوبەیدۆللاهی ژ ئەگەرێ هزرا نەتەوەیی و پالدەرێن کێم نەتەوەیان هاتبێتن ڕوویدان. دهەمان ڕاپۆرتا خۆ دا، قۆنسۆلخانەیا بەریتانیا دایە دیارکرن کو سەرەرای هەبوونا یان نە بوونا گومانێ دناڤ کوردان دا ل دۆر نەتەوەبوونا خو، دیرۆکنڤیس دده نە دیارکرن ئەڤ شۆرەشە ب دەستپێکا پەیدابوونا بزاڤا نەتەوایەتیا کوردی دهێتە نیاسین. دگەل هندێ دا، ل دۆیڤ کارڤەدانێن هژمارەکا ڕاپۆرتێن بەرپرسێن دەولەتان و بیروباوەرێن مزگینەران ل دەڤەرێ، قۆنسۆلخانەیا بەریتانیا د ڕاپۆتا خۆدا دایە دیارکرن کو شێخ عوبەیدۆللا نەهری پرۆژەك بۆ دورستکرنا حوکمێ خۆ بڕێڤەبرنێ لژێر چاڤدێرییا خیلافەتا عوسمانی دا هەبوو(Maisel,2018,1). ب ئەڤی ڕەنگی خۆیا دبیت بەریتانیا ب شێوەیەکێ بەرفرە هەولددا هۆکارێن ڕوویدانا شۆرەشا شێخی دیار بکەت و وەک دەرفەت ب دەولەتا عوسمانی بدەت داکو نەبیت ڕێگر درێکا بەرفرەبوونا پێگەهێ دناڤ دەولەتا عوسمانیدا.

2: بزاڤێن شێخ عوبەیدۆلا نەهری یێن بدەستڤەئینان پشتەڤانن بۆ شۆرەشێ:

ئێك: ل سەر ئاستێ ناڤخۆیی دا

ل 20 حوزەیرانا 1880ێ، بەتریارکێ ئەرمەنی نامەیەکێ بۆ وەزیرێ دەرڤە یێ بەریتانیا گرانیڤل (Granville) فرێدکەت و گرانیڤل هەمان نامێ بۆ بالیۆزێ بەریتانیا "گوشن"، ل ئیستەمبۆلێ فرێدکەتن و تێدا دیاردکەتن، کو شێخ عوبەیدۆللا نەهری بزاڤان بۆ دورستکرنا کومەلەکا کوردی دکەتن. هەروەسا دبەلگەنامەێن بەریتانیا دا هاتیە دیارکرن، پشتی شەرێ عوسمانی و ڕۆسیا یێ سالێن 1877-1878ێ، هەروەسا پەیمانا سان ستیڤانۆ یا 3 ئادارا سالا 1878و بەرلین یا 13 تیرمەها سالا 1878ێ، شێخی بهاریکارییا هەڤالێن خۆ ئەڤ کولەك دامەزراندن(عەلی،2016، 10).

ئەڤ كومەلە د ڕاپۆرتێن بالیۆزخانەێن بەرێتانیا ، ڕووسیا قەیسەری، بەتریارکێن ئەرمەنی و چاپەمەنیا تۆرکیا دا، ب "كومەلا ئێكەتیا كوردانThe Kurdish League society " هاتیە نیاسین(فتح الله، 2010، 33). دبەلگەنامەێن بەرێتانی دا هاتیە دیاركرن، كۆ شێخ عوبەیدوللا نەهری، دێ بیتە سەرۆكێ ئەڤێ كومەلێ ، هەروەسا بەحری بەگ كورێ مەزنێ بەدرخانی دێ بێتن كارگێرێ ڤێ كومەلێ(Sarikçioğlu,2013, 1-35). ل ئەوی دەمیدا قونسۆلێ بەرێتانیا ل تەبریز ئابۆتی دابۆ دیاركرن پێدڤییە ب هویری دویڤچوونا شێخی، كورێن ئەوی و هەڤپەیمانێن ئەوی بكەین (فتح الله، 2010، 33). دئەڤی بیاڤیدا وەزیرێ دەرڤەیێ بریتانیا گرانڤێل هەڤپێچەكێ بۆ بالیوزێ بەرێتانیا ل ئستەنبولێ (جورج یواكیم گۆشن George Joachim Coschen) هنارت و دئەڤێ هەڤپێچێ دا دبێژیت: " كومەلەیەكا كوردی ژلایێ كوردان ڤە هاتییە دروستكرت و مەرەم ژێ كپكرنا دوزا ئەرمەنایە و شێخ عوبەیدوللاهێ نەهری سەروكێ ئەڤێ كومەلێ یە" (گولی،2021، 45).

ئارمانجێن ئەڤێ كۆمەلێ ئەڤێن لخۆارێ بوون:.

1. رزگاركرنا كوردستانێ ژ زۆلم و زۆرداریا قاجاری و عوسمانیان،
2. پێكئینانا دەولەتەكا كوردی یا ئێكگرتی و ئازاد ل هەردوو پارچەێن كوردستانا عوسمانی و قاجاری ،
3. دانانا شێخ عوبەیدوللا نەهری وەك پاشایێ كوردستانێ،
4. دۆستایەتیكرنا گەلێن ئەرمەنی و مەسیحی ل كوردستانێ(باقی، 55،2000)

هەروەسا پێزانێن پتر لدۆر ڤێ كومەلێ د بەلگەنامەێن بەریتانی دا هاتینە و چەند خالەك لدۆر داینە دیاركرن، كۆ لخۆارێ :.

1. ئەڤێ كۆمەلێ لەڤێن خۆ ل هەمی باژێرێن كوردستانێ هەبوون،
2. ئەڤێ كۆمەلێ 4 هزار تفەنگێن مارتینی هەبوون، 200 پارچە ژێ ئیرانی بوون و ئەوێن دی تۆركی بوون،
3. پتریا سەرۆك هۆزێن كوردستانێ لگەل یێن سەرۆك هۆزێن كوردی ل ئەرمنیا و ڕووسیا قەیسەری ئەندامێن ئەڤێ كومەلێ بوون (باقی، 2000، 55).

ژبۆ پشت راستبوونا دەنگ و باسان لدۆر ئەڤێ كۆمەلێ، ل تیرمەها 1880ێ، كلایتۆن، جێگرێ قونسۆلخانەیا بەریتانیا ل وانێ، ب سەرەدانەكێ بەرەڤ گوندێ نەهرێ چوو بوو، ل وێرێ چاڤ ب نوێنەرێن دەڤەرێن جودا جودا یێن كوردستانێ وەك سەرۆك هۆزێن كوردێن سلێمانی، ئامێدی، هەورامان، ساسۆن، بۆتان،سێرت، مووش، سەرۆك هۆزێن كوردستانا ئیرانێ (باقی، 2000، 55). بۆ ناڤبری دیار بوو كو شێخی بزاڤكرینە ئێكگرتنەك سیاسی دناڤبەرا سەرۆك هۆزێن كوردی دا دورست بكەتن داكو دەست ب شۆرەشەكێ ل دژی دەولەتا عوسمانی و قاجاری بكەن، داكۆ مللەتێ خۆ ژبن سیاسەتا گاڤلكرن و رووخاندنێ یا هەر دوو دەولەتان رزگار بكەن(Nzibari,2012).

چونكو هەر دوو دەولەتان زۆلم و زۆرداریەك ئێكجار تۆند ب دژی كوردان بكارهینا بوو. ژبەر هندێ ل ئیلۆنا 1880ێ، شێخ عوبەیدوللاهێ نەهری كومبوونەك لگەل (220)سەرۆك هۆزێن كوردی ل دەڤەرا شەمدینان گرێدا و تێدا شێخی گرنگترین نیاز و پرۆگرامێ شۆرەشێ ب تیرۆتەسەلی بەحس كر(Sunar,1999,140). دڤێ كومبوونێ دا بریارا ئێكگرتنا كوردان بناڤێ "كۆمەلا عەشیرەتێن كورد" ب دروشمێ بلندكرنا ئالایێ خەباتێ ل دژی تۆرك و فارسان دەست ب خەباتا خۆ بكەتن (Yadirgi,2014,143).

ل ئەوێ كومبوونا دەڤەرا شەمدینانداا شێخی گۆتارەك پێشكێش كر و تێدا دا دیاركر، " ئیمبراتوریا عوسمانی بەری 550 سالان هاتیە دامەزراندن و گەهشتنا وان بۆ دەستهەلاتێ نە یا رەوا بوو و ئەڤە نێزیكی 400تا 500 سالانە حوكمی دكەن، دەست ژ ئایینێ ئیسلامێ بەردایە، رێبازا كوفرێ گرتیە بەر، هەر ژهینگێ وەرە تا نۆكە بەردەوام یا لاواز دبتن و بەرەڤ هەرفینێ دچیتن، ژبەر هندێ پێدڤییە ئەم د ئازادبین، نە بتنێ ئەم كوردێن د تۆركیا دا، بەلكۆ كوردێن ئیرانێ ژی، پێدڤییە ئەم ئازاد بین ژ هەر دەستهەلاتدارێن دژایەتییا پێشكەفتنامە دكەن، ئەڤە بوو هێڤیا بابپیرێن مە و فەرمانا وان بۆ مە ئەم هەمی خۆینا خۆ برێژین د پێناڤێ ئایینی و ئازادییا وەلاتیدا"(بێسكی، 2013، 75).

بهێزكرنا پەیوەندیێن دیرۆكی دناڤبەرا كورد، ئەرمەن، ئاشوری و عەرەبێن ل كوردستانێ ئاكنجیبووین و رێگرتن دبەلاڤكرنا پرۆپاگەندەیێن ژەهركری یێن ئارمانج ژێ تێككشكاندنا برایەتیا دناڤبەرا وان دا بوو. شێخی بزاڤكرن پەیوەندییان دگەل كێم نەتەوەێن ل كوردستانێ دورستكەتن و دیرۆكا پێكڤە ژیانا وان بپارێزتن و یەكسانی و دادوەریێ درێڤەبرنێ كاروبارێن دەڤەرێن دبن كونترۆلا خۆدا پەیرەوبكەتن(ÖZTEN,2009,).

هەروەسا شێخی بزاڤکر پەیوەندییان لگەل خەلکێ باژێرێن دی یێن کوردی گرێدەتن و وان پالدەتن بهێنە دناڤ شۆرەشا وی دا یان پشتەڤانیا شۆرەشا وی بکەن. ژبۆ ڤێ مەرەمێ شێخی نامە بۆ ژمارەکا زۆرا سەرۆك هۆزێن کوردی، کوردێن سەر سنۆری و باژێرێن کوردی یێن دناڤ دەولەتا عوسمانی دا فرێکرن. بەلێ دەستهەلاتداریا عوسمانی سانسۆرێن تۆند ل هەمبەری بزاڤێن شێخی گرتبوون بەر، ژبەر هندێ نامەێن وی نەدگەهشتنە ئەڤان دەڤەران(باقی، 200، 75). بۆ نموونە، شێخ عوبەیدۆللا نەهری نامەیەك بۆ خەلکێ باژێرێ ئەرجشێ و ئەڤ نامەیە دکەفتنە دەستێ دەستهەلاتا عوسمانی ل دەڤەرێ. لەوڕا دەستهەلاتداریيا عوسمانی ل دەڤەرێ هندەك پێنگاڤێن تۆندی و بلەز بۆ کونترۆلکرنا بزاڤێن شێخی ل دەڤەرێ دگرنە بەر (Soleimani,2016).

دهەمان پێنگاڤێن خۆدا، شێخ عوبەیدۆللا نەهری و کورێ ئەوی شێخ عوبەیدۆلقادری ژبۆ بدەستڤە ئینانا پشتەڤانیا کوردان بەرنامەیەك دانابوو، بڤی بەرنامەی شێخ سەرەدانا دەڤەرێن کوردی دکر. بڤێ چەندێ شێخی بڕیار دابوو ل بەهارا 1881ێ، سەرەدانا رەواندۆزێ بکەتن داکۆ دانووستاندنێ لگەل هۆزێن ڤێ دەڤەرێ بکەتن (Rhys Bajalan,2009). بەلێ ل 9 ئادارا 1881ێ، کەسەکێ بناڤێ (حەسەن عەلە خان) دەستهەلاتداریيا قاجاری لدۆر ڤێ چەندێ ئاگەهدار کربوو. ژبەر هندێ شێخی بەرنامێ سەرەدانا خۆ گهوری و بەرەڤ دەڤەرا پشدەر، بێتوێن، کۆیە، هەولێر، رەواندۆز و ئامێدی چوو، شێخی دڤیا بەرێخوبدەتن کوردێن باشۆرێ رۆژئاڤایێ کوردستانێ، ژبەرکو کوردێن ڤێ دەڤەرێ ژ کوردێن کوردستانا قاجاری کێمتر پشکداری د بوویەرێن دەستپێکا شۆرەشێ دا کربوو. بڤێ چەندێ دیار دبیتن، شێخی دڤیا ڤێجاری ئەڤێ پارچەیا کوردستانێ تاقیبکەتن و بکاربینتن(باقی، 2000، 75). ب ئەڤی شێوەیی دیار دبیت شێخ هەولدا ئێکگرتنەکا سیاسی لسەر بناخێ نەتەوەیی ب مەرەما بهێزکرنا پێگەهێ کوردان دناڤ وەلاتێ خۆ دا بهێز بکەت و پەیوەندییان دگەل نەتەوەیێن دی بگرێدەت داکۆ پتر فشاران بکەن سەر ئەوان دان پێدانێ ب هەبوونا مافێن کوردان بکەت.

دوو: ل سەر ناستێ دەرڤە دا

شێخ عوبەیدۆلاهی بۆ ب سەر ئێخستنا بەرنامێ شۆرەشا خۆ باوەرییەکا زۆر ب ڕووسیا قەیسەری هەبوو. چونکو ناڤبری باش دزانی کو ڕووسیا دۆژمنێ سەخت و هێزداریێ عوسمانیان بوو. ژبەر هندێ نیاز و پلانێن خۆ یێن نهێنی بۆ نۆێنەرێن ڕووسیا و قونسلێن وێ ل (وانێ، ئورمیێ، ئەرزەرۆمێ و تەبریزێ)، دابوون دیارکرن. مەبەستا شێخی ژ ڤێ چەندێ ئەو کو پشتەڤانیا دەستهەلاتداریا ڕووسیا قەیسەری بۆ شۆرەشا خۆ بدەستڤە بینتن(Jwaideh,2012; Mayell, 1996,78).

بەرەڤاژی شێخ عوبەیدۆلاهی حەژ بەریتانیا نەدکر و گومان ژ هەبوونا نۆێنەر و قونسلخانەێن بەریتانیا دکر. ژبەر هندێ لدەمێ دهاتن سەرەدانا وی زۆر یێ هووشیار و سەرخۆ بوو و بهویری و کویری بەرسڤا پرسیارێن وان ددا. چونکی ناڤبری باوەری بهندێ هەبوو کو بەریتانیا پشتەڤانەك ڕاستەقینە و بهێزا عوسمانی بوو د ئەجندەیێن وێ یێن سیاسی و لەشکەری دا ل دەڤەرێن کوردنشین. هەر دوو وەلاتان بەردەوام بزاڤ دکرن ژبۆ لاوازکرنا و ژناڤبرنا مللەتێ کورد(Soleimani,2014).

دگەل هندێدا، شێخ نامەیەکێ بۆ بالیۆزێ بەریتانیا وێلیەم ئابۆت ل تەبریزێ فرێدکەتن و تێدا ددەتن روونکرن، " کورد مللەتەکێ مێرخاسن و خۆدانێن تایبەتمەندی و رەوشتێن باشن، خودانێن دابوونەریتێن تایبەتن بخۆ ل گەل ئەڤێ چەندێ دۆژمنێن مە بزاڤێ دکەن مە مێرکۆژ و هۆڤ بدەن دیارکرن، زەلامێن کورد یێن دەستهەلات ل تۆرکیا، رۆسیا و ئیرانێ ئێك بووجونێن ل سەر ئێك ئارمانج، لەوڕا پێدڤییە چارەسەرییەك بلەز بۆ پرسا وان یا نەتەوەیی بهێتە دیتن، ئەگەر نە کورد دێ بخۆ چارەسەرییەك گونجایی بو بینن، چونکی مە ئیدی ئەم نەشێن خۆ لبەر ب زلم و زۆرداریێ بگرین، ئەم خۆینا خۆ هەتا دلۆپا دوومامیکێ رێژین داکو بەرەڤانیێ ژ خۆ بکەین و بدژی عوسمانی و ئیرانێ راوەستین، ئەم داخوازا سەربەخۆبوونێ دکەین. ئەڤە یا ئارمانجا شۆرەشا مە ژبۆ نەهێلانا زلم و زۆرداریيا تورك و فارسان ل سەر مللەتێ کورد و رزگارکرنا کوردستانێ"(Report by the British Consul on the Sheikh Ubeydullah Revolt in 1880-1881; Mayell, 1996,78).

شێخ عوبەیدۆلاهی بزاڤێن خۆرت و بهێز دکرن ژبۆ بدەستڤەئینا پشتەڤانیا دەرەکی بۆ شۆرەشا خۆ. بو ڤێ مەرەمێ بزاڤێن بەرچاڤ ئەنجامدابوون ژبۆ دورستکرنا پەیوەندییێن دەرڤە دگەل سەرکردێ مسرێ (خدێوێ تۆفیق)، ، شەریفێ مەکەهێ ل حیجازێ. دهەمان پێنگاڤێن خۆدا، شێخی پەیوەندی ب (عەباس میرزا مولك) یێ قاجاری یێ نیڤ کورد کر کو پشکداریێ د بزاڤێن وی دا بکەتن(باقی، 2000، 55). ل ئەوی دەمیدا شێخی هەولددان پەیوەندییان دگەل بەرێتانیا گرێدەت، چونکی شێخی وەسا هزردکر بەرێتانیا بەردەوام ب بهانەیا دانا مافێن نەتەوەیێن بن دەستهەلاتا عوسمانی خۆ نێزیکی ئەوان

دکر و شێخ هزردکر ئەگەر بەڕێتانیا پشتەڤانیا کوردان بکەت دێ کورد مافێن خۆ بدەستڤەهینن. بەلێ بەرۆڤاژی بەرێتانیا نەدڤیا خۆ نێزیکی کوردان بکەت و بتنێ بۆ رازیکرنا عوسمانیان و پێدانا پێزانینان لدۆر کوردان خۆ نێزیکێ ئەوێ دکرن.

3: ئارمانجێن شۆرەشێ و هزروبیریێن بەریتانیان ل دۆر

ئارمانجا سەرەکی یا شێخی، ئێکگرتنا کوردان ل سەر ئێکگرتنەك نەتەوەیی بوو د چوارچوڤێ دەولەتەك سەربەخۆدا، ب درستی نەهاتیە زانین کا گەنگی ئەڤ هزرو بیرە دمێشکێ شێخی دا پەیدابووینە. بەلێ هاتیە زانینن بوویەر و پێشهاتێن شەرێ (1877_1878ێ) و دەرئەنجامێن ژێ پەیدابووین، کارتێکرنەك بهێز د وەرارکرنا ئەڤێ هزرێ دا هەبوو. وەك دیارە پەیدابوونا ئەڤی زانایێ ئایینی یێ سۆفیگەری و نشتیمانپەروەر و هێڤی خواز بۆ سەرکردایەتیکرنا گەنجێن میللەتێ خۆ، رەنگڤەدانەك بناغەیی و کویر دگەشەکرنا هزروبیرێن وی دا هەبوو، ئەڤە ژی وێ نیشان ددەتن کو ناڤبری شیانێن مەزن درێڤەبرنا وەلاتێ خۆ دا هەبوون(Kılıç,2003,1-85).

بێگومان ئەڤ هزروبیرە دناڤ وان دەستهەلاتدارێن بەرفرهە یێن تۆندرەو د سرۆشتێ خۆدا و سنۆردارکرنا هێڤێن وی دا پەیدابوون. چونکو دوی وەختی دا بوو وان دەستهەلاتداریان دەست ب سەر داهاتێن کوردان دا گرتین و کاودانێن وان نەخۆش و بەرتەنگ کرین، لڤی دەمیدا دەنگ وباس بەلاڤبوون کو سەرکردەیەك ل دەڤەرێ هەیە بایەخەك بەرفرهە دایە خزمەتکرنا گەل و وەلاتی. هینگێ ئارمانجێن کوردستانەك سەربەخۆ، ب ئاشکرایی و رووتر جهێ خۆ دمێشکێ وی دا دکەن(Gözel,2007,114). ل دۆیف ئەڤا ل سەری هاتیە شرۆڤەکرن، دشێن ئارمانجێن شۆرەشا شێخی بڤی رەنگێ ل خوارێ دیار بکەین:

1. ئیکگرتنا کوردان ل سە ر بنیاتێ نەتەوایەتی و رزکارکرنا کوردستانا قاجاری وعوسمانی .
2. نەهێلانا دز، رێگر، کوشتن، تالانکرن و وێرانکرنێ،
3. بەرقرارکرنا ئێمناهی و ئاسایشێ ل دەڤەرێن سنۆری بێن دکەڤنە دناڤبەرا سنۆرێ ئیرانێ و عوسمانیان دا.
4. بەرقرارکرن و سەروەریکرنا یاسایێ، دادوەری و یەکسانیێ.
5. پشتەڤانیکرنا خواندنێ برێکا ئاڤاکرنا قوتابخانەیان.
6. پێتەدان ب ئایینی برێکا دورستکرنا کەنیسان و مزگەڤتان.
7. هاندانا چاندنێ و ئاڤاکرنێ.
8. پاراستنا ژیانا خەلکێ وهاندانا بازرگانی، پێشەسازی و خزمەتکرنا چڤاکی وشارستانییەتێ ل کوردستانێ.
9. هەڤکاری دگەل مللەتێن مەسیحی (ئەرمەن و کلدان و ئاشووری) ل سەر بنیاتێ لێبورینا ئاینی و رێزگرتنا وان .
10. رێکخستنا سیستەمێ کارگێری یێ کوردستانێ و پێك ئیینانا حکوومەتەك یاسایی و سەقامگیر.
11. بزاڤکرن ژبۆ بدەستڤەئینانا پشتەڤانییا سیاسی و یاسای ژلایێ دەولەتێن زالهێزڤە (Sarikçioğlu,2013, 1-35; Kılıç, 2022, 1-15)

ل دۆر ئەڤان ئارمانجێن شۆرەشێ، زاڤایێ شێخ عوبەیدۆللاهی، شێخ (محمد سەعید)، دکومبوونەکێدا دگەل مزگینەرێن ئەمریکی و مەزنێن ئاشۆری و سیمۆن ئاغا مەزنێ ئەرمەنان و هژمارەکا لایەنگرێن شێخی دابوو دیارکرن، شێخ عوبەیدۆلاهی دایە دیارکرن ئەگەر هاتوو شۆرەش ب سەرکەفت و نەشیا ئەڤان ئارمانجان جێ بەجێ بکەتن. هینگێ شێخ ئامادەیە بهێتە دادگەهەك ئەورۆپی و پاشی هەر بریارەکا دادگەە ل سەر بادەکا وی بدەتن دێ پێ رازیبتن و ب ستۆێ خۆڤە گرتن(Nzibari,2012).

پشتی سەرەدانا دەڤەرێ، هەلسەنگاندنا کاودان ، پێشهاتێن دەڤەرێ، کومبوونا دگەل سەرۆك هۆزێن کوردی و دانووستاندنکرنێ دگەل شێخ عوبەیدۆلاهی هژمارەکا دیارا نۆێنەر و بەرپرسێن بەریتانی هزروبیرێن خۆ ل دۆر ئارمانجێن شۆرەشا شێخی داینە دیارکرن. بالیۆزێ بەریتانیا ئابۆت ل تەبریز د ڕۆژێن هێرشا کوردان دا بۆ سەر ئیرانێ ، ئارمانجێن شۆرەشا شێخی ب ئاشکرایی داینە دیارکرن کو، " ئارمانجا شێخی ئەوە خۆ بکەتن سەرۆکێ دەولەتا کوردی و کوردستانا عوسمانی و قاجاری رزگار بکەتن. دهەمان پێنگاڤێن خۆدا ژبۆ شرۆڤەکرنا ئارمانجێن شێخی، جێگرێ قونسۆلخانەیا بەریتانیا کلایتۆن (Clayton) ل وانێ دایە دیارکرن کو، "من باوەرییەك تەمام هەبوو کو شێخی ئارمانجەك تەمام بۆ ئێکخستنا کوردان و دورستکرنا دەولەتەك سەربەخۆ ب سەرۆکاتیا خۆ بخۆ هەبوو"(Jwaideh,2012,81).

دبوویەر و پێشهاتێن شۆرەشێ، نوێنەرێن بەریتانیا هەمی شیانێن خۆ دمەزاختن کو ئارمانجێن شۆرەشا کوردی بۆ دەستهەلاتداریا وەلاتێ خۆ دیاربکەن. ژبەر هندێ، مێجەر ترۆتێر (Major Troteir) قونسلێ گشتی یێ بەریتانیا ل ئەرزەرۆم هزروبیرێن خۆ ل دۆر ئارمانجێ شێخی دابوون خۆیاکرن و دیارکری یە کو، " گومان دهندێدا نینە، ئارمانجا ئەڤی زەلامی، رزگارکرنا وەلاتێ وێ یە ژ بن دەستهەلاتا کاربەدەستێن عوسمانی و دانا خۆ ب سەرۆکێ کوردستانێ کو پێکهاتیە ژ پشکەکا باشۆرێ (وانێ) و پشکەکا باکوورێ ویلایەتا مۆسل و زێدەتر ژڤێ چەندێ هندی بشتێن پێگەهێ خۆ ل وان هەر دوو هەرێمان بەرفرهە و زێدە بکەتن" (جویدە، 2007، 14).

لدەمێ بالیۆزیێ بەریتانیا تومسۆن (Thumson)، ل تەهران، هزروبیرێن شێخی دهندێدا د هەلسەنگینتن کو شێخی هەمی هێز و شیانێن خۆ دمەزاختن بۆ بدەستڤەئینانا ئەڤێ ئارمانجێ. ئەڤ چەندە ژ " ئەوان ئاخڤتن و نامەیان دیار دبوو پێن کو شێخی دگەل هەمی سەرۆك هۆزێن کوردی پێن چیایێن سەر سنۆرێ ئیرانێ گەنگەشەکرین و ب ئاشکرایی دڤیا کوردان بۆ هندێ پالدەتن کو ژبن دەستهەلاتا عوسمانی و قاجاری رزگارکەتن، دەولەتەك جودا و سەربەخۆیا کوردی ب سەرۆکاتیا خۆ دورست بکەتن، بڤێ رێکێ دڤیا ب پەیمان و سۆزان هەمی هۆزێن کوردی بکەتن دبن کونترۆلا خۆڤە و ب دژی ئیرانێ شۆرەشێ بکەتن"(جویدە، 2007، 23). ئەڤە هەمی ئەو ئارمانج بوون پێن شێخی هەمی هێز وشیانێن خۆ بۆ بدستڤەهینانا وان تەرخانکرین. ژبەر هندێ بەریتانیا ب شێوەیەکێ بەرفرە و هشیار دۆیڤچوونا ئەوان ئارمانجێن شێخی دکر داکۆ بۆ دیاربیت کا شیانێن هێزێن کوردی پێن شەرکرنێ چەندن و پلانێن ئەوان پێن شەرکرن و برنا هێرشان لسەر هێزێن عوسمانی و قاجاریان چەوانن و دێ شێن پێ ئارمانجێن خۆ بدەستڤەهینن.

3.1. هێزێن شێخی ژلایێ ئاماری و چەکیڤە

د شەری دا ب بەرێخۆدانا ئەنجامێن شەری ئەگەر ماوێ وێ کورت ژی بتن، ئەگەر دەستپێکێ بهێز و رێکخستی نەبتن ، پلان و ئارمانجێن وی ب نهێنی نەهێنە پاراستن ئەو ماوێ کورت ژی تێرا ناکەتن، ب تایبەتی ئەگەر هاتوو پشت ل سەر هێزێن هۆز و خێلەیان بهێتە بەستن.ژبەر هندێ ئەو شۆرەشە هەر زیکا دێ ئالۆزی و لاوازی کەڤنێ و شکەستنەك سەرانسەری دێ بتن پاشەرۆژا وێ ، بەرەڤاژی سەرکەفتنێ د کوشتن، تالانکرن و وێرانکرنەك وەسا ژێ پەیدابتن کو دشیان دانینە بهێتە بەحسکرن (Jwaideh,2012,91).

ئەگەر هێزێن هۆزان دەستکەڤت و تالانکرن ب دەستکەفتن و چاڤێن وان پێکەڤتن، ئیدی د ئێکەم دەرفەت دا دێ بەرەڤ ماڵان چن و تاڵان کەن. ژبەر هندێ بەردەوام ئەڤ جۆرێن هۆزان ژلایێ هژمارێ ڤە بەردەوام بەر ب زێدەبوون و کێمبوونێ ڤە دچن. هەروەسا هەتا د پێشهاتێن سەرکەفتنێ دا، ئەو هژمارا د مەیدانا شەری دا شەری بجهـ دهێلن دبیتن تشتەکێ نەچاڤەرێکری بتن، ژبەرکو ئەو بتنێ بۆ تالانکرنێ و دەستکەڤتان پشکداریێ تێدا دکەن(Nzibari,2012).

دگەل هندێدا، نەبوونا سەرکردەیەکێ جهێ باوەری کو ئەوان هێزان پالبدەتن بتنێ ل دۆڤ ئامۆژگارییێن وی بچن و بڤێ چەندێ نەشێن سەرجەمێ گشتی یێن هێزێن کوردی، ئەوێن پشکداری د شۆرەشا شێخی دا کرین ب تەمامی بخەملینێن و دیار بکەین. ژبەر هندێ، لڤێرێ دێ یا فەر بیتن، بەرێخۆ بدەین ئەوان تومارانێ ئەوێن دەربارەی کارێن سەربازییێن کوردان د بەرنامێ شۆرەشێ دا هاتین تومارکرن کو دێ ل رێزێن بهێت دا بەحس کەین(جویدە، 2007،58)

وەکو هاتیە زانین لدەمێ هێرشێ دا، هێزێن ئیرانێ ئەوێن ل ئازەربایجانێ دلاوازبوون، ب ئەڤێ چەندێ دشێن بێژین شەرڤانێن شێخی ژلایێ هژمارا چەکی وجۆرێن چەکیڤە دبیت کێم یان زێدە بن، ژبەر ئەو چەك و کەرەستەێن ل شەرێ 1877ێ، بدەستڤەهیناین. دناڤ ئەوی چەکێ کوردان بدەستخۆڤەئیناین هژمارەکا زۆرا تڤەنکێن (مارتینی هێنری Martini Henry)[3] و فیشەکێن ئەوان بوون (Sarikçioğlu,2013, 1-35)

دبەلگەنامەێن ئەمریکی و بەریتانی بەحسێ هندێ هاتیە کرن، بەری هێزێ سەر ئێکەتیا کوردان ڤە دەست بهێرشێ بکەن بۆ سەر ئیرانێ، (4،000) هزار جۆرێن تڤەنگێن مارتینی هەبوون. بڤێ چەندێ دیار دبتن کو (200) هزار ژ ئیرانێ و یێن دی ژ عوسمانیان بدەستڤەئینابوون. وەسا دیارە بۆ پەیداکرنا پێدڤیێن شەری شێخی کەرەستەێن خۆ ب سناهی پەیداکر بوون. بالیۆزێ قاجاریان ل ئیستەمبۆلێ سەلماندییە کو شێخی "کارگەهەك گرنگ یا فیشەکان" هەبوو، ژبلی کو چەندین هزاران ژ شەرڤانێن شێخی تڤەنکێن ژ جۆرێ (مارتینی هێنری) پێبوون. دهەمان دەمدا، باسیل نکتین دایە دیارکرن کو "شەرڤانێن شێخی تڤەنکێن مۆدێلێن نوێ پێبوون". هەروەسا قونسلێ گشتی یێ بەریتانیا (ئابۆت)، دایە روونکرن کو "شێخی هژمارەکا زۆرا تڤەنکێن مارتینی هەبوون"(Jwaideh,2012,92).

---

[3] ئەڤ چەکە بناڤێ (مارتینی هێنری) هاتیە بناڤکرن و ب شێوازێ خۆ نێزیکی (برنوێ) یە، ل سالا 1870 هاتیە وێنەکرن و ل سالا 1871 بۆ ئێکەمین جار ژلایێ هێزێن بەرێتانی ڤە هاتیە بکارهینان و ئێک ژ باشترین جۆرێ چەکێ سەردەمێ خۆ بوو و ئەڤ چەک تا سالا 1918 هەبوو (Manning, 2013).

هەورەسا لڤی ماوەی دا، شێخی ب نهێنی پەیوەندی ب فەرمانبەرێن عوسمانی لدەڤەرێ، ئەوێن رێز لێدگرتن کربوو. هەروەسا نوێنەرەکێ خۆ هنارتبوو دەڤ هەرێمداریێ باژێرێ (شاتاخ)، داکۆ بۆ چەکی پەیدا بکەتن. ئەڤ بزاڤێن شێخی دیار دکەن، کا ناڤبری چەندێ بلەز بوو ژبۆ کۆمکرن و چەکدارکرن و ئێکخستنا کوردان(جویدە، 2007، 59)

دەستپێکرن و پێشهاتێن شۆرەشێ

ل سالا 1879ێ، بزاڤەك ل باکورێ دەریا وانێ ل دژی عوسمانیان رووبدابوو، هەروەسا ل تەباخا 1879ێ، کوردێن گەراگلی یێن هۆزا حەیدەرانلی لگەل هێزێن دەولەتا عوسمانی ب شەر چوون، د ئێکەم شەرو پێکددانا وان دا ژمارەکا زۆرا کوردان هاتنە کوشتن و 40 کەس ژێ هاتنە گرتن. دئەنجامدا، سەرهلدان و یاخبوونێن بچووك ل سەرانسەری کوردستانێ بخۆڤە گرتن(Çiftçi, 2018, 120; ; Duman,2010, 24).

ئەڤان هەمی ڕویدان و بوویەرێن تازە و بلەزێن یێن نێڤدەولەتی، هەرێمی، پێشهاتێن هەستیارێن کوردستانێ و سەرهلدانا ئاریشەیا ئەرمەنییان، شێخ ئێخستنە بەر هووشیاری و هەلسەنگاندنێن بلەز یێن پێشهاتێن سیاسی ل دەڤەرێ. ژبەر هندێ، شێخ رووی ب رووی ستراتیژییەکا سەخت و بەرنامە دارشتی ببوو(Kılıç,2003,88)، ژبۆ بەرهنگاربوونا ئەڤان بوویەران شێخی کارەکێ چەند لایەنی لدۆڤ ئەڤان بناخەیێن ل خۆارێ دارشتبوون:.

1. رئێکخستن و ئێکگرتنا هێزێن کوردی،
2. هەبوونا هەلوێستەکێ لدۆر کێشەیا ئەرمەنی،
3. ئەنجامدانا کارێن دبلۆماسی و دانەنیاسینا کێشەیا کوردی ب جڤاکێ نێڤدەولەتی یێ ئەوی دەمی، ب تایبەتی برێکا نوونەر و مزگینەرێن بەرێتانی دۆزا کوردی بگەهینتە حکومەتا بەرێتانیا و نوونەرێن ئەوێ دناڤ دەولەتێن عوسمانی و قاجاریدا.
4. ئەنجامدانا شۆرەشەکێ ل کوردستانێ
5. ئەنجامدانا کومبوونان دگەل سەرکردە و ئاغایێن کورد ژبۆ هشیارکرنا ئەوان ژلایێ نەتەوەیی و سیاسەتا بکار هینانا ئایینی ژلایێ عوسمانی و قاجاریانڤە ب دژی کوردان (Soleimani, 2016, 5-24, Delan, 2007,56).

ژبەرکو ئارمانج و ستراتیژییا ئێکێ یا گرنگ و سەرەکی یا شێخ عوبەیدوللاهێ ئێکخستنا کوردان دچوارچوڤێ دەولەتەکا سەربەخۆ دابوو. لدۆڤ ئەوی بەرنامێ بۆ شۆرەشێ هاتیە دارشتن، پێدڤیبوو د قۆناغا ئێکێدا کو سالا 1879ێ، بوو دئەڤێ قوناغێ دا شێخی دڤیا هێرش بکەتن سەر ئامێدێ و بکەتن بنگەهێ خوو[4](جویدە، 2007، 50). چونکی ل ئەوی دەمیدا دەولەتا عوسمانی گەلەک لاوازبوو و دەولەتێن ڕۆژئاڤایی زۆر فشار ئێخستبوون سەر دەولەتا عوسمانی(جەلیل، 1987، 61). و شێخی ئەڤ چەندە ب دەرڤەت زانی ب سەرۆکاتیا هێزەکا بەرچاڤ یا شەرڤانان[5] بەرەڤ ئامێدێ کەڤتە ڕێ(بێسکی، 2013، 75). بەلێ ل دەمێ لەشکەرێ ئەوی بەرەڤ وێرێ هاتی کەسەکێ بناڤێ (محمد بریفکانی) یێ ناڤدار ب (شێخ محمد بریدچی)[6]، بەرنامێ شێخی بۆ حوکمداریێ عوسمانی ل مووسلێ و وانێ بر و لدۆر ستراتیژییا شێخی ئاگەهدار کر (جویدە، 2007، 50).

دئەنجامدا، پشتی بۆرینا (5) ڕۆژان فەوجەك لەشکەرێ عوسمانی ژ مووسل بەرەڤ دەڤەرێ دهێن و لجهەکێ نێزیکی ئامێدی دراوەستیت[7] و ژلایێ خۆڤە شێخی لەشکەرەکێ ژ (900)شەرڤان پێکدهات ب سەرۆکاتیا کوڕێ خۆ شێخ عەبدۆلقادری بو جێ بەجێکرنا وێ پلانێ رادسپێرتن داکو هێرشێ بکەتن سەر هێزێن عوسمانی، بەلێ هێزێن عوسمانی هێرشێ دکەنن سەر شەرڤانێن ئەوی ، تۆشی شکاندنێ دبن و خۆ ڤەدکێشن. وەسا دیار بوو شەرەکێ ئێکلاکەر بوو(Jwaideh,2012,94). چونکو نەشەرەکێ کورت خایەن بوو، بەلکۆ شەرەکێ درێژ خایەن و ژ هەمی لایانڤە هێرشان دەستپێکر بوو. ژبەر هندێ بۆ کوردان دەرکەڤت دێ زیانێن مەزن پێکەڤن و باوەری بۆ پەیدابوو کو هێزێن عوسمانی رژدن

[4] لدۆڤ نویترین بەلگەنامەێن عوسمانی هاتیە دیارکرن شێخی ل سالا 29 تیرماها 1879 ئەڤ هێرشە بۆ سەر ئامێدیێ ئەنجام دابوو ,94-112). R-17-07-1295)

[5] ژێدەرێن کوردی دیار دکەن ژمارا ئەوان شەرڤانان دناڤبەرا 700 تا 800 شەرڤانان بوون(بوسکێنی، 2022، 5).

[6] ب پشت بەستن لسەر ڕاپۆرتێن دیپلۆماتکاریێ بەرێتانی کاپتن کلایتون بۆ تروتیری ڤرێکرین وەسا هاتیە خوێاکرن ئەو کەسێ دەستهەلاتدارێن عوسمانی ل دۆر بزاڤا شێخی بۆ ئامێدێ ئاگەهدارکری مەزنێ ئایینێ یێ مەسیحیان مارشمعون بوو، چونکی ل ئەوی دەمیدا پەیوەندییێن ئەوی دگەل شێخی تێکچوو بوون(Aminpour, 2018, 113).

[7] بوسکێنی ددەت دیارکرن لیوایەکا سەربازی یا مووسل یا (450) کەسی ل سەر سێ کەرتان هاتە دابەشکرن و بەرەڤ جهێ شۆرەشێ ل ئامێدێ چوون و ل 13 تیرمەها 1879 ئەڤ هێزە دگەل دوو هێزێن پیادە و (160) سەربازان و بەشەکێ توپخانەیا ژ مووسل دەرکەڤت و گەهشتە ئامێدێ (بوسکێنی، 2022، 7). ل ئەوی دەمیدا شەرڤانێن هۆزا هەرکییان ڕۆلەکێ گرنگ دئەڤێ هێرشا عوسمانیدا بۆ سەر هێزێن شێخی گێرا، چونکی والیێ مووسڵ هاریکاری پێشکێشی ئەوان کرن(Aminpour, 2018, 114).

ل سەر ژناڤبرنا شۆرەشێ و شیان هەبوون بۆ ئەنجامدانا ئەڤێ چەندێ. ددەمەکێ کورت دا هێرش لاواز بوو و شوێنەوارێن ئەوێ ژی نەمان(Delan, 2007,57).

لدەمێ شێخ عەبدۆلقادری مەیدانا شەری بەردایی ژی بەردەوام نامە و نۆێنەرێن خۆ ب نهێنی بۆ سەرکردەێن کورد فرێدکرن و بۆ شۆرەشێ پالددان. ژلایێ خۆڤە، ل پشت بەرۆکێن شەری بهویری بەرێخو ددا پێشهاتێن شەری و ب شێوەیەکێ ئاسایی رەفتار دگەل دەولەتا عوسمانی دکرن کو وەسا خۆ نیشاددا بتنێ بینەرەك بو و چوو پەیوەندی ب وان رووبدانانن ڤە نەبوو (Kılıç,2003,88).

هەروەسا نامەیەکێ بۆ والێ وانێ فرێدکەتن و تێدا دیار دکەتن کو چوو رۆل تێدا نەبوو و نیاز پاقژیا خۆ بۆ دیار دکەتن ، بێزاربیا خۆ ژ وان رووبدانا دیاردکەتن دهەمان دەمدا وەفاداری و سۆزداریا خۆ بو دەولەتا عوسمانی خۆیا دکەتن و دبێژتن ، " ب دەولەتا پلە بلند ڕابگەهینن، نوکە ژ هەمی دەمێن دی پتر لسەر سۆز و پەیمانێن خۆمە بەرامبەری دەولەتێ".هەروەسا دابو دیارکرن کو نامەیەك بۆ کوڕێ عەبدۆلقادری هنارتیە و تێدا داخواز ژێکربوو و نەچار کربوو وەفاداریا خۆ بۆ دەستهەلاتداریا عوسمانی دیار بکەتن(جویدە، 2007، 51).

دهەمان پێنگاڤێن خودا، لدەمێ شێخی هێزا دەستهەلاتداریا عوسمانی دیتی . دئەنجامدا بو سۆلتانێ عوسمانی دابوو دیارکرن کو ئەو نەشۆرەشەك بو ب دژی سۆلتانی بوو. بەلکۆ شۆرەشەك بۆ ژ ترسا خەلکێ هەمبەری گەندەلیا دەمو دەزگەهان لدەڤەرێ. لڤیری هەلوێیستێ دەولەتا عوسمانی بەرامبەری شێخی سەیر و سەمەر دبیتن. چونکو لدەمەکێ فەرمان ل ئیستەمبۆلێ دەرکەڤتبوو کو ب تۆندی بەرامبەری شۆرەشێ راوەستن. دگەل هندێدا والێ وانێ و مۆسلێ و بەرپرسێن مەزن یێن عوسمانی د مەبەستا شێخێ گەهشتبوون و تارادەکێ ژی باوەری ب شێخی نەمابوو. دگەل هندێدا، بەرێخوداێ هەلوێستێ دەستهەلاتداریا عوسمانی تارادەکێ بەرامبەری شێخی ئاسایی و نەرم بوو(Jwaideh,2012,95).

هەرچەوابیتن، پشتی شکاندنا قونا‌غا دەستپێکێ یا شۆرەشێ ئێدی شێخ نەچاربوو بەرێخۆبدەتن قونا‌غا دووێ و ل دەستپێکا چربیا ئێکێ 1880ێ، شەرڤانێن شیخی بەرەڤ سنوڕێ ئیرانێ چوون، دڤێ قونا‌غێدا یاکو دهێتە نیاسین ب قونا‌غا دووێ، هێزێن شێخی ل سەر سێ کەرتان هاتبوون دابەشکرن.

1. کەرتێ ئێکێ ب سەروکاتیا (هەمزە ئاغایێ مەنگوری) و (شێخ عبدالقادر کوڕێ شێخ عبیدالله) مەرەما وان دەستهەلاتداری ل سەر دەڤەرا (مهاباد و تەبریز).
2. کەرتێ دووێ ب سەروکاتیا (محمد صدیق)، ئارمانجا وان گرتنا باژێرێ ئورمیێ بوو.

کەرتێ سیێ ب سەروکاتیا (محمد سەعید) بوو ئارمانجا وی دەستهەلاتداری لسەر دەڤەرێن رۆژئاڤایێ)ئورمیێ، خویە و سلماس(بوو(Aslan,2007,60؛ جویدە، 51،2007؛باقی، 10،2010-12)

هەژی گوتنێ یە شێخ عبیدالله نەهری چاڤدێریا هەردوو چەپەرێن دوماهیێ دکر (Aslan,2007,60؛ جویدە، 51،2007،باقی، 55،2000)

کەرتێ ئێکێ یێ (شێخ عەبدۆلقادر) کوڕێ شێخی یێ ناڤەراستێ سەرکردایەتیا وی دکر، ئەرکێ سەرەکی یێ ئەڤی کەرتی بەرەیەکێ بەرفرەه یێ رەخێن باشورێ دەریاچا ئورمیێ و بەرەڤ سابلاخ (مهاباد) بوو. دئەڤی چوارچووڤەیدا جێگرێ قونسۆلخانەیا بەرێتانی ل وانێ کاپتن کلایتونی ڕاپۆرتەکێدا دایە دیارکرن کو هژمارا ئەڤێ هێزێ نێزیکی (20000) هزار شەرڤانانن بوو(الربيعي، 2018/8/15)، دگەل هندێدا، گومان دئەڤێ ڕاپۆتێدا هەیە چونکی دبیت ژمارا ئەوان زێدەتر یان کێمتر بیت[8] (Jwaideh,2012,95). ژلایێ کێ دیڤە، هاتیە دیارکرن هژمارا ئەوان هێزێن گەهشتین مهاباد نێزیکی (40) هزاران تا (50) هزار شەرڤان بوون. ژلایێ خۆڤە، قونسلێ بەرێتانیا (ئابوت)، ئامارا ڕاستەقینە یا ئەوێ هێزێ دیار دکەتن و ب (10) تا (50) هزار شەرڤانن دخەملینتن(جویدە، 2007، 51،باقی، 2000، 55).

لدەمێ هێزێن عەبدۆلقادری بەرەز سابلاخ دچوون، هژمارەکا زۆر کوردان لدەڤەرێن (شنۆ) و (سۆلدۆس) پەیوەندی بهێزێن شۆرەشێ کرن. هند پێڤە نەچوو هۆزا (مەنگۆر)،ب سەرۆکاتیا (هەمزە ئاغایی) دگەل 5هزاران شەرڤانن پشتەڤانیا شۆرەشێ کر. پاشی هۆزێن دی یێن کورد وەك هۆزا جاف خۆدانا 50 هزار چەکداران، هۆزا مامش خۆدانا 5هزار شەرکەران، هۆزا زرار خۆدانا 8 هزارا و هۆزا مۆکری خۆدانا 10 هزار شەرکەران دەست ب شۆرەشێ بکەن(Keskin,2015). هەروەسا هۆزێن دی وەك هۆزا (دیبوکری، شکاك و گاوریك پیران)، ب شێوەیەکێ بەرجاڤ پشکداری د شۆرەشێ دا کر بوون و ب قۆرئانێ سۆیندخوار تا مرنێ دگەل شۆرەشێ بن د ماوەیەکێ کورت دا باژێرێن وەك لاهیجان، بانە، سەردەشت، سنە، ژبن دەسهەلاتا ئیرانێ ئیناندەر و رزگار کرن، و زۆر پێڤە نەچوو هێزێن شێخی شیان

[8] هندەک ژێدەر ددەن دیارکرن هژمارا شەرڤانێن شێخی دگەهیشتە (10) هزار شەرڤانن و (10) هزار دگەل کورێن ئەوی بوو و چەندین هۆزێن دی یێن کورد مینا مامش، مەنگۆر، زازا، گەوریک، بانە، هەرکی، بگزادە ژ گەڤەر و برادۆست) دگەل بوون (مزیری، 1992، 10).

باژێرێ ئۆرمیێ دورپێچ بکەن و بەردەوامی دا پێشڤەچوونا خو بەرەڤ باژێرێ چوون و ئەڤ باژێرە ژی دورپێچ کر (جویدە، 2007، 51،باقی، 2000، 55)

پشتی دلّنیایی و دووپاتی داین فەرماندێ مهاباد و هێزێن پاراستنی دان رەخەکێ تاکو ب شێوەیەکێ ئاشتیانە باژێرێ بجە بهێلن و هینگێ سابلاخ بێ شەر هاتە گرتن. دگەل هندێدا هێزێن شۆرەشێ کەتن ناڤ مالێن خەلکێ تالان و وێرانکرن. دگەل هندێدا، ئیمامێ مزگەڤتا سوننەیان بانگەوازییا شەرێ درێکا خودێ دا (جیهادێ) ب دژی شیعەیان ڕاگەهاندبو(Nzibari,2012).

کەرتێ دووێ یێ هێزێن شێخی ب سەرکردایەتیا (شێخ سدیق) کوڕێ مەزنێ شێخی بوو. وەك هاتیە زانینن، هژمارا ڤێ هێزێ نێزیکی 1000هزار شەرڤانان بووم، ئەرکێ سەرەکی یێ ڤێ هێزێ ئەو بوو رەڤ مەرگەوەر بچن و پێدڤیبوو تاتیکشکاندنا هێزێن شێخ عەبدۆلقادری ڤەکێشانا خۆ بپارێزن (باقی، 2000، 55)

پێنگاڤا دوویێ، گرتنا (میاندواو) بوو، کو دیارە بەری هینگێ شێخ عەبدولقادری بناڤێ داخوازکرنا خۆارنێ و هەلسەنگاندنا هەلوێستێ خەلکێ ژ شۆرەشێ شاندەك فرێکر بوو باژێرێ. بەلێ ئەو شاند دهێتە گرتن و کوژتن. ژبەر هندێ ڕاستەوخۆ شێخ عەبدۆلقادری بریارا تولڤەکرنێ دا و ڕاستەوخۆ هێرش کرە سەر باژێرێ. دئەنجامدا، پتریا خەلکێ رابوون ب فەشارتنا کەلوپەلێن و ژ ترسێن تولڤەکرنێ رەڤیا بوون و نێزیکی 3هزار کەسان دباژێرێ مابوون کو پتریا ئافرەت، زارۆك و زەلامێن پیر بوون، لدەمێ هێرشکرنێ دا کەڤتن بەر زەبرێن شیران و رێك ب شەرڤانن هاتە دان ب ئارەزوویێن خو ل دەڤەرێن نێزیك تا میاندواو و مەراغ تالان و وێرانکرن(Jwaideh,2012,98; Aslan,2007,60).

کاڤلکرنا میاندواو، سەرکەفتنەك بێ ماف و دەستکەفتبوو. ژبەرکو زۆر پێڤە نەچوو، پتریا ئەوێن د هێرشێ پشکدار، ژبەر دەستکەفتێن گران و تالانکرنا زۆر، ژ ئێك و دوو هاتنە ڤەبرین و بەرەڤ مالێن خۆ زڤرین. ئەوا ب سەرێ باژێرێ ئینایی زیانەك کاریگەر کرە سەر شێخی و دهەمان دەمدا بۆ ئەگەرێ بلندکرن و هووشیاکرنا هەستێ خەلکێ بۆ بەرەڤانیکرنێ. دڤی بۆاری دا وێلسۆن دایە دیارکرن، " ژبەر ژ دەستدان و بنپێکرنا یاسایێ و ژبەر هەلوەشانا ئێکگرتنا هێزێن کوردی، هاتە سەلماندن کو کوردان شیانێن شەرکرنا سۆپایان نینن، ئەو کومکۆژیا ل میاندواو هاتیە ئەنجامدان، نەکۆ بتنێ تاوان بوو، بەلکۆ خەلەتییەکا زۆرا هۆڤ بوو، ژبەرکو هەستێ بەرەڤانیکرنا خەلکێ بلندکر، سەرەرای هندێ دبێهێڤیبوونێ دا دروست ببوو. بەلێ چوو رێزگرتن بۆ کوردان نەهێلا خۆ ئەگەر هەبیتن ژی"(Kılıç,2003,1-85).

ژلایەکێ ڤە، پاشی عەبدۆلقادری بەرێ هێزا خۆ دا مەراغ و پشتی گرتنا وێ بەرەڤ پێشڤەچوون دەنگو باسان وەسا دداخۆیاکرن کو هێزێن پێن بەرەڤ تەبریز ڤە دهێن و هندە دێ هێزێن وی گەهن وێرێ. ژلایەکێ دیڤە، لدەمێ دەنگ و باس هاتینە ڕاگەهاندن کو هێزا شێخ صدیقی یاکو ژ 1000هزار شەرڤانن یا بەرهەڤێن خۆ دکەتن هێرشێ بکەتن سەر باژێرێ ئۆرمیێ، هێزەکا دی ب سەرۆکاتیا بابێ وی (شێخ عوبەیدۆلّلاهی)، گەهشتنە ڤێ هێزێ کو هژمارا وان بۆ 8 هزار و باژێرێ ئۆرمیێ دورپێچکر و شەرێن کورتخایەن ڕۆژانە دناڤبەرا وان دا رویددا(جویدە، 2007، 55).

ئاکنجیێن باژێرێ ئۆرمیێ دەنگ و باسێن چارەنڤیسێ خەلکێ میاندواو گوهلێبوون، ب نیازا دانووستاندنێ بریاردا بوو خو ڕادەست بکەن و چەندین کەسان ب دەڤێ سپی (پاقژ) و زەلامێن ئایینی و پێن ناڤدار پەیوەندی ب شێخیکرن، بەلّین و سۆزدانێ ئەگەر خۆ ڕادەست بکەن دەستدرێژێ نەکەن سەر ئاکنجیێن ئەوان، شێخ ب ئەڤێ چەندێ رازیبوو و ڕۆژەك بۆ ئەڤێ چەندێ دیار کر بوو. لدەمێ ڕۆژا خۆ ڕادەستکرنێ هاتی، دەستهەلاتدارێن ناڤخۆی پێن ئیرانێ داخوازییا دڕێژکرنا مۆلەتی ژ شێخی کر، لدەستپێکێ شێخ ب داخوازییا ئەوان رازینەبوو، بەلێ پاشی مسیونەرێ ئەمریکی (دکتۆر کۆجران Dr. Cochran) کەڤتە دناڤبەرا ئەوان دا و وەك هاتیە زانینن ناڤبری دۆستەکێ نێزیکی شێخی بوو و شێخ رازیکر هێرشا خۆ بۆ سەر ئۆرمیێ پاشبئێختن (باقی، 2000، 60). ئەڤ لدەمەکێدابوو قونسۆلێ بەریتانیا ل ئۆرمییە ئابۆت ب مەرەما پاراستنا مەسیحان سەردانا شێخی کربوو(Ates, 2006, 26).

دەستهەلاتدارێن ناڤخوەیێن ئیرانێ، ب مەرەما بهێزکرن و رێکخستنا هێزێن بەرەڤانیا باژێرێ، مفا ژ ماوێ درێژکرنا وەختێ هێرشێ وەرگرت و بڤێ چەندێ هێزەکا دی یا ئیرانێ بۆ هەوارهاتنێ بەرەڤ باژێرێ ئۆرمیێ چوون. ژبەر هندێ فەرماندێ باژێرێ (ئیقبال الدولە) بریارا بەرەڤانیکرنێ ڕاگەهاندبوو. د ئەنجامدا، هەر دوو هێزان هێرش کرە سەر ئێك و بڤێ چەندێ زیانێن زۆر خراب ب هێزێن کوردی کەڤتن. د بەلگەنامەیان دا هاتیە دیارکرن ئەڤ تێکشکاندنا مەزن، کاریگەرییەك نەگەتیڤ کربوو سەر شیانێن هێزێن شێخی. ژبەر کو دئەنجامێ ڤێ شکاندنێدا شیانێن هێزێن شۆرەشێ رووخایان، بوونە پارچە پارچە ، ژ ئێك و دوو دیرکەڤتن و بەرەڤ چیایان چوون(Ozoglu,2012).

پشتی بۆرینا (10) ڕۆژان ژ چاڤەرێبوونەك تژی دل قوتان، ترس و لەرزا ئاکنجیێن ئۆرمیێ، ژ نیشکەکێڤە دروپێچ لسەر باژێرێ هاتە راکرن و هێرش هاتە ژناڤبرن. هەرچەندە دەستهەلاتداریا قاجاری یا ئیرانێ لاواز بوو، دگەل هندێدا

بەرامبەری شۆرەشا کوردی بێ دەنگ نەما، شیا ل دەڤەرێن هەمەدان، قەزوین، ماکۆ، ئازەربایجان بگرن و بهاریکاریا ئەفسەرەکێ نەمساوی سۆپایەکێ بهێز و مەزن ئامادەکر ژبۆ بەرهنگاربوونا هێزێن شۆرەشا کوردی، هێزێن ئیرانێ ب سەرکردایەتیا (ئیعتماد الدولە) و (تەیمۆر خانێ ماکۆیی) شیان دماوەیەکێ کورت دا زۆربەی دەڤەر و باژێرێن کەڤتین دبن کونترۆلا شۆرەشێ ڤە بگرنڤە و هێزێن شێخی دناڤ ئاخا ئیرانێ دا دەرکرن. هەروەسا دەستهەلاتداریا ئیرانێ داخواز ژ بەریتانیا و ڕووسیا کر فشارێ بئێخنە سەر دەولەتا عوسمانی بۆ دانانا سنۆرەکێ بۆ هێزێن شێخی(Gürbüzel,2008,88).

لدەمێ شێخ عوبەیدۆلا د قوناغا خۆ یا دووێ دا شکەستن ئینایی و بزاڤکرن دەست ب قۆناغا خۆ یێ سیێ بکەتن کو ئەو ژی رزگارکرنا کوردستانا عوسمانی بوو. بەلێ کاودان و پێشهاتێن دەڤەرێ و بابەتێن پشتی شکەستنا شۆرەشا وی ل ئیرانێ ڕێگر بوون دجێ بەجێ کرنا ڤێ پلانێ دا بۆ سەرکەفتنێ. ژبەرکو لەشکەرێ دەولەتا عوسمانی دەڤەرین وانێ و شەمدینان ژ دەڤەرێن دی پێن کوردستانێ بری بوون و هێزەکا لەشکەری یا زۆر ئینابوو کوردستانێ. دهەمان دەمدا، دەولەتا عوسمانی بزاڤ دکرن بڕێکا دانووستاندنێ شێخی رازی بکەتن دەستان ژ بەرنامێ خۆ بەردەتن(Delan, 2006,58).

ل بەهارا 1881ێ، سەرەدانا سۆلتان عبدالحمیدی ل ئیستەمبۆلێ کر. هەرچەندە، شێخی شیا ژ ئیستەمبۆلێ دەرکەڤتن و خۆ بگەهینتن کوردستانێ، بەلێ نەشیا شۆرەشەکا مەزن یا سەرانسەری ب دژی دەولەتا عوسمانی بەرپالبکەتن. ژبەر کو ئیران و دەولەتا عوسمانی چاڤدێرەیەکا تۆند دانابوو سەر و دویڤچوونەکا هویر ل سەر پێنگاڤ و بزاڤێن وی دکرن، کوردستان ببوو مەیدانا سەربازی. دگەل هندێدا، شێخی خۆ ئامادەکر بوو ب دژی هێزێن عوسمانیان (جویدە، 2007، 58).

ژبەر هندێ گەلە و شۆرپەهە بو شەری ئاسێ دکرن. لدەمێ هێزێن عوسمانیا ب ئەڤێ چەندێ ئاگەهداربووین، هێرش کرە سەر گەلها شێخی و پشتی (18) ڕۆژان ژ شەری گەلها شێخی هاتە گرتن و شێخ کەت دەستێ هێزێن عوسمانی، سەرەڕای هندێ شێخ عبدالقادر کوڕێ شێخ عوبەیدوڵڵاهێ شیا بابێ خۆ رزگار بکەت (Jwaideh,2012,95). ل 21 چریا ئێکێ یا سالا 1882ێ شێخ عوبەیدۆڵڵا نەهری لگەل ژمارەکا مەزن ژ هێزێن خۆ و (100) کەسێن نێزیکی ژمالباتا ئەوی و لایەنگرێن ئەوی دهێتە گرتنڤە و دهێنە ڕەوانەکرن بۆ مووسل(باقی، 2010، 12). بەلێ جارەکا دی ل چریا دووێ 1882ێ، شێخ و کوڕێ خو کەڤتن بوسەکا هێزێن عوسمانی وپاشی هاتنە ڕەوانەکرن بۆ ئیستەمبۆلێ و پاشی بۆ مەکەهێ(Jwaideh,2012,95). ل ئەوی دەمی بالیۆزێ بەریتانیا داخوازێ ژ سۆڵتان عەبدوڵ حەمیدی دکەت شێخی سزادەت یان تەسلیمی ئیرانێ بکەت (عثمان، 15 /4/ 2020). پشتی هینگێ ژ وێرێ دهێنە ڤەگوهاستن بۆ حیجازێ و ل تائیف دهێنە ئاکنجیکرن(باقی، 2010، 12). هینگێ ڕۆژنامەیا تایمز یا لەندەنی دراپۆرتا خۆ یا چریا ئێکێ 1880 ڕاگەهاند کورد شێخ عوبەیدوڵڵا نەهری ب "ڕزگاریخوازەکێ نیشتیمانی" ددەن نیاسین، ئارمانجا ئەوی یا سەرەکی بدەستڤەهینانا مافێن گەلێ کورد بوو ل کوردستانێ، هەر چەندە شۆڕەشا ئەوی تووشی شکاندێ بوو، بەلێ هوشیاریا نەتەوایەتی دناڤ کوردان دا بەلاڤکر(مزیری، 1992، 17).

ل 21 چریا ئێکێ یا سالا 1882ێ شێخ عوبەیدۆڵڵا نەهری لگەل ژمارەکا مەزن ژ هێزێن خۆ و 100 کەسێن نێزیکی ژمالباتا وی و لایەنگرێن وی دهێتە گرتنڤە و دهێنە ڕەوانەکرن بۆ مۆسل. پشتی هینگێ ژ وێرێ دهێنە ڤەگوهاستن بۆ حیجازێ و ل تائیف دهێنە ئاکنجیکرن(باقی، 2010، 12). پشتی بۆرینا سالەکێ ئانکۆ ل 19 چریا دووێ 1883ێ، شێخ عوبەیدۆلا نەهری د تەمەنێ (53)ێ سالیێ دا، ژ ئەگەرێ نەخۆشیا کولێرێ ل مەکەهێ دمرتن و ل مەکەهێ دهێتە ڤەشارتن (The New York Times,20 November 1883,1, The DAILY OIL REVIEW, 3 November 1908).

هەژی گوتنێ یە شێخ عوبەیدوڵڵاهێ نەهری شیا ترسەکا زۆر لدەڤ عوسمانی و قاجاریان پەیدابکەت، بەلێ نەشیا سەرکەفتنێ دبیاڤێ بدەستڤەهینانا پشتەڤانیا بەرێتانیا بدەستڤەبینت، ئەڤ چەندە دزڤریت بۆ هندێ بەرێتانیا شارەزاییەکا باش لدۆر کوردان هەبوون دزانی کوردان شیانێن سەرکەفتنێ نین و دێ مینن بدۆیڤ کۆمکرنا دەستکەڤتێن شەری ڤە و دێ ل دوومایهێ شکێن. لەوڕا بەرێتانیا دابۆ دیارکرن دێ ب هەمی شێوازان هاریکاریا عوسمانیان بۆ کونترۆلکرنا کێشەێن ل دەڤەرێن هاتینە ڕویدان کەت.

4: پەیوەندییێن شێخ عوبەیدۆلا نەهری دگەل بەریتانیا، هەلوێست و سیاسەتا وێ بەرامبەری شۆرەشا 1880-1882

4-1: پەیوەندییێن شێخی دگەل بەریتانیا

ل نیڤا دووێ ژ چەرخێ نۆزدێ دەستهەلاتداریا بەریتانیا دڤیا پەیوەندییێن خۆ بێن سیاسی، ئابۆری و بارزگانی دگەل هەر ئێك ژ دەولەتا عوسمانی و قاجاری بایەخێ پێبدەتن، ژبەر هندێ ئەندۆلا ڕۆژهەلات، ئەرمەنیا و کوردستان ببوونە جهێ بایەخ پێدان دەستهەلاتداری و نوێنەرێن بەریتانیا، بۆ ڤێ مەبەستێ دوێڤچوون ل دۆر تایبەتمەندییێن بازارێن ناڤخۆیی و

رێکێن هاتنوو چوونێ کرن. پشتی شەرێ عوسمانی و ڕۆسی یێ سالێن 1877_ 1878ێ، نافەندییێن بەریتانی بزافێن زۆرکرن تاکو عوسمانیان بۆ لایێ خۆ ڕاکێشتن و ببتە پشتەڤانا بەریتانیا دەهفرکیا وێ دگەل ڕووسیا، دڤێ بیاڤی دا، لدۆیڤ پەیماننامە بەرلین یا سالا 1878ێ، بەریتانیا زۆر دەستکەڤت بدەستڤە ئینا بوون، گرنگترین دەستکەڤت ئەو بوو کو سۆلتان عەبدۆلحەمید قۆبرس رادەستی بەریتانیا کر. ئەو ژی ژبەر هندێ بوو کو هندەك ژ سەربازێن بەریتانی مل ب ملێ هێزێن عوسمانیڤە پشکداری د شەری دا کر بوون(Nzibari,2012; Delan, 2006,58).

دڤی بیاڤی دا دەڤەرێن دبن کونترۆلا شێخی ڤە، ئەو جھ بوو یێن کو قۆنسۆلخانەێن بەریتانیا لێ و بەردەوام نۆێنەرێن بەریتانیا سەرەدانا وان دکر، بڤێ چەندێ، (کریستیان ڕەسام) بۆ وەرگرتنا پێزانینان سەرەدانا (باشقەلا) کر کو بنگەهەکێ شێخی لێبوو. هەروەسا ل سالا 1879ێ، لژێر پەردەیا ئالیکاریکرنێ بۆ زالبوونێ ل سەر وێ برسایەتییا ژئەنجامێ شەرێن عوسمانی و ڕۆسی ل کوردستانێ پەیدابووی، هندەك ئالیکاری پێشکێشی شێخی کرن. سەرەرای هندێ، شێخ بگومان بۆ ژ بەریتانیا. ژبەر هندێ دەولەتا عوسمانی ب وەرگرتنا وان ئالیکارییان هایدار کر(Kılıç,2003,1-85; Keskin,2012,41).

ل سالا 1879ێ، نۆێنەرێن بەریتانیا چەندین جاران سەرەدانا دەڤەرێن دن کونترۆلا شێخڤە کرن. جێگرێ قونسلێ بەریتانیا ل وانێ (کلایتۆن)، سەردەدانا دەڤەرا هەکاری کر بۆ دیتنا شێخی ل دەڤەرا شەمدینان. ل وێرێ کلایتۆنی دگەل شێخی کومبوو و کوڕێ شێخی (شێخ عەبدۆلقادر) دگەل دا ئامادەبوو.. چەندین دانووستاندن دنافبەرا شێخی و کلایتۆنی دا هاتبوو ئەنجامدان، پاشی کلایتۆنی داخواز کر دگەل سەرۆك هۆزێن کوردی کوم ببەتن.ئەڤ چەندە ژی بجهات، پاشی شێخی نامەیەك ڕادەستی کلایتۆنی کر داکو بگەهینتن دەستهەلاتداریا بەریتانیا و تێدا هاتبوو دیارکرن کو "مللەتێ کورد هاریکاری ژ بەریتانیا نەڤێن، بەلکۆ دڤێتن ئەو دابەشبوونا کوردستانێ دنافبەرا دەولەتا عوسمانی و قاجاریان دا نەمینتن و داخواز لێکر پشتەڤانیا کوردان بکەن ژبۆ ئێکگرتنا کوردستانێ"(Jwaideh,2012,96).

دهەمان دەمدا، شێخی ئەو ناما بۆ قونسۆلێ گشتێ بەریتانیا (ئابۆت) ل تەبریز فرێکر. دهەمان پێنگاڤێن خۆدا ژبۆ دورستکرنا پەیوەندییان دگەل نۆێنەرێن بەریتانیا، شێخی نامەیەك بۆ قونسلێ بەریتانیا ل (ئورمیێ) فرێکر و د وان نامەیان دا دابوو دیارکرن کو نەتەوەیێ کورد نەتەوەکێ زیرەك، ئازاد دابوونەریتێن خۆ یێن تایبەت یێن هەین، دوژمنێن وان ژ تورك و فارسان بەردەوام بزافکرینە ڤی مللەتی ب هۆنەترین شێوە ژناڤبەن. شێخی د نامەێن خۆدا دووپاتی لهندێ کر بوو کو سەرکردەێن کورد پێخۆشە چارەسەرێەك سیاسی یا گونجایی ب ئاشتیانە بۆ کێشەیا کوردی بهێتە دیتن. ژبەرکو کوردی ئیدی نەشێن دبن زلم و زۆرداریا عوسمانی و قاجاریانڤە بژین، ئامادەنە کار بۆ رزگار بوونێ بکەن و جووجاران کەمتەرخەمیێ بۆ قۆربانی دانێ و رزگارکرنێ ناکەن(جویدە، 2007، 37).

ل ئیلۆنا 1880ێ، قونسلێ بەریتانیا ل تەبریزێ، ئابۆت، فەرمان بالیۆزیێ بەریتانیا ل تەهران تۆمسۆن (Thumson)، وەرگرت کو سەرەدانا دەڤەرێن کوردی یێن دبن دەستهەلاتا شێخ عوبەیدۆلاهی بکەتن و وەك هاتیە زانین مەبەست ژ وێ سەرەدانێ بتنێ کومکرنا پێزانینا بوو ل سەر هێز و بزافێن شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلاهی(Keskin,2012,42).لدەمێ، ئابۆت، گەهشتیە باژێرێ ئورمیێ ئاموژگاری ل فەرماندێ هێزێن قاجاری (ئیقبال دەولە) کرن کو خو ڕادەستی هێزێن شۆرەشێ بکەتن، بەلێ ناڤبری رازینەبوو. دهەمان دەمدا، ئابۆتی داخواز ژ مەسیحیان کرن کو ب هیچ رەنگەکێ پشکداریێ د شۆرەشێ دا نەکەن و خۆ بپارێزن. ئەگەر لێنێرینەکێ دسەرەدانا ئابۆتی دا بکەین دێ دیار بتن کو چوو ئالیکاری پێشکێشی شێخی نەکرینە، بەلکۆ بەردەوام مژویلی کۆمکرنا پێزانینان بوو. سەرەرای هندێ، بەردەوام هێزێن شێخی پارێزقانیا وی ل گوند و باژێران دکر. لەوڕا دوێ سەرەدانێ چوو زیان ب ئابۆتی نەکەڤتبوون(Nzibari,2012).

دسەرەدانا ئابۆتی دا هاتیە دیارکرن کو بۆ دورستکرنا پەیوەندییان دگەل بەریتانیا و دەولەتێن ئەورۆپی شێخی داخواز ژ ئابۆتی کری کو بڕاستی بەحسێ راستی و دادوەریا شۆرەشێ بۆ بەرپرسێن وەلاتێ خۆ و ئەورۆپا بکەتن. هەروەسا سەید محەمەد، نۆێنەرێ شێخی زلم و زۆرداری هەروەسا رەفتارێن گرێت و هۆڤێن قاجاریان هەمبەری کوردان بۆ ئابۆتی شرۆڤەکر بوون(Jwaideh,2012,97).

لدەمێ شێخ هێرش دەستپێکرین بۆ گرتنا باژێرێ تەبریز، حکوومەتا قاجاری داخوازا هاریکاریێ ژ ڕووسیا و بالیۆزیێ بەریتانیا ل تەهران کر. دهەمان دەمدا، ل 11 چرییا دووێ 1880ێ، شاهێ قاجاری داخواز ژ بالیۆزیێ بەریتانیا تۆمسۆنی کر و داخوازێ ژ حکوومەتا عوسمانی کر ب دژی هێزێن کوردی راوەستیتن و هەر سەرکەفتنەکا کورد بدەستڤەدئینن، ڕامانا هندێ ددەتن کو کورد نێزیکی دبیتن. ژبەر هندێ دبلۆماتکارێن بەریتانیا دەستهەلاتداریا عوسمانی نەچارکرن کو هێزێن خۆ ب لڤینن و جهێن ستراتیجی بگرن.بڤێ چەندێ لاوازییەك کەڤتە دپەیوەندییێن شێخی و نۆێنەرێن بەریتانیا دا(Kılıç,2003, 85). بەریتانیا ئەڤ چەندەکر، ژبەرکو بەرژەوەندییێن بەریتانیا پێدڤی ئالیکارییێن ئیرانێ بوو و نەدڤیا چوو دەولەت ماتێکرنێ دکاروباراێن وێ یێن نافخۆیی دا بکەن. ژبەرکو بەریتانیا دوێ باوەرێ دا بوو ئیران وەلاتەکێ

گرنگ بوو ژبۆ پاراستنا ئیمبراتۆریەتا بەریتانی ل هندێ. بڤێ چەندێ دشێن بێژین کو بەریتانیا دگەل داخوازیێن کوردان نەبوو(عەلی،2016، 20).

لەوڕا دێ بینن، بەریتانیا ئامادەنەبوو پەیوەندییان دگەل سەرکردایەتیا کوردی گرێدەتن و دگەل داخوازیێن وان نەبوو، بەلکۆ بەرەڤاژی،داخوازیێن کوردان دەربارەی سەربەخۆیێ پشت گوهاڤێتینە و بەردەوام بزاڤ دکرن کوردان پالدەتن بمینن دبن کونترۆلا قاجاری و عوسمانیانڤە، مەسیحی ڕادسپاردن کو نێزیکی کوردان نەبن و پشکداریێ د شۆرەش و بزاڤێن وان دا نەکەن. دهەمان دەمدا،کورد بهندێ گونەهبار دکرن کو ئالیکاریان ژ ڕووسیا قەیسەری وەردگرن، دڤی بیاڤی پێزانێن نهێنی دەربارەی کوردان ددان تەهرانێ و ئیستەمبۆلێ(Jwaideh,2012,97).

جێگرێ قونسۆلخانەیا بەڕێتانیا کاپتن کلایتۆن دایە دیارکرن شێخی پلانەکا موکوم بۆ ئێکگرتنا کوردان د دەولەتەکا سەربەخۆدا دارشتییە و کاودانێن دەڤەرێ ئەو نەجارکرییە ئەو بەرێخۆبدەت ئیرانێ، و ئەگەر سەرکەڤتن ل ئیرانێ بدەستڤەهینا دێ بێ دوو دێ بەرێخۆدەت عوسمانیان دا ئەڤێ چەندێ ل ئەوێرێ ژی بدەستڤەبینت (Arizanti,15 April, 2020). لەوڕا دبزاڤێن خۆدا، بەڕێتانیا بەردەوام داخواز ژ شێخی دکرن دەستان ژداخوازیێن خۆ بێن رزگارکرن و سەربەخۆیا کوردستانێ بێتن، هەروەسا هەر دوو دەولەتێن هەرێمی ئیران و عوسمانی پالدان کو ئێکگرتنەك سیاسی و لەشکەری دورست بکەن ژبۆ ژناڤبرنا شۆرەشا کوردی. ئانکۆ دشێن بێژین بەڕێتانیا ئەکتەرەك سەرەکی د ژناڤبرنا شۆرەشا کوردی دا(عەلی،2016، 10). ئەڤ چەندە دزڤریت بۆ هندێ بەرپرسێن بەڕێتانیا دزانی شۆڕەشا شێخی چ کارتێکرن و زیانان ل عوسمانی و قاجاریان نادەت. ل ئەوی دەمیدا بەڕیتانیا بەرژەوەندییێن زۆر گرنگ لەگەل عوسمانیان هەبوون و نەدڤیا عوسمانی هیچ گومانەکێ لدۆر هەبوونا پەیوەندییێن ئەوێ دگەل شێخی عوبەیدوڵلا نەهری هەبن و بۆ پتر بهێزکرنا پەیوەندییێن خۆ دگەل عوسمانیان بەڕێتانیا هەولددا مەسیحیان (ئەرمەن و نەستووریان) ب دژی شۆڕەشا شێخی پالدەت.

2-4: سیاسەتا بەریتانیا

بەریتانیا ئەوا کو رۆلەکێ گرنگ د کێشەێن ڕۆژهەلاتی دا هەی، بەردەوام بزاڤا هندێ دکر ئارامی و ئێمناهی ل دەڤەرێ ب تایبەتی ل سەر سنۆرێ دەولەتا عوسمانی و قاجاری بهێتە چەسپاندن و تشتەکێ وەسا ڕوونەدەتن کو هندەك ئەگەران بدەتن دەستێ زلهێزێن دی ب تایبەتی ڕووسیا قەیسەری بهێتن ماتێکرنێ دکاروبارێن دەڤەرێ دا بکەتن. ئەڤ ژلایێ بەریتانیا ڤە تشتەك بوو دا مەترسیان ئێختنە سەر بەرژەوەندییێن وێ ل دەڤەرێ و رێکا گەهشتنێ بۆ هندێ. ژبەر هندێ ژبۆ بهێزکرنا پێگەه، هێزا خۆ و ژناڤبرنا مەترسیا ڕۆسیل قەیسەری ل دەڤەرێ بەردەوام د بزاڤان دا بوو(Muhammad,2017,35).

بەندێ 61ێ یێ پەیماننامە سانستیڤانۆ یێ گرێدایی ئاریشە جێ بەجێکرنا جاکسازییان ل دەڤەرێن ژێدەستهەلاتا عوسمانیان بێن ئەرمەنی لێ دژیان ب دلێ بەریتانیا نەبوو، چونکو بەریتانیا دترسیا جێ بەجێکرنا جاکسایان ل دەڤەرێن ئەرمەنینشین ب سەرپەرشتیا ڕووسیا دێ بیتە ئەگەرێ بهێزبوونا ڕووسیا ل دەڤەرێ(McDowall,2003,56). ب مەرەما هندێ کو کێشە د بەرژەوەندییا ڕووسیا دا نێکلایی نەبیتن، هەر وەکی چەوا د وەختێ خۆ دا پشتەڤانیا شۆرەشا یۆنانی و پرۆژەێن سەربەخۆ بوونێ کر، بهەمان شێوە دگەل هێزێن دی فشار ئێخستە سەر ڕووسیا پەیماننامە سانستیڤانۆ ب پەیماننامە بەرلین گهوری، تێدا کەڤتە پشتەڤانیکرنا پرۆژەێن جاکسازیێ ل وان دەڤەرێن بڕیار ل سەر هاتیە دان، بەلێ ڤێجارێ دڤیا جاکسازی ل ژێر چاڤدێریا نێڤدەولەتیڤە بان. دگەل هندێدا، بۆ سەر ئێخستنا وان پرۆژەیان، بەریتانیا مافێ سەرپەرشتیکرنێ و پێداچوونا جاکسازییان ب ستوێیێ خۆڤە گرێدابوو و دەست ب ڤەکرنا چەندین قانسۆلخانەیان ل دەڤەرێ کر(O'Shea,2004,80; Ateş,2014:744).

ئەڤجا وەك هاتیە دیارکرن ئەگەر ئەڤە ئارمانجێن سیاسەتا بەریتانیا بن، ئانکۆ تشتەکێ زۆر ڕوون و ئاشکرا بوو ب دژی هەر بوویەر و پێشهاتەکێ راوەستیتن کو ببتە ئەگەرێ پەیداکرنا نەخۆشی، نەئارامیێ و مەترسیدارکرنا بەرنامەێن وێ ل دەڤەرێ. لەوڕا ب هووشیاری و هویری بەرێخۆدا بوویەر و پێشهاتێن شۆرەشا شێخ عوبەیدوڵاهی، ب تایبەتی وەختێ بریار هاتیە دان شۆرەش ل باکورێ کوردستانێ دەست پێبکەتن. ژبۆ ڤێ مەرەمێ دەست ب پرۆپاگەندەیان کر داکو شۆرەش ب سەر نەکەڤێتن(Jwaideh,2012,98).

دئەڤی بیاڤیدا، مێجەر ترۆتێر (Major Troteir) قونسلێ بەریتانیا ل ئەرزەرۆم، دنامەیەکێدا کو بۆ بالیۆزێ بەریتانیا ل ئەستانا هنارتبوو، تێدا کاربەدەستێن عوسمانی بهندێ کەمتەرخەمکر بوون کو "نزانن چەوا شۆرەشا کوردی ب هەلسەنگینن و بهایێ وێ یێ دورست بدەتنێ". وەسا دیارە ناڤبری دڤیا عوسمان زیکا ڤێ شۆرەشێ ژناڤبەن، بۆ پتر سەلماندنا

ڤێ چەندێ جەلیلێ جەلیلی دایە دیارکرن، " شۆرەشا کوردی، ژلایێ تڕۆتێریڤە زۆرا هەستیار و مەترسیدار بوو، نەچار بوو ماوەیەکێ درێژ ل ئەرزەرۆمێ بمینتن، پشکداری د هەمی وان خۆئامادەکرنا دا کر بوو یێن بۆ لێدانا شۆرەشا شێخی هاتینە پێشنیازکرن و ڕێکخستن". دهەمان دەمدا، ددەتن خۆیاکرن کو ئەو هەمی دەنگ و باسێن ژلایێ چاڤدێرێن بەریتانیاڤە ل دۆر کوردستانێ کوم دکرن و بلەز فرێدکرن بۆ سامیع پاشا سەرکردێ لەشکەرێ عوسمانی ل ئەندۆلێ (عەلی،2016، 10).

بەریتانیا خۆ لدەمەکێ دا کر هەڤپەیمانا عوسمانیان، کو بۆ دەمەکێ درێژ نەبوو کو هەڤپەیمانا خۆ ل ژێر فشارێن ڕووسیا قەیسەری رزگارکری، نەخاسمە پشتی هندەك بارگرانێن پەیماننامانا سانستیڤانۆ ل سەر کێمکرین. ژبەر هندێ رازینەدبوو شۆرەشەك کوردی ل دەڤەرێ ڕوویبدەتن و قەوارەکێ وەسا دورست بیتن کو مەترسیێ بئێختن سەر بەرژەوەندیێن وێ. ژبۆ ڤێ مەبەستێ تاکو ژ نێزیك ئاگەهداری ئارمانجێن ڤێ شۆرەشێ بیتن، بەریتانیا دەست بزاڤ و چالاکێن بهێز ژبۆ چاڤدێرکرنا بزاڤێن شۆرەشا شێخی کرن، ب تایبەتی دماوەێ وێ کومبوونا هۆزێن کوردی دا یێ کو دناڤبەرا تیرمەە و تەباخا 1880ێ دا، ل دەڤەرا نەهری هاتیە بەستن(جویدە، 2007، 38).

ب ئەڤێ مەرەمێ کلایتۆن جێگرێ قونسۆلێ بەریتانیا ل وانێ، شیا لدەمێ برێڤە چوونا وێ کومبوونێ دا سەرەدانا دەڤەرێ بکەتن و دانووستاندن دگەل هژمارەکا سەرۆك هۆزێن کوردی ئەنجامدان. ئەڤجا بۆ هندێ کو جۆرەکێ هووشیاریێ بدەتن شێخ عوبەیدۆلاهی، کلایتۆن ب ڕوونی و ئاشکرایی گوتبوو شێخی ب هیچ شێوەیەکێ بەریتانیا رازی نابیت کو پێشهات و بوویەرێن نەخوش ل دەڤەرێ بهێنە پێش و ببنە ئەگەرێ تێکدانا ئارامیا دەڤەرێ و مەترسیێ بئێخنە سەر ئێکەتیا دەولەتا عوسمانی(Keskin,2012,43).

ئەڤە ددەمەکێدا بوو کو شێخ عوبەیدۆلاهی گۆتارەکا گرنك پێشکێشی ئامادەبووێن وێ کومبوونێ دکر. وەك ل پێشیێ هاتیە دیارکرن، نافبرێ ئامانجێن گرێدایی ب کۆنگرەیی، کاودانێن کوردستانێ، پێدڤیاتییێن ئێکەتیا کوردان و سەربەخۆ بوونا کوردستانێ ئێخستبوو بەرگوهێ ئامادەبوویان. هەر دڤێ کومبوونێ دا بوو کو ئێکەمین جڤاتا سیاسی یا کوردی بنافێ "جڤاتا کوردی"، یان "ئێکەتیا کوردان" کو هژمارەکا زۆرا سەرۆك هۆزێن کوردی تێدا ئامادەبوون ژبۆ هندێ داکو، "دلسۆزیا نەتەوەیی و وەلاتی بئێخنە ل سەر هەمی تشتان"(جویدە، 2007، 40-41).

ئەڤجا ئەگەر ئەڤێن ل سەری هاتین شرۆڤەکرن ئارمانجێن شێخی و سەرۆك هۆزێن کوردی بیتن، تشتەکێ ئاسایی کو بەریتانیا سیاسەتەك هەڤ دژی هەمبەری شۆرەش و ئێکەتیا کوردان پەیرەو بکەتن. پێنگاڤێن شێخ عوبەیدۆلاهی بەرێتانیا زۆر شەپرزەکر بوو. دئەنجامدا نۆێنەرێن پەرلەمانێ بەریتانیا، بلەز ئەڤ کێشەیە ئێخستبوو بەرچاڤێن پەرلەمانی و تێدا داخوازا دۆیڤچوونێ ل سەر کر. ژبەر کو بەریتانیا ژ هندێ دترسیا کو ئێکەتیا کوردان و بەرنامێ شۆرەشێ مەترسیێ بئێختنە سەر پرۆژێ چاکسازییان دناڤ دەڤەرێن ئەرمەنشین دا. ژبەر هندێ بفەر دیت دەست ب بەلاڤکرنا پرۆپاگەندەیان ب دژی کورد و ئێکەتیا کوردان دناڤ ئەرمەنا دا بکەتن. دپێنگاڤێن خۆ دا بەریتانیا، بهندێ ژی نەراوەستیا بەلکۆ ئایینێن دی پالددان ژ شۆرەشێ دیری بکەڤن و پشکداریێ تێدا نەکەن. سەرەرای هندێ، ئەڤە ددەمەکێدا بوو کو شێخ مژویلی بدەستڤە ئینانا ئاشتیی و هەڤالبینێ بۆ دگەل ئەرمەنان. دگەل هندێدا، بەریتانیا باش دزانی چوو مللەت وەك ئەرمەنان نێزیکی کوردان نین ژلایێ دیرۆك و کەلتۆریڤە(عەلی،2016، 15).

پشتی شێخ عوبەیدۆلاهی و هەڤپەیمانێن خۆ بەرێخو دایە ئیرانێ ژبۆ شۆرەشێ. د ئەنجامدا، ل دوماهیکا چرییا ئێکێ 1880ێ، تۆمسۆن، بالیۆزێ بەریتانیا ل تەهرانێ، وەزارەتا دەرڤە یا وەلاتێ خۆ ژ مەترسیێن شۆرەشا شێخی ئاگەهدار کر بوو. چونکو د نامەیەکێدا شێخی ئارمانجێن شۆرەشێ ژ ئێکخستنا کوردان و سەربەخۆیا کوردستانێ بۆ دیار کر بوون (جویدە، 2007، 51).

هەژی یە بێژینن دەستهەلاتداریا بەریتانیا دگەل نۆێنەرێن خو بەردەوام ب هویری و هووشیاری چاڤدێریا هەلوێستێ کوردان و هەلوێستێ شێخ عوبەیدۆلاهی ب تایبەتی ژ ئەرمەنان دکر.ل تیرمەها 1880ێ، کلایتۆن، نامەیەکێ بۆ مێجەر تڕۆتێری فرێدکەتن و تێدا دیار دکەتن کو، "ئەڤە چییە من گوهلێ بووی، هاتیە دیارکرن کو ئەرمەنیان دڤێتن وەلاتەکێ سەر بەخۆ ل وانێ دورستکەن، ئاشوریان دڤێتن ئالایێ بەریتانیا بلند بکەن و خۆ ب پشتەڤانێن بەریتانی دانن، ئەز جوجاران ڕێکێ بڤێ چەندێ ناکم، خۆ ئەگەر پێدڤی بوو دێ ژنانن ژی پر چەکم". ئەڤ مژارە چ راست یان نەراست بیتن، بتنێ ئەڤە جهێ گرنگی پێدانا دبلۆماتکاریێ بەریتانیا یە ل دەڤەرێ و بڤی شێوەی ب ڕوونی دیار دبتن کا چەند بەریتانیا ب هویری و کویری چاڤدێریا بزاڤ و پێنگاڤێن شۆرەشی شێخی دکرن(باقی، 2000، 55)

دماوێ هێرشا شۆرەشێ دا بۆ ڕۆژهەلاتێ کوردستانێ، قونسلێ بەریتانیا ل تەبریزێ وێلیەم ئابۆت خۆ گەهاندبوو بارەگایێ شێخی، بریکا دانووستاندنێن دناڤبەرا هەر دوو ئالیان دا، نافبری ب تەمامی ب داخوازی و ئارمانجێن شێخی، سەربەخۆیا کوردستانێ و هێرشکرنا هەر دوو دەولەتێن عوسمانی و قاجاری ئاگەهدار ببوو.ل دۆڤ ئەوان نامەیێن ل

دەستپێکا چرییا ئێکێ یا ساڵا 1880ێ، ئابۆتی بۆ وەزیرێ دەرڤە یێ بەریتانیا (لۆرد جۆرج لیڤین ئێرل گرانڤیل 1815-1891) هنارتین و تێدا هاتبوو دیارکرن، " چوو کەسان گومان ژ پشتەڤانیا شێخی بۆ سۆلتانی نینە". ئەڤ ددەمەکێدا بوو کو ناڤبری دەست ب شۆرەشێ کر بو ب دژی زلم و زۆرداریا کاربەدەستێن عوسمانی و قاجاری ب دژی کوردان، کو هێرشا وی بۆ سەر ڕۆژهەلاتێ کوردستانێ هەر ژبەر ئەوان هۆکاران بوو(عەلی،2016، 15).

ل چرییا دووێ یا 1880ێ، دنامەیەکا دی یا کلاێتون و ترۆتێری دا هاتیە کێشا ئەرمەنی نەرازیبوونەك زۆر دناڤبەرا کوردان دا دورستکری یە، دبێتن شێخ عوبەیدۆلا ڤێ چەندێ ب دەلیڤە بزانتن بۆ ئەنجام گەهاندنا ئێکەتیا کوردان. دڤێ نامەێدا، ترۆتێری دایە دیارکرن کو، "ئەز یێ پشت راست بووم کو ئارمانج و مەبەستێن شێخی ئێکگرتنا کوردان بۆ دناڤ دەولەتا عوسمانی و قاجاری دا، ئانکۆ دڤیا کوردستانێ بکەتن میرگەههك سەربەخۆ یان نیڤ سەربەخۆ و ئەو بخۆ سەرۆکاتیا وێ بکەتن"(باقی، 2000، 55). بڤێ چەندێ رژدیا چاڤدێریکرنا بەریتانیا ل دۆر بزاڤێن شۆرەشا شێخی ب رووڕی دیار دبتن، ب تایبەتی بەریتانیا وەسا بۆ دچوو کو ئەڤ شۆرەشە ب دژی کێشا ئەرمەنی هاتیە پێش و ئەرمەنیان بخۆ رۆلەکێ ئێکجار مەزن دگەهاندنا ڤێ پەیامێ دا بۆ بەریتانیا هەبوو. ژبەر هندێ ژی لڤێرێ جۆرەکێ بێ هێڤی بوونێ هەمبەری کێشا کوردی دهێتە نیشاندان(جویدە، 2007، 51).

لڤێرێ دشێن بسەلمینن کو گهورینا ئارستێ شۆرەشێ بۆ ڕۆژهەلاتێ کوردستانێ، فاکتەر و ئارمانجێن خوو هەبوون. ژبەر ڤێ چەندێ ئەوا هندەك زانا و دیرۆکنڤیسان ئاماژە پێدایی کو دبێتن گهورینا شۆرەشێ ب پشتەڤانیا بەریتانیا و عوسمانیان بێتن، جهێ گومانێ یە و دیرە ژ راستیێ. لەوڕا دشێن ئاماژە بهندێ بدەین کو گهەرینا ئارستێ شۆرەشێ ببوو جهێ دلخۆشیا دەستهەلاتداریا، بەلێ نە ب رازیبوون و پشتەڤانیا وان بوو. سەرەرای هندێ، دەستهەلاتدارێن عوسمانی ب شکەستنا شۆرەشێ دلخۆش بوون و دەست ژی تێدا هەبوو.

هەژی یە بێژین، کا چەوا بەریتانیا ژبۆ پاراستن و بەرەڤانیکرنا دەولەتا عوسمانی و نەپارچە بوونا ئەردێ وێ ب دژی ئارمانجێن شۆرەشێ وەستیابوو. بهەمان شێوە، دژی گهورینا ئارستێ شۆرەشێ بو ژبۆ ڕۆژهەلاتێ کوردستانێ. چونکو بەریتانیا وەسا هزر دکر کو ئیران رێکەکا سەرەکی یە بۆ چوونا هندێ، لەوڕا دڤیا ئیران وەك پرەکێ دناڤبەرا هندێ و دەولەتا عوسمانی دا بمینتن و بەرەڤانی لێدکر. ب هەمی شیانێن خۆ ب دژی هندێ راوەستیا بوو کو پارچەك ژێ بهێتە داگیرکرن و توشی ماتیکرنێ بێتن ژلایێ دەولەتێن زلهێز ڤە. دهەمان دەمدا، بەریتانیا ژ هندێ دترسیا کو دەلیڤەك بهێتە پێش و د ئەنجامدا ئیران نێزیکی ڕووسیا قەیسەری بێتن. ئەڤە ژی بۆ ئەگەرێ هندێ کو بەریتانیا بزاڤێ بکەتن دەستهەلاتداریا عوسمانی و قاجار پالدەتن ئێك بگرن و ب دژی پێنگاڤێن شۆرەشا کوردی راوەستن، ب تایبەتی پشتی ڕووسیا هێزێن خۆ ئیناین سەر دەڤەرێن سنوری، بەریتانیا زۆر دل تەنگ ببوو.

5: هەلوێستێ بەریتانیا

ل ناڤەڕاستا چرییا ئێکێ یا 1880ێ، بالیۆزێ بەریتانیا ئابۆت، برێکا تەبریزێ بلەز بەرەڤ رێکا سەلماس و خۆی و ئورمێ ڤە چوو و خۆ گەهاندە دەڤەرێن دبن کونترۆلا لەشکەرێ شێخی ڤە، ل گەڤەرێ، شنۆ و باژێرێ ئورمیێ لدەمێ هێزێن کوردی لبەر چەپەرێن شەری و مژویلێ هێرشکرنێ و خۆ پاراستنێ، ئابۆتی چەندین جاران سەرەدانا شێخی کر، بۆ راوەستاندن و ژناڤبرنا هێرشێن هێزێن کوردی و کەڤتە ناڤبژیڤانکرنێ دناڤبەرا شێخی و (ئیقبال دەولەی)، والیێ ئورمیێ دا، بۆ ڤێ مەبەستێ زۆر بزاڤکر بوون. دبەرامبەر دا، نەبتنێ ئیقبال دەولە بڤێ چەندێ رازی نەبوو، بەلکۆ ئیهانا ئابۆتی ژی کر بوو. دبەرامبەر دا، ب مەرەما هندێ، کۆ شێخ بۆ ئابۆتی ب سەلمینتن، هەلوێستێ وی بەروڤاژی یێ ئیقبال دەولە بە، دژی خۆین رشتن، شەر و ئالۆزیانە و لدۆیڤ داخوازی و ئامۆژگاریێن ئابۆتی چوو. هەروەسا شێخی داخواز ژ ئابۆتی کر، کۆ نامەیەکێ بدەتنێ داکۆ ل پاشەڕۆژێ بۆ بهێتە سەلماندن، کا تا چ ڕادە هەلوێست و رەفتارێن شێخی یێن مرۆڤایەتیێ بوون، بەلێ ئابۆتی داخوازییا وی رەتکر بوو(باقی، 2000، 60).

دناڤ گەرمایەتیا شەری و ب شەرچوونا هێزێن کوردی و ئیرانێ، پشتی بۆ ئابۆتی دیار بوو، شەر د بەرژەوەندییا شێخی دا نینە، بریاردا بزڤرتن تەبریزێ ڤە. ل زڤرینا خۆ دا، ژبەر نەئارامییا رێکا سەلماس و خۆی یاکو پێ هاتی دەڤ شێخی و ئەڤ رێکە ددەستێ هێزێن ئیرانێ دا بوو، ژبەر هندێ بریاردا، برێکا شنۆ، سندووس، سابلاغ و میاندواو بزڤرتن تەبریز، ئەڤ رێك دئازادکرنێ دابوون و دبن کونترۆلا هێزێن کوردی ڤە بوون. هەروەسا شێخ عوبەیدۆللای نامەیەك بۆ کورێ خۆ شێخ عەبدۆلقادری هنارتبوو و تێدا داخواز ژێکر هاریکاریا ئابۆتی بکەن تاکۆ بگەهتن جهێ خوو. بڤێ چەندێ شێخێ تا سابلاغ ب هێزێن خۆ ڤە هاریکاریا ئابۆتی کر، ل سابلاغ، ئابۆتی شێخ عەبدۆلقادر، هەمزە ئاغایێ مەنگۆر و هندەك سەرکردەێن دی یێن شۆرەشێ دیتبوون و چاڤێکەفتن لگەل ئەنجامدابوون(جویدە، 2007، 71).

ل سابلّاغێ ژی، شێخ عەبدۆلقادری، 300 چەکدار ب سەرۆکاتیا هەمزە ئاغا، عەبدۆلّلاخانێ زەرزا و چەندین سەرۆك هۆزێن ناڤدار هەتا دەڤرا (بناو) لگەل هنارتن. بەرامبەری ڤێ قەنجییا کوردان، لدەمێ ئابۆت گەهشتیە دناڤ هێزێن ئیرانێ دا، دەنگ وباسێن ژمارا چەکدارێن کوردی و جهێن وان نیشا سەرکردەێن هێزێن ئیرانێ دا بوون(Nzibari,2012). ئەڤ هەلوّیستێ ئابۆتی، بۆ دۆیڤ نەچوونا ئەڤان جۆرێن داخوازیێن شێخی، نموونەیەکا زیندی یا هەمی دبلوّماتکارێن بەریتانیا بوو، دنامە و ڕاپۆتێن خۆدا بۆ بێن دسەر خۆ دا، هزروبیرێن خۆ ب شێوەیەکێ نەدۆستانە بەرامبەری کوردان بڤی رەنگێ ل خۆارێ دیارکرینە :.

1. پشتەڤانیا داخوازیێن نەتەوەیی بێن کوردان نەهێتنکرن،
2. داخواز ژ کوردان بهێتە کرن، پێگیریێ ب بریارێن حکوومەتێن ناڤەندی بکەن،
3. گەلێن مەسیحی دپشکداریکرنا شۆرەشا کوردی دا دویر بکەن،
4. ناڤ و دەنگیا شۆرەشێ بشکێنن و ڕووسیا قەیسەری ب پشتەڤانیکرنا وێ گونەهبار بکەن ، داکۆ هایداربوون و پشتەڤانیکرنا تورکیا ب دەستڤەبینتن داکۆ ئیرانێ لاواز بکەتن و ڕووسیا قەیسەری وێ ڤالاهیا سیاسی لدەڤەرێ پر بکەتن(باقی،2000 ،55).

پشتی شرۆڤەکرنا پەیوەند و سیاسەتا بەریتانیا هەمبەری شۆرەشا شێخی، دشێن هەلوّیستێ بەریتانیا ژ شۆرەشێ دیار بکەین و بێژین ژبەرکو شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلّاهی شلقەکا هەستیار و مەترسیدار ل دەڤەرێ پێڤە دیاربوو. دئەنجامدا، هەر زیکا ل ئەورۆپا دەنگڤە دا و بەربەلاڤبوو. چونکو هێرشکرن بۆ سەر ئیرانێ و داگیرکرنا وێ بخۆ بخۆ کێشایەکا نێڤدەولەتی بوو. بێ چەند و چەندایەتیەك دا دەولەتا عوسمانی هێتن دناڤ دا . ژبەرکو شێخ هەڤوەلاتیێ وێ بوو و هەر دناڤ عەردێ وێ دا دەست ب هێرشێ کربوو(جویدە، 2007، 72).

ژبەر هندێ، بەریتانیا ژلایێ خۆڤە، بایەخەك گرنگ ب پاراستنا قەوارێ دەولەتا عوسمانی ددا. هەروەسا ب رەنگەکێ هویر و کویر چاڤدێریا بویەر و پێشهاتێن شۆرەشێ دکر هەتا کو گەهشتیە وی رادەیی هێرش دکرن سەر دائێخستنا سنوورێ ئیرانێ بەرامبەری ڕووسیا قەیسەری دکر. بێگومان ئەڤ چەندە دابیتە ئەگەرێ هندێ کو دەولەتا عوسمانی پشکداریێ دوان بارودۆخێن هەستیار دا بکەتن(Kılıç,2003,88)،لدۆیڤ هزروبیرێن ڤەکۆلەرێ، دشێن بکورتی هەلوّیستێ بەریتانیا ژ شۆرەشا شێخی بڤی رەنگێ ل خۆارێ دیار بکەین:

1. نۆێنەرێن بەریتانیا بۆ شێخی دیارکر بوو کو ئەو دژی شۆرەشا وی نە و دڤێتن ئەو هێزێن خۆ ژ ئیرانێ ڤەکێشتن بۆ چیتن جهێ خۆ یێ رەسەنی کوردستانێ.
2. دەستهەلاتداریا بەریتانیا یا دوو دل بۆ ژ شۆرەشا شێخی. چونکی ئەو ژێدەرێ پێزانین دانێ ئەرمەنی بوون. ئەوان زۆر بخرابی بەحسێ کوردان دکر.
3. بەریتانیا نەدشیا (زەلامێ نەخۆشێ ئەورۆپا)، ب ئاشتیێ دناڤخۆ بخۆدا دابەش بکەتن.چونکو بڤێ چەندێ دا ئارامیا دەڤەرێ تێکچتن و دا مەترسی کەڤن سەر بەرژەوەندیێن بەریتانیا ل دەڤەرێ.
4. دۆژمناتیا بەرتیانیا بۆ عوسمانیان ل دەڤەرێ دوژمناتیا موسلمانا بوو. چونکی سوّلتانێ وێ خەلیفە بوو.
5. بەریتانیا دەربارەی ڤێ چەندێ زۆر هەستیار بوو، ژبەر داگیرگەهێن خۆ بێن مۆسلمان ل هندێ و جیهانا ئیسلامی.

ل ئەوی دەمیدا بەڕێتانیا هەلوّیستێن خۆ بڕێکا نوونەرێن خۆ مینا ئابوتی بۆ شێخی لدۆر پێشهاتێن شۆڕەشا ئەوی دیاردکر ئەو ب دژی ئارمانج و بزاڤێن شۆڕەشا ئەوینە، ژبەر هندێ بەڕێتانیا ب هیچ ڕەنگەکێ ئامادەنەبوو هاریکارییا کوردان خۆ دبیاڤێ مرۆڤایەتیدا بکەت، چونکی بەڕێتانیا وەسا هزردکر ڕووسیا قەیسەری کورد بۆ پاراستنا بەرژەوەندیێن خۆ ب دژی عوسمانیان دکر. هینکێ بەڕێتانیا ژ شیانێن کوردان دوو دڵ بوو و کورد ب مرۆڤێن (شەرخواز و توندرەو) دڕاپۆرتێن بەڕێتانیا هاتبوون نیاسین. چونکی پتریا ئەوان ڕاپۆرتێن لسەر کوردان هاتینە نڤیسین ئەرمەنیان نڤیسابوون و بەڕێتانیا بۆ وەرگرتنا مفایی ژێ ل پاشەرۆژە وەردگرت.

6: هۆکارێن شکەستنا شۆرەشا شێخ عوبەیدۆلّا نەهری

پشتی ئەنجامدانا ڤێ ڤەکۆلینێ چەندین ئەگەر لدۆر ئەگەرێن شکەستنا ڤێ شۆڕشێ ژلایێ ڤەکۆلەریڤە هاتنە ئاشکراکرن، بڤێ رەنگێ لخوارێ هاتینە دیارکرن:.

1. لدەمێ شۆرەشا شێخی بەرپالبووی زانایێن ئایینی بەیاننامەك بناڤێ شەرێ پیرۆز بەلاڤكر و تێدا كوردێن سوننە بدژی شیعەیان پالدان. ئەڤێ بەیاننامێ ئەنجامێن خراب ب دۆڤ خودا ئینانن، كەرب و كینەكا تۆند دناڤ شیعەیان دا بەلاڤكربوو. لەوڕا ئەڤ شۆرەشە ببوو شەرەكێ ئایینی و نەتەوەیی ب دژی ئیرانێ.
2. خیانەت و نەیاز پاقژییا هژمارەكا زۆرا سەرۆك هۆز و خێلێن كوردی دبەرتەنگیان دا دهات پال شێخی و دەمێ دبوو شەر دچوون دگەل دۆژمنی
3. نەبوونا هەڤسەنگێ دبیاڤێ هژمار و ئێكگرتنێ دا دناڤبەرا هێزێن شۆرەشێ دا دگەل یێن ئیرانێ، هەروەسا هەلوێست و رەفتارێن هۆڤانەیێن سەربازێن ئیرانێ بۆ ژناڤبرنا شۆرەشا كوردی بخۆ بخۆ هۆكارەك بوو ژبۆ رەڤینا هێزێن كوردی هەمبەری هێزێن ئیرانێ.
4. نەبوونا چەكەكێ زۆر و پێشكەڤتی داكو پێ بشێن بەرەڤانیێ ژخو بكەن ، بكاربینن د شەران دا.
5. رێكخستن و بهێزكرنا لەشكەری مەرجەكێ سەرەكی بوو ژبۆ رێڤەبرنا كاروبارێن شۆرەشێ. بەلێ چوو پێڤەرێن رێكخستنێ دهێزێن شێخی دا نەبوون. بەرەڤاژی، هێزێن شێخی هێزێن هۆزان بوون، ئانكۆ نەرێكخستی بوون و شارەزایی دبیاڤێ بكارئینانا چەكیدا نەبوون. دگەل هندێدا، شێخی ئەو بربرا پشتا شۆرەشا شێخی بوون.
6. نەبوونا هەمانهنگیێ دناڤبەرا سەركردەێن شۆرەشێ، ب تایبەتی ئەوێن سەركردایەتیا كەرتێن شۆرەشێ دكرن. ئەڤە ژی بۆ هندێ دزڤریتن كو هێزێن شۆرەشێ ئامرازێن پەیوەندیكرنێ یێن بهێز نەبوون. دهەمان دەمدا، چەپەرێن وان یێن شەری ژ ئێك دوو دیربوون و نەدشیان ب سناهی پێزانینانن ل دۆر پێشهات و كاودانێن هەستیارێن شۆرەشێ شرۆڤە بكەن.
7. هەورەسا نەبوونا هێزێن پشتەڤانی و هەوارهاتنێ، لدەمێ هێزێن وان دكەڤتن كاودان و پێشهاتیێن هەستیار و تەنگاڤ دا ل هەوارا وان بچن. هەبوونا ئەڤاە جۆرێن هێزا بۆ شۆرەشێ زۆر گرنگ و پێدڤیبوون. چونكو شۆرەش دناڤبەرا سنوڕێ دوو وەلاتێن بهێز و دۆژمنێن كێشا كوردی دا هاتبوو بەرپالكرن.
8. پتریا هێزێن هۆزان ئەوێن پشكداری دشۆرەشێ دا كرین بتنێ بۆ دەستكەفت و تالانكرنێ پشكدار دبوون، ل مەیدانا شەری چەپەرێن شەری بجە دهێلان و بەرەڤ مالان دچوون ژبۆ تالانكرنێ و بدەستڤەئینانا دەستكەفتان بۆ سەرۆك هۆزێن خۆ و خوو. سەرەرای هندێ، بەری ئەو بهێن دناڤ هێزێن شێخی دا بۆ ب قۆرئانێ سۆیندخوار كو كارێن نەرەوا نەكەن.
9. خەلكێ ب شێوەیەكێ گشتی هێڤی و ئومێدێن مەزن ب شۆرەشێ هەبوون، چاڤەریێ هندێبوون كو كو ڕۆژ بۆ ڕۆژێ كاودانێن ژیان ، ئاسایشا وان بەرەڤ باشبوونێ ، هەروەسا ب ئێكجاری ژ زلم و زۆرداری و چەكێ دەولەتا قاجاری و عوسمانی رزگار بن. بەلێ ژبەر دەست درێژیكرنا هێزێن شێخی بۆ سەر مالێن خەلكێ و كوشتنا هژمارەكا زۆرا خەلكێ ب تایبەتی د هێرشا مهاباد و میاندواو دا، ئەڤە بۆ ئەگەرێ هندێ خەلكێ دەڤەرێ كەربێ ژ هێزێن وی وەرگرن و هاریكاریان هێزێن ئیرانێ بكەن ژبۆ دەركرنا هێزێن شێخی
10. شێخی نەشیا پشتەڤانیەكا بهێز یا كێم نەتەوێن دناڤ دەولەتا عوسمانی و قاجاری دا، ب تایبەتی (ئاشوری، بەلۆجی و ئەرمەنیان)، بدەستڤە بینتن. ئەڤە ژی بۆ هندێ دزڤرتن كو هێزێن شێخی زۆر دەست نەخۆشی بۆ وان دورست دكرن، نۆزەنەرێن دەولەتێن زلهێز ب تایبەتی مزگینەرێن وان یێن ئایینی ب تایبەتی یێن بەریتانیا بزاڤكرینە رووبێ راستەقینەیێ شۆرەشێ بەرەڤاژی بۆ وان شرۆڤەكەن. ئانكۆ وەسا بۆ دایە دیاركرن ئەو ئارمانجێن شێخ بۆ پرۆپاگەندەیان دكەتن بتنێ بو هندێ نە كو بشێتن پشتەڤانن بۆ خو پەیدابكەتن و پێگەهێ خۆ دناڤ خەلكێ دا بهێز بكەتن. دهەمان پێنگاڤێن خودا دایە ئاشكراكرن ئەگەر هاتوو شۆرەشا شێخی ب سەركەفت و ئارمانجێن خۆ بدەستڤەئینانن، ئەو دەولەتا شێخ سەرۆكاتیا وێ دكەتن دێ هەمان سیاسەتا عوسمانی و قاجاریان هەمبەری وان بكارئینتن.
11. نۆزەنەر و دبلۆماتكارێن سیاسی و لەشكەری یێن بەریتانیا ئەوێن كارێن سیاسی و هەوالگێریێ دناڤ دەولەتا عوسمانی و قاجاری دا دكرن، بەردەوام بزاڤ دكرن كو مەسیحیان بدەن پاش و داخواز ژێدكرن نەهاریكاریان پێشكێشی هێزێن شێخی بكەن و نەپشكداریێ دشۆرەشێ دا بكەن
12. ژبەركو دەولەتێن زلهێز ب تایبەتی بەریتانیا و وەلاتێن دی یێن ئەورۆپا شۆرەشا شێخی ب مەترسیەكا هەستیار و گرنگ بۆ سەر بەرژەوەندییێن خۆ ل دەڤەرێ ب تایبەتی ل ئیرانێ دیت. لەوڕا رابوون ئالیكاریێن سەربازی و ئابۆری ژ هەمی لایەنانڤە پێشكێشی دەستهەلاتداریا ئیرانێ كرن د ماوێ هێرشا شۆرەشێ دا بۆ سەر دەڤەرێن كوردی ل ئیرانێ.

13. هەر ژ دەستپێکا بەرپالبوونا شۆرەشێ شێخی دەست بزاڤێن دبلۆماسی دگەل نوێنەرێن دەولەتێن زلهێز کر ژبۆ بدەستڤەئینانا پشتەڤانیا نێڤدەولەتی بۆ شۆرەشێ. بەلێ شێخ د بزاڤێن خودا سەرکەفتی نەبوو و نەشیا پشتەڤانیا دەولەتێن زلهێز (رۆسیا، بەریتانیا، فەرەنسا و ئەمریکا)، بدەستڤە بینتن. ئەڤە ژی بۆ هندێ دزڤریتن کو کورد نەخودان کیانەکێ سیاسی یێ سەربەخۆ بوون، بەلکۆ وەك کێم نەتەوە دبن دستهەلاتا عوسمانی و قاجاریان دا دچاڤێن دەولەتێن زلهێزدا دهاتنە دیتن.

14. دماوێ رووبدانا شۆرەشێ دا و هەوێن شۆرەشێ دا بۆ سەر دەڤەرێن کوردی ل ئیرانێ، دەستهەلاتداریا ڕووسیا قەیسەری بێ دەنگ مابوو، چوو هەلوێست و سیاسەت هەمبەری شۆرەشێ دیار نەکربوون. ئەڤە ژی بۆ هندێ دزڤریتن کو شێخی پشکداری د شەرێن ڕۆسی و عوسمانیان یێن سالێن 1877- 1878ێ دا کربوو. دهەمان دەمدا، هژمارەکا باشا کوردان دناڤ ڕووسیا قەیسەری دا دژیان، دەستهەلاتداریا ڕووسیا قەیسەری دترسیا، ب دیارکرنا هەلوێستەکێ هەمبەری شۆرەشێ ، دەرگەه بو وان بهێتە ڤەکرن و پشکداریێ د شۆرەشێ دا بکەن. هەروەسا دترسیا ئەگەر هاتوو شۆرەشا شێخی ب سەرکەفت ئەو کورد داخوازا هەمان ئارمانجێن شۆرەشا شێخی بکەن.

15. ئاشکراکرنا پلان و ئارمانجێن شۆرەشێ بو نوێنەر، دبلۆماتکار و کەسایەتێن نەجهێ باوەرێ یێن کو بۆ مەبەستێن خو دگەل شێخی کوم دبوون یان پشکداری دشۆرەشێ دا کرین. ئەڤ چەندە دهێنە دیتن دپرتیا وان کومبوونێن شێخی دگەل نوێنەرێن بەریتانیا ئەنجامداین. دهەمان دەمدا، د ئەوان نامەێن شێخی بۆ نوێنەرێن بەریتانیا فرێکرین ب روونی و ئاشکرایی هاتینە دیارکرن.

16. هەروەسا نوێنەر و دبلۆماتکارێن بەریتانیا ب هەمی شیانێن خۆ پێزانینێن نهێنی ل دۆر بزاڤ، پێنگاڤ، پلان و هێزێن شێخی ددان دەولەتا قاجاری و عوسمانی. لەوڕا دێ بینن، بۆ ڤێ مەرەمێ، هەر ژ دەستپێکا رووبدانا شۆرەشێ نوێنەر و دبلۆماتکارێن بەریتانیا هەمی شیانێن خۆ مەزاختینە بهێنە دناڤ دەڤەرێن دبن کونترۆلا شێخی ڤە، کومبوون دگەل خەلکێ کرینە هەتا چاڤێکەڤتن دگەل شێخی بخۆ ژی ئەنجامداینە داکو پێزانینێن دورست ل دۆر هەمی لایەنێن شۆرەشێ بدەستخۆڤە بینن.

17. دەستهەتداریا بەریتانیا بەردەوام بزاڤ دکرن کو دەولەتا قاجاری و عوسمانی پالدەتن سنۆرێن خۆ بپارێزن، ئێك بگرن و دئێك چەپەردا ب دژی هێزێن کوردی شەری بکەن ژبۆ ژناڤبرنا شۆرەشا کوردی. بێگومان بەریتانیا ئەڤ چەندە دکر داکو زیان ب بەرژەوەندیێن وێ نەکەڤن و دا رێکا چوونا وێ بۆ هندستانێ بمینتن پاراستی.

دەرئەنجام

پشتی ڤەکۆلینی ل دۆر ئەڤی بابەتی هاتیە ئەنجامدان چەندین دەرئەنجام و راستیێن دیرۆکێ ژێ پەیدابوون.

هەر دەستپێکا ڕوبدان شۆرەشا شێخ عوبەیدوڵڵاهێ نەهری بەرێتانیا ب بڕێکا دیپلۆماتکاری و نوونەرێن خۆ ب هووری دۆیڤچوونا هۆکارێن لپشت ڕویدانا ئەوێ دکرو دا دیارکرن سیاسەتا عوسمانیان یا بکارهینانا ئاینێ ئیسلامێ و بەرەڤ پێشڤەچوونا هزرا نەتەوەیی ئەگەرێن ڕویدانا شۆرەشێ بوون.

دیسان قۆنسۆڵ و نوونەرێن بەرێتانیا ل دەڤەرێ ب شێوەیەکێ بەردەوام بزاڤدکرن هەلسەنگاندنا ئارمانجێن شۆرەشا شێخی بکەن و بۆ ڕونبوو ئارمانجا سەرەکی یا شێخی ئێکگرتنا هۆزێن کوردی و دروستکرنا دەولەتەکێ بۆ کوردان بۆ، ژبەر هندێ شێخی هەولددا خۆ نێزیکی نوونەرێن بەرێتانیان بکەت و ئارمانجێن خۆ بۆ ئەوان ڕون بکەت.

ل ئەوی دەمیدا بەرێتانیا ب شێوەیەکێ زۆرێ هشیار دۆیڤچوونا هێز و شیانێن شەرڤانێن شێخی و چەکێ ئەوان دکر و بۆ ڕون ببۆ شێخی ڕێژەیەکا باشا چەکی هەیە و هێزەکا زۆرا شەرڤانن یا هەی و ئاریشەیا سەرەکی یا شەرڤانێن شێخی ئەو بۆ نەهاتبوون ڕێکخستن و مەشقکرن و شەرڤانێن کورد ب دروستی فێری ستراتیژیێن شەرکرنێ دگەل هێزێن بیانی دناڤ باژێران دا نەبوون بەرۆڤاژی شەرڤانێن کورد فێری شەرێن چیای ببوون.

بەریتانیا ژ پێشڤەچوونێن شۆرەشا شێخی نەئارامبو و نەدڤێن پێشڤەچوونێن ئەوێ ببنە ئەگەرێ پەیداکرنا مەترسییان لسەر ڕەوشا عوسمانیان. ژبەر هندێ دیپلۆماتکارێن بەریتانیا ددا دیارکرن بەریتانیا ناهێلیت ب هیچ ڕەنگەکێ مەترسی بکەڤنە سەر دەولەتا عوسمانی و بۆر روی ب روی بوونا هەر ئاریشەکێ دێ هێزێن دەولەت عوسمانی ب هەمی شیانێن خۆ بەرەڤانیێ ژ دەولەتا عوسمانی کەت. ژبەر هندێ دیپلۆماتکارێن بەریتانیا ڕابوون پێزانیێن تێروتەسەل لدۆر پێشڤەچوونا شۆرەشا شێخی پێشکێشی عوسمانیان و لیستەکا ناڤێن سەرۆک هۆزێن کوردی یێن جهێ گومانێ پێشکێشی هێزێن عوسمانی کرن و ئەو ب توندی سزادان یان کوشتن.

لسەردەمێ شۆڕەشا شێخ عوبەیدوڵڵا نەهریدا ڕاگەهاندنا بەڕێتانیا مینا ڕۆژنامەیا لەندەن گرنگییەکا زۆر ب ڕویدانێن ئەڤێ شۆڕەشێ دا و شۆڕەشی ئەوی ب مەترسی بۆ سەر دەولەتا عوسمانی دزانی و دیارکر کورد شێخی وەک ڕێبەرێ بزاڤا خۆ یا نیشتمانی دزانن و کورد پشتەڤانیا ئەوی دکەن چونکی ئەو هەولددەت دەولەتەکا نەتەوەی و گرێدایی بنەماێن ئیسلامێ و دابوونەریتێن کوردی ڤە ل دەڤەرێ ئاڤا بکەت.

هەروسا شێخی بزاڤێن خۆرتکرن کو پشتەڤانیا نێڤدەولەتی ب تایبەتی بەڕێتانیا بدەستڤەبینتن. ژبۆ ئەڤێ مەبەستی رابۆ بگێرێدانا دانووستاندن و هنارتنا نامەیان بۆ نۆێنەر و بالیۆزخانەێن وەلاتێن زلهێز وەك بەریتانیا کرن. دگەل هندێدا، ژلایەکێ ڤە، نەکو بتنێ ئەڤ دەولەتە بێ هەلوێست مابوو، بەلکۆ دهندەك کاودانا دا هاریکار و پشتەڤانیا دەستهەلاتداریا ئیرانێ دکرن داکو جو زیان ب بەرژەوەندی و مسیونەرێن ئەوان یێن بەلاڤکرنا ئایینێ مەسیحی ل دەڤەرێ نەکەڤن.

ژلایەکێ دیڤە، بەریتانیا ب هەمی شیانێن خۆ ب دژی بزاڤێن شۆرەشێ راوەستایە، ب تایبەتی ژی ل دەمێ هێزێن شۆرەشێ بەرێخوداینە ڕۆژهەلاتێ کوردستانێ، بەریتانیا زۆر دل تەنگ ببوو هەتا گەهشتی ئەوی رادەیی داخواز ژ نۆێنەرێن خو کری سەردەدانا دەڤەرێن دبن دەستهەلاتا شێخی ڤە بکەن ژبۆ کومکرنا پێزانینان ل دۆر هێز و شیانێن شێخی. دیسان نەستووری و ئەرمەنی پالدان ب دژی شۆڕەشا شێخی ڕاوەستن. بەریتانیا ئەڤ چەندە دکر داکو چوو پارچە ژ ئیرانێ ڤە نەبن. چونکو بەریتانیا ئیران وەك پرەکێ بۆ پاراستنا ئمبراتۆریەتا خۆ ل هندێ دیت. لەوڕا دێ بینن، د زۆر هەلکەڤتان دا ئیران و عوسمانی پالدانە د ئێك چەپەر دا ب دژی شۆرەشا کوردی راوەستن.

لدوومامهیێ وەسا دهێتە هزرکرن مەزنترین خەلەتی د شێخی د بوویەر و پێشهاتێن شۆرەشا خۆ داکرین، ئەو بوویە کو شێخشی پشت بەستن ل سەر هێزێن هۆزان کری یە و کرینە بربرێن پشت شۆرەشا خوو. هەروسا د کومبوون، دانووستاندن و نامەێن خۆدا، شێخی ئارمانج و پلانێن شۆرەشێ بۆ بالیۆز و نۆێنەرێن وەلاتێن ڕۆژئاڤایی ب تایبەتی بەریتانیا گوتینەو ب تێروتەسەلی بۆ وان شرۆڤەکرینە.

ئەڤ چەندە بۆیە ئەگەرێ هندێ کو ئەو مفا ژ هزر وبیرێن شێخی وەرگرن و پێزانینا بدەن دۆژمنێن شۆرەشێ هەتا گەهشتیە وی ڕادەی کو نۆێنەرێن وان ماتێکرنێ د هێرشێ هێزێن شێخی دا بکەن و داخوازێ ژێ بکەین هێرشێن خۆ بۆ ماوەیەکێ پاش بێخن. ئەڤێ چەندێ دەلیڤە دایە هێزێن دۆژمنێن شۆرەشێ خۆ پتر ئامادە و بهێز بکەن بۆ هێرشان. دبیت ئەڤ چەندە رێکەڤتنەك نهێنی بێتن دناڤبەرا نۆێنەرێن وەلاتێن بیانی و هێزێن ئیرانێ دا هاتبین ئەنجامدان، بەرامبەری هندەك دەستکەفتان.

پاشبەند

دارا مالباتا شێخێن نەهری



درەختی ساداتی نەهری

(عەلی، 2016، 5)

نامەیەک دەربارەی شێخ عوبەیدوڵڵا نەهری



(Aytemur, 2020).

بەلگەنامەیا دەستپێکرنا ئاریشەیان دناقبەرا شێخ عوبەیدوڵڵا نەهری و ئیرانێ دا ل ساڵا 1872



(Ateş, 2013,14)

نامەیا شێخ عوبەیدوڵڵا نەهری بۆ خەلکێ ئەرجش

(Ateş, 2013,14)

نەخشێ هێرشێن شۆرەشێ ل کوردستانا ئیرانێ



(Nzibari, 2012)

ڕاپۆرتێن قونسوڵێ بەریتانیا وێلیەم ئابۆت ل تەبریزێ ل دور شۆرەشا شێخ عوبەیدۆڵاهی

Report from William Abbot

Tabreez, 1 October, 1881

I mentioned in my Dispatch No.27 of last year, which I had the honor to address to your Lordship that on quitting Oroomiah [Urmiya] I had an interview with the Sheikh Obeidullah [Ubeydullah]. Considerable interest appears to attach to that Kurdish chief who is now at Constantinople. I have therefore thought that a brief account of the conversation I had with him as well as a description of his person and character may prove interesting to her Majesty's government . . . He speaks Turkish and Persian fluently but with a Kurdish accent, and has a considerable knowledge of Arabic . . .

I had heard so much about him, but never anticipated that it would fall to my lot to be in personal relations with him. I appreciated the kindness and courtesy he had shown me and thanked him for the readiness with which he had listened to my representation on behalf of Christian and Mussulman non-combatants as well as for restoring property, which his troops plundered from Nestorian villages. I then asked the Sheikh what his programme was. He replied that he wished to reorganize Kurdistan. I enquired how he intended doing this, adding that he was neither justified in making war upon Persia nor raising a rebellion in Turkey, to attain his object. He then observed that he had been badly treated by both these powers. The Porte not has given him credit for good intentions. Kurdistan required to be ruled with an iron hand. No one understands its requirements better than he did. There remarked the Sheikh that he was treading on delicate ground. Did he imply that his object was to form Kurdistan into a separate Principality, independent of the Porte or merely to weld together its rude component elements, reduce order out of chaos and became the responsible head of Kurdish nation answerable to the Sultan for their good conduct as well as for the collection of the taxes? To this the Sheikh replied that nobody ever doubted his loyalty to the Sultan, but that he had a very poor opinion of the Pashas. He felt that the moment had arrived when something ought to be done for Kurdistan. He loved his countrymen. They were sorely in need of reforms. It was true that they were uneducated, undisciplined, addicted to brigandage and altogether in a most barbarous condition. He was anxious to remedy these evils and place his people in the position to which human beings they were entitled. The Kurds in Persia had been shamefully treated. Exaction, oppression, cruelty, violence, lust, every species of wrong, these had been the

(Report by the British Consul on the Sheikh Ubeydullah Revolt in 1880-1881)

ڕاپۆتێن بەریتانیا ل دۆر هێرشا شۆرەشا شێخی بۆ سەر ئیرانێ



TURKEY. No. 5 (1881).

CORRESPONDENCE

RESPECTING THE

KURDISH INVASION OF PERSIA.

Presented to both Houses of Parliament by Command of Her Majesty.
1881.

LONDON:
PRINTED BY HARRISON AND SONS.
[C.—2851.] *Price* 1½*d.*



TABLE OF CONTENTS.

(Report by the British Consul on the Sheikh Ubeydullah Revolt in 1880-1881)

ڕاپۆتێن بەریتانیا ل دۆر هێرشا شۆرەشا شێخی بۆ سەر ئیرانێ





(Report by the British Consul on the Sheikh Ubeydullah Revolt in 1880-1881)

سەرەدانا دکتۆر کۆچرانی بۆ چارەسەرکرنا شێخ عوبەیدۆڵلا نەهری ل نەهری، بەهارا 1880ێ

(Ateş, 2013,12)

مرنا شێخ عوبەیدۆلا نەهری د راپۆرتەك ڕۆژنامەیا نیۆیۆرك تایمز و ڕۆژنامەیا پێداچوونا نەفتێ یا ڕۆژانە دا

Obituary 1 -- No Title
New York Times (1857-1922); Nov 20, 1883;
ProQuest Historical Newspapers: The New York Times (1851-2008)
pg. 1

OBITUARY NOTES.

Sheik Obeidullah, the Kurdish Chief, has died of cholera at Mecca

(The New York Times, 20 November 1883,1)

Special to The Oil Review.

London, Nov. 3.—Persons who are prominent in court circles confirm the rumor that the Prince of Wales is in delicate health, his lungs said to be in weak condition.

UNDER THE SULTAN.

The Way the Turkish Ruler Removes His Enemies.

Things get done in the sultan's realms, things like the massacres of 1895 in Asiatic Turkey and of 1903 in Macedonia, which come home to the consciousness of every thinking Turk. Take the case of the Kurdish Sheik Obeidullah, who was a guest of the sultan for a time in 1883 and was afterward sent to Mecca in order that pious occupations might keep him out of mischief. He died very soon after his arrival of cholera, it was officially announced, although he was the only sufferer from cholera in Mecca that year.

Take the case of Mithad Pasha, the liberal prime minister and the champion of parliamentary government. He was tried for treason in aiding to dethrone Sultan Abdul Aziz and was sent to Taif, near Mecca. After a time he died rather suddenly. By and by a man who had been a soldier in Arabia appeared in Constantinople babbling a tale that ended with, "I did not know that it was Mithad Pasha or I would not have put the soaped cord about his neck." Of course the police saw that the man was crazy and put him where he was safe from harm.

Take the case of Said Pasha, ex-grand vizier, who fled to the British embassy in Constantinople seven or eight years ago, declaring that he would be killed unless allowed asylum and who could not be induced to leave the building until the ambassador brought him a formal promise of safety sealed with the sultan's own seal.

Meditation upon this class of mysteries makes people shake in their shoes every time that they see one of the great army of paid informers who know everything. Men do not say that the sultan does the things which cause this trepidation, but that "the palace" does them. They speak of the "palace" as though it were a sentient but invisible organism, and when they speak of it they look behind them and take out their handkerchiefs and wipe a clammy sweat from their faces.—Henry Thompson in World's Work.

A Gentleman.

Class distinctions in England are

Coats

We just purchased
turer; all styles, all co
of coats in the city a
think of buying a coat

Look Thi

Our ready

A. D.

(The DAILY OIL REVIEW, 3 November 1908)

گۆڕێ شێخ عوبەیدوڵڵا نەهری ل مەکەهێ

(Ateş, 2013,13)

گوندێ نەهری: کەلها شێخ عوبەیدوڵڵا نەهری

(Ateş, 2013,14)

لیستا ژێدەران:

ب پیتێن عەرەبی:

باقی ، محەمەد حەمە ،2000، شۆرشی شێخ عوبەیدوڵڵای نەهری: 1880لەبەڵگەنامەکانی قاجاری دا ، چ1، چاپخانەی وەزارەتی پەروەردە، هەولێر.
باقی، محەمەد حەمە،2010، بیرەوەرییەکانی سەید عەزیز شەمزینی (زیندەکیی من)، چاپخانەی شڤان، سلێمانی.
بوسکێنی، ڕەسول.(2022). ڕۆڵێ باشووری کوردستان لە ڕاپەڕینی شێخ عوبەیدوڵڵای نەهریدا و چەند بەباتێکی مێژووی، ئامادەکردنی: هەوڵنامەی کتێب، چاپی دیگیتاڵی.
بۆسکێنی، ڕەسول.(2012). کێشەی ڕۆژهەڵات و ڕاپەڕینی بەدلیس، چ1، چاپخانەی حەمیدی: سلێمانی.
الربيعي، نبيل عبدالأمير.(2018). ثورة الزعيم الروحي للكرُد الشيخ عبيدالله النهري 1880م (الحلقة الأولى)، الحوار المتمدن(5964)، متاح عن: https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=608572
عثمان، فارس.(2020). انتفاضة الشيخ عبيدالله النهري و الموقف الدولي، مجلة الشرق الأوسط الديمقراطي،متاح عن: https://alawset.net/2020/04/15 /انتفاضة-الشيخ-عبيد-الله-النهري-والموق/#_ftn24 (https://alawset.net/2020/04/15 /انتفاضة-الشيخ-عبيد-الله-النهري-والموق/#_ftn24
عەلی ، جەعفەر ، 2013، ناسیۆنالیزم و ناسیۆنالیزمی کوردی ، چ1، هەولێر :چاپخانەی ڕۆژهەلات.
عەلی، تێلی ئەمین.(2016). بزوتنەوەی شێخو عوبەیدوڵڵای نەهری لە بەڵگەنامەکانی بەریتانیا دا، وەرگێران" زێبار عەزیزخان مهاجر ، چ1، چاپخانەی ناوەندی هزر: سلێمانی.
فتح الله، جرجيس.(2010). مبحثان على هامش ثورة الشيخ عبيدالله النهري، ط3، دار ئاراس للطباعة و النشر: أربيل.
گولی. مەسعود خالد.(2021). شێخ عوبەیدوللایێ نەهری ، چاپخانا کاروان: دهوک.
مزیری، شعبان.(1992). گرفتاری یا کوردا ل تورکیا، دەزگەها ڕەوشەنبیری و بەلاڤەکرنا کوردی: بەغدا.
وەدیع، جویدە،2007، شۆرشی شێخ عوبەیدوڵڵای نەهری لە بەڵگەنامەی ئەمریکی و بەریتانی : وەرگێران : محەمەد حەمە باقی ، چ1، چاپخانەی دەزگای ئاراس: هەولێر.

Çavkanî / References

Ali, J. (2013). Nasiunalizim u Nasiunalizmi Kurdi, c1, Heweler: Capxanaiy Rojhalat

Ali, T. A. (2016). Bzutnewey Sheikh Obaidulla Nehri la Belganamakane Baritani da, W: Zebar Azizkhan Mehajr, C1, Sulaimane: Capxaney Nawandi Hizr.

Alrbia, Nebil Abdulamir.(2018) sewra al-zaim alruhi al-Kurd Sheikh Obdaidullah Nehr 1880 m (Halqa Awl Al-Hiwar almutmadin, Muta An: https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=608572

Aminpour, M. A. (2018). Kurdish-Christian intercommunal relations: the sectarianization of northern Ottoman-Iranian borderlands, 1830-1914 (Doctoral dissertation, The University of Texas at Austin).

Arizanti, M. (2020). The Rise of Sheikh Ubeydullah and His Disillusionment with Ottoman by K. Soleimani, The Time of Israel, retrieved, 15 April, 2020, from: https://blogs.timesofisrael.com/the-rise-of-sheikh-ubeydullah-and-his-disillusionment-with-the-ottomans-by-k-soleimani/

Aslan, S.A., (2007). Clashes of agencies: the formation and failure of early Kurdish nationalism 1918-1922 (Doctoral dissertation, Royal Holloway, University of London).

Ateş, S., (2014). In the Name of the Caliph and the Nation: The Sheikh Ubeidullah Rebellion of 1880–81. Iranian Studies, 47(5),.735-798.

Ates, Sabri.(2013).Seyh Ubeydullahe Nehri Isyani,Kurt Tarihi,pp.9-15

Atmaca, M. (2017). Three stages of political transformation in the 19th century Ottoman Kurdistan. Anatoli. De l'Adriatique à la Caspienne. Territoires, Politique, Sociétés, (8).

Aytemur, Huseyin Siyabend.(2020). Osmanh Arsiv belgeleriyle Seyh Ubeydullah ve smr Antlasmalari, Independent Tukce, retrieved 18 Temmuz, 2020, itibaren: https://www.indyturk.com/node/213041/türkiyeden-sesler/osmanlı-arşiv-belgeleriyle-şeyh-ubeydullah-ve-sınır-antlaşmaları (31 October, 2024).

Baqi, M. H. (2000). Sorsi Sheikh Obaidullah Nehri 1880 La Balgenamakani Qajarida, c1, capxanei wezareti parwarda, Heweler.

Baqi, M.H(2010). Birewariyekani Sayid Aziz Semzini (Zindeki min), capxaneye Shvan, Sulaiymani.

Beski. H. R.(2013). Malbata Shamdinan u Role awe di bzava rizgarixuwaza Kurdi de, W: Rashad becrmani, c1, duhok: Capxana Perzgeh Duhok.

Buskeni, Resul.(2017). Keseiy rojhelat u Raperiny Badlis, c1, Capxanaiy Hamdi: Suleimani

Buskeni, Resul.(2022). Roli Basuri Kurdistan la Raperini Sheikh Obaidullah Nehri da u cand babateki Mejuiy, Amadekirina : Hewalname Kteb, Capy Dijital.

Çiftçi, E., (2018). *Fragile alliances in the Ottoman East: the Heyderan Tribe and the empire, 1820-1929* (Doctoral dissertation, Bilkent University).

Delan, H., (2006). *The Plight of Kurdish Natinonalism: Critical Analysis of the Kurds in Turkey, Iran, Iran, and Syria around First World War* (Doctoral dissertation, The University of Waikato).

Dennis, B. R. (2015). *Explaining Coexistence And Conflict in Eastern Anatolia, 1800-1878* (Doctoral dissertation, The University of Utah).

Duman, G., (2010). *The Formation of the Kurdish Movement (s) 1908-1914: Exploring the Footprints of Kurdish Nationalism* (Doctoral dissertation, MA thesis). Istanbul: Bogaziçi University).

Fatuallah, Cercis. (2010) Mabahisan ala hams sewra sheikh Obaidullah Nehr, T3, Dar Aras Li tabia o nasir: Erbil.

Ghalib, S. A. (2011). *The Emergence of Kurdism With Special Reference to the three Kurdish Emirates within the Ottoman Empire 1800-1850* (Doctoral dissertation, University of Exeter), p.189

Gözel, O. (2007). The Implementation of the Ottoman Land Code of 1858 in Eastern Anatolia. *Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Orta Doğu Teknik Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü*.

